PIRSIYARIYAN

WERNER GÎTT

WERNER GÎTT

# PIRSIYARIYAN




PIRSÊN KU HER DEM DIXWAZIM BIPIRSIM

Ravensberger Bleiche 6 · 33649 Bielefeld
0521 947240 · info@clv.de · **clv.de**

**Christliche Literatur-Verbreitung**
Bücher, die weiterhelfen

# Fragen, die immer wieder gestellt werden - kurdisch (Kurmandschi)

Werner Gitt

Taschenbuch, 208 Seiten
Artikel-Nr.: 256196
ISBN / EAN: 978-3-86699-196-5

Prof. Dr. Werner Gitt gibt Antworten, die aus der Evangelisationspraxis, aus Gesprächen mit fragenden Menschen und aus dem Studium der Schrift erwachsen sind. Die Fragen sind nicht »am grünen Tisch« entworfen, sondern wurden wirklich gestellt. Von daher handelt es sich nicht um theologische Spitzfindigkeiten, sondern um Probleme, die Zweifler, Fragende und Suchende wirklich bewegen. Der Autor behandelt dabei folgende Themen:
Gott – Bibel – Schöpfung, Wissenschaft und Glaube – das Heil – die Religionen – Leben und Glauben – Tod und Ewigkeit.
Ein hilfreiches Buch zur Gesprächsführung mit Christen und Außenstehenden. Zur Weitergabe an...

Wenn Sie ein "echtes" Buch bevorzugen oder diesen Artikel verschenken möchten, können Sie diesen Download-Artikel ggf. auch käuflich erwerben, solange verfügbar.

**Artikel ansehen auf clv.de**

cLv

Werner Gîtt

# Pirsiyariyan –

## Pirsên ku her tim dixwazim bipirsim

CLV

Christliche Literatur-Verbreitung e.V.
Ravensberger Bleiche 6 · 33649 Bielefeld

**Di Derbarê Nivîskar de:** Prof. Dr. Wener Gîtt, di sala 1937'an de li Raînecka Prûsyaya Rojhelat hate dinê. Di sala 1963'an de dest bi zankoya teknîk ya Hannoverê kir û di sala 1968'an de bawernameya endazyariyê stend. Paşê li Zankoya Teknîk ya Aachenê, di beşa Enstîtuya Endazyariya Sehetîkirinê de wekî asîstan dest bi xebatê kir.
Li pêy lêkolînkirina du salî, di sala 1970'an de li Zankoya Teknîk ya Aachenê dozîneya xwe bi dereca herî serfiraziyê û bi madalyonên Borchers ve bir serî. Hê di Enstîtuya Fizîk û Teknolojî ya Germena Federal de rêvebirî û profesoriyê dike. Di derbarê zanista zanînê, matematîka hejmarî û endazyariya sehetîkirinê de gellek nivîsên wî yên zanistî hene.
Ji bilî vana pirtûkên wekî din jî nivîsandine. Ji vana hinekan bi gellek zimanî ve (Bulxarî, Xirwatî, Çekî, Îngilizî, Fînî, Fransewî, Magyarî, Îtalyanî, Lîtûwanî, Qirgizî, Lehî, Romenî û Rûsî) hatine wergerandin.
Ji sala 1984' de vir de li Zankoya Teolojî ya Basela Swêdenê, wekî profesorê mêvan di derbarê "Kitêba Pîroz û Zanist" de dersan dide. Li Germenîstanê û li derveyî wê hê di gellek zankoyan de di derbarê vê mijarê de konferansan daye.
Wekî din jî li gellek welatî (Awistralya, Awûstûrya, Belçîqa, Fransa, Magyarîstan, Qazaxîstan, Qirgisîstan, Lîtûwanya, Namîbya, Norwêç, Polonya, Portekîz, Romanya, Rûsya, Komara Efrîqaya Başûr, Swêd, Swêden û Yekitiya Dewletên Emerîkî) di derbarê mijara "Bawerî û Zanist"ê de axaftinan kirine.

1st Kurdish Edition (Kurmanji)

© of the German Edition:
Werner Gîtt, "Fragen, die immer wieder gestellt werden"
1989 by CLV · Christliche Literatur-Verbreitung e.V.
Ravensberger Bleiche 6 · D-33649 Bielefeld, Germany
www.clv.de

© of the Kurdish Edition 2018 by CLV
Werger: M.Sait Alpaslan & Resûlê Qereqoçanî
*(Translated into Kurdish [Kurmanji]: M.Sait Alpaslan & Resûlê Qereqoçanî)*
Cover: Gerhard Thiessen
Typography: EDV- und Typoservice Dörwald, Steinhagen
Printed in Germany: by GGP Media GmbH, Pößneck

256196
ISBN 978-3-86699-196-5

# Naverok


**Pêşgotin** 11

**Pêşgotina Di Derbarê Çapa Duyem Ya Îngilizî de** 14

**1. Pirsên Di derbarê Xwedê de ne (PDX)** 15

PDX1: Ma ka ez ê çawa ewle bibim ku Xwedê birastî jî heye? 15

PDX2: Xwedê li ku derê yî? 15

PDX3: Gelo wateya peyva Xwedê çiye? 17

PDX4: Em çima nikarin Xwedê bibînin? 18

PDX5: Xwedayê ku rê li ev qas êş û janên li ser dinê ne dide, ma çawa dibe Xwedayê hezkirinê? Xwedê çima destûra jankêşiya me dide? 18

PDX6: Ma yê ku divê bona her tiştî bête tawanbarkirin ne Xwedê ye? 20

PDX7: Xwedê di dema Peymana Kevin de neteweyek di şeran de bitûmî tune kir, lê belê di Waaza xwe ya li Çiyê de ji me re dibêje ku ji neyarên xwe ve hez bikin. Gelo Xwedayê Peymana Kevin ji Xwedayê Peymana Nû ve cihêtir e? 21

PDX8: Ma Gelo Xwedê Îblîs afirandiye? 22

PDX9: Ma gelo pêkan e ku Xwedê hînî tiştekî nû bibe? 23

PDX10: Gelo birastî jî Îsa Mesîh jiyaye? Îsa Mesîh, Lawê Xwedê ye? 24

PDX11: Pêwendiya di navbera Xwedê û Îsa Mesîh de çiye? Ma her du jî di kesayetekê de bûne yek? An jî kîjan sereta ye? Gelo em ji kê re dua bikin? 26

**2. Pirsên Di derbarê Kitêba Pîroz de (PKP)** 30

PKP1: Kitêba Pîroz ji aliyê mirovan ve hate nivîsandin: Ma ev yek her tiştî dîmaneyî nake? Ka di vê rewşê de em ê çawa bikaribin bibêjin ku Kitêba Pîroz ji Xwedê ye û her tiştê tê de ne rast in? 30

PKP2: Ka ez ê çawa fam bikim ku Kitêba Pîroz rast e an jî ne rast e? 33
PKP3: Gelo bi çi awayî Kitêba Pîroz ji berhemên wêjeya dinê ve cihêtir e? 34
PKP4: Gelo di roja me de danezanên nû yên bi Kitêba Pîroz ve bêne vekirin hene? Bêşik Xwedê ji Nivîsên Pîroz ve seretatir e û bêyî navbeykar dikare bi me re pêwendiyê deyne. 37
PKP5: Gelo hûn di derbarê "Şîfra Kitêba Pîroz" ya pirtûka Mîchael Drosnîn e de çi difikirin? 39

**3. Pirsên Di Derbarê Afirandin, Zanist û Baweriyê de (PDA)** 44
PDA1: Gelo bûjeneke bê can werdigere organizmayek zindî? 44
PDA2: Gelo dinya û gerdûn çend salî ne? Ma meto-deke temena dinê bihesibîne heye? Gelo hûn di derbarê bi awaya karbonê dîrokdîtinê çi difikirin? 46
PDA3: Dûrbûnên bi milyaran salên roniyê ve pêk tên çawa bi famkariya we ya dinya ciwan ve lihev dikin? Ma nabe hûn biferizînin ku dinya, qandî tîrêjek ronahî bigihêje me kevnar e? 49
PDA4: Gelo Darwîn, di derbarê Xwedê de çi difikirî? 51
PDA5: Di roja me de di pêşbaziyên werzîşê de rekorên berê bêderfet bûn têne buhartin. Ma ev yek peresana rasteqîn napeyitîne? 53
PDA6: Gelo em ji aliyê zanistî, guhdayîna Kitêba Pîroz ya têgînên dinyewî ên bandora xwe winda kirine û modeya wan buhurîne bikar tîne, bikin an na? 54
PDA7: Gelo di derbarê awahiya erdgilorê de çi dikare bête gotin? 56
PDA8: Di afirandinê de rojek çi qas domiya? 58
PDA9: Du têgihana Afirandinê ya ku pev re ditewişin hene? 59
PDA10: Gelo dînozoran di keştiya Nûh de bicih bûn? 62
PDA11: Lawên Adem bi kê re zewicîn? 63

PDA12: Li gora famkariya we nîqaşên zanistî yên ku bi awayekî xwurt piştgiriyê didin afirandinê an jî bi awayekî herî xwurt afirandinê red dikin kîjan in? 64

**4. Pirsên Di Derbarê Xelasiyê de (PX)** 69

PX1: Em ê çawa xelas bibin – bi kirinên xwe yan bi baweriya xwe? 69

PX2: Gelo Xwedê çima bona xelasiyê xaçê mîna rêyekê pêşniyar kir? Gelo bona vê metodek din tunebû? 70

PX3: Gelo Îsa Mesîh ji ber gunehên ku hê em dikin çawa 2000 sal berê mir? 72

PX4: Ma Îsa Mesîh li devila hemî gunehên mirovahiyê, tenê bona gunehên mirov yên ku dixwaze lê bête bexşandin bimira ne çêtir bû? 73

PX5: Xwedê, bi mirina Îsa Mesîh ya li ser xaçê, ji hemî mirovan re bona ji kêfarata gunehên xwe xelas bibin derfetekê dide. Ma li dêvila vê yekê Xwedê efûyek giştî derxista ne bes bû? 76

PX6: Ez bawer im ku piştî mirinê jî xelasî dê bibe. Ez wisa bawer im ku xêra Xwedê ji têgihandina we zêdetir e. 77

PX7: Gelo hûn di derbarê zarokên gellek bi ciwanî mirine û hê tiştekî ne bijartine çi difikirin? An jî yên ku beriya welidîne mirine (bi beravêtinê an jî kurtajê) û yên dînik? Ma gelo ew di bin naletê de ne? 83

PX8: Ma Cihûda Îsxeryotî, bona ku Îsa Mesîh xelasiyê bona me pêkbînê, îxanetê lê bike, ji berê ve nehatibû peywirdarkirin? 85

PX9: Gelo ez ê zarokek wekî îhtimala wî ya bi bêbawerî mirinê ji sedî pênciye çawa bînim dinê? (Pirsa jinikeke nû baweriyê aniye) 87

PX10: Kitêba Pîroz dibêje ku Xwedê mirov dibijêre. Ger biryarên di derbarê xelasî û naletîbûnê de ji berê ve hatibin stendin, ma em ê çawa qala vîna azad bikin? 89

PX11: Gelo hûn dikarin bi zanistî hebûna dojehê bipeytînin? (Pirseke keça xwendakarê dibistana navîn e) 92

**5. Pirsên Di Derbarê Olan de (DO)** 94

DO1: Li rûyêerdê gellek ol hene. Nepêkan e ku hemiyên vana xelet bin. Ma îdiaya rêya yekane ya dibe jiyana abadîn Xirîstiyani ye, bi xwe ne pozbilindiyek nayê hesibandin? 95

DO2: Em gişt, mînak misliman û Xirîstiyanan ji heman Xwedê re dua nakin? (Pirsa ku ji aliyê misilmanek ve hatiye pirsîn) 96

DO3: Ka ez ê çawa hîn bibim ku çavkaniya belavoka Mizgîniyê ya Îsa Mesîh Xwedanî an jî olî ye? 98

**6. Pirsên Di Derbarê Jiyan û Baweriyê de (PDJB)** 100

PDJB1: Em çima hene? 100

PDJB2: Wateya jiyanê çiye? 101

PDJB3: Ez ê çawa di nava jiyana rojane û baweriya xwe de ahengekê pêk bînim? 104

PDJB4: Ez tim xewnên xerab yên dubare dikin dibînim. Gelo ez van xewnan çawa şîrove bikim? 109

PDJB5: Guneh çiye? 111

PDJB6: Gelo Kitêba Pîroz destûrê li hevjiyana kesên nezewicîne dide? Cotek kengî (di çi mercan de) zewicî tête hesibandin? Dema biryara hevjiyanê bidin? Piştî têkiliya yekem carî cinsî? Piştî mehra fermî an jî merasîma dêrê? 112

PDJB7: Bawerbûn nayê wateya zanebûnê – vê gavê em ê çawa baweriyê mîna vebiriyê bihesibînin? 118

PDJB8: Ma divê nîşaneke derveyîn ya ji nûve bûyînê tunebe? 119

PDJB9: Hûn bi me re, mîna ku Xwedê we şandibin diaxifin. Ma mafê tevgera bi vî awayî kî dide we? (Pirseke di axaftina min ya girtîgehê de hatiye pirsîn) 120

PDJB10: Gelo hûn di derbarê endazyariya genetîkê de çi difikirin? 121
PDJB11: Gelo Îsa Mesîh ji mêşên reş û kermêşan ve çi kirin? Ma wan kuştin? 123

**7. Pirsên Di Derbarê Buhuştê de Pirsên ku Her tim Miraq Dikin Lê Tu Carî Hewl Nedane ku Bipirsin** 126
B1: Buhuşt cihê ku heta abadîniyê em ê li bextewar bibin e 132
B2: Buhuşt cihê ku hestên me jê zewqê bigirin e 134
B3: Buhuşt cihê ku pîroziya abadîn lê tê kirin e 135
B4: Buhuşt cihekî nûwaze ye 138
B5: Buhuşt cihê ku jiyanên me lê diltêr bibin e 140
B6: Buhuşt mala me ye 142
B7: Buhuşt cihê ku em ê lê serweriyê bajon e 143
B8: Buhuşt cihê ku Îsa Mesîh lê ye 144
B9: Buhuşt cihê ku em ê bibin wekhevê Îsa Mesîh e 146
B10: Buhuşt cihê taybet yê ku bi kovanê li bendê bin e 147

**Beşa Pêvek** 150
Daxuyanên Kîtêba Pîroz 150
I. Rêgezên bingehîn yên Kitêba Pîroz 150
I. 1. Rêgezên bingehîn yên Kitêba Pîroz (R= Rêgezan) 151
I. 2. Rasteqîniya Kitêba Pîroz 152
I. 3. Ceribandina rasteqîniyên Kitêba Pîroz 154
I. 4. Mijara Kitêba Pîroz 156
I. 5. Danezanên Kitêba Pîroz 158
I. 6. Rûmeta Danêzanên Kitêba Pîroz 166
I. 7. Fambûn û famkariya Kitêba Pîroz 168
I. 8. Rasteqîniya danezanên Kitêba Pîroz 169
I. 9. Dempariya ku danezanên Kitêba Pîroz wan digire nava xwe 171
I. 10. Gihaştina rasteqîniya Kitêba Pîroz: Berîdayina Îsa Mesîh 172
I. 11. Encam 179

| | | |
|---|---|---|
| II. | Rêgezên şîrovekirina rasteqîniya Kitêba Pîroz (RŞ=Rêgezên Şîrovekirinê) | 179 |
| III. | Divê em çima Kitêba Pîroz bixwînin? | 183 |
| IV. | Divê Em Kitêba Pîroz Çawa Bixwînin? (RX=Rêgezên Xwendinê) | 186 |
| V. | Deh Waadên ku Ji Yên Kitêba Pîroz Xwendine re Hatiye Dayîn (Bona Kesên Kelamê Xwendine û di Jiyana Xwe de Bikar Tînin) | 188 |

**Peyama Xwendekarekî** 190

**Nivîskarê Pirtûkê: Kurteçîroka Jiyanê** 193

**Çavkanî** 205

**Kurtkirinên Kitêba Pîroz** 207

# Pêşgotin

**Ev pirtûka çawa hate nivîsandin:** Çavkaniya ramanê nivîsandina vê pirtûkê, di derba konferansên mizgînîdayînê ên ku nivîskar li Mala Moda ya Muhlhauser a li Munihê yî didan de derket holê. Modakar Harro Muhlhauser, destûrê da ku em di dema heftayekê de her şev, qatê yekem ya karxana wî bikar bînin. Me her şev kincên di asqiya de ne ji asqiyên wan dadiqistin jêrê û 250 sandalî bicih dikirin. Piştî ku axaftin diqediya me dîsa sandaliyan bi ser hev re rêz dikirin û asqiyan jî bona xebatkar sibehê kincan bicih bikin dîsa dadiliqandin.

Tu carî bona hemî guhdarîvan rûnin sandaliyên me qîm nekirin, lê belê xalîçeyên qalind û pêlikên derencê jî cihê rûniştinê pêk anîn. Di encamê de me bi rehetî 350 kesî digirtin hêwanê. Ji ber ku şunwar di navbera Munîhê, li navendeke danûstandinê (Çend mîtro dûrî qesra bajarvaniyê û Dêra Fraûenkîrche “Meryema Pîroz” bû) de bû, bala dorûberên ne Xirîstiyan in jî dikêşandin. Piştî axaftinê, di derbarê mijara wê şevê de beşa pirs-bersivê jî dihate pêkanîn. Mirovan jî bê derfetê gellekî qenc bikar dianîn.

Beriya ku di derbarê baweriyê de biryarekê bidin gellek pirsên wan ên divê bête bersivandin hebûn.

**Celebê Pirsan:** Naveroka vê pirtûkê, bersiva gellek pirsên ku di axaftinên nivîskar yên Munîhê de hatine pirsîn dide. Tevî vêya di axaftinên herêmên wekî din de bersivên pirsên wekhev ên ku ji nivîskar re hatine pirsîn jî tê de ne. Nivîskar ev demekê ye “Di roja Ciwaniyê de” (Ahldene Jugentag), rêvebiriya bernama bi navê “Li Krelîngênê Saeta Pirsê” ye dike. (Krelîngen – Navenda Mizgînîdayînê ya li Bakurê Germensîstanê ye). Di dema vê bernamê de çend mijarên lê hatine nîqaşkirin jî di pirtûkê de hene. Deqek wekhev ya mijarên di pirtûkê de li ser xebat hatiye kirin hene – hemî pirs ji aliyê kesê ras-

teqîn ve hatine pirsîn. Di vê pirtûkê de bersivên kesên ku “di nava” Xirîstiyaniyê de ne li bendê ne nayên dayîn. Lê li dêvila vê yekê pirsgirêkên mejiyê kesên gumanê dikin, lê dipirsin û digerin, bi nêzikayikekî cidî tênê axaftin.

Cerba ku nivîskar ji pirsên kesên di nava lêgerînekê de ne jê pirsî ne qezenc kiriye, di naveroka pirtûkê de ji awahîdayînên hinek xwedênasî an jî teorîk ên ku ditirsînin zêdetirî, mijarên bingehîn yên ku mirovên rasteqîn (ji rêzê) giramiyê didinê, pev re hatine lêkolînkirin û bersivandin.

**Rêbaza Bersivandinê:** Rêbaza wacê ya ku Grêkan di dema antîk de pêşve birine, di zanistiyên erênî de ew qasî biser ketine ku, mirov dixwaze vê awaya ramandinê bi beşên din de jî bi kar bîne. Di Dewra Ramandinê de ev bikarhatina wacê bibandor bû û di encama vê yekê de, dest pêkirin û nirxandina Kitêba Pîroz hate kirin. Ger pirsên di vê pirtûkê de bi dest ve têne hildan matematîkî yan jî zanistî bûna, dibe ku hisabên wacê bibûya alîkar. Lê belê mijarên li vê têne axaftin, bi pirranî di derbarê pirsên bûneweriyê de ne û di bersivandinê de bigiştî ji analîza wacê ya teşeyî dûr hatine sekinandin e. Di hewldanek wisa de qet alîkariya feylesofiyê jî nabe. Feylesofê Germen Hans Lenkê ku ji Karlsrûhe yî bi awayekî gotina aşkere wisa têdighîne: “Feylesofî di derbarê naveroka mijarê de gellekî kêm çareseriyê tîne. Feylesofî di derbarê pirsgirêkan de ne, ne di derbarê mijar û çareseriyê de. Yekcaran feylesofî îdia dike ku mijarê mîna pirsgirêkek nûh bikar anîn, ji bersivek kêm ya bona mijarê hatiye dayîn gellekî girîngtir e.”

Xwedê dikare me di ramanên me de, tevgerên me de û di baweriya me de bibe rasteqîniyê. Ew, vê yekê dixwaze jî. Bo vê yekê, divê bona me pîvana di girîngiya jiyanê de yî Kelama rayedar ya Xwedê, yanê Kitêba Pîroz be. Tu berhemekî mirov nikare cihê vê çavkaniya zanînê bigire. Ji ber ku bersivê ji pirsan re hatine dayîn di bingehê de xwe disipêrin vê pîvanê, Beşek daxuyaniyê ya naverok rêgezên

bingeh û rêgezên şîrovekirinê ne bi dawiya vê kitêbê ve hatiye vekirin.

Ev rêgezên bingeh cara yekemîn di vê pirtûkê de hatine hewandin. Mebesta vê kirina me, dema bi Kitêba Pîroz re xebatê de, zanîna bingeh ya pêdivî jê re heye pêk anîne.

Ez dixwazim hinek tiştên ku bona xwendekaran amade bikim pê vekim. Bersiv her tim mîna ku tê xwestin (an jî mîna ku bibe) ne bi kitekit in. Û wekî din jî divê ji pirsan bijartineke pîşkar bihata kirin. Ji ber ku hinek pirs pevra têkildar in, bersivên wan jî wekî dubarekirinê ne.

Piryariyan bona naverok bi hêsanî bêne şopandin bi beşan ve hatine cihêkirin. Hinek pirs raste rast ji jêgirtinên Kitêba Pîroz hatine bersivandin. Pirsên din jî, dîsa ji Kitêba Pîroz lê belê bi awayeke binavgîn, ji beşên ku jêgirtin hatine kirin, bi pêkanîna jigiştîhatinên biwacî hatine bersivandin. Encamên bi vê rêbazê hatiye gihaştin çawa ku xwe disipêrin kûrahiya zanîna Kitêba Pîroz ya nivîskar û bi hunera hişajotineke zexm, lê dîsa jî divê pîşkar be. Pirsên ku bi “Çima” destpê dikin, wekî rêzikekê di rewşa “nayê bersivandinê” de ne. Ev pirsan jî helbet dê rojekê bersivê bibînin (Yûhena 16:22-23). Lê belê ev dê dema bawerî vegere dîmenê dê pêk bê.

**Spasî:** Ez ji hevsera xwe ya xoşewîst; ya ku bi çavekî nirxandinê lêkolînê li xebata min kiriye û pêşniyarên qenc kiriye û karê nivîsên min bi kompîtûra li malê yî nivîsandiye ya bi zehmet e girtiye ser xwe, spasiyan dikim.

Ez dua dikim ku ev pirtûka min, ji kesên ku ji pirsên xwe yên di derbarê jiyan, mirin û baweriyê de li bersivê digerin re alîkariyê bike.

Werner Gîtt

# Pêşgotina Di Derbarê Çapa Duyem Ya Îngilizî de

Ez gellek bextewar im ku wergera Îngilizî ya pirtûka min cara duyem tête çapkirin. Ev çap, guhertoya ya pêşveçûyî, firehtir û rojanebûyî ya çapa yekem e. Beşa herî tijî ya vê çapê ve hatiye vekirî, beşa 7'an ya mijara buhuştê yî. Ez dixwazim spasiyan pêşkêşî Dorte Gotzê ku wergera beşên pêvek kirine, bikim. Ew bi xwe ji Zankoya Heîdelberg ji beşên wergerê Îngilizî û Rûsî perwende yî. Veronîka Abraham ya li Zankoya Queens a Kanadayê perwerda Mêjû û Feylesofiyê dibîne jî di van wergeran de peywirdar bû.

Sarah Jayne Cûrtûs ya ku ji Brîtaniya Mezin e, sehetiyê ji aliyê şêwazê li pirtûka min kir; ew bi xwe perwerda xwe ya Îngilizî û Germenî di Zankoya Sheffî eldê bir serî. Ez dixwazim ji hemî endamên vê tîmê re bona xebatên wanî bi balkêşî û xîret in spasiyan rêz bikim.

Ya dawîn, hevalê min Dr. Carl Wieland (Awistiralya) hemiya pirtûkê xwend û hinek serrastkirinan kirin. Dr. Wieland (Awistiralya) rêvebiriya navenda zanist û lêkolîna afirandinê; Bersivên Afirandinê *(Answers In Genesi*s) ya li Brîsbanê ye û li hemiya dinê bi nav û deng e, dike. Û ji aliyê din, di kovara *"Creation ex nihilo"* ya li 120 welatî xwendakarê wê hene (Hejmara çapa wê > 50000) edîtoriyê jî dike. Ez bona alîkariyên bi rûmet spasiyên xwe jî pêşkêşî wî dikim.

Ev pirtûk (bi Germenî) cara yekem di sala 1989'an de hate çapkirin û niha çapa wê ya 20 (2006)'an tête çapkirin. Bigiştî hejmara çapê 400.000 e. Ji hevpeyvînên bi xwendekaran re kirime an jî ji nameyên ku ji min re şandine, fam dikim ku gellekan bi alîkariya vê pirtûkê rêya ku diçe Îsa Mesîh dîtine. Di vê navberê de çardeh wergera pirtûka min hatiye kirin.

Werner Gîtt, Sermawez 1998

# 1. Pirsên Di derbarê Xwedê de ne (PDX)

**PDX1:** *Ma ka ez ê çawa ewle bibim ku Xwedê birastî jî heye?*

**BX1:** Li ser dinê tu netewe an jî civaka mirovan (babistîn) nîne ku ji xwedayekî ji xwe seretatir, ji ruhekî an jî ji hebûnekî re peristinê nekin. Ev rewş, jibilî bihîstina Mizgîniya Îsa Mesîh, bona civaka mirovan (babistîn) yê li herî tenaya dinê ne û qet bi çandekî din re têkiliyên wan nebûne jî wisa ye.

Gelo ev çawa pêkan e? Dema em afirandina nûwaze ya dora me girtiye temaşe dikin, em xwedî hunera hişê ku fam bike, hemiyên vana berhemên afirkerek bi çavan nayê dîtin in. Her kes dizane ku qumçikek, seyareyek, saetek an jî ataşek bi xwe û xwe nayê holê. Ji ber vê yekê şandî Pawlos di Peymana Nû de wisa dinivîse: "Ji ber ku ji afirandina dinê ve, xisûsiyetê wî yên ku nayên dîtin, yanê, hêza wî ya bêdawî û Xwedaniya wî bi kirinên wî tê fêhm kirin ku, bi eşkeretî tê dîtin; bo vê yekê uzrê wan nîne." (Rom. 1:20).

Afirandina bi çav ve tête temaşekirin, çawa ku rê li bi hebûna afirkerekî bawer bûnê ve û encamên di derbarê hêz û dewlemendiya ramanên Wî derxistina me veke jî, tevî wê di derbarê xwezaya Wî (mînak; hezkirin, jiyan, xêr û qencî) de qet tu zanînê nade. Kitêba Pîroz a vay ji ber vê yekê ji me re hatiye dayîn.

**PDX2:** *Xwedê li ku derê yî?*

**BX2:** Em, mirov, dixwazin ku Xwedê li derekê bicih bikin. Bo vê yekê, mîna ku di demên kevnare de dibû, di roja me de jî (nêo-paganîzm), mirovan di derbarê xwedayan de gel-

lek têgînên senemperestiyê pêş ve birine. Grêkan bawer dikirin ku xwedayan li çiyayê Olîmposê dijîn. Teûtonan (gelên ji nîjada germenan e û di demên kevin de li bakurê Ewropa jiya ne) jî xwedayên xwe li Walhalla yê (Di demên kevnar de di mîtologyaya Skandînav de qesra xweda Odîn) bicih kiribûn.

Matematîkvan û Ezmannasê Fransî P. Laplace (1749 – 1827) wisa dinivîse: "Min lêkolînê li hemiya fezayê kir lê Xwedê nedîtim."

Şîroveyek mîna vêya jî ji aliyê kozmonotên Sowyet ve hatiye kirin: "Di dema firîna xwe de rastî Xwedê nehatim." (Nîkolayew, Pirsên Di Derbarê Xwedê de (PDX) 1962, Wostok III)

Dema em ji aliyê Nivîsên Pîroz li mijarê binêrin, hemî ev gotin ji binî ve xelet in, ji ber ku Xwedê derveyî zerengiya me ne. Ew ê ku fezayê afirandiye, nabe ku pariyek ji zerengiya me be. Tevî vêya Wî bandor daniye ser her derê fezayê. Ew li her cihî û her tim heye. Şandî Pawlos vê mijarê li ber lijneya Girê Aresê, ji gelê Atîna yên pûtperest in re wisa daxuyanî dike: "Ji ber ku em di wî de dijîn, dileqin û henin; mîna ku, ji hozanên we jî hinekan gotine: Ji ber ku em jî ji nîjada wî ne." (K. Şa. 17:28) Nivîskarê Zebûrê jî hay ji vê rastiyê heye: Tu li riya ku ez diçimê û dera ku lê dimînim dinêrî, ji hemî kirinên min haya te heye. Ji pêş û paş ve, te dor li min girt, û destê xwe danî ser min." (Zebûr 139:3,5). Ev ayet nîşan dide ku Xwedê çawa dorûberê dinya me pêçaye û çawa bandorê li ser her deqê wê daniye.

Bi matematîkî ramanê fezaya pirr-zerengî (fezaya ku tê zanîn bi sê zerengî ye), dibe ku alîkariyê bona pirsa; Xwedê li ku derê yî, alîkar be. Fezaya ku bi zerengiya n-, tenê komika bin ya fezaya bi zerengiya (n+1) ye.

Bi awayekî wekhev, mînak, fezaya çar zerengî, di fezayeke sê zerengî de nayê famkirin, lê belê dîsa jî bandor li ser her deqî ye.

Kitêba Pîroz di ayeta 1.Qiralan 8:27’an de vê mijarê bi vî awayî danîne holê:

“Ma gelo Xwedê birastî jî li rûyêerdê dijî? Tu bi ezmanan, bi ezmanê ezmanan jî nayê bicih bûn…”

**PDX3:** *Gelo wateya peyva Xwedê çiye?*

**BX3:** peyva *Xwedê*, ne navekî ji tîpa pêşîn ya çend gotinî pêk hatiye yî (mînak: wekî ÛNESCO, ÛFO). Xwedê xwe bi cûreyên pênasiyan daxuyanî kiriye, hemiyên vana jî şayesandina xwezaya Xwedê dikin. Li jêrê navek/pênavek Xwedê yê diyarkirî (berdêlka Îbranîtî û Kurdî), mîna ku cara yekem di Kitêba Pîroz de hatine bikaranîn tête dayîn.

*Elohim* Afr. 1:1; Navê Xwedê (li vê bona ku yekîtiya sêhan ya Bav, Law û Ruhê Pîroz daxuyanî bike, bi Îbranîti bi haweya pirranî hatiye bikar anîn)

*Eloah* (Di zimanê Îbranîtî de rewşa yekanî ya peyva Xwedê yî. Di Peymana Kevin, beşa Eyûb de 41 carî derbas dibe. Lê di beşên din de jî bi awayekî belavbûyî tête dîtin)

Pirsên Di Derbarê Xwedê De

*El* (Afr. 33:20, “*El-Elohe Îsraêl* – Xwedê, Xwedayê Îsraêlê”)

*El-Olam* (Afr. 21:33, “Xwedayê bêmirin”)

*El-Şaday* (Afr. 17:1, “Xwedayê ku Hêza Wî Têrî Hertiştî Dike”)

*El-Roi* (Afr. 16:13, “Xwedayê ku min dibîne”)

*Yahve* (Afr. 2:4, li gor Ji Misirê Derketin 3:15 “XUDAN Xwedê”)

*Yahve-Rafeka* (Der. 15:26, “Xwedayê ku Şifê Dide We”)

*Yahve-Nissi* (Der. 17:15, “XUDAN Direwşa min e”)

*Yahve-Yire* (Yar. 22:13-14, “XUDAN pêktîne”)

*Yahve-Şalom* (Ser. 6:24, “XUDAN aştî ye”)

*Yahve-Zidkenu* (Yêr. 23:6, “XUDAN rastiya me ye”)

*Yahve-Şama* (Hêz. 48:35, "XUDAN li wê ye")
*Yahve-Roi* (Zeb. 23:1, "XUDAN Şivanê min e")
*Yahve-Zeboat* ("Xwedayê Artêşan")
*Adonay* (Afr. 15:2, "XUDANê Serwer" [Di Peymana Kevin de 134 carî derbas dibe])

(Çavkanî: Abraham Meîster, "Bîblîsches Namenlexîkon" [Ferhenga Navên Pîroz], Pfaffîkon, 1970)

**PDX4:** *Em çima nikarin Xwedê bibînin?*

**BX4:** Adem û Hawaya ku cotên pêşîn yên ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin in, bi Wî re di nava têkiliyek nêzîk de bûn û bi rû be rû hatibûn digel Wî. Ji ber ku mirov kete gunehê, ji Xwedê ve dûr ket. Ew, Xwedayek pîroz yê ji gunehê dikerihe yî. Ji ber vê yekê, nêzîkayiya destpêkê qediyaye. "yê pîroz û serwerê tekane, Qiralê qiralan, Xudanê xudanan, xwediyê bêmiriniyê tenê, yê ku di ronahiya ku mirov nikare nêzîkî wê bibe de disekine, yê ku tu mirov wî ne dîtiye û ne jî dikare bibîne, …" (1Tîm. 6:15-16). Ji ber vê yekê, tenê piştî ku em bimirin û bikevin mala Bavê xwe, em ê bikaribin Wî bibînin. Rêya ku diçe Wî jî, tenê ji Îsa Mesîh ve derbas dibe. "…Bêyî navgîniya min tu kes nikare were digel Bavo" (Yû. 14:6).

**PDX5:** *Xwedayê ku rê li ev qas êş û janên li ser dinê ne dide, ma çawa dibe Xwedayê hezkirinê? Xwedê çima destûra jankêşiya me dide?*

**BX5:** Beriya Ketinê (Afirandin beşa 3) ne mirin, ne jan, ne tengasî nejî tiştên ku rê li vana vekin hebûn. Xwedê, her tiştî bona ku mirov bi awayekî nûwaze bijî afirandibûn. Mirov bi vîna xwe ya azad rêya xwe bijart û ji ber vê yekê

ji Xwedê ve dûr ket. Xwedê çi qas azadiyek mezin daye mirov, em nikarin daxuyaniya vî tiştî bikin. Tevî vê yekê em bi aşkereyî dibînin ku encama pişt li Xwedê zîvirandinê çawa bêtarî ye. Cerbên tahl vê yekê di roja me de jî nîşanî me dide.

Hinek mirov hewl didin ku tawanbariyê li Xwedê bikin. Lê belê divê em jibîr nekin ku berpirsiyar ne Xwedê, em yanê lawênmirov in.

Ger em şevê di otobanê de roniyên seyareya xwe bitefînin û biçin û di encama vê yekê de bibin sedema qedayekê em nikarin ji ber vê yêkê çêkirên seyarê berpirsiyar bibînin. Çêkiran cotek far danîne ser seyarê, bona ku rê ronî bikin. Ger em bi zanînê ronahiyan bitefînin ev berpirsiyariya me ye "…Xwedê ronahî ye…" (1Yû. 1:5)

Ger em ji rêyek tarî û ji Xwedê bi dûrketî biçin; em nikarin tawanbariyê li Xwedayê ku bona em nêzî Wî bijîn me afirandine, bikin. Xwedê hezkirin e û dê wisa bimîne, ji ber ku tiştekî hiş nastîne kiriye: Bona ku me ji vê rewşa tenê em berpirsiyarê wê ne xwelas bikin, Lawê xwe bi xwe daye.

Îsa Mesîh di beşa Yûhena, Ayeta 15:13 de bi vî awayî qala xwe dike: "Di tu kesî de, qandî mirov di oxra hevalên xwe de canê xwe bide, hezkirinek mezin nîne." Ma gelo ji vê hezkirinê hê jî mezintir hezkirinek heye? Di oxra mirovahiyê de li cihê ku jê re "Golgota" yanê Serqoq tête gotin, tiştekî ku di wê roja de hatiye kirin mezintir be tu carî nehatiye çêkirin. Ji ber vê yekê xaç, nîvenda deqa hezkirina Xwedê ya ji mirovan re ye. Em hemiyan – yên bawermend an ne bawermend in – li dinyayek ketî de dijîn. Em gişt ji cerbên xwe ve dizanin ku jan û tengasî, pariyên jiyana dinyewî ên cuda nabin e. Êşên şexsî dibe ku ji me re wisa nayên famkirin bêne. Dema kesek di nava firehiyê de be, em sedema rastî bêtarîhatinê û di nava nexweşiyan vegwezandina yên din bipirsin. Kesên bawermend, bipirranî ji

yên bawer nakin ve zêdetirê jan û tengasiyê dikêşin. Bina nivîskarê Zebûrê têgihandiye: “Ji ber her ku refaha xeraban didîtim, çavnebariyê li kanca dikirim. Ew bi êşê nizanin, bedenên wan tendrust û qelew in. Derdê kesên wekî din nizanin, mîna wan tahde nabînin” (Zeb. 73:3-5).

Nivîskar tengasiya xwe bi awayekî rast dinirxîne û hay jê heye ku ev ne cezayek ji ber gunehên wî hatiye dayîn e. Bi Xwedê re nîqaşê nake û zexm pêwendiyê pê re datîne:

“Dîsa jî ez her tim bi te re me, tu ji destê rastê bi min digire. Bi şîretên xwe re rênîşanî min dide, di encamê de min digehîne bilindahiyê. Dibe ku bedena min û dilê min biçikin, lê belê Xwedê di dilê min de hêz, para ku dikeve aliyê min e heta abadîniyan” (Zeb. 73:23-24,26).

**PDX6:** *Ma yê ku divê bona her tiştî bête tawanbarkirin ne Xwedê ye?*

**PDX6:** Dema Xwedê piştî ketinê Adem bangî cem xwe kir, wî bi gotina: “Jinika ku te danî digel min fêkiyê darê de min, min jî xwar”, Hawa nîşan daye (Afr. 3:12). Dema Xwedê ji Hawa ve pirsî, wê jî sûc avêtiye ser yekî din: “Mar min xapand, ji ber wê yekê xwarim” (Afr. 3:13). Em di derbarê gunehê de di tevgerek ecêb de ne: Wekî berpirsiyariyê her tim jibilî xwe kesekî din nîşan didin û di encamê de Xwedê tawanbar dikin. Tenê li derveyî famkariya me tiştek pêk tê û Xwedê hemî sûcî di Îsa Mesîh de digire ser xwe: “Xwedê, bona di saya Mesîh de em bibin rastiya Wî, Mesîhê ku bi gunehê ve nizane bona me kir guneh!” (2Kor. 5:21). Bona me azad bikin hemî nalet î hemî hêza xwe li ser Wî bûne bar. Dema Ew bi xaçê ve hate şidandin, her cih bona sê saetî bi reşetariyê ve hatiye girtin û Ew, birastî jî, ji aliyê Xwedê ve hatibû terikandin. “Mesîh, li gora daxwaziya Bavê me Xwedê kir, me bona ku ji dema

nuha ya xerab ve xelas bike di berdêla gunehên me de xwe feda kir” (Gal. 1:4).

Jibilî danezana Mizgîniyê nûçeyek hê jî kêfxweş bike nîne.

**PDX7:** *Xwedê di dema Peymana Kevin de neteweyek di şeran de bitûmî tune kir, lê belê di Waaza xwe ya li Çiyê de ji me re dibêje ku ji neyarên xwe ve hez bikin. Gelo Xwedayê Peymana Kevin ji Xwedayê Peymana Nû ve cihêtir e?*

**BX7:** Hinek mirovan, Xwedayê Peymana Kevin mîna Xwedayê hêrs û tolê, Xwedayê Peymana Nû jî, mîna Xwedayê Hezkirinê dibînin.

Mirov bixwaze dikare bi du têgihandinên di Peymanên Kevin û Nû de ne vê xeletiya vê dîtinê bipeytîne. Di Peymana Kevin, Yêremya 31:3’an de Xwedê wisa dibêje: “Belê, bi hezkirina abadîn ji te hez kirim; bo vê yekê te bi dirûdiyê kişandim cem xwe.” Û di Peymana Nû de jî Îbr. 10:31: “Bi destê Xwedayê Zindî ve ketin, tiştekî tirsehêz e” Xwedê, Xwedayek di mijarê gunehê de bihêrs e, li hemberî poşmanî û tobê de jî Xwedayek bi hezkirinê ve tijî ye.

Em şahidiya vêya di Peymanên Kevin û Nû de jî dibînin, ji ber ku Xwedê qet naguhere, her tim wekî xwe dimîne. Ew, “Bavê Ronahiyan yê tê de siya çivanokî an jî guhertinê nîne yî” (Aq. 1:17). Heman vê yekê, Lawê Xwedê jî tu carî naguhere, “Îsa Mesîh doh, îro û heta abadîniyê wekî xwe ye” (Îbr. 13:8).

Nivîsên Pîroz bi mînakên, Xwedê ji aliyekî daraziyê li gunehên mirovan dike û ji aliyê din zarokên xwe çawa diparêzê, nîşan didin ve tijî ne. Di dema tofanê de hemî mirovên li derve keştiya Nûh mane, ji ber xerabian di bin avê de man û tenê heyşt kesê di keştiyê de bûn xelas bûn. Mîna vêya, dê di roja daraziyê de beşek mezin yê miro-

vahiyê tune bibin, ji ber, wan deriyê û rêya fireh ya mirov dibe têkçûnê pejirandine (Met. 7:13-14). Xwedê, axên ku waadkiribûn da gelê xwe yê Îsraêlê, lê belê ji Misirê Derketinê de Amalekiyan êrîşî yên şunda mayîne kirin. Xwedê di Jinûvelêkirina Zagonê, ayetên 25:17-19 de tunekirina Amalekiyan têdighîne û Saûl, dawiyê bi destûra Xwedê vêya pêktîne (1Sa. 15:3).

Di dema Peymana Nû de jî, Hananya û Safîra, ji ber ku hemî rasteqîniyê negotine, ji aliyê Xwedê ve hatin bicezakirin (K. Şa. 5:1-11) Ev mînakan nîşanî me didin ku Xwedê bi awayekî ji me hê jî cidî nêzîkî gunehê dibe. Xwedê vê tevgera xwe qet neguhertiye.

Xwedê ji gunehê dikerihe; Ew dê her xerabiyê daraz bike. Ew, di roja me de jî dikare hemî neteweyan ji rûyêerdê ve paqij bike. Germenan di dewra III. Reîch de ji ber pilansaziyeke gelê Xwedê Îsraêlê tune bikin bikar anîne, li dijî Xwedê guneheke mezin bikar anîn. Çawa ku Germenîstan çel salî, wekî du parî mayînê û windakirina pariyê rojhelatê, di derbarê vê mijarê de, daraziyeke Xwedê ya aşkere yî. Xwedê dikarîbû hemiya netewê jî tune bikira, lê belê dilovaniya Wî ew qasî mezin e ku, dibe ku di oxra hinek bawermendên hê hene de vê yekê nekir. Ger li Sodom û Gomorayê deh kesên rast bihatina dîtin ev bajaran dê nehatina tunekirin (Afr. 18:32). Ger daraziya Xwedê di heman demê de nehatibe cih, ev ji ber dilovaniya Wî pêk tê. Tevî vêya demeke her kesên ku baweriyê anîne (2Kor. 5:10) û neanîne (Îbr. 9:27, Pey. 20:11-15) hisabê hemî kirinên di jiyana xwe de kirine bidin jî dê were.

**PDX8:** *Ma Gelo Xwedê Îblîs afirandiye?*

**BX8: 1.** Yûhena di ayeta 1:5'an de em dixwînin ku Xwedê Ronahî ye. "Di Wî de qet tarî nîne. Xwedê bitûmî saf

û bêqisûr e" (Met. 5:48). Û milyaketan vê yekê daxuyan dikin: "XUDANê Serwerê Her Tiştî ye Piroz, pîroz, pîroz e!" (Îşa. 6:3) Ew Bavê Roniyê ye (Aq. 1:17) ji ber vê yekê nabe ku çavkaniya xerabiya be. Kitêba Pîroz têdighîne ku, hemî xerabî, ji ber Îblîsê demekê kerûb, milyaketê roniyê bû, xwest ku xwe bi "Bilindê Bilindan" (Îşa 14:14) wekhev bike, pêk hatine. Di Hêzekîêl 28:15-17'an de xirûr û ketina wî bi vî awayî tête têgihandin: "Ji roja ku tu hate afirandin, heta dema ku di te de xerabî hate dîtin, tu bêqisûr bû. Ji ber zêdeyiya danûstendina xwe tu bi zordestiyê ve tijî bû û te guneh kir. Bo vê yekê, mîna tiştekî qirêj be te ji çiyayê Xwedê ve avêtim, ji nava kevirên ku dişewitin te qewirandim, ey Kerûbê parezker. Tu ji ber xweşikiya xwe bi xirûrê ve ket, ji ber rewnaqiya xwe te zanyariya xwe xera kir. Bi vî awayî te avêtim erdê, te kirim rûreşî."

Mirovên pêşîn ji dema ku ketin tora xapandinê, bûn zebûnê gunehê, bi vî awayî xerabî bi nava afirandinê ve çizirîn û Îblîs jî bû serwerê vê dinê. "Ji ber ku şerê me ne li dijî xwînê û goşt e, lê li dijî rêvebiriyan, li dijî serweriyan, li dijî hêzên vê dinya tarî, li dijî artêşên xerabiyê yên ruhî, yên li cîhên ezmanî ne" (Ef. 6:12).

**PDX9:** *Ma gelo pêkan e ku Xwedê hînî tiştekî nû bibe?*

**BX9:** Hînbûn, wekî pênasiyê, rasteqîniyên berê nedihatin zanîn fêrbûn/têgihîştin e. Li gor ku Xwedê bi her tiştî dizane (Zeb. 139:2, Yû. 16:30), tu diyarokek nû nîne ku Ew fêrî wê bibe. Wekî Serwerê feza û demê be, xwediyê hemî zanîna raborîn û dahatûyê yî. Lê em jî divê bi xwa re xêzekê re bi pêwendî bin. Xudan tenê bi taybetmendiya bi her tiştên ku aidî xwe ne zanînê ve, bûyerên dahatûyê bi navgîniya peyxamberiyên di Nivîsên Pîroz de ne ji me re dighîne.

**PDX10:** *Gelo birastî jî Îsa Mesîh jiyaye? Îsa Mesîh, Lawê Xwedê ye?*

**BX10:** Têgihandinê pêşiyê yên hatina Îsa ya rûyêerdê, herî girîngê peyxamberiyên Kitêba Pîroz pêk tînin.

Di Peymana Kevin de cihê bûyîna Wî (Mîk. 5:1 → Lûq. 2:4), secera Wî (2Sa. 7:16 → Met. 1:1-17), Bi Xwedê re di heman demê de têkiliya bav û law (Zeb. 2:7, 2Sa. 7:14 → Îbr. 1:5), û têkiliya Wî ya bi mirovan re (Dan. 7:13 → Lûq. 21:27), Xizmeta Wî (Îşa. 42:7 → Yûh. 9), Sedema / armanca xizmeta Wî (Îşa. 53:4-5 → Mar. 10:45), di berdêla 30 zîvî de, îxaneta ku lê hatiye kirin (Zek. 11:12 → Met. 26:15), jan kêşandina Wî û li ser xaçê mirina Wî (Zeb. 22 → Luk. 24:26) û ji Mirinê Vejîna Wî (Hoş. 6:2 → Lûq. 24:46).

Di derbarê pirsa li jorîn e de, 400 salê ku di navbera kitê dawîn ya Peymana Kevin û Kitêba Pêşîn ya Peymana Nû de; bitaybet girîngiyek bi bandor dide ser peyxamberiyên ku di Mesîh de hatine cih. Çavkaniyên derveyî Xirîstiyaniyê, ên şahidiyê li jiyana Îsa Mesîh kirine jî hene. Mînak, berhemên dîrokzanê Romî Tacîtûs, Seûntonîûsê di dema îparator Hadrîyanûs de peywirdarê qesra Romê bû, Li Enedolê parêzgarê Bîtinyayê Thalûsê Romî û yên wekî din.

Wekî mînakek diyar be, ez dixwazim jêgirtinekê ji Flaviûs Josephus, (Bûyîna wî. P.Î 37) ve bikim: "Demekê Îsayê ku mirovê zanyar e hebû ku – dibe ku jê re mirov gotin ne li cih be – ji ber ku Wî gellek mûcîzetan pêk anîne û rastiyan bi dilxweşî daye hînkirin e. Ev kesa him ji Cihûyan û him jî ji gelên neteweyên din ve gellek kesî kişandiye aliyê xwe. Ew Mesîh bû. Dema Pîlato, li ser pêşniyarên serekên olî ên girîng in û di nava me de ne, Wî mehkûmî bi xaçê ve şidandinê kir, yên ku ji Wî hezdikin, pêşiyê Wî neterikandin, ji ber mîna ku peyxamberên pîroz vêya û bi

dehhezaran mûcîzetên di derbarê Wî de ji berê ve têgihandibûn, di roja sêyemîn de dîsa bi awayekî zindî xwe nîşanî wan da. Li pêy wê, ew civaka ku bi navê Xirîstiyanan tête nasîn, di roja me de hê didomin." (Josephus, Antiquities of the Jews, "Dirokçeya Cihûyan" II Berg, r. 412, Oxford, Çapkirin *D.A.Talboys*, 1839)

Xwedê dibêje ku Îsa Lawê Wî ye. (Di îmadkirina Wî de Meta 3:17; li çiyê dema xuyabûna Wî hate guhertin Marqos 9:7). Milyaket jî bûyîna Wî; wekî "Lawê Yê Herî Bilind" dide bangkirin. (Lûq 1:32) Xudan, li Lijneya Bilind (Sanhedrîn) a qatê herî bilind ya darazkirina dunyewî û ruhî de herî rayedar e û ji kahîn û alimên olê ve pêk tê û serokkahîn Kayafa serekantiyê lê dike de bi xwe diyar kiriye ku Ew Lawê Xwedê ye (Met. 26:63-64, Mar. 14:61-62, Lûq. 22:70). Mirovên wekî din jî diyar kirine ku Îsa Mesîh Lawê Xwedê yî.

- Pêtrûs: "Tu Mesîhê Lawê Xwedayê Zindî ye" (Met. 16:16).
- Yûhena: "Ger kesek, bi aşkereyî qebûl bike ku Îsa Lawê Xwedê ye, Xwedê di wî de dijî, ew jî di Xwedê de dijî" (1Yû. 4:15).
- Pawlos: "…jiyana ku niha di bedenê de didomînim, bi baweriya ji Lawê Xwedê yê ku ji min hezdike û di oxra min de xwe feda kiriye, didomînim" (Gal. 2:20).
- Marta: "Marta, 'Belê, Xudan' got. 'Min baweriyê anî ku tu Mesîhê Lawê Xwedê yê ku dê were dinê yî'" (Yû. 11:27)
- Natanyêl: "Rebbî, tu Lawê Xwedê yî, tu Qiralê Îsraêlê yî!" (Yû. 1:49).
- Serpelê Romî: "…Ev birastî jî Lawê Xwedê bû!…" (Met. 27:54).
- Xesandiyê Etiyopî: "Ez baweriyê tînim ku Îsa Mesîh Lawê Xwedê yî" (K. Şa. 8:37).

Şêytan, bi pêwendiya di nava Xwedê Bav û Law Îsa Mesîh de ye dizanîbû (Met. 4:3,6); cinan jî rastiya Ew, Lawê Xwedê yî qebûl kiribûn (Met. 8:29).

Fêrisî û Serokkahînan ji rastiya ku Îsa Mesîh Lawê Xwedê yî gellekî bêaram dibûn (Mar. 14:53-65). Neteweyên gel ên sor bûne jî tevgereke wek vêya dan xuyakirin (Yû. 19:7).

Bona Cihûya û Misilmanan Îsa Mesîh, heta roja me kelemek hê jan dide ye. Îsa tenê "birayek" (Şalom ben Horîn), "Di nava lawan de Lawek" (Xwedênasê germen Heînz Zahrnt), mirovek bi qenciyê ve tijî ye an jî reformîsteke civakî bûya, nedibû "Xelasker." Ew, Xelaskerê me ye, ji ber bi rastî jî Lawê Xwedayê Zindî ye (Met. 16:16).

**PDX11:** *Pêwendiya di navbera Xwedê û Îsa Mesîh de çiye? Ma her du jî di kesayetekê de bûne yek? An jî kîjan sereta ye? Gelo em ji kê re dua bikin?*

**BX11:** Hişê mirov nikare têgihîştina Xwedê bike. Ew hebûnek li derveyî zerengiya me ye, ne dinyewî ye û gehîştina raza Wî bêderfet e. Bo vê yekê di emirê yekemîn yê Deh Emir de, bi her awayî wêneyê Wî çekirin hatiye qedexekirin. Tevî vêya Xwedê "xwe bêşahid nehiştiye" (K. Şa. 14:17). Wî xwe daxuyanî me kirine. Ew Xwedayê yekane yî, di heman demê de Yekîtiya Sêhan e.

1. Xwedê Yek e. Jibilî Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûp Xwedayek din nîne (Der. 3:6): "Pêşî û dawî ez im. Jibilî min Xwedê nîne (Îşa. 44:6). "…Berî min xwedayek nebû, li pêy min jî dê nebe. Ez, tenê ez XUDAN im, xeyrî min Xelasker nîne (Îşa. 43:10-11). "Dê xeyrî min xwedayê te nebe" (Der. 20:3). Qet tu derbasdariya xwedayên olên din nîne: "Hemî îlahên gelan tiştekî vala ne…" (Zeb. 96:5). "Gişt vikîvala, kirinên wan jî vala ne. Senemên gelan tenê ba ye, nîn e" (Îşa. 41:29).

2. Xwedê Yekîtiya Sêhan e: Xwedê di heman demê de wekî Bav, Law û Ruhê Pîroz be, Xwedayê Yekîtiya Sêhan e. Ev, nayê wateya ku sê heb Xwedê hene – mîna ku li gellek cihên Kitêba Pîroz ve nivîsandiye (mînak 1Kor. 12:4-6, Ef. 1:17, Îbr. 9:14) – ev ahenga (armoniya) Xwedê ya sê beşên ku ji daxwazi, kar û xwezaya Wî ve pêk têne ne. Em ji Xwedayê Yek e bi sê awayî qal dikin: Bav (Xwedê) Law (Îsa Mesîh û Ruhê Pîroz. Ev wateya taybet bi awayekî her aşkere di ayeta Meta 28:19'an de diyar dibe. Yekîtiya Sêhan ya bi Îngilizî wekî Trînîty tête binav kirin, ji gotina *trînîtas* (a ji sê beşî pêk tê) ya Latînî ye hatiye darişttin. Ev gotina di Kitêba Pîroz de derbas nabe, ji ber hewldana mirovan ya ku dixwazin nepena xwedayî tenê di gotinekê de bikine têgîn, ev yek derketiye holê.

Xwedê di **Îsa Mesîh** de bû mirov: "Kelam bû mirov û di nava me de jiya" (Yû. 1:14). Xwedê bû ku tê dîtin, tê bihîstin, tête destlê dayîn (1Yû. 1:1) û bi rêya baweriyê şênber bû (Yû. 6:69). Xwedê Xudan Îsa Mesîh ji me re şand û "Xwedê, Mesîh wekî qurbanê bi xwîna xwe ve gunehan dide bexşandin û bi rêya baweriyê ve tête pejirandin pêşkêş kir" (Rom. 3:25). Bo vê yekê peywireke Îsa Mesîh ya divê bona me bibe serî hebû. Baweriya hew dema em Îsa Mesîh wekî Xudan û Xelasker qebûl bikin dibe baweriyek xelasker. Ew, bona me çû xaçê. Wî berdêla gunehên me dan û ev berdêl gellekî buha bû (1Pê. 1:18). Bo vê yekê bona xelas bibin tenê em bangî Wî dikin (Rom. 10:13). Em tenê bi navgîniya Wî dikarin bigihêjin Xwedayê Bav (Yû. 14:6). Wekî zarokên Wî bin em dikarin bi gotinên "Abba, Bavo" bangî Wî bikin (Rom 8:15). Îsa Mesîh Lawê Xwedê yî. Xwezaya Wî, xwezaya Xwedê yî. "Ez û Bav yek in" (Yû. 10:30). Bo vê yekê Wî dikarîbû wisa bigota: "Yê ku min dîtiye, Bav (jî) dîtiye" (Yû. 14:9).

Paşî vejînê Tomas mukir tê: "Xwedayê min û Xudanê min" (Yû. 20:28) Îsa Mesîh Xwedanî ye û xwezaya Wî bi

Bav re yek e. Ev rastî di ayetên jêrîn de tevî pênas û lêkeran jî bi aşkereyî hatine diyar kirin:

Afirker (Îşa. 40:28 → Yû. 1:3), ronahî (Îşa. 60:19-20 → Yû. 8:12), şivan (Zeb. 23:1 → Yû. 10:11), pêşî û dawî (Îşa. 41:4 → Pey. 1:17), yên gunehan dibexşîne (Yêr. 31:34 → Mar. 2:5), Afirkerê milyaketan (Zeb. 148:2-5 → Kol. 1:16), Yê ku milyaket pesnê Wî dide û jê re diperiste (Zeb. 148:2 → Îbr. 1:6).

Di ayeta Fîlîpiyan 2:6'an de wekhevî/hemaniya Îsa Mesîh û Bav tête teqlandin. Dema Ew, mîna mirovekî hate rûyêerdê, di şêweya xizmetkarekî de bû û bitûmî girêdayî Bav bû û serî li ber danîbû. Di vê peywendê de – yanê hatina Îsa Mesîh ya di xuyabûna mirovekî de – di nava Bav û Law de cihêtiyek seretatiya aşkere derdixîne holê: "Lê belê ez dixwazim hûn bi vê yekê jî bizanibin: Serê her zilamî Mesîh, serê jinikê zilam û serê Mesîh Xwedê ye" (1Kor. 11:3). Lê belê Xudan Îsa Mesîh êdî li aliyê rast yê Xwedê rûdinê û bitûmî nimêna heyîniya Wî ye (Îbr. 1:13). "Bav li erd û ezmana hemî rayedariyê daye Law" (Met. 28:18). Hemî rayedariya darazkirinê jî ji Law re hatiye dayîn (Yû. 5:22), ji ber ku her tiştî bi Law ve pêwendî danîne (1Kor. 15:27). Di encamê de wisa nivîsandiye:

"Dema her tişt bi Law ve hate pêwendîdanîn, wê gavê dê Law jî bi Xwedayê ku her tiştî pêra pêwendîdaniye ve bi pêwendî bibe. Wisa ku bila Xwedê di her tiştî de bibe her tişt (1Kor. 15:28).

Em **Ruhê Pîroz** jî bi heman awayî wekî kesayetiya Xwedê ya sêyem qebûl dikin, lê peywirên wî ji peywirên Law cihêtir in. Ruhê Pîroz Alîkarê me ye (Yû. 14:26) û li ber Xwedê nûnerê me ye, çavên me li rastiya Kitêba Pîroz ve vedikin (Yû. 14:17). Li ber Xwedê bona me navbeynkarî dike (Rom. 8:26) û ger Ew nebe em nikarin Îsa Mesîh mîna Xudan û Xelaskerê xwe binasin (1Kor. 12:3b).

**Dua:** Îsa Mesîh ka dê ji Bav re bi çi awayî dua bête kirin, hînî şagirtên xwe û me dike (Met. 6:9-13). Dema şandî Yûhena, bi hêza milyaket ve xwe davêje erdê û dixwaze bi wî biperiste, nûçegihanê Xwedê bi awayekî hişk wî îkaz dike: "'Qet meke!' got. 'Ez mîna te û mîna yên ku tevî birayên te yên peyxamber in li gor gotinên vê kitêba dikin, qûlê Xwedê me. Ji Xwedê re biperiste!'" (Pey. 22:9). Ji Îsa Mesîh re duakirin, bona bawermendekî him pêdivî û him jî cergê hatiye rûyêerdê emirek e. Îsa Mesîh ji şagirtên xwe re wisa dibêje: "We heta niha bi navê min ve tu tiştî nexwestin. Bixwazin, hûn ê bistînin. Wisa ku bila kêfxweşiya we bêkêmasî be" (Yû. 16:24) û "Ger ku hûn bi navê min tiştekî bixwazin, ez ê bikim" (Yû. 14:14). Di Kol. 3:17'an de şîreta bi navê Xudan Îsa duakirinê dide me: "Hemî gotin û kirinên xwe bi navê Xudan Îsa, bi navgîniya Wî, ji Bav Xwedê re bi spaskirinê bikin." Xudan Îsa, navbeynkarê yekane yê di nava Xwedê û mirovan de yî (1Tîm. 2:5) ji ber vê yekê dema mirov dua dikin, bangî Wî dikin. Stêyfanê di oxra baweriya xwe de miriye ji me re, mîna bawermendekî bi "Ruhê Pîroz" ve tijî û mînak tête nîşan dayîn. (K. Şa. 7:55). Dema ji aliyê girseyên bi hêrs ve tête recimandin duaya wî wisa ye: "Xudan Îsa, ruhê min bistîne!" (K. Şa. 7:59). Dema Xudan Îsa Mesîh li ruyêerdê dijiya jî bi Xwedayî jê re peristin hatibû kirin û Wî vê yekê red nekir. Zilamê bicizam (Met. 8:2), zilamê ku bi korî welidiye (Yû. 9:38) û şagirtên Wî (Met. 14:33) hemiyan li ber Wî bejnên xwe tewandin û Wî mîna Xudan û Xelasker qebûl kirin. Li gor Nivîsa Pîroz ev tevger, nîşana herî aşkere ya peristin û pesindayinê ye. Di Nivîsên Pîroz de qet tu ayet nîne ku bibêje ji Ruhê Pîroz re dua bikin. Li gora Kitêba Pîroz divê dua tenê ji Xwedê re – ji Bav re an jî ji Îsa Mesîh re – ji Law re bête kirin.

## 2. Pirsên Di derbarê Kitêba Pîroz de (PKP)

Bersivên li jêrê ne lêkolînê li ewlekarî û derbasdariya Kitêba Pîroz ve dikin. Ji ber vê yekê xwedî avahiyek gellekî girîng e. Li vê beşê – hevgirtiya girîngiya mijarê – dê tenê pênc heb pirs bêne bersivandin. Beşek hê jî bi kitekit wekî din li pêy pirtûkê ve hatiye vekirin.

**PKP1:** *Kitêba Pîroz ji aliyê mirovan ve hate nivîsandin: Ma ev yek her tiştî dîmaneyî nake? Ka di vê rewşê de em ê çawa bikaribin bibêjin ku Kitêba Pîroz ji Xwedê ye û her tiştê tê de ne rast in?*

**BKP1:** Em ê vê pirsa ku ji ser rasteqîniya ayetên pîroz ve hatine pirsîn, bi mînakek diyar e ya ku bi seretatiya matematîkê ye bibersivînin. Di Kitêba Pîroz de 6,408 ayetên naveroka wan daxuyana peyxambertiyê yî hene, ji vana 3,268 hebî çûne serî, yên di derbarê dahatûyê de ne. Tu peyxamberî ji daxuyana ayetê cudatir neçûye serî. Li ser dinê tu pirtûk ne xwediyê vê wesfê ne. Di destê me de – hew bi formuleke matematîkê tête daxuyanîkirin – para rastiyek bêhempa heye. Niha dixwazim vê pirsê bipirsim: Ma gelo dibe ku ev qas peyxamberî bi rasthatinî biçibe serî? Mînak, bêyî destekariya Xwedê temambûna vana pêkan e?

Dema em van pirsan bigrin dest, em hisabeke dibêtiyê bikar bînin. Di modela hisabkirina jêrê de du jande hatine paşçavkirin, yanê di Kitêba Pîroz de carna çend ayet peyxambertiyekê dibêjin carna jî ayetek, di derheqa çend peyxambertiyê de dibêje. Mîna vêya, ji hinek peyxambertiyan çend carî qalkirin jî nehatiye tevlîkirina vê hisabê.

Bona modela hisabkirinê bête hêsankirin, bi formûla bingehîn ya dibêtiyê hatiye telafîkirin. Ger em *şensa*

temambûna peyxambertiyekê, wekî dibêtiya bingehîn ya herî bilind e p = 0.5 bihesibînin, wê gavê dibêtiya hemî 3,268 peyxambertiyên ku çûne serî *w*, bi awayekî rast dê bête hesibandin: $w = 2^{-3268} = 1.714 \cdot 10^{-984}$. Birastî dibêtiya cihhatina her peyxamberî, bi awayekî matematîkî di nava 1:1000 û 1:çend heb milyon (yanê di hezarî de yek û di çend milyonî de yek) dê bête formul danîn.

Di vê rewşê de em, nirxa p wekî 1:2 (= 0.5) (Ji sedî pêncî) bistînin em dê bi feraziyek ewlekar re karê xwe bikin. Bona ku em hevberkiyê li nirxên me bona w dîtine bikin, li hinek pergalên lotoya hejmarî binêrin. Di lotoya hejmarî de (6 hejmarên rast û paşhatî ne ji nava hejmarên ji 1'ê heta 49'an in nîşandayîn) dibêtiya qezenckirina îkramiya mezin çawa ku 1:14 milyon e, em divê vê pirsê bipirsin: Bona ku dibêtiya qezenckirina me bigihêje 3,268 peyxambertiyên ku çûne serî, divê hejmarên di lotoya hejmarî de ne heta çenda bin?

Dê wê gavê mezinahiya kûpona lotoya hejmarî çi qas bûya?

a) Qandî tableya tenîs (pînpon) ê
   Qad $Q = 1.525 \cdot 2.74 \text{ m}^2 = 4.1785 \text{ m}^2$
   Li gor hejmarên kûpona lotoya hejmarî ya asayî, hejmara mêjerên ku dê di vê qadê de bicih bibin (L), dê 167,140 bibûya.
b) qandî qada futbolê?
   Dema Qad $Q = 7{,}350 \text{ m}^2$ be, dê L, 459,375,000'ê re wekhev be.
c) An jî qandî mesaheya rûbarî ya dinê ye?
   Ger Qad $Q = 510$ milyon $\text{km}^2$ be, dê L, $31.3653 \cdot 10^{18}$ bibe. $10^{18}$ jî kentîlyon an jî milyon milyon milyon e.

Ger pêdivî hebe ku hesibandina dibêtiya mêjerên qandî L ne şeş hebî li hev anînê, wê gavê dê divêtiya (w) di mînakên jorê de ne, bibûya mîna yên li jêrê ne:

a) w = 1 : $0.4 \cdot 10^{30}$ (an jî $2.5 \cdot 10^{-30}$)
b) w = 1 : $1.3 \cdot 10^{49}$ (an jî $7.69 \cdot 10^{-50}$)
c) w = 1 : $1.3 \cdot 10^{114}$ (an jî $7.69 \cdot 10^{-115}$)

Hejmarên bona “w” derketine nîşan didin ku hevberkiyên ji a) heta c)’yê bitûmî kêm in. Hejmara mêjerên pêdivî lê hene, li gora encamên matematîkî birastî jî hilmbirîn (xweştirîn) in.

Bona ku hevberiyeke têra xwe bikin, divê hem hejmaran atomên li hemiya gerdûnê be bifikirin, ji ber ku $10^{80}$ ye, ev jî tena xwe hejmarek hişnagire ye (1 û li kêleka wê heyştê heb nîn (sifir), an jî dehhezar milyonê bi xwe re heyşt cara lêkdan). Bona famkirina hejmara mêjera astronomik ya bona wê lotoya hejmarî a serxweza, yanê $2.74 \cdot 10^{164}$’ê, divê mirov, xwedî hêzeke di ser zerengiya hişê xwe de be. Ê de ka bifikirin ku di barîgehên her yek qandî barîgeha me ye de, qandî hejmara atomên di barîgeha me de hene, ger wisa be bi vî awayî jî hejmara mêjerên li ser lotoya hejmarî ne dê 27,400 qatî kêmtir bibe.

Di ronahiya tiştên jorîn de tenê tiştekê tête diyar kirin: Peyxamberiyan Xwedanî ne, nabe ku çavkaniyên wan mirov bin. Ev hisabdayînan me dibe kurtkirina encama ku Îsa Mesîh di duaya xwe ya ji Bavê xwe re kiriye de gihaştiyê:

“Soza te rasteqîn e” (Yû. 17:17). Pêdivî nîne ku çavkaniya Nivîsa Pîroz mirov be, lê li dijî vêya “Hemiya Nivîsên Pîroz peyxama Xwedê ne ” (2Tîm. 3:16). Xwedê hinek kesên bijarte, zanînên girîng – bêyî kesayetiyên wan, hestên wan, xwezayên wan li derve hiştinê – bona ku ji bo me qeyd bikin bikar anîn. Di derbarê vê pirsê de zanîna kitekit di beşa Pêvekan de di bin sernavên (Zanîna Bingehîn ya Kitêba Pîroz, Çavkaniya Kitêba Pîroz, Naveroka Rasteqîniya Kitêba Pîroz, Ceribandina Rastiyên Kitêba Pîroz) de dê bête dîtin.

**PKP2:** *Ka ez ê çawa fam bikim ku Kitêba Pîroz rast e an jî ne rast e?*

**BKP2:** Di bin hinek mercan de pêvajoyek fizîkî an jî reaksiyonek kimyewî ya bi awayekî matematîkî hatiye hesibandin, dê bibe an jî pêk neyê, ne bi nîqaşa komê, lê di encama cerbên xwe dubare dikin de aşkere dibin. Li dijî îdeolojî an jî bêjedariyên dinyewî, Kitêba Pîroz bi awayekî cerbî merca peytandina rastiyên xwe pêşkêşî me dike. Xwediyê pirsên bi hemî ne feylesofî ne û (lê belê) li rastiyê digerin, dikarin tevlî vê ceribandina ku Xwedê bi xwe jî esehiyê lê bike, bibin:

"Tiştên ku di Kitêba Zagonê de nivîsandîne ji devê xwe nexe. Bo tu hemiyan bi pûtedayînê bîne cih, bi şev û roj wan bifikire. Wê gavê tuyê serfiraz be û bigihêje armanca xwe (Yşû. 1:8).

Ev cerb ji sê gihanekan ve pêk tê:

1. Mercên cerbê hînbûn: Divê pêşiyê em naveroka Kitêba Pîroz binasin, yanê bi sebr û pûtedayînê divê em wê bixwînin.

2. Cerbê çêkirin: Ya duyemîn, divê li gor hemî talîmatan tevgerin û bicih anîn.

3. Azmûna zanînên Cerbê: Her kes dixwaze di qadên mîna kar û zewac û hwd. de serfiraz be. Di rojnameyên bi giranî di derbarê magazînê de ne pirsên ku ji şêwirdaran re têne pirsin vê yekê dipeytînin. Di destê tu şêwirmendê zewacê, gerînendeyê karxanê an jî şêwirmendê siyasetê de, bona serfiraziyê reçeteyek amade nîne. Tenê Kitêba Pîroz, bi şertê ku li gor mercên jorê ne kirinê; lêkerên zanyarî û serfiraziyê waad dike.

Yên ku vê cerbê pêk bînin, dê her dem bigihêjin encameke qenc. Windakirin an jî ketina xesarê ne pêkan e. Di vê cerbê de tiştên mîna pereyên mîna di lîstikên şensê de têne windakirin an jî selefên deynan, bêne windakirin jî nîn

in. Ger hûn guh bidin Kitêba Pîroz, wê gavê wisa dibe ku hûn bi Xwedê re kar dikin û qezenca we jî dê girsehêz be. (Di Beşa Pêvek de di bin sernavê “Rastiyên Kitêba Pîroz” de bi kitekit cih li mijara rasteqîniya Kitêba Pîroz ve hatiye dayîn).

**PKP3:** *Gelo bi çi awayî Kitêba Pîroz ji berhemên wêjeya dinê ve cihêtir e?*

**BKP3:** Kitêba Pîroz di bingehê de ji berhemên din yên wêjeya dinê ve cihêtir e; ji ber ku xwediyê awayek bêhempa, bêwekhev e û bi tu tiştî ve nayê hevberkirin e.

**1.** *Çawa ku di navbera demek hezar salî de hatiye nivîsandin, lê Kitêba Pîroz domdariyeke bêmînak nîşan dide:* Kitêba Pîroz ji aliyê nêzîkî çel û pênc kesên ku raborîn û karên wan ji hev cuda ne hatiye nivîsandin. Di nava nivîskarên Kitêba Pîroz de, kesên mîna Mûsayê perwerda bilind kiriye, Yêşûyê serfermandarê artêşê, Danîêlê serokwezîr, Nehemyayê sermeyger, Dawidê Qiral, Amosê şivan, Pêtrûsê masîvan, Metayê nerxgir, Lûqayê nûjdar û Pawlosê konvan jî hene.

Hinek beşên Kitêba Pîroz di şunwarên serxweza de hatine nivîsandin; li çolê (Mûsa), di zîndanê de (Yêremya), di qesrê de (Danîêl), di gerê de (Lûqa) an di di sirgûnê de (Yûhena).

Nivîsên Kitêba Pîroz, şabûn û hezkirin, tirs û hizrên nivîskarên xwe jî nîşan didin. Ev navbera demê ya di berhemek din de qet nayê dîtin, ji ber ku di nava nivîskarên wê de ev dema nivîsandinê di nava 60 nifşeyî de hatine belavkirin û ew qas cihêtiyên tewekeyên civakî hene, lê belê dîsa jî di naveroka Kitêba Pîroz de hevgirî û aheng pêş de derdikevin. Çawa ku nivîskaran, bi sedan mijarên cihê, bi şêwazeke yek ahengiyek mirov ditewişêne bikar anîne. Cerban

nîşan dayîne ku mirovên ji ew qas demên cihê ve têne û xwediyê ew qas kesayetiyên cihê ne, ger bêyî destekariya Xwedê ev qas cureyên mijarê bikar bianîna, ev qas aheng û yekitî pêk nedihat. Bi taybetî Xwedê û pilanê Wî yê xelasiyê, di Kitêba Pîroz de adetî mîna tayekî gewez heta Xaçê dûdirêj dibe û diçe.

**2.** *Kitêba Pîroz, qandî ku di berhemeke din de nayê dîtin, xwedî şêwazek wêjeyî ya berfireh û dewlemend e:* (Binêrin Beşa Pêvek I, Rêgezan R58)

Ji aliyê din jandeyên mîna çîrok, efsane û destan yên spekulatîf in li derve hatine hiştin. Wekî din, cih li fîşaleyên çilwerî û/an jî bi kêmasî ne, yên ku bi pirranî di hîcw, pesnahî, destanî û komediyan de cih digirin, nehatine dayîn.

**3.** *Kitêba Pîroz bi pirrcureyî ya di mijarên xwe de derdikeve pêşiyê:* Berhemeke bawerî, zagon (hiqûq) û dîrok pev re û di heman demê de hatine vekolandin in. Rêgezên bingehîn yên gellek aliyê zanînê pêk tînin û bona bûyerên rojane dîrektîfên wê yên bêhejmar hene. Herî qencê şêwirmendê zewacê ew e. Ka em ê bi dê û bav û zarokan re, bi heval û neyaran re, bi cîran û merivan re, bi biyanan re, bi mêvanan re û bi birayên xwe yên bawermend re têkiliyekê çawa deynin, ew nîşan dide. Destpêka dinê û jiyanê, xwezaya jiyanê û dawiya dinê digre dest. Xwezaya Bav Xwedê û Law Îsa Mesîh û bikaranîna Ruhê Pîroz ji me re daxuyanî dike.

**4.** *Kitêba Pîroz, kitêba yekane ya tê de bitûmî peyxamberiyên ewlehî hene yî*: Ji ber ku çavkaniya hemiya van peyxamberan Xwedanî ne (1Sa. 9:9; 2Sa. 24:11; 2Pê. 1:20-21) û di berhemên wêjeyî yên dinê de ev yek nayê dîtin (Ne di Quranê de û ne jî di nivîsên Nostradamûsê medyûmê Fransewî) de. Di navbera têgihandina (nivîsandina) peyxamberiyan û temambûnê wan de ew qas demek fireh heye ku, nirxkerên herî tund jî nikarin îdia bikin ku piştî bûyer bûne ev peyxamberî hatine têgihandin.

**5.** *Wekheviya şahidaya di Kitêba Pîroz de ye, di keriyek din ya demê de nîne:* Kitêba Pîroz ji destpêka demê ve (Afirandin) heta dawiya wê (Peyxamgirtin 10:6b) dirêj dibe. Wekî din tu pirtûk nîne ku destpêka demê bi teqeziyek her wekî din qeyd bike an jî encama wê birastî teswîr bike.

Wekî din Kitêba Pîroz qala rasteqîniyek zagonên dinyewî yê vesînor dike, lê darbas nabinê, yanê bêdawîbûnê dike.

**6.** *Tu paşpêyiyên danezanên di Kitêba Pîroz de ne nehatibe peyitandin:* Bona tu hinartinên zanistî yên di Kitêba Pîroz de cih digirin de, li gor encamên lêkolînan, pêdiviya serrastkirinê nebûye. Lê li paşpêyê vêya, bêhejmar mînak hene ku, terîfkirinên zanistî yên di Kitêba Pîroz de ne, li pêy sedsalan, di encama lêkolînan de hatine peyitandin (mînak; hejmara stêrkan [G7, r. 15-23]; awaya dinê [G1, r. 59-60]).

**7.** *Qandî Kitêba Pîroz mirov, bi têgihandinek rasteqîn teswîr dike, tu pirtûk ya vêya bike nîne:* Cih nade fîşalên qerfokî yên aliyên neqenc yên mirovan dinuxumîne, çîrokên jiyanê yên hatine nepixandin an jî lehengiyên hatine bilindtirkirin. Ji ber vê yekê di têgihandinên Kitêba Pîroz de li gunehên bapîrên baweriyê (Afr. 12:11-13), zinêkirina Dawid (2Sa. 11) û bêrêziya civakên dêrê ve (1Kor. 1:11, 2Kor. 2:1-4) cih hatiye dayîn.

**8.** *Kitêba Pîroz qala bûyerên mirovên wê demê nikarin xeyalê wan jî bikin û dê di dahatûyê de bibin, dike:* (Mînak; laboratûarên fezayê, îstasyonên rêgehê – Obadya 1:4). Di hînkariyên Kitêba Pîroz de, qala hinek rewşên ku dê paşî sedsalan were cih tête kirin (mînak; pirsgirêka tevzînerê 2.Korîntiyan 6:16-17; zanistiya genetîkê, binêrin PDJB 10).

Heyşt wesfên li jorê qala wan têne kirin, nîşan didin ku Kitêba Pîroz bêhempa ye û bi pirtûkên din ve nayê hevberkiyê. Phîlîp Schaff yê dîrokzan bi vî awayî qala Nivîsên

Pîroz û bêhempabûna wê dike: “Îsayê Nisretî çawa ku pere û leşkerên Wî tunebûn; ji Îskenderê Mezin, ji Sezar, ji Mihemed û Napolyon zêdetir mirovan fetih kirine. Ew, bêyî alîkariya zanist û perwerdê di mijarên mirovî û îlahî de ji hemî feylesof û zanyaran zêdetir aşkerebûnê aniye. Wî di derbarê jiyanê de tiştên ku heta wê rojê nehatine gotin têgihandiye û bêyî nivîsandina rêzikekê bandoreke, ji bêjekî an jî helbestvanekî hê jî kûrtir daniye. Ew ji hemî navdarên dema kevnar û ya hemdem zêdetir pênûsan tevgerandiye û zêdetir peyxamê daye waazan, gotaran, guftegoyan, nivîsên lêkolînê, berhemên hunerê û murxên spasiyê” *(Josh McDowell)*.

Peyv û tîpên naveroka Nivîsên Pîroz (mînak: Wergera Kîng James 783,137 peyv û 3,566,480 tîp) di hejmareke diyarkirî de bin jî, dewlemendiya ramanê bêdawîn e. Emrê mirovekî têra qedandina ramanên ku tê de ne nake (Zeb. 119:162). Em dikarin her tim û di her periyodê de bixwînin, dê tu carî aciz neke. Dema em beşekê dîsa bixwînin, her car ramanên nû û bona beşên din şandinên çepûrastiyê dikarin bibînin. Ev yek jî dê me bibe vê encama girîng: Kitêba Pîroz Kitêba yekane ya Xwedanî ye. Rastiya wê ji aliyê Xwedê ve hatiye tesdîq kirin (Zeb. 119:160, Yû. 17:17).

**PKP4:** *Gelo di roja me de danezanên nû yên bi Kitêba Pîroz ve bêne vekirin hene? Bêşik Xwedê ji Nivîsên Pîroz ve seretatir e û bêyî navbeykar dikare bi me re pêwendiyê deyne.*

**BKP4:** Dema em vê pirsê bibersivînin, du rêyên cihê yên têkildariya îlahî em ji hev cuda bikin: Ya yekemîn Kitêba Pîroz e, ku ev yek bona her kesî derbasdar e, ya duyem jî Xudan di jiyana her kesî de bikaranîna cihê û rêbertiyê de yî.

**1.** Pêveka Kitêba Pîroz?

Tevlî kesên bona nivîsandina Kitêba Pîroz ji aliyê Xwedê ve hatine diyarkirin û rayedarkirin (mînak: Yêr. 1:5, Gal. 1:12) peyxamberên derewçîn jî hewl dane ku danezanên xwe yên ne rayedar in bidin bihîstin. Xwedayê ku pirsa, "Ka em ê çawa bizanibin gelo gotinek ji XUDAN e an jî na?" (Jinû. 18:21) bersivandiye bona ceribandina rastiyê pîvaneke gellekî girîng pêşkêşî me dike: "Ger peyxamberek li ser navê XUDAN biaxife, lê belê gotina ku gotiye neyê cih an jî çênebe, ew gotin ne ji XUDAN e. Peyxamber bi bêrêzî axifîye. Ji wî metirsin" (Jinû. 18:22). Îsa Mesîh jî di Waaza xwe ya li Çiyê de di derheqê peyxamberên derewçîn de hişyar dike û rêya danasîna wan daxuyan dike: "Ji peyxamberên sexte xwe biparêzin! Di nava eyarê berxikan de têne digel we, lê belê di derûniya xwe de gurên hov in. Hûn ê wan ji fêkiyên wan binasin. Ma ji nebatên bi histrî tirî, ji strîmişkan hêjîr têne hevdan?" (Met. 7:15,16).

Yûhenayê Şandî jî bi gotineke îkazker qala vê xeterê dike: "…gellek kesên xapînok bi her aliyê dinê ve belav bûne… Di tu kesê ku bi ser hedê xwe ve ketiye û bi hînkariya Mesîh ve dilsoz nemaye de Xwedê nîne (2Yû. 7,9).

Kitêba Pîroz peyxama Xwedê ye. Xwedê bi navgîniya Lawê xwe axifiye (Îbr. 1:2) û dê li pêy vêya peyxameke din nebe (Pey. 22:18). Tenê peyvekê jî nikarin bi Nivîsa Pîroz vekin. Pêtrûsê Şandî di mijarê "hînkariyên têkbir" (2Pe. 2:1) ên di dema xwe de hişyariyê kir û têgihand ku dê vana mirov bibin têkçûnê.

Çewtkirin û pêvekên rêşaş ên ku bi Kitêba Pîroz ve hatine vekirin: Joseph Smîth (Kitêba Mormonan); Jakob Lorbeer (Rêhevalên Nû yên Şoreşê/Frîends of the Neo-Revolutîon); Ch.T. Russel (Şahidên Yehova); J.G. Bîschoff (Şandîtiya Nû/New-Apostolîc), Mary Baker Eddy (zanistiya Xirîstiyaniyê/Chrîstîan Scîence) û hemiyên din, ne

danezanên Xwedanî, lê derewên tirsehêz yên dilxapînok û mamosteyên sexte ne. Xwedê peyxamên pêvek nadin, tenê bona yên ku di Peymanên Kevin û Nû de dayîne re ronahiya nû digire.

Yanê Kitêba Pîroz çavkaniya yekane ya tevîhevkirina zanînê û pîvana yekane ya rastiya her tiştî dê bête peyitandin e. Ji ber vê yekê bona van sedemên ku li jorê hatine daxuyankirin, di roja me de, li gotinên hinek kesên ku bi peyvên “Xudan ji min re got ku…” destpê dike, gellek bi balkêşî bête nêrîn û ceribandin.

**2.** Di Jiyana mirov de rêberiya Xwedê: gellek carî, di hinek rewşa de em dixwazin ku Xwedê bi aşkereyî bi me re biaxife. Xwedê dikare vêya bike, lê belê bipirranî nake. Martîn Lûther, John Wesley, Hudson Taylor an jî Bîlly Graham mirovên Xwedê yên serfiraziyên serxweza qezenc kirine ne. Ew bi Gotina Xwedê ve ewle bûbûn û hêza xizmetên xwe yên berdar, ji Kelamê ve distendin. Di duaya me ya di Zebûra 86:11’an de: “Ya XUDAN, rêya xwe hînî min bike, ez li gora rastiya te bimeşim, min bi biryar deyne, tenê ez ji navê te bitirsim”, em dixwazin ku Xwedê dest bide ser jiyana me. Em dikarin vê dastdayînê bijîn, lê ev hew di rewşeke em paşî wateya wê fam bikin de çêdibe û ne bi dengê Xwedê yê ku tê bihîstin, pirranî bi bêdengiyê ve dibe.

**PKP5:** *Gelo hûn di derbarê “Şîfra Kitêba Pîroz” ya pirtûka Mîchael Drosnîn e de çi difikirin?*

**BKP5:** Rojnamevanê Emerîkî Mîchael Drosnîn di pirtûka xwe ya bi navê “Şîfra Kitêba Pîroz” e de (The Bîble Code, Weîdenfeld & Nîcolson, Brîtanya, 1997) têdighîne ku di Kitêba Pîroz de şîfreyek heye û çareseriya vê şîfreyê jî wisa ye.

Di dema vê kirarî de, pêşiyê 304,805 tîpên di her pênc pirtûkên Mûsa, ya bi Îbranîtî de derbas dibin li gora rêzên wan û di navbera wan de valahî nîn be li kompîturê bar dikin. Paşê her tîpê ku tê rêza *n*, ji vê rêzkiriê derdixînin (mînak: navbera *n*'yê: = 2, 3, 4 an jî 17, 35 hwd.) bi vî awayî rêzên tîpan yên nû çêdikin. Hejmara rêzên tîpan dikarin bi rêya qelizandina çarçoveyê zêdetir bikin – mînak; bi tîpa pêşîn ve destpê nake, bi tîpeke din ve destpê dike. Û wekî din rêza pêristên ku, di encamê de hatine dîtin jî dibe ku bi awaya blokan bêne verast kirin û valahiyên di navbera vana de ne li gor daxwaziyê bêne guhertin, bi vî awayî pêkanînên tîpan ên ku gengaz in bi hejmareke girîng bêne zêdekirin. Li pêy vê kirariyê, destpê dikin û li peyv an jî pariyên peyvên ku bona roja me ya îroj weke "peyxamberî" bêne şîrovekirin digerin.

Ma gelo divê em ji metodeke wisa re bibêjin çi?

**Bervêdana ji Aliyê Zanîn-Bîroziyê:**

**1.** Metoda ku hatiye bikaranîn, bitûmî kêfî ye. Di nava ev qas tîpan de helbet gengaz e ku nav û gotinên watedar derkevin. Ji ber ku lêgerîna peyvan di nava bloka tîpan de tenê ne bi berwarî tîkane û koşeyî tête kirin, gengaziya dîtinê gellekî pêkan e. Û ji aliyê din, dema li peyvan digere ji rastê berve çepê, ji çepê berve rastê, ji jor berve jêr, ji jêr berve jor xwendin jî serbest e.

Ji bilî vêya, Drosnîn di lêgerînekê de metoda xwendinê birasthatinî diguhere û bi vî awayî, dikare peyvên hê jî li gor mijarê ne bibîne. Mînak, peyvekên rastê berve çepê, ya duyemîn ji jor berve jêrê dixwîne, lê belê balê didin tenê peyvên duyemîn. Di vê navberê de guhertinên ji ber koşeyîyê jî divê ji bîr ve mekin.

**2.** Divê ji hiş neyê derxistin ku, beşek mezin ya rêzkirina peyvan, ji aliyên cihê bêne xwendin jî, jibilî bermayiyek an jî çopeke tiştekî watedar jê dernayê, wêdetir nîne.

Xeyrî vêya dema mirov awahiya xerîb ya Îbranîtiyê, ji ber ku hinek tîpên dengdar nayên nivîsandin, bigre ber çavan, gengaziya dîtina peyv an jî pariyên peyvan ên watedar gellekî bilind e.

**3.** Li gor metoda şîfra Kitêba Pîroz, nîşan her tim ji heman çavkaniyî bidest ve dixin. Ji ber vê yekê tim belavkirina tîpan (ya nivîsa Îbranîtî nîşan dide) her car wekhev dimîne. Di vî halî de gengaziya birasthatinî derketina peyveke di Îbranîtiyê de, ji komikeke belavkirina hejmara tîpan cihê (an jî birasthatinî) ye hê jî bilindtir e.

**4.** Drosnîn bona lîstika xwe ya îstatîstîkî, bi xeletî bijartina navê "Şîfra Kitêba Pîroz" licih dîtiye. Divê bona şîfreyekê afirkirê wê an jî yekî ku wê bişîne hebe. (G5, r. 67-80)

Mîna ku li jorê hatiye daxuyankirin pêkanîn bi metoda Drosnîn derketine holê bitûm birasthatinî, ne. Encamên rasthatinî jî nayên çareserkirin, ji ber ku ji ber pênasiyên xwe qet tu wateya wan nîne. Bo vê yekê, tiştên ku Drosnîn li pêy van çareserkirinên xwe xwendine bitûmî kêfî ne, nehatine armanckirin û kesî ku wan şandiye jî nîne.

**5.** Matematîkzanê Awistralyayî Brendon McKay, metoda "Şîfra Kitêba Pîroz" ya Drosnîn, di pirtûka "Moby Dîck" ya ku bi Îngilizî hatiye nivîsandin de bikar aniye û kehanetên "bandordar" yên wekhev derxistine holê. McKay bi vî awayî peytandiye ku encamên vê metodê, ji çavkaniya ku hatiye bikar anîn serbixwe ye.

Di zêdeyiya tîpên ku hejmara wan pirr in de her kes dikare tiştên ku lê digere bibîne. Di nava tîpên ku dor li peyva hatiye dîtin digirin de, dibe ku peyvên wekî din yên li gor vê peyvê ne derkevin. Drosnîn her wekî peyveke ne li gor armancê ye (an jî li dijî wê ye) davê paş çavan. Di vê navberê de divê em daxuyan bikin ku, dema McKay metoda wî bikar dianî, peyva "Drosnîn" birasthatinî hema li nêzîka peyva "Derewçîn" ve dît.

**Bervêdana ji Aliyê Kitêba Pîroz:**

**1.** Danezana bingeh ya Kitêba Pîroz, xelaskirina mirovan ya ji aliyê Xwedê, di Îsa Mesîh de çû serî. Armanca Kitêba Pîroz; ji me re têgihandina Xwedê û Îsa Mesîh, ka em ê çawa bikaribin xelas bibin û çawa bigihêjin jiyana abadîn nîşanî me dayin e.

Kitêba Pîroz bi bûyerên polîtîk yên deng didin ve têkildar nabe. Drosnîn di vê lêgerîna xwe de li dijî peyxama Kitêba Pîroz ve disekine. Di gotinê de tu danezanên şîfra wan çareserkirine, ne li gora naveroka Kitêba Pîroz in.

**2.** Peyvên ku ji aliyê Drosnîn ve hatine keşf kirin, bi awayekî kêfî anîne digel hev. Ne xwedî rêzeke diyar in û bitûmî hevokekê çênakin. Lê di Kitêba Pîroz de hevokên têgihîştî hatine bikaranîn û hemî vegotin bi rehetî têne famkirin. (Ef. 5:17). Xwedê xwe, ne bi hinek lîstikên kompîturê yên ku nayên famkirin, lê bi Kelama Xwe daxuyan dike (2Tîm. 3:16; Gal. 1:12; 2Pê. 1:21). Danezana Kitêba Pîroz ev qasî aşkere ye ku, bawermendên nû jî dikarin bihêsanî têbighêjinê (1Pê. 2:2). Ev danezan, nabe ku tenê bi şifreyeka dizî, ya di dawiya sedsala 20'an de bête çareserkirin hatibe parastin û veşartin.

**3.** Drosnîn, wêneyek Xwedê ya ku bi Kitêba Pîroz ve ditewişe û hatiye çewtkirin xêz dike. Mînak, wisa dinivîse: "Şîfre mîna ji kesekî qenc e lê belê bitûmî ne xwediyê hêzê ye û ev xetera tirsehêz nîşanî me dide ku em tewdîra xwe bistînin, ji me re hatiye şandin xuya dibû" (r. 103). Di pirtûka "Şîfra Kitêba Pîroz" de sala 2006'an (Li gora salnameya Cihûyan sala 5766) di derbarê dûvstêrkek dinê tune bike de yî (r. 153). Li gor Kitêba Pîroz dawiya dinê ne ji ber dûvstêrkek, lê dê bi daraziya Xwedê ve bê (2Pê. 3:7,10). Kitêba Pîroz dibêje dê tu kes (hela "Şîfra Kitêba Pîroz" qet) bi vê demê nizanibin.

**4.** Drosnîn di pirtûka xwe de bi gotina; "Ez nizanim çima tevlî vî karî bûm. Ez ne miroveke oldar im. Bi Xwedê

jî bawer nabim. Ez bitûmî miroveke gumanber im" dinivîse. Lê belê Xwedê peyxama xwe dide qûlên xwe yên bi Wî bawer in û bi Wî ewle dibin. (Amo. 3:7). Ji ber vê yekê Drosnîn peyxamberek sexte yî.

Ger mirov bi eşkereyî biaxife: Metoda "Şîfra Kitêba Pîroz", lîstika peyvdîtinê ya kêfî û rêgezên bingehîn yê bîrdoziya zanînê digre bin pêlan e. Ev têgîn tenê bona dengdayînê avêtine holê û rê li nîqaşên neberpirs in vekirine. Encamên ku Drosnîn gihaştinê, yanê pariyên tîpan ên ku pev re zeliqandine, dijî xwezaya peyxama Kitêba Pîroz in, ji ber vê yekê li dijî Xwedê û Kelama Wî derdikevin.

## 3. Pirsên Di Derbarê Afirandin, Zanist û Baweriyê de (PDA)

**PDA1:** *Gelo bûjeneke bê can werdigere organizmayek zindî?*

**BA1:** Cihêtiya mezin ya di nava kîmyayên organîk û înorganîk de, li ser bingehek zexm bûn: Dihate zanîn ku pêkhatiyên organîk tenê bi navgîniya organîzmayên zindî li xwezayê pêk têne.

Dema organîzmayek dimire, pêvajo berevajî dibe û bûjenên organîk dirizin û bi pêkhatiyên înorganîk ve cihê dibin. Di sala 1828'an de Kîmyagerê Germenî F. Wöhler (1800 – 1882) dema amonyûm siyanata înorganîk wergerand ureya (karbamît) pêkhatî ya organîk, ev cihêtiya bingehîn ji holê rabû. Di roja me de dema bê xwestin, gellek pêkhatiyên organîk bi awayekî çêkirî têne bidest xistin. Lê belê bona çêkirina vêya pêdivî li endazyariya pêvajoyê û zanîna kimyê ve hene. Bi kurtayî pêdivî li zanînê heye.

Dema em li celebên zindiyan dinêrin, di aska fizîko – kîmyayî de, di nebatan, ajalan an jî mirovan de, di nava pêvajoyan û pêvajoyên fizîkî û kimyayî yên li derve wan dixebitin de qet nakokî nîn in – yanê hemî zagonên xwezayê têne bikar anîn. Bi vî awayî ji aliyê kîmya û fizîkê de di nava bûjenê nezindî ne de û bûjenên di zindiyan de ne, bi rêgezî qet cihêtî nîne. Di roja me de spekulasyonên neo-darwînizmê, yên ji ber ku zindiyên pêşî bûne, ew qas pêş ve çûyîne ku heta îdiaya; pêvajo sererast dixebite ji ber wê, di roja me de bûjenê nezindî wergeriyaye organîzmaya zindî, avêtine holê. Lê belê organîzmaya zindî û bûjena di zindiyan de yî du tiştên cihê ên ku di nava wan de şaşitî neyên kirin in. Em têra xwe zanîna di derbarê organîzma-

yekê de, pêkhatiyên wê bi awayekî kimyewî ji hev cuda bikin jî nikarin fam bikin. Di tevlihevbûna organîzmayan de tiştekî gellek girîng heye: “Zanîn” – ev çendaniyek hişî ya, bûjenê bi xwe nikare hilberîne yî. Zanîn, rêgeza berpirsiyarê hunera hilberîn û bi xwe şêwegirtina xwe ya taybet ya her zindiyî ye. Di xwezaya mirî de, mînak, li gora zanîna xwezaya xwe de, rêgeza hiberînê nîne. *Bi vî awayî zanîn, dibe taybetmendiyek diyarî ya organîzmaya zindî ji bûjena bêcanî cihê dike.* Bi heman awayî – di pêkbûna celebekî zindiyan de – li dijî pêkbûna krîstalan – li gor pêdiviyên zagona fizîko – kimyewî, têkiliya wê bi awahiyek ji berê ve hatiye diyarkirin nîne. Dema em bûyera jiyanê (zindî) bigirin dest, divê em bi wesfeke ji fizîk û kîmya wêdetirê ve dirêj dibe mijûl bibin. Ev cerbên navê cerbên peresanê lê hatiye dayîn û pêkhatina jiyanê bitûmî mîna pêvajoyek fizîkî – kîmyewî be diyar dikin, bi rastî vê îdiaya me dipeytînin. Zanîn tu carî ji cerbeke fizîkî – kîmyewî ve pêk nayê!

- Di cerbên Mîllers yên bi pirranî serî tê lêdan de, hinek amînoasîtên bi xwe kevirên avahiya proteînan e, bi awayekî çêkirî bi ser ketine, lê belê ji wan zanîn nehatine peydakirin. Yanê ev hewldan tu wesfekî em jê re bibêjin “cerba peresanê” tê de nîne.
- Çerxa-girde ya ji aliyê Manfred Eigen ve hatiye pêşniyarkirin, bitûmî rawêjek e û ji rastkirina cerbî ve dûr e. Eigen, bikaranîna vê di gotinê de, “maşîneya peresanê”, armanca xwe, peresanê bikêşîne zerengiya cerbî. Di nivîsa xwe ya di kovara “Bild der Wissenschaft” (No. 8-1988, r. 72) de wisa nivîsandiye: “Em di maşîneyek xwe de di pêşve birina (peresankirina) vîrusê bakteriyal de serfiraz bûn… Proje bi ser ket jî. Di nava sê rojî de me di cihêkirina celebekî (çêbûnekî) rastî mûtasyonê hatiye lê di berxwe de dide, serfiraz bûn. Ev, peytandiye ku

pêvajoya peresana mînak di laboratûarê de pêkan e ku bête dubarekirin.”

Lê ya ku rast e, deqa wî ya derketina rê, jixwe *celebekî zindî* bû. Zanîneke nû nehatibû hilberîn. Li dêvila vêya, li ser zanînên hene cerban hatibûn çêkirin û di encamê de li ser çavkaniya zanînê de ne pêkan bû ku tu tiştî bibêje.

**Divê em bin rastiyek girîng xêz bikin:** *li ser dinê di tu laboratûarê de, hê ji bûjenek organîk ya mirî ve organîzmayek zindî nehatiye hilberîn.* Ev rastî, dema rasteqîniya ku biyoteknolojî, bona celebên zindî biguherînin gellek metodan pêş ve dibin, bigrin ber çavên xwe girîngiyek cihê digire.

Di cerb û lêkolînên biyoteknolojîk de her tim ji zindiyekê dest bi kar dikin û bona guhertina wê tête xebitandin. Cihêtiya kûr ya di navbera biyoteknolojî û kemo-teknolojî de, di astekê nayê girtin de yî. Birastî, rojekê, bi pêkanîna hemî zanîna li dinê û di dawiya lêkolînên dijwar de, ger ev cihêtî bête girtin jî, ev tenê dê rastiya, bona afirandina jiyanê pêdiviya hebûna aqilek û dahêneriyek bipeyitîne.

**PDA2:** *Gelo dinya û gerdûn çend salî ne? Ma metodeke temena dinê bihesibîne heye? Gelo hûn di derbarê bi awaya karbonê dîrokdîtinê çi difikirin?*

**BA2:** Hê metodek ku temena dinê û gerdunê pêkbîne, nehatiye dîtin. Ji ber çi? Ji ber ku ji afirandina xwezayê vir de (bona demên pêvajoyan qeyd bike) saetek wê ya dixebite nîne. Di nêrîna pêşin de xerabûna radyoaktîfa atomên bêbiryar, gengaz e ku mîna dempîvanekê xuya bibe. Taybetmendiya her îzotopa bêbiryar ya elementên kîmyewî, li gor xwe xwediyê dema nêvîbûyînê ne. Ev, di navbera dema xerabûna radyoaktîf û hejmara atomên ku hene dadikevin nêviyê de ne (T). Tê zanîn ku ji 320 îzotopên di xwezayê

de ne, ji çelî zêdetirî wê radyoaktîf in. Ev bandora fizîkî deqa spartinê ya diyariya temenê radyometrîk e. *Di saetên demdirêj de* (dempîvanan de) ev cûreyan cih digirin:

- Saeta ûranyûm/toryûm-gule $T = 4.47 \cdot 10^9$ sal bo Ûranyûmê -238 ($^{238}U$)
- Saeta potasyûm argon $T = 1.31 \cdot 10^9$ sal bo potasyûmê -40 ($^{40}K$)
- Saeta rûbîdyûm stronsiyûm saati $T = 48.8 \cdot 10^9$ sal bo rûbîdyûm -87 ($^{87}Rb$)
- Û saeta dema kurt $^{14}C$ (bi gotinê C14) bi $T = 5{,}730$ sal.

Di dema hevkêşeyên xerabûna fizîkî, bi awayekî matematîkî bête bikar anîn, rastî gellekî tiştên nenas ve têne. Pergaleke wisa bi matematîkî tu carî çareser nabe. Wateya wê ya fizîkî ev e: di destpêkê de zanîna hejmara bûjena radyoaktîf bêderfet e, ji ber ku tu kes hejmara atomên bêbiryar ên ku di destpêkê de hebûn nikare bizanibe.

Ji bilî vêya, “metoda îzokron (xwarîka hevqeware)” jî heye. Di vê metodê de; di destpêkê de hejmara bûjena radyoaktîf, tenê bona ku bi mînakên hevgen re diyar bikin tête xebitandin. Ji ber ku pîvanên ka awahiya mînakekê hevgen e (genê wê yek in) (kongenetîc) an ne hevgen e, bi rêya lêkolînê ve ji pêşiyê de bipîve nînin, di vê metodê de jî ber ve nediyariyê çûyîn heye.

Metoda $^{14}C$ (xerabûna karbona radyoaktîf), piçekî cuda ye. Di vê metodê de senga destpêkê, bi rêya jimartina xelekên di gewda daran de (dendrokronolojî) ne tête diyarkirin. Dema em rasteqîniya, darên li dinê herî kevnare ne 5,000 salî ne bigirin ber çavan, bona her salê, bi jimartina xelekekê, dikarin temena darê bête dîtin. Nebatê herî kevnare ya ku di roja me de hê dijî, cûreyek darê çamê ya biqepûşk, a ku navê wê ya Latînî pînûs arîstata ye. Ev dara li D.Y.A, eyaleta Nevadayê ye û di sala 1998’an de bêkêmasî 4,924 salî bû.

Xwarika kalîbrasyonê ya bi navgîniya hejmara xelekan ve hatiye peydankirin, derfeta bi rêya hevberiyê dîtina temena mînakê pêk tîne. Metoda bi karbonê temendîtinê ne bona sala çend milyonî tenê bona çend hezar salî dikare bikar bê.

Di çarçofeya bîrdoziya peresanê, bi milyonan salên ku qal û behsa wan têne kirin ne bi pîvanên fizîkî, lê xwe disipêre, di gotinê de, bi *pîvoka dem ya jeolojîk*, ya ku li ser dinê bi herî teweka xwe ya stûr, a pariyê dema çêbûna jeolojîk ve raste rast hevgirî ye tête hesibandin. Ev bîrdozî bona hemî çêbûnên jeolojîk, ji berê ve ferz dike ku lezbûna tilpê ya maksîmûm her tim sabît dimîne û qethî hevbeş e. Ev pêşî ferzkirin heta ji aliyê nêrîna peresanî jî nikare bête parastin, hela tew mirov tofana Nûh bigire ber çavan dê ev yek pîvanen maqûl gellekî bibûrînê.

**Divê em vê yekê jibîr nekin**: Guhertinokên fizîkî (mîna demê) hew di rewşa diyarkirina qenderî ya di pêvajoyekê de dê bikaribe bandora fizîkî bipîve. Ev senga ku hatiye pîvandin, bi alîkariya pergaleke kalîbrasyonê (mînak: xwaroka kalîbrasyonê an jî pîvaka kalîbrasyonê) wekî hejmara unîteyên hatine terîfkirin dikarin bêne qeydkirin. Termometreyek bi zîbeq ya li ser hejmar nîne dema bixine nava ava kelandî, dê qebareya zîbeqê fireh bibe û di nava amûrê cam de bilind bibe, lê hew germahiya avê nikarin diyar bikin. Bona pîvana sehetiyê pêdivî ji termometreyek bikalîbre re heye, tenê ev dikare segaya rasteqîn ya pîvanê bide me. Di saetên demdirêj ên radyometrîk de jî *pergaleke bikalîbre* (mînak weke di pêvajoyek xwezayî de pariyên deman qeyd dike) nîne.

Dîroka herî kevn ya ku hatiye peytandin Li Rojhelata Nêzîk de û li Misirê nêzîkî B.Î. di sala 3000'an de destpê dike. (Balkêşe ku ev navberiya demê bi temena darên kevn ve di nava ahengê de ne!).

Kitêba Pîroz, xwediyê taybetmendiya, kitêba ku qeydên herî kevnare yên dîrokê tê de, ne. Heta mirovê Xwedê pêşiyê afirandiye ve bi paş ve diçe. Secereyên lihevkirî derfetê dide ku mirov ji afirandinê heta vê gavê, dema ku buhuriye bi awayekî rast bihesibîne. Her çi qas secere bêkêmasî neyên hesibandin jî, dinya mîna ku di bîrdoziya peresanê de tête hesibandin ne bi milyonan salan, lê tenê bi çend hezar salî ye. Dinya, gerdûn û bûyîna mirovahiyê hemî di heman temenê de ne, di navbera dema afirandina wan de tenê cihêtiya çend rojî heye.

**PDA3:** *Dûrbûnên bi milyaran salên roniyê ve pêk tên çawa bi famkariya we ya dinya ciwan ve lihev dikin? Ma nabe hûn biferizînin ku dinya, qandî tîrêjek ronahî bigihêje me kevnar e?*

**BA3:** Danezanên di vê pirsê de, ji aliyê segaya roniyê ya ku di roja me de hatiye famkirin ya 300,000 km/çirk e, rast e (Segaya teqez di 17'min Konferansa Giranî û Pîvanan ya ku di sala 1983'an de hate lidar xistin weke 299,792,458 km/çirk hatiye terîfkirin). Ronahî xwedî lezgîniya belavbûna, gellekî bilezî, lê tevî vêya bisînor (bi dawî) e. Ji ber vê yekê stêrkên niha em dibînin, weke şewleyên ronahiyê jî nîşanî me didin, ne di derbarê niha ya stêrkê de, lê belê di derbarê raborîna wê de agahiyan dide me. Encamek (ya ne fermî!) em ji vê yekê derxînin: Ji ber ku stêrkên çend milyar salên roniyê dûr in hene, divê qet nebe ev stêrkan çend milyar sal kevn bin. Bona vê awaya ramanê hê jî bi hêsanî fam bikin van her du pêkerên girîng jî bidin ber çavan:

**1.** *Ne dem, dûrayî*: Sala roniyê, ne mîna metre yekeya demê, lê yekeya dûrbûnê yî. Salek roniyê qandî 9.46 trîlyon kîlometre yî. Ev, rêwîtiya roniyê ya di salekê de dike yî. (Bi heman awayî, mirov dikare bibêje ku ronî, metro-

yekê di 1/299,792,458 çirkê de derbas dike. Di vê navberê de li dêvila metro bi qama mewcan binav bikin, roniyê bi yekeyên demê ve binavkirine). Çawa ku dûrbûna di navbera heyokên A û B de bi tiya a'yê tête zanîn, zanîna vê dûrbûnê di derbarê mercên din de (mînak temena wê) agahiyekê nade.

**2.** *Ramanê Afirkeriyê*: Bi awaya ramanî hevbeşkirina dûrbûn û demê, encama ekola ber ve peresana ku dibêje raborî û dahatû xwediyê demek bêtixûb e, yî. Lê di Nivîsa Pîroz de, deqek diyarî ya destpêka tewereya demê, wekî di ayeta yekemîn ya Kitêba Pîroz de hatiye diyarkirin, ne bi milyonan, lê tenê bi çend hezar salî şûnda diçe, heye. Ji ber vê yekê di tewereya demê de ji vê deqê wêdetirê dirêjbûn, bi fizîkî bêderfet e. Redkirina vê rastiyê, weke hebûna mirovekî ji çêbûna wê ya di malzaroka dayikê wêdetirê de kişandin e. Bi vî awayî nêrînê em ji hefteya afirandinê ve şûnda binêrin. Di roja çaremîn de stêrk tên afirandin (Afr. 1:14-16).

Li gor xeta ramanê ya ku li jorê hatiye daxuyankirin, dema afirandin temam bû, divê li ezmên tenê stêrkek jî tunebin. Lê stêrka herî nêzîkî dinê ye Alpha Centaûrî qandî 4.3 sala roniyê dûr e. Dê hew piştî afirandinê di 4.3 salî de ji dinê ve xuya bibûya. Stêrka Barnard, ya duyem herî nêzîkî dinê ye (5.9 sala roniyê) jî divê ji vêya 1.6 sal pişt re xuya bibûya. Ger rewi wisa bûya, hê îro jî meyê nikarîbûna hemî stêrkan bidîtana, ji ber her sal wekî çi qas ji dinê dûr bin, ew qasî bi zêdebûnê ronahiya stêrkan bigiheşta me. Lê belê çavdêriyên ezmannasan, têdighînin ku rewş ne wisa ne.

Li gor heman ekola ramanê, Adem di tûmiya 4.3 salî de dê li ezmanekî lê qet stêrk nîne binêriya. Paşê, di dawiya 1.6 salî de jî dê tenê du stêrk bihatina xuyakirin. Birahîmê ku kêm û nêzîk 2000 sal li pêy afirandinê jiya ye, hemî stêrkên galaksiyên wekî din li aliyekî, dê stêrkên herî şewledar yên Kakêşana ku qandî 130,000 sala roniyê dûr e, nedîtana. Lê belê Xwedê, ji Birahîm re, bona ku wî şaş û

metal bihêle, stêrkên bêhejmar ên ku biçav têne dîtin nîşanî wî dane: "'Li ezmanan binêre'" got, 'ma tu dikarî stêrkan bijmêre?'" (Afr. 15:5).

Ji ber vê yekê, formula li jorê ye, ya hejmara sala roniyê = temena herî kêm ya stêrkê ne li gor Kitêba Pîroz e. Em dikarin çareseriya vê pirsê di Peymana Kevin, beşa Afirandin, ayetên 2:1-2'an de bibînin: "Ezman û erd bi hemî hêmanên xwe temam bûn. Xwedê, karê ku dikir di roja heftemîn de qedand. Wê rojê karê xwe qedand û rawestiya." Peymana Nû jî şahidiyê li vê rastiyê dike: "…Lê belê Xwedê, ji destpêka dinê ve karên xwe temam kirine" (Îbr. 4:3).

Dema hefteya afirandinê qediya her tişt bi awayekî bêqisûr temam bûbûn. Stêrk jî dikevin nava vêya, ji ber ku hemî afirandin "Ji afirandina dinê ve, wesfên Xwedê yên ku nayên dîtin, yanê hêza Wî ya bêdawî û Xwedêbûna Wî, bi kirinên Wî ve hate famkirin û bi aşkereyî têne dîtin…" (Rom. 1:20).

Wekî li gor xwezaya afirandinê be, em nikarin hemî zagonên xweza yên roja xwe di nava dema afirandinê de şîrove bikin.

*"Temam bû"* bi her awayî hatiye qedandin e; wekî stêrkê, tîrêja ronahiya ku ji wê tê jî hatibû afirandin. Mînak, roniya stêrka li herî dûr e jî gîhaştibû dinê. Tiştekî divê em jibîr mekin heye, hewldanên me yên zanistî (raman û lêkolîn) me bibin bibin, dê bibin dawiya hefta afirandinê. Bona tiştên di hefteya afirandinê de bûne fam bikin divê em li ser Kitêba Pîroz bixebitin/lêkolînê bikin.

**PDA4:** *Gelo Darwîn, di derbarê Xwedê de çi difikirî?*

**BA4:** Darwîn, li pêy kurteperwedeya xwe ya tipê, çawa ku bi qadên din ve eleqedar dibû, lê li ser pêşniyara bavê xwe, perwerda teolojiyê jî dît (1828–1831). Di pirtûka xwe ya

bi navê “Reha Celeban” de wisa dinivîse: “Di baweriya ku Afirker hilma xwe daye çend celeb an jî celebek zindiyên dor li me girtine û çawa ku dinya me bi erdkêşiyê ve dizîvire û diçe de, di destpêkek ev qasî bidilnizmî de, afirandina celebên bêhejmar yên rewnaqdar û nûwaze de hin tiştên mirov kêfxweş dikin hene.” Vê gotina Darwîn, bi awayekî sergirtî nîşan dide ku baweriya wî ya bo Afirker (deîstîk) heye. Xwedê bi awayekî mîna hemî sedema kozmîk û bîyolojîk tête qebûlkirin, lê têkildariya Wî ya rasterast bi mirovan re û têgihandina afirandiyê ya di Kitêba Pîroz de nagire ber bala xwe. Darwîn bi danezana xwe ya di derbarê; mirov “mohra raborîna xwe ya heywanî ya nayê paqijkirin li xwe dike” de, bi aşkereyî nîşan dide ku têkiliya wî û ya Kitêba Pîroz ji hev qut bûne.

Bi awayekî berfirehî belavbûn û qebûlkirina ramanê peresanê bi saya Darwîn pêkan bûye. Mîna ku Darwîn di çîroka jiyana xwe de nivîsandiye; vê ramanê li dijî peyxama Kitêba Pîroz veke vebijarkek din didît. “Di wan deman de bi aşkereyî hay jê dibû ku dîroka Peymana Kevin xelet e… û fam kirim ku ji pirtûkên hîndû an jî warwaran zêdetir bawerdêr e… hêdî hêdî red kirim ku Xirîstiyanî ne peyxamek Xwedanî ye.”

Vê baweriya wî di salên par de dê hê jî xurttir bibûya: Bêbawerbûn, bi bêdengiyekê min bi dest ve xist û di encamê de çû serî. Ew qasî hêdî pêş ve diçû ku, ez ji vêya qet bêaram nedibûm. Ji wê demê vir de, di derbarê rastiya biryara xwe de qet şik û guman neket dilê min. Ger mirov rastiyê bibêje, ez qet fam nakim ku mirovek bixwaze ku bêje Xirîstiyanî rast e.”

Darwîn, her çi qas peyxama Kitêba Pîroz ji binî ve red kiribe jî, deîzmek bêdiyar jî ferz dike (mînak, Xwedê weke bêyî kesayitî [dervî kesayetiyê] be qebûlkirin). Ernst Haeckel jî bi fereziya; “organîzmayan bitûmî bi rêyên fizîkî – kîmyewî peresanî bûne”, gava ateîzmê ji binî ve avêtiye.

Di roja me de neo-Darwînîstên mîna M. Eîgen, C. Bresch, S.J. Gould û R. Dawkîns jî heman rêyê dişopînin û bi dîtinên xwe yê lêvegerandinê (redûctîonîst), yên di derbarê xwe bi xwe rêkûpêkkirina bûjenê (xwe sazkirina), de gellek mirovan ber ve ateîzm an jî deîzmê, yanê li dîtinek dinyewî ya li dijî Kitêba Pîroz e ve dajon.

**PDA5:** *Di roja me de di pêşbaziyên werzîşê de rekorên berê bêderfet bûn têne buhartin. Ma ev yek peresana rasteqîn napeyitîne?*

**BA5:** Di rojnameya Braunschweiger Zeitung ya 3 Mijdar 1988'an de di nîvîseke ya di derbarê Olîmpiyatên Dinê ya 24'an li Seûlê de, wisa dinivîse: "Lîstikên Olîmpiyatê ên li Seûlê bi 38 rekorên dinê ve rengîn bû. Tixûbên zerengiya mirov, li paytexta Korêya Başûr dîsa hate binavkirin. Di vê navberê de belengazî jî di kesayetiya Ben Johnson yê hate dîskalîfiye de zindî bû. Johnsonê ku ber ve rekorên dinê û olîmpiyatê banz dida, paşê derket holê ku dopîng bikar aniye. Lijneya Navnetewî ya Olîmpiyatê, yekşema borî, daxuyan kir ku ji dereceyên heta niha bidest xistine tenê deh heb bi guman in. Lê belê rêjeya bikar anîna dopîngê ya ku nehatiye diyarkirin, gellekî bi ser vêya ye. Gellekên ji atlêtên li Seûlê serfiraziyên mezin pêk anîne di bin gumanê de ne.

Lîstikên Olîmpiyatê yên 24'an bû sedema derketina atlêtên mezin – Ajnekarê Germen Krîstîn Ott ya şeş rekor di destê wê de ye û madalyona zêrînî qezenc kiriye, ajnekarê emerîkî Matt Bîondî yê pênc madalyona zêrînî qezenc kiriye, "qiralê jîmnastîkê" Vladîmîr Artemowê xwediyê çar rekorî, bi derketinên xwe yên 100 m û 200 m ve atlêta stêrk Florence Grîffîth-Joyner ya Emerîkî. Di nava werzîşkarên divê tevlî lîsteya navdarên olîmpiyatê bibin, bê şik Steffî

Graf a (çar yekemîniya wê ya Grand Slamê heye) û xwedî pênasiya “Goldem Slam”ê yî û serfiraziya sedsalê ya herî girîng pêk aniye jî heye.

Rekorên dinê birastî jî her tim têne nûkirin. Ger em bûyerên dopîngê derxînin jî pêşveçûnên di performansa de bi aşkereyî li holê ne. Di vê navberê de dixwazim vê deqê jî bi bîr ve bînim; ev rekoran bi kirina gellek lêkolînên sporê û bi encamên van lêkolînan li ser antrêmanên dijwar ve tetbîqkirinê ve hatine qezenckirin. Performansên sereta yên ku ji aliyê werzîşkar ve hatiye nîşandayîn ne ji ber taybetmendiyên rakendî, lê belê ji ber antrêmanên dijwar ve hatine bi dest xistin. Dema navberê didin antrêmananî dawiya serfiraziyan jî têne.

Lê belê di modela peresanê de, pêdivî ji bona şuxulîneke ji nifşeyê ta nifşeyê didome û bipêşveçûnê ve encam dibîne heye. Li gor bîrdoziya peresanê, mûtasyon û bijirîn, hêzên tamdayînê yên pêşveçûna peresaniyê ne. Lê belê vana ne hatine plansaziyê ne jî armanckirin. Li dijî vêya, zagoneke cihê derhêneriyê li xwezayê dike: bêçalakîbûn, tebatîbûn, zagona xerabûyîna vejenê û meyla “pehnkirinê”. Jiyan, di avahiya molekulek – makro – de jî, her tim ber ve armancê yî. Di roja me de qet şik nîne ku kompîtur di encama pîlanên têkel de hatine pêşniyarkirin. Lê zandûra herî girîft ya mîkrokiryar jî, dema bi pergal û kirinên hicroka zindî re bête hevberkî kirin mîna pêlîstika zaroka ye.

**PDA6:** *Gelo em ji aliyê zanistî, guhdayîna Kitêba Pîroz ya têgînên dinyewî ên bandora xwe winda kirine û modeya wan buhurîne bikar tîne, bikin an na?*

**BA6:** Di nivîsên Kitêba Pîroz de tu carî kozmolojiya (gerdûnnasiya) dema hatiye nivîsandin nayê bikar anîn. Lê bitûmî li dijî vêya têgînên Rojhelata Nêzîk ên antîk bi xwe-

dênasiyek lîberal têste şîrovekirin û nivîsandin. A. Lapple yê ku dîtina çavkaniya hemiya Kitêba Pîroz mirov e, pejirandiye, wisa dinivîse: “Demekê bawer dikirin ku dinya pehn e. Afirandina di nava vê dîskê de yî jî bi avên nizm ve – tofana pêşîn an jî oqyanûsa pêşîn ve – hatiye dorûber girtin… Li ser dinê, ezmana ku roj, heyv û stêrkan mîna lembeyan hatine bicih kirin ji serî heta seriyê din şidandî disekinî. Li ser ezmanê jî avên bilind hebûn, ku vana ji şivakeyan an jî ji cihokan weke baran be dadiketin rûyê erdê ” (‘Die Bibel – heute’, [The Bible Today / Di Roja Me de Kitêba Pîroz], Munchen, r. 42).

Ger em çend jêgirtinê ji Kitêba Pîroz ve bigirin, em dikarin dîtinek wisa ji binî ve birizînin û bipeytînin ku beriya şêweya dinê dihate zanîn Nivîsên Pîroz çi qas rasteqîne ne: Peymana Kevin di Eyûb 26:7’an de wisa dinivîse: “Ew bi ser valahiyan ve ezmanên bakur radixîne, dinê bi ser nînbûnê ve dadiliqîne.” Dinya ne li ser oqyanûsekê de ajnê dike ne jî li ser erdzemîneke sabît ve disekine. Di rastiyê de li ser valahiya dorûber lê girtine de azad digere.

Kitêba Pîroz di şêweya dinê de jî yekser agahiyê dide, her çi qas armanca bingehîn ya ayetê ne ev be jî, wisa têste qalkirin: “Yê ku li ser quba ezmanê rûniştiye XUDAN e…” (Îşa. 40:22). (Peyva *khûg* ya di nivîsa Îbranîtî de cih digire di wateya gilover an jî topê de yî.)

Şêweya dinê ya gilover di ayetên derbarê hatina duyemîn ya Îsa Mesîh de bi aşkereyî cih digirin. Ji ber ku dê Xudan “mîna brûskek ji rojhelatê bavêje û heta rojavayê ji her alî ve xuya bibe” (nişkav de) were (Met. 24:27) “û ji ber ku her çav (her kes di heman demê de) Wî bibînin”, Peyxamgirtin 1:7. Dema Ew xuya bibe dê bona nêviyê mirovahiyê dema rojê; bona yên din ên ku li aliyê din yê dinê dijîn re dê dema şevê be. Lûqa 17:34,36 di derbarê vê mijarê de dibêje: Ez vêya ji we re bibêjim; dê wê şevê ji du kesên ku di nava livînekê de ne yek bête stendin, yê din bê berdan. Ji du

jinikên pev re genim dihêrin yek bête stendin, ya din bê berdan.” Şev û roja dinê mîna di nava livînan razandin û genim hêrindan de, bi du awahî hatiye gihandin ku, ev jî tenê bi dinyayek li dora xwe dizîvire hevdem be dibe.

Di Peymana Kevin, beşa Zekerya de, hatina Xudan bi gotineke li dijî famkariya wê demêyî û rasteqîniye hatiye têgihandin (Zek. 14:7): “Rojek taybet, dê tenê roja ku XUDAN pê dizane be. Dê şev jî roj jî nebe. Dê şev ronî bibe.”

**PDA7:** *Gelo di derbarê awahiya erdgilorê de çi dikare bête gotin?*

**BA7:** Mirovên zanistê bi mînak û feraziyeyên bêhejmar ên ku tenê xwe disipêrin peresana kozmîk ve, xwestine ku awahiya rûyêerdê diyar bikin. Di nava van kesên ku Heckmanê Germen, navê “peyxamberên gerdûnnasiya (kozmolojî) nû” li wan kirine, em dikarin A.Friedmann, A. Einstein, E.A. Milne, P. Jordan, F. Hoyle, G. Gamow, A.A. Penzias û R.W. Wilson bijmêrin

Hemî xebatên bona famkirina awaya gerdûnê ya fezayî hatine kirin, yanê vekirî an jî girtî, bisînor an jî bêsînor, bidawî an jî bêdawî, qop an jî qer, qet bi ser ve neketine. Ezmannasê navdar O.Heckmann di kitêba xwe a bi navê “Stêrkan, Gerdûn û Modelên Dinê” (Stars, Cosmos, World Models, r. 129) ye de bi vî awayî qala wan xebatan dike: “Afirkeriya hişê mirov ne hindik e. Ji ber vê yekê dîtinên dinyewî yên ku afirandine jî gellekî pirr in. Di encamê vêya de, rexnekirek di demên nêzîk de xwe bi xwe bawer dike ku bikaribe bibêje bîrdoziyên gerdûnî, bi awaya birêje, berevajiya hejmara bûyerên ku têne zanîn e.”

Astrofîziknasê Germen V.Weidemann, di ‘Kongreya 16. Ya Feylesofî ya Dinê’ (Dusseldorf – 1978) de, di vê mijarê

de çavdêriyeke xwe ya girîng aniye ziman: " Fereziyên feylesofî yên ku gerdûnnasî (kozmolojî) xwespartî wa ne, ji piştgirên guliyên zanistên din yê xwezayê hê jî zêdetir in. Tevî vêya, ger em sînorên yê ku bi navê zanistî tête binavkirin şunda vekişînin û em hêviya xwe ji bersivên di derbarê pirsên din yên kozmolojiyê de qut bikin, wê gavê em ê di hewcedariya qebûlkirinê de bimînin ku gerdûn ji binî ve nayê famkirin. Divê zanistî qebûl bike ku, nikare bersiva hinek pirsan bide. Yên li şunda mayîne jî, bîrdoziya di derbarê tiştên têne zanîn e."

Jixwe ev encaman di Kitêba Pîroz de qeydkirî ne. Ayeta di derbarê famnekirina gerdûnê de kilît e, di Yêremya 31:37'an de cih digire: "'Ezman bêne pîvandin, bingehên dinê bêne lêkolînkirin û famkirin, ez ê nîjada Îsraêlê, ji ber hemî kirinên wan red bikim' dibêje XUDAN." Xwedê di vê ayetê de di nava encamên lêkolînên ezmannasiyê û dahatûya neteweyekê de pêwendiyê datîne – bi vî awayî du rewşên serbixwe, di danezanekê de pev re pêwend dikin. Beşa pêşîn ya waada Xwedê ya dê bi netewa Îsraêl ve dilsoz bimîne hatiye dayîn, bi beşa duyem ve, yanê bi rastiya, dê hemî lêkolînên li ser ezmannasî û jeofîzikî têne kirin – tevî hemî hewldanan – dê di famkirina kureya erdî û gerdûnê biser nekevin, ji nêz de têkildar e.

Waada Xwedê ya ji netewa Îsraêlê re yî esehî û ewlekar e. Ji ber vê yekê heman rewş bona beşa duyem ya danezanê jî derbasdar e. Lêkolînên li ser ezmannasî û jeofîzikî dê tu carî negihêjin armancên xwe. Bi vî awayî armanca Stephen W. Hawkingê astrofîzikvanê kûd, yê Îngiliz, dê mîna xewn û xeyalekê bimîne: "Bona bersivan ji pirsên Em… çima hene û gerdûn çima hene, bibînin, em ê tevlî nîqaşan bibin. Dîtina bersiva vê pirsê, li gor Hawking, "dê serfiraziya dawîn ya hişê mirov be". (Dîroka Kurt ya Demê "A Brief History of Time", Bantam Pres, 1988, r. 175).

**PDA8:** *Di afirandinê de rojek çi qas domiya?*

**BA8:** Ev pirs, bi pirranî rê li nîqaşên germ vedike. Her kes li gor dîtinên xwe, di vê mijarê de gellek bîrdoziyên nakokiyê li hev dikin, pêş ve dibin. Lê ger em di derbarê mijarê de hejmara agahiyên xwe bivebirînin, dê bersivdîtina me hê jî zûtir bibe. Di roja me de tu yê milên zanistê di derbarê vê mijarê de ne xwediyê agahiyên cerbî an jî bûyerên li ser şîrove bike ne. Danezanên rasteqîn û yekane ji aliyê Xwedê ve bi emirên di beşa 1. Ya Afirandinê de û li Sînayê (Der. 20:11 û pişt re) dayîne hatine ragihandin. Di têgihandina Afirandinê de kronolojiyek tengav heye. Hemî afirandin di nava şeş rojên ku hev şopandine de temam bûye.

Kitêba Pîroz, yekeyek fîzikî, tevî metodek pîvanê ya beramberê wê ye pev re kar anîne û bi vî awayî rastiya xwe carekî din peyitandiye (Bi rêgeza 80'emîn ya beşa 1. A Pêvekan de hevberî hev bikin). Bi vî awayî dirêjiya rojekê – bi awayekî mercên zanistî jî diltêr bike – pênavkiriye. Ev dema jeo-astronomîk ya bi rojekê gera dinê ya li dora xwe yî hatiye diyarkirin, 24 saet e. Xwedê di 10 Emirên ku li Çiyayê Sînayê dane de bona mirovahiyê şeş rojên xebatê û rojeke rawestanê diyar kirine. Ji Misirê Derketin 20:9-10: "Tuyê **şeş roj** bixebite, hemî karên xwe bike. Lê belê roja heftemîn ji min re, ji Xwedayê te XUDAN re wekî Roja Şabatê hatiye nezirandin… Ji ber ku XUDAN ezmanê, erdê, behrê û heçiyên di hundirê/li ser wan in di **şeş rojî** de afirandin û di roja heftemîn de rawestiya."

Li gor bîrdoziya peresanê, hewl didin ku rojên afirandinê carna wekî pariyên demên dirêj ji nû va terîf bikin. Ayeta Zebûra 90:4, "Ji ber ku di çavên te de hezar sal derbas bûye rojek, mîna doh, mîna nobetek şevê ye". Ji Afirandina Beşa 1. re wekî kêfî, adetî formûleke matematîkê ve tête tetbîqkirin. (Lê belê di Zebûra 90'an de û wekî din di 2.Pêtrûs 3:8'an de di derbarê Xwedayê ku bi demê ve

ne pêwendî ye, bê dawiye de tête qal kirin). Celebek matematîkê ya wisa dem dirêjbûna qandî 1:365,000 pêk tîne, lê belê ji ber ne li gor Kitêba Pîroz e, divê bi aliyekê bête avêtin. Heman hincet li ser Meta 27:63 jî dikare bête tetbîq kirin: "…Ez ê piştî mirina xwe (sê rojî) sê hezar salî bivejim'…" Lê belê Îsa Mesîh mîna ku gotibû di roja sêyemîn de vejiyaye.

Rerxnekaran wisa bawer dikin ku, bi şeş rojî de afirandina dinê ya Xwedê ve bawerî, bona xelasiyê ne ferz e û gellek caran bervêdana xwe ya di vê mijarê de tînin ziman. Ez pirranî vê bersivê didim wan: Ma gelo hûn bawer nakin ku Îsa Mesîh bi xaçê ve hate şidandin û mir û sê rojê pişt re vejiya?

Pirranî bersiva ku distînim "belê" ye. Li ser vê bersivê ez dighêjim encamê: Di roja sêyemîn de vejîna Xudan bona xelasiya min gellekî girîng e? Ma bo çi hûn bona Kitêba Pîroz diçin cihêtiyeke wisa? Ma em dikarin bi aliyekê bawer bibin û bi aliyê din ewle nebin? Bervêdanên min yên li dijî nîqaşên di derbarê heftiya afirandinê de û bi awayekî kêfî ji nû ve terîfkirina rojan re, di pirtûka min ya navê wê Di Destpêkê de Zanîn Hebû de bi kitekit hatiye şîrovekirin.

**PDA9:** *Du têgihana Afirandinê ya ku pev re ditewişin hene?*

**BA9:** Du beşên pêşîn yên Kitêba Pîroz û wekî din ayetên bêhejmar ên ku wekî din, di derbarê afirandinê de ne bi têgihandin û çavdêriyan ve tijîne. Hemî têgihandin hev û din temam dikin û wekî yekbûyî çalakiya Xwedê ya afirandinê têdighînin.

**Mirov bi pirranî bi du awayî nêzîkî Kitêba Pîroz dibin**. Yek ji vana dilsoziya Kitêba Pîroz, ya din jî nirxandin e. Ka dê mirov bi çi awayî nêzîkî Kitêba Pîroz bibe, gellek beriya di Peymana Nû de şîrovekirina me ya girîn-

giya Vejîna Îsa Mesîh an jî mûcîzetên Wî, tête diyarkirin. Ev nêzikayî di Afirandinê de bi ramanê du têgihandinên li dijî hev in ve destpê dike.

**1.** Nêzikayiya ji Kitêba Pîroz re dilsoz dimîne: Beşên 1 û 2 yên Afirandinê (tevî beşên din yên Kitêba Pîroz ên ku bi peyxama Xwedê ve hatiye nivîsandin, binêrin 2Tîm. 3:16) ji hişê mirov ve pêknehatine. Çavkaniya van zanînan Xwedê bi xwe ye. Tu kes nebûye şahidê afirandina Xwedê. Ji ber vê yekê, tenê Ew bi xwe dikare bi rêya peyxamê bigehîne me ku ka çi bûye û qediyaye. Dîtina ku bitûnmî li dijî vê dîtinê yî lê jê rê hatiye daxuyan kirin.

**2.** Nêzikayiya Kitêba Pîroz dinirxîne: Ramanê têgihandinê mîna Afirandin 1:1-2:4a û 2:4b-2:25 bi du beşî cihêkirinê ve diparêze. Li gor ramanê wan jî ev beşan jî, mîna "elohîst" (çavkaniya nû) û "yahvîst" (çankaniya kevn) ji aliyê du nivîskarê cihê ve hatiye nivîsandin. Çavkaniya Kevn "yahvîst"; di derbarê dinê û jiyanê de gihaştiye encamên cihê. Piştî dîlitiya Babîlê ev nivîsên cihê berhev kirine. Di vê nêzikayiya nirxandin de; bona piştgirî li fereziya ku bi du çavkaniyî ye bête kirin, beşên binakokî û cihêtiyan têne pêş de dayîn.

Her du dozîneyên bingehîn ya vê fereziyeyê lê jêrê hatiye daxuyan kirin:

a) Ji ber ku navên Xwedê yên cihê (Elohîm – Yahve) hatine bikar anîn, têgihandin ji hev cihê ne.
b) Di rêzkirina Afirandinê de di nava nivîsan de cihêtî hene:
   - Di têgihandina pêşîn de "nebatan – ajalan – mirov"
   - Di têgihandina duyem de "mirov – nebatan – ajalan".

Divê bi awayekî xurt li dijî van her du ferzkirinên ku Kitêba Pîroz dinirxînin de bervêdan hebe:

**Bervêdana (a):** Xwedê, bona ku em aliyên cihê yên

xwezaya Wî fam bikin; di Kitêba Pîroz de xwe wekî Bav, Law û Ruhê Pîroz; ji heft sedî zêdetir nav û binavan daxuyan dike. Li gor dîtina li jorê, ger navên Xwedê yên cihê, li nivîskarên cuda re bête barkirin divê ya herî kêm heft sed nivîskar hebin. Ev fereziyeyek kêfî ye û ne li gor peyxama Kitêba Pîroz e.

**Bervêdana (b):** Afirandin 2:4b ne têgihandina Afirandinê ya cihê ji çavkaniyeke cuda ye. Di van ayetan de kiteyek diyar, yanê afirandina mirov, bi awayeke berfireh tête bikaranîn. Armanceke cihê tê de ye, lê paralelê têgihandina Afirandin 1:1-2:3 e. Di van ayetan de ka Xwedê cotên mirovan yên pêşîn çawa, li ku derê û bi kîjan dorê ve afirandine û têkiliya va mirovan ya bi hev re û bi Xwedê re çiye, bi awayekî aşkere tête dupatkirin.

Em dikarin têgihandinên wekhev di beşên din ên Kitêba Pîroz de jî bibînin. Bûyerek pêşiyê bi awayekî kurtekirina giştî, bi kronolojîk tête gîhandin. Di têgihandina duyem ya li pêy tê jî bi awayekî berfirehî qala kitekitan dike. Di ayeta 8'an de bi aşkereyî hatiye nivîsandin ku Xwedê bexçe çikandiye (daniye). Çikandina bexçe, ji berê ve ferz dike ku nebat ji xwe ji berê ve hatiye afirandin. Piştî çikandina XUDAN Xwedê, li gora ayeta 9'an, "Li bexçê cureyên darên xweş ên fêkiyên qenc didin, digehiştin". Divê ev ayet jî bi afirandina Xwedê ve neyê tevlihev kirin. Di Afirandinê, Beşa 1'în de, ji peyvên ku hatine bikaranîn cihêtir, ên li vê hatine bikaranîn, yanê mîna "çikand", "gehîşt" ne tevgerên afirandinê ne, ji ber tevgerên ku dar û nebat ji berê ve hatine afirandin têdighînin.

Ji aliyê din, şîroveya ayeta 19'an jî gellekî girîng e: Kesê ku vê ayetê tena xwe bigire dest (bi binpêkirina rêgezên şîrovekirinê yên Beşa Pêvek II'an de hatine dayîn) û jê encamekê derxîne, dikare ferz bike ku ajal piştî mirovan hatine afirandin. Lê belê ger mirov bigire ber çava ku beşa 2:7-25 ya Afirandinê têra xwe antroposentrîk (li ser

mirov ve kombûye) e, wê gavê dê bi hêsanî fambike ku ayeta 19'an ne ji dema afirandina ajalan, lê hunerê hiş û axaftin ya mirovê ku nû hatiye afirandin – mîna ku Adem nava dida ajalan – têdighîne. Hevoka li pêy tê jî nîşan dide ku ajalanên bi ber mirovan ve têne anîn jî ji destê Afirker ve derketine.

Ez dixwazim bala we bikêşim deqeke girîng, “hemî ajalên kedî û bejî, civîkên li ezman difirin” ên ku li vê bi awayekî diyarî qala wan têne kirin jî di roja şeşemîn de tevî mirovan hatine afirandin.

Bona ku em van zanînan mîna ku heq kirine şîrove bikin li nivîsa Îbranîtî ya ayeta 19'an binêrin. Di nivîsa Îbranîtî de du raweyên demê hatine bikaranîn (ya yekemîn anîna ajalan û navdayîna wan ku, ev dema borîn e; ya duyem yanê afirandina heywanan jî bi raweya borî ya diyar e û li jêrê bi tîpên îtalîk ve hatine xuyanîkirin: “XUDAN Xwedê ajalên li erdê, civîkên li ezmanan hemiyan ji axê ve afirandibûn. Bona ku bibîne ka dê çi navî li wan bike, hemiyan anîn digel Adem. Adem her çi navî dabe her yekî, ew zindî bi wî navî ve hate bîranîn” (Afr. 2:19).

**PDA10:** *Gelo dînozoran di keştiya Nûh de bicih bûn?*

**BA10:** Di Peymana Kevin, pirtûka Eyûb di beşa 40'an de tenê bikurtayî qala dînozoran nayê kirin, di ser de cih didin kitekitên awaya bedenên wan jî (40:15-18,23). “Li Behemota ku tevî te afirandime binêre, mîna dewaran giha dixwe. Binêre, çi hêz di pişta wê de heye, masûlkeyên zikên wê çi qas xurt in! Teriya xwe mîna urzê dileqîne, şidandîne rehikên hêtên wê. Hestiyên wê mîna boriyên tûncê, hêtên wê mîna çovikên hesin in. Çem bicoşe jî ew venaceniqe, di nava ewlekariyê de yî. Çemê Şerîa bigihêje qirika wê jî.” Kitêba Pîroz (Wergera NIV) wergera peyva

“behemot” ya Îbranîtî nekiriye, ji ber ku zindiyek mîna vê ajalê ku tête terîfkirin di roja me de nîne. Teriya wê ya xwurt weke tuwanckirina tîmsehê yî, lê belê dê ev ê jî bi nivîsê re ne di nava ahengê de be, ji ber ku tîmseh ajaleke goştxwur e. Hîpopotam jî ajaleke gellekî mezin yê di nava avê de dijî û gihaxwur e, lê belê ji ber ku teriya wê gellekî biçûk e, divê ew jî bête jibartin. Celebê yekane ya bi hemî awayî li gora terîfa li jorê ye saûropodên di koma dînozoran de yî.

Ji beşên herî kevn yê Kitêba Pîroz, yek jî Eyûb e, lê belê dîroka nivîsa wê ya esehî nayê zanîn. Ji ber ku qaşikê erdê di encama tofanê de bitûmî hate guhertin û çiya, çem, behr û oqyanûsên nû pêk hatin, di Eyûb, ayeta 40:23’an de qala Çemê Şerîa tête kirin, ev jî bi aşkereyî diyar dike ku piştî tofanê jî dînozor hê dijiyan. Yanê ev ajalan jî tevî keştiya Nûh xelas bûne. Em dikarin wisa bifikirin; ji ber ku van ajalên laşgir di keştiyê de gellek cih girtine; wê gavê dibe ku Nûh tenê çêlikên dînozoran an jî dibe ku tenê hêkên wan girtibin keştiyê. Ji ber piştî tofanê heman mercên hewa û ekolojiyê tunebûn, van ajalan di nava demê de mirine û nîjada wan tune bûne. Ev daxuyana di derbarê tunebûna dînozoran de ne, ji fereziyên dijî Kitêba Pîroz in yên di roja me de di derbarê vê mijarê de ne hê jî bawerdêr in.

**PDA11:** *Lawên Adem bi kê re zewicîn?*

**BA11:** Cotê mirovê pêşîn du lawên Adem û Hawa hebûn: Kayîn û Habîl. Piştî ku Kayîn Habîl kuşt wisa nivîsandiye: Kayîn ji hizûra Xwedê cuda bû. Li rojhelata Bexça Adenê, di erdên Nod de bicih bû. Kayîn bi hevsera xwe re raket. Hevsera wî ducanî ma û Henox anî dinê…” (Afr. 4:16-17). Gelo çima hevsera Kayîn nişkav de derket holê?

Ger di Kitêba Pîroz de cih bidana her kitekitên ku em bi

ramanek hişmendiyê encaman ji xwe re derxînin, wê gavê divê Kitêb bi sedan cîlt pêk bihatana. Lê belê diyariya tenê cîldekî û bikaranîna vaca me daye me. Bi vî awayî em dikarin bona hin pirsên xwe, yên ku di derheqê mijarên negirtine dest de, lê ji danezanên din ên Kitêba Pîroz jê encaman derxînin û bibersivîn.

Di Afirandin 5:3-4'an de wisa dinivîse: "Dema Adem 130 salî bû, lawekî wî yê di dirûvê wî û wekheviya wî de welidî. Navê Şît li wî kir. Piştî bûyîna Şît, Adem 800 salê din jiya. Wekî din lawên wî, qîzên wî bûn." Em dikarin ji vê hevokê fambikin ku gellek zarokên dayik û bavê pêşîn bûne. Ji ber vê yekê divê hevsera Kayîn yek ji xuşkên wî bin.

Encama yekane ya Ketina Mirov ne kêşandina tengasiyê û mirin bû, tevî vêya, genên ku pêşiyê nûwaze bûn, her ku çûn hatin guhertin û xerabûn. Dema em bêne dewra Mûsa, yanê ji afirandinê 2,500 sal wêdetirê, Xwedê zewaca di nava merivên nêzîk de qedexe kir (Lêv. 18). Ji ber ku xerabûna genê gihaştibû asteke bixeter. Tevî vêya di dema Birahîmê ku 400 sal berî Mûsa jiyabû, ji ber ku Birahîm bi xuşka xwe ya bav yek e dê cuda ye zewicîbû, em fam dikin ku ji zewacê di nava malbatê de hê destûr hebû.

**PDA12:** *Li gora famkariya we nîqaşên zanistî yên ku bi awayekî xwurt piştgiriyê didin afirandinê an jî bi awayekî herî xwurt afirandinê red dikin kîjan in?*

**BA12:** Jiyan bi celeb awayên cuda derdikeve hemberî me. Lê belê organîzmayeke bi yek hicrokî ye jî, çawa ku zindiyek rêze yî, lê dîsa ji berhemenê destê mirovan hê jî tevlîhev û komplîke yî û li gor armancekê hatiye rêkûpêk kirin. Bona şîrovekirina jiyan û derketina jiyanê ya holê li du rêgezên li dijî hev in tête nêrîn: peresan û afirandin. Li

gora bîrdoziya peresanê, jiyan, mîna li jêrêyî tête danasîn kirin: “Jiyan bitûmî bûyerek bûjenî ye. Bo vê yekê divê bi têgînên kîmyewî û fizîkî bête terîfkirin û cihêtiya wê ya yekane ya ji xwezaya mirî, tevlîheviya wê yî.” Ji milên din ên zanistê (mîna zanista zanînê, bîyolojî, astronomî, paleontolojî, jeolojî, tip) gellek mirovên zanistê di derbarê bîrdoziya peresanê de bervêdanên girîng pêş ve dayîne. Di navenda mijara afirandin û peresanê de, ji ber aliyên nakok yên her du modelî jî, lihevnekirinek çareser nabe dom kiriye û hatiye (Binêre PDA1). Ger pertalek xwe bitûmî spartiye rêgezên zanistî yên ceribandinê, dibe ku ev rewşa biserneketinê ji holê rabûya.

Divê bi awayekî wisa bête formulekirin ku van rêgezan derfetê bide ku tenê bi mînakek cerbî, rewşa li dijê yî birizînin. Ger mînakek li dij neyê dîtin, ev rêgezan derbasî asta zagonên xwezayê bibin û bi vî awayî di şîrovekirina bûyerên ku nayên daxuyankirin de jî, peywireke girîng bigirin ser xwe.

Di heman awayê de, rêgeza enerjiyê ya ku tenê di ceribandina de derbasdar e jî bi tu dîtinên dinyewî ve pêwendî nemîne û bête bikar anîn. Ji ber vê yekê rêwîtiya heyvê, bi saya ferzkirina rêgeza enerjiyê esehî derbasdar e hatiye pêkhatin.

**Rêgezên Zanînê yên Cerbî** jî xwediyê heman astê ne. Wîsa ku, em dikarin bi saya wan di asta zagona xwezayê ya di derbarê afirandin/peresanê de yî bigihêjin encamekê. Bûjen û enerjî taybetmendiya mirovan ya bingehîn in, lê belê di axirê de bona pergalên zindî ji yên mirî cuda bikin ne bes e. Taymetmendiya bingeh û ya hemî zindiyan ji hev cuda dikin zanîn e. Zanîn, di derûniya hemî awayên jiyanê de heye (bona ku hemî fonksyonên jiyanî pêk bên, bona hilberînê, zanîna genetîk).

Têgihandina zanînê, bona hemî zindiyan roleke bingehîn dileyize. Mîna, dema kêzik ji çîçegan veguhas-

tina polenê dikin, ev yek transfera zanîna ku pêşiyê pêk tê (zanîna genetîk) yî; vehuhestina bûjenê ya duyem e. Helbet ev ne teqez terîfkirina jiyanê ye. Lê belê ev yek bona famkariya me pêkerek xwedî taybetmendiyeke jiyanî ye. Bêguman, pergala herî tevlihev ya zanîn tê de heye, mirov e. Ger em hemî pêvajoyên zanînê ya bedena mirov bihesibînin, (bîrewer – ziman, zanîna ku tevgerê masûlkeyan ya zanîn bi rê de dibe; bêhiş – xebata ezayan, pergalên hormonê yên bi zanînê ve berî lê tê dayîn) em ê bibînin ku rojane qandi $10^{24}$ bît zanîn tête bikaranîn. Ev hejmara astronomîk ya zanînê, hemî berhevkirina mirovahiyê ya di hemî pirtûkxaneyên dinê de ne, ku qandi $10^{18}$ bît e, milyon qatî derbas dike.

Ger em di bîrdoziya zanînê de li pirsa "jiyan çawa derket holê?" binêrin, mîna heman pergalên vehuhestin an jî bikaranîna zanînê dikin, divê em li rêgezên cerbî ên li jêrê ne balkêş bin:

1. Zanîna bêşîfre nabe.
2. Ger rêgezeke azad û biarmanc (w/o deliberate convention) tunebe, şîfre jî nikare bibe.
3. Yê ku zanînê bişîne tunebe, zanîn jî nikare bibe.
4. Ger çavkaniyek baqil tunebe, zincîra zanînê jî nikare bibe.
5. Di destpêkê de ger çavkaniyek baqil tunebe, zanîn jî nabe. Bi gotineke din, zanîn li gor xwezaya xwe qenderiyek hişmendiyê yî.
6. Ger viyan nebe zanîn jî nikare bibe.
7. Zanîna ku ne xwediyê pênc astên hîyerarşîk be, nikare bibe:
    a. Îstatîstîk (taybetmendiyên frekansa nîşanê û veguhestina nîşandayînê)
    b. Hevoksazî (taybetmendiyên şîfre û rêzikên avakirina hevokan)
    c. Zanistiya Wateyê (taybetmendiyên wateyan)

d. Pragmatîzm (taybetmendiyên lêkeran)
e. Apobetîk (berên / taybetmendiyên encam û armancan)

8. Tu zanîn bi xweber çênabe.

Di pirtûka min ya "Di Destpêkê de Zanîn Hebû" de van rêgezan hê jî bikitekit hatine têgîhandin [G5, r. 50-132]. Taybetmendiyên Zagona Xwezayê Bûyîn hatine rastandin [G5, r. 26-42]. Ji ber vê yekê vegotina "Bîrdoziya Zanînê ya weke Zagona Xwezayê be" terîfkirinek rast e.

Ji ber vê yekê jiyan, wekî li dijî bîrdoziya pelesanê be bi vî awayî tête terîfkirin:

**Jiyan** = beşa bûjenî (aliyê kimyewî û fizîkî) + beşa ne bûjenî ye (zanîna ji ber hişmendiyê yî). Ev formula kurt bi aşkereyî nîşan dide ku pevgihanên jiyanê yên him bûjenî û him jî ne bûjenî ne hene. Aliyeke pevgîhana ne bûjenî ye, zanîna ji ber hişmendiyê yî. Lê belê beşên jiyanê din, ên derveyî pevgihanên nebûjenî ne jî hene. Hema piştî mirinê, di hicrokên organîzmayan de zanîna genetîk hebûna xwe didomîne. Lê belê tiştekî gellekî girîng e kêm e: Tiştê ku cihêtiya di nava jiyan û mirinê de diyar dike ev tişt e. Ev cihêtî bona her kesî aşkere ye, lê belê bi awayekî zanistî nayê daxuyankirin.

Di bûjenê de hemî têgînên ku bi xweberî pêkhatina zanînê de ne, di bikaranînê de bi ser ve neketine (mînak zivrîna hîper ya Eîgen an jî pêşniyaza Kupper ya Darwînîsta molekuler). Ji ber vê yekê ez hê fam nakim ku Manfred Eîgen hê çawa bawer dike ku dê çavkaniya zanînê bi pêvajoyên bûjenî ve daxuyan bike.

"Algorîtmayek di derbarê derketina zanînê ya holê de, divê em zagonek xwezayê bibînin" ('Stufen zum Leben' [Gavên ber ve jiyanê], Piper Verlag, 1987, rûpel 41). Pêşniyaza; "çavkaniya zanînê nînbûna zanînê ye" (rûpel 55) bi hemî rêgezên cerbî re di nava nakokiyê de yî û ji ber vê yekê ji rasteqîniyê ve dûr e. Lê li dijî vêya, heyşt rêgezên

zanînê, yên li jorê ne, di bikaranînê de rastiya wan hatine peyitandin û li her cihekî dinê de, di cerba ku di laboratûarekê de hatiye kirin, wan nerizandine.

Ji ber vê yekê divê em ji xwe re bipirsin: Ma gelo jiyan di pêvajoyek afirandina biarmanc de derket holê? Ev, rêgeza ku me di Kitêba Pîroz de dîtine yî. Çavkaniya hişmendî, ya zanistê zanînê bona hemî zanîna mîna pêdiviyekê dibîne – tevî zanîna bîyolojîk – di rûpelê pêşîn yê Kitêba Pîroz de nivîsandiye: "Di destpêkê de Xwedê… Afirand" (Afr. 1:1). Tevî vêya dozîneya peresanê ferz dike ku zanîna di zindiya de yî, pêdivî ji yekî şandî re nabîne. Ev dozîne, bi cerbên zagonên xwezayê yên ku di jiyana rojane de têne dîtin yên di derbarê zanîna ku li jorê hatiye dayîn de bi awayekî mezin ji binî ve dirize.

A vay, ji ber vê yekê, zanista zanînê, îroj ji me re ji aliyê çavkaniya jiyanê bi afirandinê ve daxuyankirinê de peytên herî xurt pêşkêş dikin.

(W. Gîtt: 'Zanîn: Qenderiya Bingehîn ya Sêyem', Siemens Review, Cîlt 56, Hejmar 6, 1989, Rûpel 2-7.

W. Gîtt: 'Ist Information eine Eigenschaft der Materie?', West-Deutscher Verlag, EuS 9, 1998, Rûpel 205-207.

W. Gîtt: 'Zagonên Xwezayê yên Di Derbarê Zanînê de, Yek Ji Qenderiya Bingehîn Ya Serwerê Pergalên Biyolojîk e' Sempozyûma Kirariya -Biyo ya Pasîfîkê, Kapalua, Maui (Hawaii), 4-9 Rêbendan 1998; [G4, rûpel 155-159].)

# 4. Pirsên Di Derbarê Xelasiyê de (PX)

**PX1:** *Em ê çawa xelas bibin – bi kirinên xwe yan bi baweriya xwe?*

**BX1:** Di Peymana Nû de du danezanên pêşiyê wekî di nava nakokiyê de bin xuya dibin cih digrin:

a) Xelasiya bi baweriyê: “Ji ber, em di wê qenîetê de ne ku mirov ne bi kirina pêdiviyên Zagonê, lê bi baweriyê tê pakkirin” (Rom. 3:28).
b) Bi lêkeran xelasî: “Hûn dibînin, mirov ne tenê bi baweriyê, bi lêkerê jî tê pakkirin” (Aqû. 2:24).

Li gora danezana bingehîn ya Peymana Nû, kes bi baweriya ji Îsa Mesîh re tête pakkirin (xelas dibe) (Yû. 3:16, Mar. 16:16, K.Şa. 13:39 û 16:31). Ev baweriya ku xelas dike, ne tenê qebûlkirina rastiyên Kitêba Pîroz, lê divê mirov xwe bi kesayetiya xwe radestî Lawê Xwedê bike: “Di kesê ku tê de Lawê Xwedê heye de, jiyan heye…” (1Yû. 5:12).

Her mirovê ku berî dide Xudan Îsa Mesîh, guhertina herî mezin ya di jiyana xwe de dijî. Ev guhertin di awaya jiyana mirov de û di kirinên wî de bi aşkereyî diyar dibe: “Ger hûn ji min hez dikin, hûn ê emrên min bînin cih” (Yû. 14:15); “Hûn ê jî şahidiyê bikin” (Yû. 15:27); “Heta ku ez vegerim van pereyan bikar bînin (Lûq. 19:13); “…Ji Xudan re qûlitiyê bikin” (Rom. 12:11); “…ji neyarên xwe hez bikin…” (Met. 5:44); “Li dijî xerabiya tu kesî xerabiyê mekin…” (Rom. 12:17); “Ji mêvanhezbûnê nerevin…” (Îbr. 13:2); “Mihên min biçêrînin” (Yû. 21:17).

Li ser navê Îsa Mesîh xizmetkirin, bikaranîna diyariyên ku ji mirov re hatine dayîn, pêwistiya baweriya ku pak dike yî. Di Peymana Nû de van karan weke fêkiyên baweriyê an jî lêkerên baweriyê têne binavkirin.

Her kesê ku li gor vana neke di bin naletê de yî: "Vî dîlê bêkêr bavên derve, tariyê. Dê li wê girî û qirçîniya diranan hebin" (Met. 25:30).

Pêdiviyên Zagonê (Gal. 2:16) an jî karên mirî (Îbr. 6:1 û 9:14) yên ne mîna lêkerên baweriyê ne jî, kirinên kesên hê baweriyê neanîne ne. Li vê jî dîsa heman rêgez derbasdar e: Ger du mirov bi heman awayî tevbigerin, ev esehî ne di heman wateyê de yî. Peywendiya nivîsarî ya ayeta Aqûp 2:24 [binêrin li jorê deqa b)] nîşan dide ku baweriya Birahîm bi lêkerên berbiçav de diçe serî: Birahîm îtaetê ji Xwedê re kir û welatê xwe terikand (Afr. 12:1-6) û bona lawê xwe Îshaq ji Xwedê re qurban bike, destûr de (Aqû. 2:21). Bi heman awayî lêkera Rehaba gandêr (Aqû. 2:25), yanê li warê Kenanê sixûran xelaskirina wê jî (Yşû. 2:1-6) encama baweriya wê ya ji Xwedê re yî.

Bi vî awayî tiştek derdikeve holê: Bawerî û lêker bitûnek nayê jihevqetandin in. Çawa bedena bêruh mirî be, baweriya bêlêker jî mirî ye (Aqû. 2:26). Li jorê ayetên a) û b) pev re ne di nava nakokiyê de ne, lê hev temam dikin (Binêrin Beşa Pêvek II. Rêgezên Şîrovekirinê).

**PX2:** *Gelo Xwedê çima bona xelasiyê xaçê mîna rêyekê pêşniyar kir? Gelo bona vê metodek din tunebû?*

**BX2:** Di Peymana Kevin de bi awayekî aşkereyî ji şidandina xaçê ve qal nayê kirin. Tevî vêya di derbarê xaçê de hinek kitekit û peyxamberî cih digirin. Mînak Zebûr 22:16: "…destên min, lingên min qul dikin." Dema Pawlosê şandî ji Mesîhê ku bi xaçê ve hatiye şidandin qal dike (Gal. 3:13), ji Peymana Kevin jêgirtinekê dibêje "Her kesê ku bi ser darê ve daliqandî binalet e" (Jinû. 21:23). Romiyên ku bi xaçê şidandinê ve daliqandinê ji Farisan dîtine, vêya mîna metodek înfaza "herî bêrehm û tirsehêz" (Cîcero) û "ya herî

şermezar dike/rezîl" (Tacîtûs) dîtine. Xaç pariyek pîlana Xwedê bû: Îsa Mesîh "…şermê tune hesiband û baldrêjiyê li mirina li ser xaçê kir" (Îbr. 12:2).

Îsa li ser xaçê hustî li ber mirinê jî tewand û xwe nizm kir (Fîl. 2:8). Divê fikirandina bi awayekî din mirin; yanê recimandin, serjêkirin, jahr dayîn an jî di avê de xeniqandin, li derveyî mijarê bête girtin. Ji ber ku wekhevkirina Ketin û Xelasiyê "darek" e: Guneh bi navbeynkariya darekê ketiye dinê (Afr. 2:17 – Darê qencî û xerabiyê zanînê) û dê dîsa li ser darekê bête tunekirin.

Xaça Mesîh ya li Golgotayê, darê binaletiyan e; "Her kesê bi ser darê ve hatiye daliqandin binalet e" (Gal. 3:13). Îsa tena serê xwe, bi awayekî şermî dimire: Ew binalet e. Zagona Mûsa, yê gunehkar binalet dike. Ev nalet, ji ketinê ve li ser hemî mirovan bu. Îsa Mesîh, naleta Xwedê ya li ser gunehê ye, li dêvila me hilgirt ser xwe. Peyama xaçê, ji bo hemî mirovahiya ku ji ber hemî gunehên xwe di bin naletê de ne bû peyama xelasiyê.

Papa II. John Paul ji Kampa Civandinê ya Auschwitzê (di dema şerê cîhanê ya II'an de ya Germenan bû) weke Golgotaya sedsala bîstan qal dike.

Di roja me de ekolek ramandina xwedênasî ya Îsa Mesîh di piştgiriya êşên yên din dibîne de heye. Li gor vê ekolê, tête ramandin ku van mirovan jî mîna Îsa Mesîh lêdanê dixwin û janê dikêşin û rastî mirinek tirsehêz dibin. Lê belê mirina Îsa ya li ser xaçê tu carî bi mirina yên din ve nayê hevber kirin; xaça Wî, bi gellek xaçên li Orşelîm û li Romê ne ve nayên hevber kirin. Wesfeke vê xaçê ji yên din gellek cudatir e heye, ji ber ku xaça Mesîhê Lawê Xwedê yî. Ew ne tenê kesê baldrêjiyê li, ber bêdadiya xurtê vê dinê dike yî; Ew kesê tekane yê xezeba Xwedê ya li dijî gunehê yî hilgirtiye yî. Ew Berxê Xwedê yê tekane, yê li dêvila gellek kesî daraziya Xwedê li xwe bar kiriye yî. "Danezana di derbarê Xaçê de" (1Kor. 1:18). Ji wê demê vir de, di navenda

waazên Xirîstiyan de yî. Ji ber vê yekê tenê gotineke şandî Pawlos bibêje hebû: “Dema di nava we de bûm, bi biryar bûm ku, xeyrî di derbarê Îsa Mesîh û şidandina Wî ya xaçê tiştekî din nizanibim” (1Kor. 2:2).

Amelia M. Hûll di murxeke hişyarbûnê ya navdar e de wateya xaçê ji me re têdighîne:

Ger tu li yê Xaçkirî binêrî tuyê jiyanê bibînî,
Tuyê di wê demê de bigihêje jiyanê,
Mirovno, gunehkarno bona xelasiyê vegerin Wî
Ji Yê ku bi darê ve hatiye mîx kirî!

**PX3:** *Gelo Îsa Mesîh ji ber gunehên ku hê em dikin çawa 2000 sal berê mir?*

**BX3:** Beriya sazkirina dinê, pîlanê Xwedê ya xelaskirina mirovahiya ku ji ber gunehan ketiye hebû. (Ef. 1:4). Sedema vêya, Xwedê ketina mirov, weke encameke vîna wan ya azad hesibandiye û tiştên ku dê bibin ji berê ve zanîna Wî bû.

Xwedê hema piştî ketinê an jî di dawiya demê (dinê) de bi navgîniya Xudan Îsa Mesîh dikarîbû xelasiya mirov pêk bianiya. Lê belê ya birastî jî girîng e, dayîna vê fersenda xelasiyê bû (Îbr 9:28). Di rewşa pêşiyê de, dê berdêla gunehê bipêşîn bihatibûya dayîn, di rewşa duyem de jî, dê ber ve paşê ve bihata cih. Em van her du têgînan jî ji alemê karsaziyê dizanin: Ber ve pêşiyê an jî ber ve paşiyê dayîn. Xwedê dema herî li cih e, bi zanyariya xwe biryar dayîbû. Mîna di Galatiyan 4:4’an de hatiye nivîsandin: “Lê belê dema wext gihaşt hev, Xwedê, bona yên di bin zagonê de ne bighînin azadiyê yê ji jinê welidiye, Lawê xweyî heq yê di bin zagonê de welidiye şand.”

Mirovên ku berî Îsa Mesîj jiya ne û di dewrên xwe de hînkariyên Xwedê ên di derbarê xelasiyê de ne guhdarî

kirine jî, heman mîna mirovên ku paşê welidîne û danezana mizgîniyê bihîstine, bi saya fîdya ku Îsa Mesîh li Golgotayê daye xelas bûne (Îbr. 9:15). Xelasî ji aliyê demê ve di Romiyan 5:8'an de wisa hatiye daxuyankirin: "Xwedê hezkirina xwe ya bona me bi vêya dipeyitîne: Hê em gunehkarbûn, Mesîh bona me mir."

Di dema Birahîm û Eyûb de Zagon tunebû. Van mirovana li gora dengê wicdanên xwe tevgeriyan û bi Xwedê ve ewle bûn. Xwedê vê kirina wan, rastiya (pakbûna) wan hesiband (Rom. 4:3).

Di dema Dawid de, zagonên sînayê ji demekê ve di meriyetê de bûn. Van zagonan, standartên ku Xwedê mirovan dipîvîne bûn. Gunehan jî bi pêşkêşiyên ajalan ve dihatin nuxumandin. Lê belê ajalên ku dihatin qurbankirin nikarîbûn gunehê ji holê rakirina (Îbr. 10:4). Pêşkêşiyên ajalan jî, her yek tenê sembolên hatina Îsa Mesîh nîşan didin bûn.

Ji ber vê yekê navê "Berxê Xwedê, yê gunehê dinê ji holê rakiriye" li Wî kirine (Yû. 1:29). Sûcên me hew bi navgîniya Îsa Mesîh ji holê tête rakirin; gunehkarê ku poşman bûye û tobe kiriye tenê dikare bi Wî bawerî anînê ve xelas bibe. Em di demeke êdî pêşkêşiya qurbanê temambûye de dijîn; qurbanên ajalên yên sembolî ne di raborînê de man. Bi kefaleta Îsa Mesîhê qurbanê bêqisûr e, li me hatiye bexşandin.

**PX4:** *Ma Îsa Mesîh li devila hemî gunehên mirovahiyê, tenê bona gunehên mirov yên ku dixwaze lê bête bexşandin bimira ne çêtir bû?*

**BX4:** Li gora Kelama Xwedê, berdêla gunehê mirin e (Rom. 6:23). Ka em bêjin di dîroka mirovahiyê de tenê mirovek bi bihîstina mizgîniyê berê xwe dabe Îsa Mesîh,

tenê bona wî jî berdêla gunehên raborînê mirin bû. Nivîskar, bi Hermann Bezzel (1861 – 1917) re di heman ramanî de yî. Bezzel wisa dibêje; hezkirina Îsa Mesîh ew qas mezin bû ku dê bona wî mirovî tenê xelas bike jî biçûya mirinê. Lê belê kirina Lawê Xwedê, ya kêferata me daye, ew qasî nûwaze ye ku, berî xelaskirina hemî mirovahiyê yî. Ji ber vê yekê Yehyayê Îmadkar; "A vay Berxê Xwedê yê gunehê dinê ji holê radike!" gotiye (Yû. 1:29). Niha jî, her kesê ku bixwaze dikare vê xelaskirinê qebûl bike. Çîroka li jêrê yî, mînaka vê deqê yî:

Dewlemendek xwedî zeviyê Îrlandayî; fêrbûnek balkêş dide aliyên ku zeviyên wî dixebitînin. Rojekê li hemî cihên berbiçav yên milkên xwe ve vê bangkirinê dadiliqîne: "Di duşema ku pêşiya me serê sibehê ji 10'an heta nîvrojê ez ê li qesra xwe bim. Di vê demê de, ez, bona ku deynê karkerên xwe bidim, amade me. Bo vê yekê divê hemî meqbûzên perên wan nehatine dayîn bêne."

Ev banga serasayî bi rojan dibe sermijara axaftinan. Hinek jî dibêjin qey ev pêşniyar derewek nêtxerab e, yên din jî ji ber ku beriya vêya tiştekî wisa nehatiye kirin, bi gotina; mihaqeq tiştek di vî karî de heye, gûmanbar dibin. Dema roja duşemê tê, mirovan li cihê hatiye diyarkirin dicivin. Saet tam di dehî de xwedîzevî tê qesra xwe û dikeve menzela xwe, deriyê xwe digire. Lê belê ji yên ku hatine, tu kes newêrin ku herin menzela wî.

Mirovan di bangkirinê de derbasdariya destxeta karsazên xwe û nêtxerabiyê de di nava hev de nîqaşê dipejirînin. Saet di 11:30'an de cotek kalepîr tevlî nava komê dibin. Zilamê kal, meqbûz di dest de ji dora xwe ve dipirse; gelo cihê ku dê deyn bête dayîn ev der e? Mirovan bi awayekî xeyd bi zilam ve dipekin: "Wisa ye, lê heta niha bo kesekî nehate dayîn!" Yekî din jî: "Birastî tu kesî newêriyan ku bipirsin. Lê belê, ger wî bixwesta, dê jixwe derketa derve û ji me re bigotana." Tevî hemî van gotinên newê-

rekî cotê kal dikevin menzelê. Ji aliyê karsaz ve gellekî bi dilnizmê pêşwazî li wan têne kirin, hemî deynên meqbûzê têne hesibandin û çekek berdêla hemî deynî ji wan re tête dayîn. Dema cot bi spaskirinê berê xwe didin derve, karsaz ji wan re wisa dibêje: "Ji kerema xwe heta saet girtinê, saet 12'a li vê bimînin." Cotê kal dibêjin yên li derve ne di derbarê vê mijarê de ji wan li benda agahiyekê ne. Karsaz jî bi îfadeyek gellekî biryardar: "Hûn bi gotina min ewle bûn; yên li derve ne, ger bixwazin deynên wan bête dayîn, divê mîna we bikin."

Biryara karsaz bona hemiyên alî derbasdar bû û hebûna wî, têra dayîna deynê hemiyan dikirin. Lê li ber vê yekê tenê deynê wan cotkarên pev re hatibûn digel karsaz hate dayîn." (Çavkanî: Friedhelm Konig, "Du bist gemeint" (Bangî te dikim), ji r. 127'an wê de kurtkirin). Bi heman awayî, mirina Îsa Mesîh jî bona dayîna deynên hemiya mirovahiyê bes e. "A vay, mîna çawa ku tenê sûcek (ya Adem) rê li mehkûmbûna hemî mirovahiyê vekiribe, kirineke rastiyê jî (ya Îsa Mesîh) pakbûna jiyanê dide hemî mirovan pêk anî" (Rom. 5:18).

Pêşniyara dayîna kêferatê û pêkanîna xelasiyê bo her kesî vekiriye; divê bona her kes bi vê yekê bizanibin bête xebitandin. Lê hew tenê yên ku dilaweriya bi Kelama Xwedê ve bawerbûyînê nîşan dayine û yên ku xwe bi kesayetiya xwe bo Wî nezirandine bi tûmî bêne bexşandin û xelas bibin.

**PX5:** *Xwedê, bi mirina Îsa Mesîh ya li ser xaçê, ji hemî mirovan re bona ji kêfarata gunehên xwe xelas bibin derfetekê dide. Ma li dêvila vê yekê Xwedê efûyek giştî derxista ne bes bû?*

**BX5:** Bi saya mirina Îsa Mesîh ya li ser xaçê, bexşandina Xwedê ji her kesî re tête pêşkêşkirin. Pawlosê şandî li Girê Aresê vê yekê bang dike: "Xwedê nezaniya demên borî ji nedîtinê ve hat; lê belê niha emir dike ku her kes li her derê tobe bikin" (K. Şa. 17:30). Êdî pêdivî nîne ku tu kes ji ber gunehên xwe mehv bibin. Hemî gunehkar dikarin efû bibin. Ger Pawlosê demekê dixwest dêra Mesîh xera bike jî hatibe efûkirin, ev bona her kesê din jî derbasdar e. Ji her du tawandarên tevî Xudan Îsa Mesîh bi xaçê ve hatibûn şidandin tenê yek – yê ku gunehên xwe li Wî mukur hatibûn – xelas bûbû. Tawandarên din jî redkirin û biçûkdîtina Îsa Mesîh domandibû û ji ber vê yekê li gunehên wî nehatibûn bexşandin. Ev bûyer nîşanî me dide ku Xwedê efûya bigiştî daneniye, lê li gor biryarên me yên şexsî tevdigere. "Ez îroj erd û ezman li dijî we şahid datînim ku min jiyan (a abadîn) û mirinê, pîrozkirin û naletê danîn ber we. Jiyanê (a abadîn) hilbijêrin ku, hûn jî, zarokên we jî bijîn" (Jinû. 30:19).

"…XUDAN dibêje ku: A vay, rêya ku diçe jiyanê jî, rêya ku diçe mirinê jî datînim ber we" (Yêr. 21:8).

Her kesê ku birastî jî li bexşandinê digere, giraniya sûcê wî her çi be dê lê bête bexşandin: "…Ger gunehên we, we bi xwînê ve gemirandibin jî hûn ê mîna berfê sipî boz bibin…" (Îşa. 1:18).

Em dikarin pûte bidin ser vê deqa girîng û mijarê biqedînin: Mirov ne ji ber gunehên xwe; lê ji ber viyana xwe – bi gotineke din ji ber ku tobekirinê naxwaze – di bin daraziyê de yî. Di buhuştê de ne yên xizmeta pêdivî dikin, lê belê tenê yên ji dil dixwazin dê hebin.

**PX6:** *Ez bawer im ku piştî mirinê jî xelasî dê bibe. Ez wisa bawer im ku xêra Xwedê ji têgihandina we zêdetir e.*

**BX6:** Ev pirs gellek carî tête pirsîn, ji ber xelasbûna mirovên nêzîkî me ne, gellekî bandorê li ser me datînin. Birastî tevî vê pirsê çend pirsên din jî têne pirsîn:

- Ên ku di derbarê Îsa Mesîh de bi awayekî çewt û kêm hatine agahdar kirin,
- Yê ku danezana Îsa Mesîh ya ku xelas dike, tenê di dêrên bi dîtina dinyewî û tê de waazên polîtîk têne dayîn de bihîstiye û biryar daye ku Xirîstiyanî ne li gor wî ye,
- Yê ku mîna Xirîstiyaneke xuya dibe lê daxwaziyên wî yên herî kûr li dijî Kitêba Pîroz in,
- Li gor dîtinê yên ku em negihîştine dilên wan an jî ji ber ku naxwazin mizgîniyê bibhîzin, ji hewldana me ya mizgîndayinê tu xêrê nedîtine,
- Gelo dê mirovên din, ên wekî xwedênenasekî an jî di terîqetên hînkariyên wan rêşaşî ne de mezin dibin dê çi bibin?

An jî:

- Lê dê ji yên ku; ji ber, di roja me de di dersên olê yên dibistanan de pêwendiyek nirxandina Kitêba Pîroz hatibe pejirandin û ciwanên di bin bandora wê de bimînin û carekî din mijara baweriyê nefikirin, û
- Yê çawa ku ne qebheta wan e lê belê fersenda bihîstina mizgîniyê nedîtine û bandora mizgîniyê li ser wan nebûye, dê çi bibe?

Hemî van pirsan, bûye sedemê pêkhatina komên ku di derbarê van pirsan de bersivên cuda didin. Ev koman ditînên cuda yên mîna piştî mirinê xelasbûnê an jî naletbûnê bitûmî redkirinê dipejirînin. Hinekên ji van dîtinên nakok li jê hatine bikaranîn:

**1.** *Parazkerên Lihevkirina Gerdûnî* îdia dikin ku piştî

demekî diyar bicezakirinê her kes – mînak, kesên wekî Hitler, Stalin yên Nîhîlîst û yên ruhparêz – jî dê xelas bibin.

**2.** Li gor mezheba Katolîkan, ger ruhên kesên mirî ên ku hê pêdivî bona safîkirina wan hebin, beriya ku bikevin buhuştê, li Arafê (cihê ku buhuşt û dojehê ji hev cuda dike) di nava dema bicezakirinê de dê bêne pakkirin. Ev bawerî di demên kevnar de, bi taybet ji aliyê Awgûstinos û Papa I. Gregorius (yê mezin) hatibû parastin. Dîtina; dema cezaya "ruhên reben" yên miriyan li Arafê bikêşînin, dê bi duayên kesên zindî ên bona wan li ber Xwedê bigerin ve bête kurtkirin, di Dema navîn de rê li nivîsandina peyamên cezakurtkirinê û di salnameya Katolîkan de sazkirina Roja Ruhan (All Souls' Day), vekiribûn.

**3.** Di dêra Mormonê de beriya çend nifşeyan jiyabin jî, bona kesê baweriyê neaniye xelas bibe, li dêvila kesê mirî, îmadbûna kesekî din ve pêkan e

**4.** Şahidên Yehowa jî bawer dikin ku, ji bilî 144,000 kesên hatine bijartin, bona tu kesî buhuşt û dojeh nîne. Şopînerên vê baweriyê wisa bawer in ku dê dinyayek nû bi mêrasî bistînin; bawer nakin ku di buhuştê de bi Bav, Law û Ruhê Pîroz re pardariyek abadîn bête jiyandin. Yên ku xeyrî wan in jî, yan dê di gorê de razên, yan jî bi karanînek navê "qurbanê fidyê" dayîne dê azad bimînin.

**5.** Di Dêra Şandîtiyê ya Nû de (New Apostolic Church) xizmetê ji miriyan re dikin. Di vê xizmetê de pîrozên ku xwe bi xwe peywirdar kirine bandorê li ser dinya miriyan jî dikin. Diyariya xelasiya ku li vê dinê dê bête qezenckirin, ji kesê mirî ve, ji pîrozên ku mirîne û li dinya din "xizmeta xelaskirinê" didomînin ve derbas dibe.

**6.** Civakên din wisa bawer dikin ku dê yên baweriyê bi Îsa Mesîh ve bînin biçin buhuştê, yên baweriyê neynin jî bitûmî ji holê bêne rakirin û bêne tunekirin.

**7.** Di ekola ramanek din de jî şîrovekarên hinartinê li

1. Pêtrûs 3:18-20’an dikin, digihêjin encama ku bona xelasiyê danezana mizgîniyê li warê miriyan hatiye çêkirin.

Hemiyên van dîtinan – ez bawer im ku bi nêta qenc – dixwazin hêviyê bidin wan mirovên ku me ji serî de qala wan kiribûn. Lê belê spekulasyonên wisa tu qenciyê ji me re pêk nînin. Ji ber vê yekê, em dikarin van pirsan tenê ji Wî yê ku vana bi gotina xwe bibersivîne bipirsin. Em dikarin lêkolînê li Nivîsên Pîroz bikin di derbarê, gelo piştî mirinê fersenda xelasiye heye an nîne de? Ji ber ku pirseke gellekî girîng e em dikarin bibêjin ku Xwedê di derbarê vê mijarê de dê me bê zanîn nehêlin (binêrin Beşa Pêvek I, R51). Tenê Kitêba Pîroz dikare me ji rêşaşî û hînkariyên çewt biparêze.

**1. Li pêy mirinê darazî tê:** Ger di ronahiya Kitêba Pîroz de lê bête nêrîn, bîrdoziyên parastina piştî mirinê dê carekî din fersenda xelasiyê bête dayîn dikin, xeyalên bêbinî ne: “Carekê mirin û paşê darazbûn çawa qedera mirovan be…” (Îbr. 9:27). Ev rêgez bona qandî yên gotina Xwedê bi awayekî bihîstine, bona yên nebihîstine jî derbasdar e. “…Em ê hemî derkevin ber kursiya daraziyê ya Xwedê.” (Rom. 14:10). Xwedê, Lawê xwe mîna darazkir pîşandiye. Em ne ji ber tiştên ku dê li aliyê din yê deriyê mirinê bibin; bona tiştên ku di jiyana xwe de Niha û li Vê kirine bêne darazkirin: “Ji ber ku dema di bedenê de jiyînê; dixwaze qenc, dixwaze xerab, bona berdêla kirinên xwe ragêjin, divê her yekê me li ber kursiya daraziyê ya Mesîh xuya bibin (2Kor. 5:10). Tu kes – bawermend, bêeleqedar, bêxwedêyan, raman azadan, rêşaşan, senemperestan – nikare ji kursiya daraziyê ya Xwedê birevin (K. Şa. 17:31).

**2. Pîvanên dema darazkirinê dê bêne bikar anîn:** Pîvanên daraziya Xwedê ne kêfî ye; bo tu kesê cihêtî tê de nîne (1Pê. 1:17; Rom. 2:11). Xwedê rêzikan ji me re gihandine. Em ê jî li gor rêzikên di Kitêba Pîroz de hatine daxuyanîkirin bêne darazkirin:

“…Yê ku wî kesî di roja dawîn de daraz bike, gotina ku gotime ye” (Yû 12:48). Em herî girîngên pîvanên yên ku Kitêba Pîroz de hatine daxuyanîkirin rêz bikin:

a) ***Li gor dadiya Xwedê:*** em dikarin bi vê yekê ewle bibin: “Xwedê vebir xerabiyê nake, Yê Ku Hêza Wî Têra Her Tiştî ye dadiyê rêşaş nake” (Eyû. 34:12), ji ber ku Ew Darazkirê Bidad e (2Tîm. 4:8). Ji ber ku dê rastî û dadî serweriyê bajon, dê çewtkirinan an jî beyanên xelet jî nebin: “…Belê, Xudan Xwedayê ku hêza Wî têra her tiştî ye; daraziyên te rast û bidad in…” (Pey. 16:7).

b) ***Li gor tiştên ku ji me re hatine emanetkirin:*** Tu mirov ne mîna yekî din e, tiştên ku ji her kesî re hatine emanetkirin, di pîvanên cihê de ne. Yên ku danezana Mizgîniyê nebihîstine, Xwedê qandî yên din nas nakin. Heçî tiştên ku di derbarê Wî de dizanin, ji afirandina li dora xwe dîtine ne (Rom. 1:20) û yên di wicdanên (dilên) wan de nivîsandî ne (Rom. 2:15). Zanînên wan ji yên ku mizgîniyê bihîstine kêmtir in. Bona zilamê dewlemend çêkirina karên qenc û danezana mizgîniyê belavkirinê, ji zilamê xizan zêdetir fersend û derfet heye. Lê yên xwedî diyariyên hişmendî ne berpirsiyariyên wan ên taybet hene. Di navbera kesên ku li welatekî bi dîktatoriyê tête rêvenerkirin û kesên ku li welatekî azad ve dijîn cihêtî hene. Xudan, di Lûqa 12:48’an de wisa têdighîne: “Lê belê yên ku bi nezanî di tevgera dîlitiyê li xwe heq dikin de ne, dê koteka hindik bixwin. Her ji kê re zêde hatibe dayîn, dê ji wî zêde bête xwestin. Her ji kê re gellek tişt hatibin emanetkirin, dê ji wî zêdetir bête xwestin.”

c) ***Li gor kirinên me:*** Xwedê bi kirinên her kesî dizane û Ew ê “berdêla kirina her kesî bide wî” (Rom. 2:6). Lêkerên me, kirinên me (Met. 25:34-40) û tevî vêya tiştên ku em xwe ji ber kirinên wan didine alî ne (Met. 25:41-46). Kirinên her kesî di pirtûka Xudan de qeydkirî ne û vana dê bingeha daraziyên bi dad yên ku dê Xwedê roja daraziyê bidine saz dikin (Pey. 20:12-13).

d) ***Li gora fêkiyên ku em didin:*** Her tiştên ku em bi navê Xudan dikin û bi navê Xudan dibinê (Lûq. 19:13) –helwest û tevgera me, kirinên me– di Kitêba Pîroz de mîna fêkiyên mayînde hatine binav kirin (Yû. 15:16). Ev fêkiyan pîvana bingehîn ya em ê pê bêne darazkirin in (Lûq. 19:16-27). Dê hemî karên mirî bêne şewitandin (1Kor. 3:15), yên li şunda bimînin jî bêne xelatdarkirin (1Kor. 3:14), ji ber ku rûmeta wan mayînde ye.

e) ***Li gora hezkirina me:*** Di nava fêkiyan de ya herî taybet û sereta ye hezkirin e (1Kor. 13:13). Bicihanîna Zagona Pîroz e (Rom. 13:10). Ya ku li vê tête qalkirin, tiştên ku me bona navê hezkirina Xwedê (Met. 22:37) û Îsa Mesîh kirine ne (Yû. 21:15).

Hezkirina ji xwezxwaziyê pakbûyî divê ji hezkirina hesabkar û fênek ve bête cihêkirin: "Ma ger hûn tenê yên ku ji we hezdikin hezbikin, dê xelata we çi be?" (Met. 5:46). Şîmonê ku Fêrisiyek bû, Îsa Mesîh li mala xwe kir mêvan, lê belê bo Wî, li gor kevneşopiya wê demê, bona lingên xwe bişo avê jî neda (Lûq. 7:44). Lê jinika gunehkar jî, rûnên bibêhn rijandin lingên Wî. Ev jinika, ji ber ku bexşandinek mezin stendibû, hezkirina xwe rijand ber ve Xudan (Lûq 7:47). Hezkirin fêkiyeke Ruh e (Gal. 5:22). Girîngiyek wê ya abadîn heye.

f) ***Li gora gotinên me:*** Li gora Îsa Mesîh, nîçikên gotinên me ber ve abadîniyê dirêj dibin. Ev pîvana daraziyê, dibe ku ya herî kêm tête zanîn be: "Ez vê yekê ji we re bibêjim, mirovan, bona her gotina xwe ya vala dibêjin dê di roja daraziyê de hisab bidin. Hûn ê bi gotinên xwe pak bibin û dîsa bi gotinên xwe ve sûcdar bêne derxistin" (Met. 12:36-37).

g) ***Li gora berpirsiyariya me:*** Kesayetiyên me ew wisa hatine pêkanîn ku, girtina berpirsiyariyê bûye pariyeke şexsiyeta me ya cuda nabe. Xwedê gellek derfetên em berpirsiyariyê bikin dide me. Li hember xapandinê jî em ber-

pirsiyarê kirinên xwe ne. Adem her çi qas bi xapandinekê guneh kiribe jî, hewcedar bûye ku baldrêjiya vê kirina xwe bikêşe. Ji ber ku encama baweriyên çewt, binaletîbûyîn e, di Nivîsên Pîroz de îkazên di vê mijarê de gellekî hestiyar in: (Minak, Met. 24:11-13; Ef. 4:14; Ef. 5:6; 2Tîm. 2:16-18). Ji ber vê yekê divê xetera hînkariyên terîqetan yên çewt, neyên biçûk dîtin.

h) ***Di helwesta me ya li hemberî Îsa Mesîh de:*** Ya herî girîng têkiliya me ya şexsî ya bi Lawê Xwedê re yî. “Jiyana abadîn ya kesê ku bi Law bawer kiriye heye. Lê belê dê yê ku gotina Law guhdarî neke jiyanê nebîne. Xezeba Xwedê li ser yê wisa dimîne (Yû. 3:36).

Guneh hemî mirovahiyê xistiye bin daraziyê. “A vay, mîna ku tenê sûcek rê li mehkûmiyeta hemî mirovahiyê vekiribe, kirinek rastiyê jî pakbûna ku jiyanê dide hemî mirovahiyê pêk anî” (Rom. 5:18). Rêya derketinê ya tekane jî xwe zeft bi Îsa Mesîh ve girtine: “Ji ber vê yekê, êdî bona yên ku aidî Mesîh Îsa ne qet mehkûmiyet nîne” (Rom. 8:1).

**3. Dayina Daraziyê:** Dê her kes li gora pîvanên jorîn bêne darazkirin. Dê her aliyê mirov bidine ber çavan.

Dê darazî çi bibe? Dê mirovahî bi du beşî ve bêne cudakirin. Lê Îsa Mesîh jî di vê jiyanê de me bona bijartinekê bikin dawet dike: “Ji deriyê teng ve bikevin. Ji ber ku deriyê ku mirov dibe mirinê mezin û rê fireh e. Yên ku ji vî deriyî dikevin pirr in. Lê deriyê dibe jiyanê teng, rê jî dijwar e. Yên ku vê rêyê dibînin kêm in” (Met. 7:13-14).

Mîna ku bona yên nikarin biryarê bidin rêyeke navberê nîne, di navbera buhuşt û dojehê de herêmek bêalî nîne. Di encamê de yên xelasbûne û xelasnebûne tenê dê cihêtiyek bête kirin. Wê gavê dê Xudan ji civakekê re, “Hûn, yên ku Bavê min wan pîrozkirine werin! Serweriya ku ji avakirina dinê ve bona we hatine amadekirin bi mêrasî bistînin!” bibêje (Met. 25:34); ji civaka din re jî, “Ez nizanim hûn kî ne û ji ku ve hatine. Hûn giştî ji ber min vekişin, ya yên

xerabiyê dikin!” bibêje (Lûq. 13:25,27). Di nava civaka din de tevî xwedênenas û yên xerabiyê dikin, yên ku mizgîniya Mesîh bihîstine, lê belê bersiva erênî nedane jî dê hebin. Wê gavê dê di nava şaşitiyê de wisa biqêrin: “Me li ber te xwarin û vexwarin te jî di kuçeyên me de hîn dikir” (Lûq. 13:26).

**4. Bersiva me:** Li gora Nivîsa Pîroz dê piştî mirinê fersendekê xelasiyê nebe. Divê em biryara xwe di vê jiyanê de bidin. Xudan Îsa Mesîh ji ber vê yekê bi vî awayî bang dike: “Hewl bidin ku hûn ji deriyê teng ve bikevinê” (Lûq. 13:24). Di roja daraziyê de, dê kitêbên Xwedê yên hemî kitekiteyên jiyana me ya dinyewî tê de ne bêne vekirin (Pey. 20:12). Yê ku navê wî di Kitêba Jiyanê de yî dê bête pîrozkirin.

Tu şansekî olên derveyî Xirîstiyaniyê nînin. Em nizanin ji mirovên ku qet Mizgîniyê nebihîstine lê li Xwedê digerin (K. Şa. 17:27) û yên ku hewl didin ku jiyana abadîn bibînin (Rom. 2:7) dê çend kes xelas bibin. Bona yên ku Mizgîniyê bihîstine, qet tu rêya revê an jî mahne ji bo çavên xwe li danezana xelasiyê girtinê re nîne. Xelasî çawa tête qezenckirin, bi awayekî kitekit di Beşa Pêvek I. 10’an de hatiye bikar anîn.

**PX7:** *Gelo hûn di derbarê zarokên gellek bi ciwanî mirine û hê tiştekî ne bijartine çi difikirin? An jî yên ku beriya welidîne mirine (bi beravêtinê an jî kurtajê) û yên dînik? Ma gelo ew di bin naletê de ne?*

**BX7:** Beriya bersivandina vê pirsê divê em bizanibin ku goştpere (embriyon) kengî dibe kesayetiyek. Ger em berbi herkên dinyewî yên roja xwe ve bikevin, em dikarin bibêjin ev mijar bi baweriyên kêfên şexsî an jî zagonan re pêwend in. Ger em bixwazin bersivek ewlekar li pirsa em dê kengî

bibin kesayetiyek bibînin, divê em li Kitêba Pîroz bibînin. Jiyana mirov, dema avika nêr di herza jinê de berê bigire tête holê. Her pêşveçûna emriyonîk, raste rast destekariya Afirker dixwaze: “Hebûna min ya hundirîn te afirand, di malzaroka diya min de te min honand. Ez pesnahiyan pêşkêşî te dikim, ji ber ku bi awayekî nûwaze û giyansûz hatim afirandin. Çi karên te yên nûwaze hene! Ez bi vêya gellekî qenc dizanim” (Zeb. 139:13-14).

**Dema Xwedê bangî Yêremya kir, dibêje ku wî ji berê de mîna serekekî dîtiye û qala rastiya ku wî bona vê peywirê hilbijartina xwe dike:** “Beriya ku di malzaroka dayikê de şêweyê dame te, te naskirim. Beriya bûyînê te cihê kirim. Te ji neteweyan re kirim peyxamber.” (Yêr. 1:5).

**Divê em vê yekê ji bîr nekin:** Li gora ayetên pîroz mirov ji destpêkê ve kesayetiyek e (Lûq. 16:19-31; Îbr. 9:27). Hebûneke bûneweriya wî tu carî dawî nabîne û bona abadîniyê hatiye afirandin e. Lê belê gelo mirov ji newala mirinê ve derbas bibe pê ve dê biçe ku derê?

Ev mijar bona yên ku danezana mizginiyê bihîstine û wê qebûlkirine, gellekî zelal e. Daxwaziya Xwedê diyar e: “…Xudan di cihanîna waadê xwe de dereng namîne; lê belê li dijî we sebir dike. Ji ber ku mehfbûna tu kesî naxwaze, tobekirina her kesî dixwaze” (2Pê. 3:9).

Xelasî an jî naletîbûn tenê bi biryara me ve girêdayî ne. Em xwediyê azadiya bijartina bi Xwedê re bûyînê an jî bêyî Wî çûyîna dojehê, ne. Em dikarin ji van herduyan yekê hilbijêrin (Jinû. 30:19; Yêr. 21:8).

Û ji aliyê din zarokên gellekî biçûk in dimirin, pitikên beravêtinê, zarokên hişên wan ne li serî ne, bona biryarek encama wê ew qasî mezin û cidî ye, ne xwedî huner in (ne di wê bîreweriyê de ne).

Li gor hînkariyên çewt yên Dewranavîn de, wisa dihate bawerkirin ku dê ruhên zarokên biçûkî mirine û nehatine

îmadkirin bêne binaletîkirin. Ev dîtin ji hînkariya ne li gor Kitêba Pîroz e ku dibêje, dê ruhên zarokan bi rêya îmadê ve xelas bibin, pêk tê. Lê belê di derûniya Kitêba Pîroz de xelasbûn ne bi îmadbûnê, lê bi Îsa Mesîh bawerkirinê ve dê bê qezenckirin, heye (K. Şa. 16:31). Ji ber vê yekê îmada zarokan (ya ku di her awayî de bona pitikên ji ber hatine avêtin bêderfet e), bona bersivandina pirsên li jorê ne alîkar nînin. Bersiva vê pirsê em di ayeta: "Xwedê… Yê Ku Hêza Têra Her Tiştî Dike dadiyê rêşaş nake" de dibînin (Eyû. 34:12), ji ber ku daraziyên Wî her tim rast û bidad in (Pey. 16:7) û bêyî hêvişandina kesan tête sepandin (1Pê. 1:17; Rom. 2:11).

Em dikarin ji ber hemiyên vana bibêjin ku, mirovên di destpêka bendê de têne qalkirin, ne berpirsiyarên çarenûsên xwe ne. Yên ku di çaxa xwe ya çarpiyan çûyinê de ne (û pitikan) dema anîn digel Îsa Mesîh, şagirtên Wî fikirîn ku ev bona Xudanên wan yê hemiya rojê westiyaye bêaramiyek ne li cih e. Lê belê Îsa Mesîh vê fersendê bikar tîne û têdighîne ku zarok mêraskerê taybet ên Serweriya Xwedê ne: "Berdin, bila zarok digel min werin" got, "li wan nebin asteng! Ji ber ku Serweriya Xwedê bona yên wisa ne" (Mar. 10:14).

**PX8:** *Ma Cihûda Îsxeryotî, bona ku Îsa Mesîh xelasiyê bona me pêkbînê, îxanetê lê bike, ji berê ve nehatibû peywirdarkirin?*

**BX8:** Divê mijareke bête bîranîn. Xelasî ne bi saya Cihûda, bi saya Îsa Mesîh pêkhatiye. Bona ku em xelas bibin, divê Xudan Îsa Mesîh bimira. Divê mirovek bitûmî bêguneh e, li ser navê gunehkaran, barê hemî gunehan li xwe hilgirta. Li gora pîlana Xwedê: "Îsa ji bo sûcên me radestî mirinê kirin û bona pakbûna me hate vejinandin" (Rom. 4:25).

Ji dema ku Îsa Mesîh daxwaziya xwe ya ji vî karî re de heta bi xaçê ve şidandina Wî ji Cihûyan ta Romiyan gellek kes di nava vê bûyerê de cih girtin. Lijneya Bilind ya Cihûyan (Mar. 14:64), ajaweyên mirovan (Yû. 19:7; K. Şa. 13:28), Pîlato (Mar. 15:15) û leşkerên Romê (Mar. 15:24). Cihûda jî di nava vê xayintiyê de bû, lê zordayînek Xwedayî nîn bû, ev biryara wî ya bi daxwaz bû.

Çawa ku Xudan Îsa Mesîh ji berê ve hay ji vê biryara wî ya bi daxwazkarî hebû (Yû. 13:21-30) û peyxamberiya vê kirinê bi kitekit hatibû kirin (Zek. 11:12-13), xuya dike ku ev ne zordayîn lê zanîneke îlahî ye. Ajoyên Cihûda di nivîsên Pîroz de ne aşkere û diyar in. Heinrich Kemnerê (1903 – 1993) avakirê Dibistana Xwedênasî ya li Krelingenê yî, pêş ve ajotiye ku Cihûda bi vê kirina xwe xwestiye Îsa Mesîh bike rewşeke dijwar û Ew jî bona netewa Îsraêlê hêza xwe nîşan bide. Li gora vê dîtinê, Cihûda nikarîbû xeyal bikira ku dê Îsa Mesîh bikeve ber mirina xwe jî.

Her çi qas gelek mirov raste rast tevlî mirina Îsa Mesîh bûbin jî, bandora rasteqîn pêk neanîne. Ji ber ku Îsa Mesîh, bi daxwazya xwe bona gunehên hemî mirovan miriye. Têkiliya me her yekî bi mirina Îsa Mesîh ve heye, ji ber ku, “Lê ji ber serîhildanên me, bedena Wî hate qelişandin. Ji ber sûcên me Wî tahde kişand. Cezaya ku bona xweşiya me pêdivî pê hebû ji Wî re hate dayîn. Me bi birînên Wî çêbûnê dîtin” (Îşa. 53:5).

Pêtrûs li ber keçikek xizmetkar ya negirîng e Îsa Mesîh redkiriye. Ev bûyer dibe ku bi îxaneta Cihûda ya bi Îsa Mesîh ve bête hevberk kirin. Cihêtiya bingeh ya di navbera van her du mirovan de (Pêtrûs û Cihûda) ne di gunehên wan de, lê di nêzikayiya wanî gunehê de ye. Ji ber Pêtrûs bona redkirina xwe janê kêşandiye û (2Kor. 7:10 *Jana ku bi daxwazya Xwedê hatiye kişandin*) tobe kiriye û lê hatiye bexşandin. Ger Cihûda jî li cihê rast – li ber lingên Îsa Mesîh – li bexşandinê bigeriya dê lê bihata bexşandin. Lê

Cihûda venegeriya Efendiyê xwe, ji ber vê yekê nalet li ser wî ma: Lawêmirov ji rêya ku diyarkirî diçe. Lê belê wey li halê kesê ku Wî daye dest" (Lûqa 22:22).

**PX9:** *Gelo ez ê zarokek wekî îhtimala wî ya bi bêbawerî mirinê ji sedî pênciye çawa bînim dinê? (Pirsa jinikeke nû baweriyê aniye)*

**BX9:** gellek malbat, ji ber zêdebûna gelheyê, qirêjiya hawêrê û çekstendina nûwaze, naxwazin bibin xwedî zarok. Berî yekbûnê di Komara Federal ya Germenistanê de zêdebûna gelheyê berve kêmbûnê bû, yanê piştî mîlenyûmê li bendê bûn ku gelheya welêt ji 61 milyonî dakeve 59 mîlyonê. Lê lûther li ber pirsa; gelo dawiya dinê sibê bihata weyê çi bikirana, bersiva "min ê biraleyek sêvê biçikanda" dabû.

Pirsa li jorê, berpirsiyarike mezin pêş de dide. Nîşan dide ku, jina ciwan hay ji abadîniyê heye û wê ji mijarên din yê serveyî girîngtir dibîne.

Bona safîkirina mijarê, divê du pirsên din bêne pirsîn: Gelo Kitêba Pîroz, di derbarê hejmara zarokên ku em lê bibin xwedî de ji me re dibêje çi? Û pirsa di derbarê xelasbûna zarokên me de bi çi awayî bersivê dide? Li gor rêza afirandina Xwedê em wekî mêr û jin hatin afirandin. Emirê Xwedê yê pêşîn daye mirov: "Berdar bibin û zêde bibin" (Afr. 1:28) bûye. Ev emir tu carî ji holê nehatiye rakirin. Xwedî zarok bûyîn û zarokan, diyariyek Xwedê, bo mirov e: "Zarok diyariyeke XUDAN in, berê malzarokê diyariyek e" (Zeb. 127:3).

Xwedîzarok bûyîn weke bereketekê tête qebûl kirin: "Xwezî li mirovê ku tîrdanka wî bi wan ve tijî ye!" (Zeb. 127:5). "Dê hevsera te li mala te bibe mîna mêweyek berdar; zarokên te li dora sifrê mîna ajên zeytûnê. A

vay, kesê ku ji XUDAN bitirse dê bi vî awayî bête pîrozkirin (Zeb. 128:3-4).

Xwedê tenê bona me bi zarokdayînê ve namîne (Afr. 33:5), wan bi hezkirina Xwedê mezinkirina me, daxwaziya Wî ya herî mezin e. "Van gotinên min di hişên xwe de û dilên xwe de bigirin. Weke nîşanek be, bi destên xwe girêbidin, mîna pêçeka eniyê bipêçin. Wan hînî zarokên xwe bikin. Dema hûn di mala xwe de rûdinin, di rê de dimeşin, radizên, radibin, her tim qala wan bikin" (Jinû. 11:18-19).

Ger em li gora şîreta Xwedê bikin, dê hewldanên me bê fêkî nemînin: Zarok, li gora rêya ku pê bigire bigehîne, dema kal bibe jî ji wê rêyê çewt nabe" (Meth. 22:6) Ji ber vê yekê, em dikarin bêyî xofan bibin xwedî zarok, ji ber ku ger em zarokên xwe li gora şîretên li jorê ne mezin bikin, dê di dahatûyê de şensa wanî bawerî anîn û xelasbûnê gellekî zêdetir bibe. Lê vê jî ew waada Xwedê ya nûwaze derbasdar e: "Ez jî ji yê ku ji min hezdikin, hezdikim, yê bi xîret bigere, dê min bibîne" (Meth. 8:17). Xwedê ji mirovê ciwan yên ku vedigerin Wî hezdike: "Dilsoziya te ya di ciwaniya te de, hezkirina te ya di bûkaniya te de, li çolê, di axa ku nehatiye çandin de te çawa min şopandiye di bîra xwe de tînim" (Yêr. 2:2).

Em yên bawermend in, dikarin bi ewlekarî bibin xwedî zarok; ji ber ku dibêtiya mehvbûna wan tu carî ne 50:50 ye. Ger em zarokên xwe li gor Nivîsa Pîroz mezin bikin, dê waada Xwedê bi dorûberî wan biparêzin. Cerban nîşan dayîne ku; ger malbatên bawermend hê ji temenên pêşîn ve Xudan Îsa Mesîh hînî zarokên xwe bikin, ew ê jî di nava demê de rêya baweriyê bibînin.

**PX10:** *Kitêba Pîroz dibêje ku Xwedê mirov dibijêre. Ger biryarên di derbarê xelasî û naletîbûnê de ji berê ve hatibin stendin, ma em ê çawa qala vîna azad bikin?*

**BX10:** Parazkirên herî xwurt yên hînkariya bi navê *Bijartinî (Bi Latînî praedestînatîo)* tête zanîn Aûreliûs Awgûstinûs (354–430) û John Calvin (1509–1564) bûne. Li gor pêşfereziya vê hînkariyê bawermendbûn an jî bêbawerîbûn; xelasbûn an jî naletîbûna mirov, ji berê ve hatiye diyarkirin. Ji ber ku du derfet hene, em dikarin navê diyarîbûna cot jî li vêya bikin. Divê em vê mijarê bi hînkariya Kitêba Pîroz ve hevberk bikin û biceribînin.

Di bersivên ku heta niha hatine dayîn de me binê mijara; di têkiliya mirov ya bi Xwedê re viyana wî ya azad roleke mezin dilîze, xêz kiribûn. Lê belê divê ev vegotin cih li çavdêriyeke mîna dema baweriyê tîne, mirov tevdigere lê Xwedê pasîf dimîne, veneke. Ji ber ku di Kitêba Pîroz de dîtinek wisa nîne. Di Romiyan ayetên 9:16 û 18'an de wisa dinivîse: "Nexwe, bijartin ne li gor daxwaz an jî hewldana mirov lê bi dilovaniya xwedê ve girêdayî ye. Ango Xwedê bi yê ku dixwaze dê dilovaniyê bike, bi yê ku dixwaze, dilê wî bicedew bike." Li vê ya bi aşkereyî tête dûpatkirin, kirina Xwedê ye. Weke kîla di destê kûzker de, mirov jî di destên Xwedê yên çalak û azad de ne: "Lê belê ya mirov, ma tu kiye ku bersivê didî Xwedê? Yê ku şêwe lê hatiye dayîn ji yê ku şêwe dide re, 'te çima min wisa kir?' dibêje? An jî ma qene rayedariya kûzkar nîne ku qabekê bona karekî bixîret, ya din bona karekî rêze çêbike?" (Rom. 9:20-21). Ji ber vê yekê em nikarin di xelasiya xwe de qet mafekî jî îdia bikin. Biryara mirov ya azad her tim digel bijartina Xwedê ya azad re bikar tê. Bijartinî bi taybet di ayetên li jêrê ne derdikeve pêşê:

- Meta 22:14: "Ji ber ku yê vexwendî zêde, yê bijartî kêm in."

- Yûhena 6:64-65: “Dîsa jî di nava me de yên baweriyê neanîne hene.” Îsa ji serî de dizanîbû ku yên bawerî neanîne û yê ku dê Wî bide dest kî ne. Sedema ku ji we re; ‘Tu kesê ku Bavo berê Wî nede min nikare were digel min’ dibêjim ev e.”
- Efesiyan 1:4-5: “Ew, bona ku em li ber Wî, di hezkirinê de pîroz û bêqisûr bin, berî avakirina dinê, di Mesîh de me bijartin. Li gor daxwaz û armanca Wî ya qenc, bona bi navgîniya Îsa Mesîh em jê re bibin lawên qenc, me ji berê ve diyar kirin.”
- Romiyan 8:29-30: “Ji ber ku wî, kesên ji berê ve zanîbû, bona wergerîne mînakê Lawê xwe, ji berê ve hilbijartî ye; da ku, bila ew di nava gellek birayan de bibe yê pêşîn welidiye. Û wî, bangî kesên ku ji berê ve hilbijartiye kir û kesên ku bangî wan kiribû salih jî hesiband û kesên ku salih hesibandibû bilind jî kir.”
- Karên Şagirtan 13:48: “Û dema neteweyan vêya bihîstin, kêfxweş bûn û gotina Xudan bilindtir kirin û heçiyên ku bona jiyana abadîn hatibûn bijartin, bawerî anîn.”

Bona têgihîştina ayetên di derbarê bijartinê de, divê em deqên li jêrê ne qenc fambikin:

**1**. *Dem:* Bijartin, bûyerek beriya hebûna me pêkhatiye yî: Beriya avakirina dinê (Ef. 1:4); beriya afirandina me (Yêr. 1:5) û beriya destpêkê (2Se. 2:13).

**2.** *Xizmetkirin:* Bijartin her tim di derbarê ji Xwedê re xizmetkirinê de yî. Xwedê, Silêman bona perestgehê ava bike (1Dî. 28:10), Ezbeta Lêwiyiyan bona peywira kahîntiyê bikin (Jinû. 18:5) bijartine. Îsa Mesîh, şagirtên xwe bona bibin şandî bijartin (Lûq. 6:13; K. Şa. 1:2). Şandî Pawlos bona xizmetê ji neteweyên din re bike hatibû bijartin (K. Şa. 9:15) û hemî bawermend jî bona fêkiyê bidin têne bijartin (Yû. 15:16).

**3.** *Li Kesî Nenihêrtin:* Karê bijartinê li gor hewldana mirovî an jî standartên kesî nayê kirin. Xwedê li ya negirîng e dinêre. Gelê Îsraêlê bi hejmarî pirr kêm bû (Jinû. 7:7), Mûsa ne axaftvaneke qenc bû (Der. 4:10), Yêremya xwe gellekî ciwan didît (Yêr. 1:6) û dêra Mesîh li ber çavê dinê negirîng bû (1Kor. 1:27-28).

**4.** *Bona xelasiyê, ne bona naletiyê:* Mebesta Xwedê çiye – xelasiya me yan naletiya me? Xwedê mebesta xwe bi awayekî aşkere têdighîne me: "Di nava mîhên belavbûyî de, şivanek her çawa bi keriyê xwe re têkildar bibe, ez ê jî bi mîhên xwe re wisa têkildar bibim. Rojek bi ewr û tarî de ez ê wan ji her cihên ku belavbûne ve xelas bikim" (Hez. 34:12).

Îsa Mesîh sedema hatina xwe yî rûyêerdê bi van gotinan têdighîne: "Herweha Lawêmirov, bona ku yê wendabûyî bigere û bibîne hat" (Lûq. 19:10). Xwedê, bona di Îsa Mesîh de bighîne jiyana abadîn, li mirovan digere. Vê daxwaziya Xwedê bona hemî mirovan derbasdar e: "Ew [Xwedê], dixwaze ku hemî mirov xelas bibin û bigihêjin vîna rastiyê (1Tîm. 2:4). Vê daxwaziya Xwedê di 1.Selanîkiyan, ayeta 5:9'an de tête daxuyan kirin: "Ji ber ku Xwedê me, ne bona ku em rastî xezebê werin, lê bi navgîniya Xudanê me Îsa Mesîh bighêjin xelasiyê diyar kirin."

Deqek bi vî awayî aşkere dibe: Di navbera xelasî û bijartinê de pêwendiyek qethî heye. Lê belê heman pêwendî di navbera naletîbûn û bijartinê de nîne. Xwedê mirovan bona naletkirinê hilnabijêre. Bi vî awayî, Xwedê ji ber helwesta wî ya bi rik, dilê firawûn tûnd dike, lê belê ev bi tu awayî tiştekî berî welidîna wî hatiye diyarkirin nîne. "Pirr dereng e" têgîneke di Kitêba Pîroz de gellekî lê şahidî tête kirin e, lê tevî vêya di tu hînkariya wê de bona dojehê bijartin, cih nagire. Piştî ku Hêrodes Yehyayê Îmadkar da kuştin, guhên wî giran bûn; ji ber vê yekê Îsa Mesîh êdî bersivê neda wî (Lûq. 23:9).

Deqa ku divê neyê jibîr kirin: Her du rêgez jî (Bijartinî û xelasî) derbasdar in (yanê danezanên hevûdin temam dikin in!). Xwedê mirovan bona xelaskirinê hildibijêre. Lê belê mirov xwediyê azadiya qebûlkirin an jî redkirina xelasiyê yî. Dema lawê wendabûyî got; "Ez ê rabim û vegerim cem bavê xwe" (Lûq. 15:18) û biryarê da, bavê wî dibîne û bi banzdan dere hembêz dike û wî radimusîne (Lûq. 15:20). Ger em bi awayekî azad xelasiyê hilbijêrin, dê daxwaziya Xwedê bête cih: "…Min bi hezkirinek abadîn ji te hez kir, bo vê yekê te bi xwînermiyê kişandim digel xwe" (Yêr. 31:3) û "…beriya avakirina dinê di Mesîh de me bijartin" (Ef. 1:4). Beriya ku em di derbarê Xwedê de biryarekê bidin, gellekî berî bûyîna me, Ew, bona me hebûnê jixwe biryardar bûye. Xwedê li benda biryara me disekine û rêzdariyê nîşanî biryara me dike, lê belê bêyî xêr û dilovaniya qebûlkirin tu carî ne pêkan e (Rom. 9:16). Tenê Xwedê dizane ku dê mirov ji ber banga Wî ya îlahî çawa di bin bandorê de bin (Flp. 2:13) û vîna xwe ya azad çawa bikar bînin (Flp. 2:12).

**PX11:** *Gelo hûn dikarin bi zanistî hebûna dojehê bipeytînin? (Pirseke keça xwendakarê dibistana navîn e)*

**BX11:** Firehiya zanistê qandî firehiya dozîneyên xwe yî. Ev deq bipirranî têt paşçav kirin. Zanîn û daxuyanan, qandî pîvana pêvajoyên dinya bûjenê dê bête firehkirin. Zanist, bona pêvajoyên bi hejmaran nayên daxuyankirin an jî pîvan fêdeyek wêdetirê pêk nayne. Ji ber vê yekê, divê zanista xwezayê tixûbên diyar in nebuhure, ya na dê ji zanistbûnê derê, tenê dê bibe spekulasyon. Loma, zanist di derbarê avabûna dinê an jî dawiya wê de nikare zanînekê pêk bîne. Ne jî tu beşên zanistê dikarî di derbarê piştî mirinê de zanînekê ji me re pêk bîne. Ger zanist di derbarê hebûna

dojehê de tiştekî nikaribe ji we re bibêje, wê gavê çavkaniyek bêhempa ya em bikaribin jê zanînê bistînin heye.

Rastiyên dojeh û buhuştê, bi mirina Îsa Mesîh ya li ser xaçê, bi awayeke diyarî ji me re têne pêşandankirin. Ya herî qenc wateya Mizgîniyê daxuyan bike xaç e. Ger her kes bi awayekî otomatîk bikariba biçûya buhuştê, qet pêdiviya xaçê nedima. Ger rêyek an jî olek din ya xelasiyê pêk tîne hebûya, Xwedê Lawê xwe li ser xaçê bi mirinê ve nediterikand. Xaça Îsa Mesîh, bi aşkereyî hebûna buhuşt û dojehê nîşan didin. Bêyî xaçê tu yên ji me pak nedibûn, em dê hemî mehkûm bimana. Em dikarin danezana xaçê bi vî awayî kurt bikin: Lawê Xwedê ji dojehê (mirina abadîn) xelas dike. Bona mirovahiyê tiştekî ji vêya nûwazetir nehatiye pêkanîn. Dema Xudan Îsa Mesîh mijarên mîna hezkirin, dilovanî, xêr, rastî û buhuştê bi awayekî zindî û gellekî bibandor dida fêrkirin, bi awayekî balkêş qala dojehê dike. Ew dojehê mîna kendaleke bêbinî terîf dike, ew der; “Kurmê ku yên li wê ne dikojin namire, agirê ku dişewitîne jî natefe” ye (Mar. 9:48) û cihê ku lê “…ezaba abadîn” (Met. 25:46) bête dîtin e.

Li gor vê rastiyê, Îsa Mesîh me bi awayekî zexm hişyar dike: “Ger çavê te yê rastê te bixe gunehê wê derxîne, bavêje. Ji ber tunebûna endamekî bedena te, ji avêtina dojehê ya hemî bedena te qenctir e” (Met. 5:29).

“Ger destê te an lingê te, dibe sedemê tilpekîbûnê, wê jêke û ji xwe bavêje! Ji te re çêtir e ku, tu destkûd an seqet bikevî jiyînê, ne ku du dest an du lingên te hebin û tuyê bi nava agirê abadîn ve bête avêtin” (Met. 18:8).

# 5. Pirsên Di Derbarê Olan de (DO)

**Taybetiyên olan yên hevpar:** Dema her mirov bikaranîna afirandinê temaşe bike dê bigihêje encama divê Afirkerek vana hemiyan hebe (Rom. 1:19-21). Ji ketinê vir de, wicdanê mirov di hişmendiya tawanbariya ji Xwedê dûrketinê de yî: “Bi vî awayî (neteweyên din) nîşan didin ku pêdiviyên Zagona Pîroz di dilên wan de nivîsandîne. Wicdanên wan şahidiyê li vêya dikin. Ramanên wan jî yan wan tawandar dikin, yan jî diparêzin (Rom. 2:15).

Neteweyên din li gor daxwaz û ramanên xwe rêyeke bi Xwedê re lihevhatinê geriyane û bi vî awayî gellek olên din pêşve birine.

Peyva ku bi Kurdî ol e, bi Latînî religio ye (religio = Tirsa Xwedê, xîret). Ev peyva Latînî jî gengaz e ku ji kirara “re-ligiare” ya ku tê wateya “bi paşê ve/bi şûnda girêdan/pêgirtin” pêkhatiye. Ev hewldana bi Xwedê ve girêdanê, ji du rêyên bingeh yên wesfandina hemî ola ne pêk tê: Bi rêzikên mirovan danîne (mînak: serjêkirina qurbanê û hwd) û bi navgîniya tiştên pîroz (mînak: peykerokên Bûda, çerxên duayê, Kabeya li Mekkeyê).

Ez ê di vê xebata xwe de hemî hewldana mirovan ya ku bona bi Xwedê re aştbûnê ne, wekî ol/olan binav bikim. Lê belê danezana Mizgîniyê, tam li dijî vana ne. Xwedê bi xwe tevdigere û nêzîkî mirov dibe.

Di encamê de, em nikarin rêya Kitêba Pîroz mîna olekê biwesf bikin.

**DO1:** *Li rûyêerdê gellek ol hene. Nepêkan e ku hemiyên vana xelet bin. Ma îdiaya rêya yekane ya dibe jiyana abadîn Xirîstiyani ye, bi xwe ne pozbilindiyek nayê hesibandin?*

**BO1:** Qet tu ol xelasiyê pêk naynin. “Xirîstiyanî” jî ger tenê olek bûya, nikarîbû xelasiyê pêkbianiya. Tenê Xwedayek Afirkerê erd û ezman ê (her tiştî) heye. Di derbarê vî Xwedayî de çavkaniya me ya zanînê Kitêba Pîroz e. Tenê Ew, birastî dikare rêya xelasiya me, ji me re bigehînin. Ger olek din ya heta abadîniyê ji windabûyînê xelas bike hebûya, dê Xwedê vêya ji me re bigehanda. Pêdivî li ser xaçê mirina Îsa Mesîh jî nedima.

Hew ji ber ku bi mirina Wî kêferata me hatiye dayîn, divê ev bona xelasbûna me di giringiyek jiyanî de be. Xaça Îsa Mesîh, li ber Xwedayê Pîroz, bi aşkereyî nîşan dide ku metodek hê jî “Kêm biha ye” nîne ku gunehên me paqij bikin. Xwedê bi mirina Îsa ya li ser xaçê gunehên me daraz kirine. Di encamê de; tenê vegera Îsa Mesîh û jiyana xwe radestî Wî kirin dê bikaribe me xelas bike. Lê belê li gor pêşdîtina olan, mirov tenê dikare bi hewldana xwe xelas bibe. Li gor danezana Mizgîniyê, Xwedê her tiştî bi navgîniya Lawê xwe Îsa Mesîh biriye serî; tiştê ku tenê divê mirov bike bi bawerî anînê qebûlkirina vê xelasiyê yî. Ji ber vê yekê, di Karên Şagirtan 4:12’an de bi vegotinek esehî tête gihandin: “Wekî din di kesekî de xelasî nîne. Di binya vî ezmanî de navekî din yê hatiye bexşandin, yê bikaribe me xelas bikin nîne.” Ji bilî Îsa Mesîh tu pirek ku diçe buhuştê nîne.

Hemiyên olan, mîna leylanê di çolên mirovahiya wenda de dibiriqin in. Miroveke dê ji tîbûnê bimire, nikare bi leylana waheyekê xelas bibe. Bi heman awayî, xweşdîtiniya ji van xeyalên karên mirovan in, mirov dikare bibe têkçûnê (Meth. 14:12). Pêdiviya mirov ji ava paqij re heye. Kitêba

Pîroz, ji Îsa Mesîhê ku waheya rasteqîn û yekane û fersenda yekane ya xelasiyê yî re bi awayekî aşkere şahidiyê dike: "Îsa ji wî re; 'Rê, rastî û jiyan Ez im' got. 'Bêyî navgîniya min, tu kes nikare were digel Bav'" (Yû. 14:6).

"Ji ber ku tu kes xeyrî bingeha ku hatiye danîn, yanê ji bilî Îsa Mesîh bingeheke din nikare deyne" (1Kor. 3:11).

"Di kesê ku tê de Lawê Xwedê heye de, jiyan heye. Di kesê ku tê de Lawê Xwedê nîne de, jiyan nîne" (1Yû. 5:12).

**DO2:** *Em gişt, mînak misliman û Xirîstiyanan ji heman Xwedê re dua nakin? (Pirsa ku ji aliyê misilmanek ve hatiye pirsîn)*

**BO2:** Ez dikarim bi pirsekê bersivê bidime we. "Xwedayê we Allah, ma Bavê Îsa Mesîh e?"

– "Na, Lawê Allah tuneye. Tiştekî wisa gotin, mîna ji Xwedê re çêrkirin e!"

– "A vay hûn dibînin, Xwedayê min û Xwedayê we nabe ku yek bin."

Gellek mirovên bi olên wekî din ve bawer dibin, di miraqa, gelo her kes bi heman Xwedayî ve bawer in an na? Xwedayê Kitêba Pîroz, heta di dema Peymana Kevin de jî bi gotina: "…Pêşîn û dawîn ez im, ji bilî min Xweda nîne" (Îşa. 44:6) têdighîne. "Ez, tenê ez XUDAN im. Xeyrî min Xelasker nîne" (Îşa. 43:11). Ev Xwedayê Zindî, Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûp (Met. 22:32) in. Ew, Bavê Îsa Mesîh e (Mar. 14:36).

Cihêtiyên di nava Bavê Îsa Mesîh û "Allah" li jêrê hatine rêzkirin:

**1.** *Têkiliya di navbera Xwedê û mirov de*: Di baweriya Îslamê de Xwedê tu carî xwe daxuyan nake. Her tim dûr dimîne. Banga bawermenda ya "Allahû ekber" (Allah bilind e, mezin e) derdixîne holê ku: "Tu kes nikare bi

Allah re têkiliyê deyne – mîna hikûmdarek rojhelatî çawa li jorê, ji gelê xwe dûr serweriya xwe bajo, ew jî her tim li alema din e.

**2.** *Têkiliya bav – law*: Bona misilmanek, têgîna mirov bibin zarokên Xwedê û Xwedê bibe Bavê me (Abba, Bavê Xoşewîst Rom. 8:15) tenê ne tiştekî hişnagire di heman demê de bona Xwedê bêhurmetî (çêr) tê hesibandin. Ji ber ku Xwedê, bi vebirî di alemekî ji vê dinê cihêtir e de dijî.

**3.** *Xwedayê mirovek e*: Di Kitêba Pîroz de, têgihandina xelasiyê de, di wekheviya mirov de, bi awaya Îsa Mesîh daketina Xwedê ya rûyêerdê, bûyera herî girîng e. Xwedê tenê di nava me de nejiya, Wî hemî gunehê dinê hilgirt ser xwe û li ser xaçê bi jankêşiyê mir. Xelasiya mirov ya ku encama vêya yî, ji aliyê misilmanekî nayê famkirin.

**4.** *Dilovanî û hezkirina Xwedê*: Xwedê li dijî gunehkaran dilovan e: berdêla ku li ber vêya daye jî nayê pîvan:

"…we min bi gunehên xwe ve mijûl kirin, bi sûcên xwe bêzar kirin" (Îşa. 43:24). Xwedê dilovan e, ji ber ku xelasiya me bo Wî gellekî bi bihayî bûye (1Kor. 6:20; 1Pê. 1:19). Lê berdêla dilovaniya Allah qet tiştek nîne.

**5.** *Xwedê ewlekariya me ye:* Di baweriya Îslamê de têgihîştina hebûna Xwedayek xêr û xelasiyê dide nîne:

"Ji ber, ez bawer im ku, ne mirin, ne jiyan, ne milyaketan, ne rêvebiriyan, ne tiştên dema niha, ne jî tiştên dema ku bê, ne qudretan, ne bilindahî, ne kûritî, ne jî tiştekî dinî hatiye afirandin, nikare ku me ji hezkirina Xwedê ya di Xudanê me Mesîh Îsa de ye veqetîne" (Rom. 8:38-39). Baweriya Îslamê nikare têgînên mîna Xwedayeke xwe li ser xaçê nizm dike û Ruhê Pîroz yê mesh (paqij) dike fam bike. Nikare venîgana (tehayûla) bi hemî rewnaqiya xwe şunda hatina Îsa Mesîh jî bike.

**DO3:** *Ka ez ê çawa hîn bibim ku çavkaniya belavoka Mizgîniyê ya Îsa Mesîh Xwedanî an jî olî ye?*

**BO3:** Di gera rasteqîniyê de cihêtiyên aşkere ya di navbera danezana Mizgîniyê ya Îsa Mesîh û olan de, dikarin alikariyê ji mirov re bikin:

**1.** Di hemiya olan de mirov xwe bi xwe dest bi gerîna Xwedê dike. Lê belê di encama vê lêgerîna de tu kes bi wateya wê ya rasteqîn nikare: "Êdî bi Xwedê re têkiliyek min ya şexsî heye – dilê min bi xweşiyê ve tijî – li gunehên min hatin bexşandin – ewlehiya min a jiyana abadîn heye" bibêje.

Lê di danezana Mizgîniyê ya Îsa Mesîh de Xwedê nêzî me dibe. Kendala gunehê bi xaça xwe ve digire û xelasiyê ji me re pêk tîne. Her kesê ku vê xelasiyê qebûl kirine dikarin bi aramî wisa têbigehînin: "Ez bawer im ku ne mirin, ne jiyan… dê nikaribe me ji hezkirina Xwedê ya Xudanê me Îsa Mesîh de yî cuda bike" (Rom. 8:38-39).

**2.** Di Peymana Kevin de, peyxamberiyên di derbarê Xelasker de cih digirin (mînak Afr. 3:15; Hej. 24:17; Îşa. 11:1-2; Îşa. 7:14) bitûmî hatine cih. Di olan de peyxamberiyên ne hatine têgihandin û cih nînin.

**3.** Xwedê hemî olan wekî senemperestî û sêrbaziyê mehkûm dike (1Kor. 6:9-10; Gal. 5:19-21; Pey. 21:8). Di tu yên van olan de bona mirov xelasî pêk nayê (Gal. 5:19-21). Ger oleke xelasiyê pêk tîne hebûya, wê gavê dê Îsa Mesîh vê yekê ji me re bigehanda û pêdivî nedima ku Ew li ser xaçê bimiriya. Hew Lawê Xwedê, çû mirina li ser xaçê ya çareya yekane ya xelasiya me ye. Îsa Mesîh ji ber vê yekê wisa têdighîne: "Ji ber vê yekê herin, hemî neteweyan mîna şagirtên min bigehînin…" (Met. 28:19).

**4.** Xwedê qurbanbûna Îsa Mesîh ya gunehan dide bexşandin û ji mirinê vejîna Wî tesdîq dike (Rom. 4:24-25). Li ser dinê gora vala ya yekane, ya Wî ye: "…Ma çima

hûn Yê Zindî di nava miriyan de digerin?” “Ew li vê nîne, vejiya…” (Lûq. 24:5-6). Sazkirên hemî olan mirîne û bi mirîtiya xwe ve mane.

**5.** Di hemî olan de mirov hewl dide ku xwe bi kirinên xwe ve xelas bike. Mizgîniya Îsa Mesîh jî tam li dijî vêya kirina Xwedê yî.

Ji ber ku bi berdêlê hûn hatin kirîn; bo vêya Xwedê di bedena xwe de bilind bikin! (1Kor. 6:20).

**6.** Olan di derbarê mirovahî û Xwedê de xwe disipêrin ramanên xelet (qelp). Ya ku kîbûna me û kîbûna Xwedê, bi awayekî rast têdighîne, tenê Kitêba Pîroz e. Em nikarin xwe bi xwe, bi awayekî Xwedê me biecibînin biguherin, “Ji ber ku her kes gunehê kir û bêyî bilindahiya Xwedê ma” (Rom. 3:23).

**7.** Di tu olê de Xwedê bona mirovan xelas bike, buhuştê naterikîne. Xwedê di Îsa Mesîh de bûye mirov: “Û Gotin bû beden û bi xêr û rasteqîniyê ve tijî, di nav me de jiya; me jî bilindahiya wî, wekî bilindahiya Lawê tekane yê Bav e, dîtin.” (Yû. 1:14).

Ji ber vê yekê Îsa Mesîh di nava olan de ne vebijarkeke herweha, lê belê têkbirin û redkirina olan e. Ew rêya yekane ya diçe malê – mala Bavo – ye: “‘Rê, rastî û jiyan Ez im’ got. ‘Bêyî navgîniya min, tu kes nikare were digel Bav’” (Yû. 14:6).

# 6. Pirsên Di Derbarê Jiyan û Baweriyê de (PDJB)

**PDJB1:** *Em çima hene?*

**BDB1:** Hebûna mirov bi pêvajoyek peresanî ve nayê girêdan. Sedema hebûna me, daxwaziya Xwedê ya di derbarê afirandina mirovan e. Di tu derê Kitêba Pîroz de, hebûna mirov bi pêvajoyek peresanî ve nayê girêdan; em nikarin vegotinên mîna; – mînak: ji ber ku Xwedê ji tenêbûnê aciz bû, ji ber ku ji afirandinê hezdikir, ji ber, xwest ku mirovên ji wan hez bikin biafirîne – bixwînin.

Di beşa Afirandin 1:26-27 de di derbarê afirandina mirov de biryarstendina Xwedê û ka ev çawa çêbûye têdighîne: “Xwedê; ‘Em mirov di teşeya xwe de, wekî xwe biafirînin’ got. ‘Bila di behran de ji masiyan re, li ezman ji civîkan re, ji heywanê kedî re, marîjokan re bibe serwer.’ Mirov di teşeya xwe de afirand. Bi vî awayî mirov di teşeya Xwedê de afirîbû. Mirovan mîna nêr û mê afirandin.” Ev ayetan bi aşkereyî nîşan didin ku afirandina me bitûmî li gor daxwaziya Xwedê bûye. Em ne “hebûnên li gerdûnê beredayî digerin” in ” (Friedrich Nietzsche: 1844 – 1900), ne “koçberên li qeraxa gerdûnê ne” (Jacques Monod; 1910 – 1976), ne ji hebûnên ji heywanan hatine guhertin in! Em ji kirina afirandina Xwedê ve pêk hatine.

Û li aliyê din Kitêba Pîroz ji me re dighîne ku Xwedê ji me hez dike: “Ez ji dûr ve bi Wî xuya bûm û wisa gotim: Min bi hezkirinek abadîn ji te hezkir, ji ber vê yekê bi dilovanî kêşandim digel xwe (Yêr. 31:3) an jî “Ji ber Xwedê ew qasî ji dinê hez kir ku Lawê xwe yê tekane da. Wisa ku, tu yê baweriyê bi Wî anîne mehv nebin, lê gişt bigihêjin

jiyana abadîn.” (Yûhena 3:16). Ev ayeta ji me re têdighîne ku em bona jiyaneke abadîn bijîn hatine afirandin.

**PDJB2:** *Wateya jiyanê çiye?*

**PDJB2:** Zindiyê yekane yê ku li armanca hebûna xwe digere tenê mirov e. Di vê mijarê de sê pirsên bingehîn zorê dide me: Ez ji ku tê me? Armanca jiyana min çiye? Ez bi ku ve diçim? Gellek mirov li ser van pirsan fikirîne. Feylesofê Germenî, Hans Lenkê ji Karlsruhe yî, di nivîsekê de dibêje ku divê em di nava feylesofiyê de di vê mijarê de bersivan bibînin: “Feylesofî di derbarê naverokê de gellekî kêm dikare çareseriyên qethiyen pêk bîne. Feylesofî bi pirsgirêkan re têkildar e, ne bi mijar û çareseriya wê re. Feylesofî carna wisa qebûl dike ku; mijarê mîna pirsgirêkek nûh bigirin dest, ji bersiva nîvco ya ji mijarê re hatiye dayîn qenctir e.”

Hermann Hesse (1877–1962) yê helbestvan wisa dinivîsîne: “Jiyan bêwate, dijwar, ehmeqî, lê belê dîsa jî nûwaze ye – jiyan qerfê xwe bi mirov re nake, lê belê ji kurmikek zêdetir girîngiyê jî nade mirov.”

Nivîskara Fransî ya heyînparêz û xwedênenas Simone de Bouvoir (1908–1986) jî di behra bêwateyan de xwe winda dike: “Ger bitûmî winda bibe û vala derkeve, ma dê çi armanca jiyanê hebe? Ma di destpêkê de çima bû ku? Di encamê de her tişt bêwate ye: xweşikiyên jiyanê, karên mirov, her tişt. Jiyan bi xwe bêwate ye.”

Zanistên mîna psîkolojî, biyolojî an jî tip jî nikarin bersivê pêkbînin, ji ber ku pirsa armanca jiyanê nakeve qada pisporiya wan.

Hinek mirov armanca jiyana xwe d tiştên ku li jêrê hatine diyarkirin de dibînin:

- Qencîkirin: Gellekan vê ramanê dipejirînin. Birastî,

bona ku qenciyê bikin ji Xirîstiyanan re emir hatiye dayîn (Gal. 6:10, 2Se. 3:13), lê hew bi karên qenc ve mirov nikare bibe bawermendê Mesîh.

- Qezenckirina rêz û pesnahiyê: Werzîşkaran bona hinek rekorên dinê biborînin û madalyonên zêrînî qezenc bikin hewl didin. Lê hunermend jî bona li dinê navdariyê qezenc bikin dixebitin.
- Afirandina berhemên mayînde: Mirovan dixwazin ku bi vî awayî navên xwe di dahatûyê de jî bidomînin (mînak: bi damezirandina weqf û muzexaneyên li ser navê xwe). Yên din jî bi berhemên xwe ve (helbestan, novelan, bîranînan hwd.) dixwazin bêmiriniyê bidine navên xwe. Lê divê em vê yekê jibîr nekin: Navdarî û dengên dinyewî dibuhurin. Piştî mirinê, tu qenciya vana ji me re nabe. Ji ber ku li cihê ku em ê herinê; "hezkirin, keribandin û çavnebariyên wan ji zû ve qediyane. Dê ji tiştên ku di bin rojê de bêne kirin careke din parên wan (para me) nebin" (Waî. 9:6).

Ger jiyana me afirandina Xwedê be, wê gavê dê tenê jiyanek bi Xwedê re ji nêzîk de pêwendî ye û di rêvebirina Wî de ye dê watedar be. Ger dilê mirov – ew mirov xwediyê hemî dewlemendî û zewqên dinê be jî – negehîştibe xweşiya Xudan, dê vala, bêaram û têrnebûyî bimîne.

Niha jî ka em binêrin Xwedê di derbarê armanca jiyana me de çi gotiye.

Em dikarin vê yekê bi sê bûjenê aşkere bikin:

**1**. Armanca Xwedê ya di jiyana me de, bi Wî re bawerî anîna me ye. Heta ku mîna Xudan û Xelasker baweriyê bi Îsa Mesîh ve neynin em ê heta abadîniyê wenda bibin. Şandî Pawlos a vay, ji ber vê yekê ji notirvanê zîndana Fîlîpiyê re wisa dibêje: Baweriyê bi Xudan Îsa Mesîh ve bîne, tu jî, maliyên te jî, hûn ê xelas bibin" (K. Şa. 16:31). Xwedê xelasbûna hemî mirovan û gihaştina wanî hişmendiya rasteqîniyê dixwaze" (1Tîm. 2:4).

‘İsa Mesîh, ji ber ku xelasî di jiyana hemî mirovan de tiştê herî girîng e, ji zilamê kud yê ku jê re anîne re wisa dibêje; “Kurê min dilawêr be, gunehên te hatin bexşandin” (Met. 9:2). Di çavê Xwedê de xelasiya ruhanî her tim ji qencbûna fîzikî ve pêştir e.

**2.** Piştî xelasiyê êdî em dikevin bin xizmeta Xwedê: “Bi kêfxweşiyê qûlitiyê jê re bikin, bi murxên şadiyê derkevin hizûra Wî!” (Zeb. 100:2). Wekî şopînerên Îsa Mesîh jiyana me divê berê xwe bide ji Wî re şagirtên din dîtinê (Met. 28:19).

**3.** “Mîna xwe ji cînarê xwe hez bike” (Met. 22:39). Di vî emrê ku di derbarê hezkirinê de ye, Xwedê ne tenê yên li warên dûr ve dijîn e, pêşiyê bona yên ku ji me re hatine emanet kirin, yanê hevserên me, zarokên me, dê û bavên me, cînarên me û hevalên me yên kar re, peywirekê dide me. Di Kitêba Pîroz de rasteqîniya em ji xwe hez dikin, ji serî de hatiye qebûlkirin, lê divê em vê hezkirinê bi cînarên xwe re (yên ku li dora me ne) jî par bikin.

Bûjenên 2. û 3., yanê ji Xwedê re xizmetkirin û ji cînarên xwe ve hezkirin, di Kitêba Pîroz de mîna fêkiyên jiyanê têne binav kirin. Li dijî serfiraziyên dê bibuhurin, tenê ev fêkiyan mayînde ne (Yû. 15:16).

Dema li ser dinê jiyana me dawî bibe dê Xwedê li vê fêkiyê bigere û ka bi yê ku ji me re hatiye emanetkirin (jiyan, dem, pere, diyariyan) me çi kirine dê bipirse (Lûq. 19:11-27).

Tenê qedehek ava cemidî ya me bi navê Îsa Mesîh ve daye jî xwediyê girîngiyek mayînde yî (Met. 10:42).

**PDJB3:** *Ez ê çawa di nava jiyana rojane û baweriya xwe de ahengekê pêk bînim?*

**BDB3:** Yê ku bitûmiya dilê xwe baweriyê bi Îsa Mesîh ve bîne, helbet dê guhertinên diyar di jiyana wî de bibin.

Sê wesfên diyar yên jiyana nû hene:

**1. Ji gunehê dûrketin:** Bi Mesîh ve bawerî anîn, bexşandina gunehan jî tîne. Ji ber ku êdî em ji dîlitiya gunehê xelasbûne, em dê jiyaneke cihê bajon. Em yên wekî bawermendên Mesîh yên ji nû ve welidîne, ne bêguneh in, lê belê tiştên ku me di raborînê de asayî didîtin, êdî bona me, mîna ketina teyarê zerengiyên tirsehêz qezenc dikin. Îtaetkirina destûrên Xwedê, yên ne bona qedexekirinê, lê mîna talîmatên jiyaneke serfiraz in, dê boçûna jiyana me biguherînin. Ev guhertina nû, ji Xwedê re nîşan dide ku em ji Wî hezdikin (1Yû. 5:3). Bona mirovên wekî din, em dê bibin "Nameyeke Mesîh şandiye" ya ku her kes dikare bixwîne.

**2. Di jiyana me ya rojane de cihê baweriyê:** Her kesê ku baweriyê bi Îsa Mesîh ve bînin, ji ber vê yekê Kitêba Pîroz xwendine, dê bibe xwediye xezîneyek dewlemend ya ji ayetên di her qadên jiyanê de bo wî qenc in ve pêkhatine. Ji van ayetan hinekan li jêrê hatine dayîn. Ji ber ku ev beş baweriyê di nava jiyana xwe de tetbîqkirinê de yî, ji beşên Methelokên Suleyman û Waiz yên di Peymana Kevin de ne, gellekî jêgirtin hatine kirin. Di vê beşê de şîretên di derbarê ji xwe re 2(a) û têkiliyên 2(b) bi mirovên din re ne cih digirin.

**2(a)** Şîretên Ji xwe re:

- Bedena me (Rom. 13:14; 1Kor. 3:17; 1Kor. 6:19)
- Xwarin û vexwarinên me (Meth. 23:20)
- Xwarinên beriya ketinê (Afr. 1:29)
- Xwarinên beriya tofanê (Afr. 9:3-4; 1Kor. 8:8; Kol. 2:16; 1Tîm. 4:3-5)
- Razan (Zeb. 4:8; Meth. 6:6-11, 20:13; Wai. 5:12)

- Xebat (Der. 20:9-11, 23:12; Meth. 6:6-11, 14:23, 18:9, 21:25; Wai. 3:13, 10:18; 2Se. 3:10)
- Xebata rêgezeke jiyanê ye (Wai. 2:3-11)
- Dayîna mîşeya xebatkaran (Yêr. 22:13; Îşa. 65:23; Lûq. 10:7)
- Dema vala (Meth. 12:11b)
- Qezencikirina mulk û pere (Wai. 4:6; 1Tîm. 6:6-8; Îbr. 13:5)
- Rûmet û daxwaziyên dinyewî (Wai. 2:2-11)
- Hebûna ku lê xwedî ne (Met. 6:19; Meth. 10:22)
- Dewlemendî (Meth. 11:28, 13:7 û 14:24; Wai. 5:19)
- Avakirina Xanî (Zeb. 127:1; Yêr. 22:13)
- Werzîş (1Kor. 9:24-25; 1Tîm. 4:8)
- Hizran (Zeb. 55:22; Meth. 12:25; Flp. 4:6; 2Tîm. 2:4; 1Pê. 5:7)
- Di zewacê de zayendîtî (Meth. 5:18-19; Wai. 9:9, 1Kor. 7:3-6)
- Zayendîtiya derveyî zewacê (Meth. 5:20-23, 6:24-32; Yêr. 5:8-9; Îbr. 13:4b)
- Guneh (Afr. 4:7; Zeb. 65:3; Law. 3:39; Yû. 20:23; 1Yû. 1:9, 5:17; Îbr. 12:1)
- Alkol (Zeb. 104:15; Meth. 23:30-35, 20:1; Ef. 5:18; 1Tîm. 5:23)
- Ziman (Zeb. 119:172; Meth. 12:14,22, 14:3,5, 18:20-21, 25:11; Ef. 5:19; Kol. 4:6; Aqû. 1:19; Îbr. 13:15)
- Xirîn/Ceribandin (1Pê. 1:6-7; Aqû. 1:2,12)
- Wicdanê ku tawandar dike (1Yû. 3:20)
- Hêrs (Ef. 4:26)
- Dem (Lûq. 19:13b; 1Kor. 7:29; Ef. 5:16)
- Helwest/Tevger (Flp. 2:5)
- Xewnan (Wai. 5:6)
- Kêfxweşî û bextewarî (Zeb. 118:24, Meth. 15:13; Meth. 17:22; Flp. 4:4; 1Se. 5:16)
- Bi xwe re qencîkirin (Met. 22:39)

- Mêzîna rast (Meth. 11:1,24 û 20:10)
- Feylsofî an jî olên şexsî (Meth. 14:12)
- Ciwanî (Zeb. 119:9; Wai. 11:9, 12:1)
- Kalbûn (Zeb. 71:9)
- Mirin (Eyû. 14:5; Zeb. 88:4; Wai. 8:8)

Bona tiştên rewşên li jêrê ne bêne kirin:

- Nexweşî (Wai. 7:14; Aqû. 5:14-16)
- Tengasî û dijwariyan (Zeb. 46:2, 50:15, 77:3, 73:21-28 û 107:6-8; Flp. 4:19)
- Tengavî û keser (Zeb. 42:5 û 119:25)
- Ji mirovan tirsîn (Zeb. 56:12, 118:6,8, Meth. 29:25)
- Bêtarî (Îşa. 45:7, Law. 3:31-37; Amo. 3:6)
- Karên rojane (Wai. 9:10; Kol. 3:17)
- Bi destvekirî dayîn (Meth. 11:24-25; Wai. 11:1; Mal. 3:10; 2Kor. 9:6-7)
- Ji yekî re kefîlbûn (Meth. 6:1-3, 11:15, 17:18)
- Stendina depozît (Der. 22:25-26)
- Li rêberekî gerîn (Zeb. 37:5, 86:11, 119:105)
- Li hevserê gerîn (Hel. 3:1; Amo. 3:3; 2Kor. 6:14)
- Di oxra rastiyê de jankêşî (1Pe. 3:14)
- Hînkariyên sexte (Kol. 2:8; 2Pe. 3:17; 1Yû. 4:6)
- Pîlan sazkirin (Wai. 9:10; Flp. 4:13; Kol. 3:23)

**2(b)** Şîretên di derbarê têkiliyên me yên bi mirovên din re:

- Bi hevserê/a me re (Ef. 5:22-28; 1Pe. 3:1-7; Îbr. 13:4)
- Zarokên me re (Jinû. 6:7; Meth. 13:1; Ef. 6:4; Kol. 3:21; 1Tîm. 3:12).
- Bi dê û bavên me re (Der. 20:12; Meth. 6:20, 30:17, Ef. 6:1-3)
- Bi hevalên me re (Mîk. 7:5)
- Bi hevsera bixawên ya tirsa Xwedê tê de heye re (Meth. 12:4a û 31:10-31)
- Bi hevsera bêedeb û disîplîn re (Meth. 11:22, 12:4b û 21:19)

- Bi neyaran re (Meth. 25:21-22 û 24:17; Met. 5:22,44; Rom. 12:14)
- Bi mirovên xerab re (Meth. 1:10, 24:1-2; 1Pe. 3:9)
- Bi mirovên bêqail re (Meth. 9:8 û 23:9)
- Bi bawermendan re (Rom. 12:10; Gal. 6:2,10b; Ef. 4:32; Flp. 2:4; 1Pe. 3:8-9)
- Bi yên baweriyê neanîne re (Met. 10:32-33; K. Şa. 1:8; Kol. 4:5; 1Pe. 2:12,15)
- Bi aqilmendan re (Meth. 15:22)
- Bi mirovên din re (Met. 22:39; Gal. 6:10a; 1Yû. 4:20-21)
- Bi serekên rûhanî re (Îbr. 13:7)
- Bi nexweşan re (Met. 25:36; Aqû. 5:14-16)
- Bi nojdaran û tipê re (Met. 9:12; 1Tîm. 5:23)
- Bi biyanan û mêvanan re (Met. 25:35; Rom. 12:13; Îbr. 13:2)
- Bi xizanan re (Meth. 3:27, 19:17; Met. 25:34-40)
- Bi rêşaşan re (Aqû. 5:19)
- Bi peyxamberên sexte re (1Yû. 4:1-3, Cihû. 18-19)
- Bi gumnaberan re (Cihû. 22-23)
- Bi jinebiyan re (1Tîm. 5:3; Aqû. 1:27)
- Bi mirovên kêfxweş an jî şûnê digirin re (Meth. 17:22; Rom. 12:15)
- Bi kalepîran re (Lêw. 19:32, Meth. 23:22; 1Tîm. 5:1)
- Bi miriyan re (Wai. 9:5-6)

**2(c)** Şîretên di derbarê mijarên li jêrê ne de:

- Civaka bawermendan (K. Şa. 2:42, Îbr. 10:25)
- Afirandin (Afr. 1:28)
- Hikûmat (Met. 22:21; Rom. 13:1-7; 1Pê. 2:13)
- Îsraêl (Zek. 2:12)

**3. Li vê dinê bûyîn lê belê aidî vê dinê nebûyîn:** Xudan Îsa Mesîh, xetên bingehîn yê peywira şagirtên xwe wisa terîf dike:

"…Çi heye ku hûn ne yên dinê ne; min we ji dinê peji-

randin. Ji ber vê yekê dinya ji we dikerihe" (Yû. 15:19). Her mirovê ku bi Îsa Mesîh ve baweriyê bîne, mîna mirovên din li vê dinê dijî, lê belê tevî yên ku di bûjena 2'an de qala wan têne kirin, di helwesta wî ya li dijî jiyanê de zerengiyek mîna abadîniyê heye. Ev zerengiya abadîniyê bandorê him li ser têkiliya bawermend ya bi Xwedê û Law re û him jî helwest û tevgêrên wî ve dikin.

**3(a) Pêdiviyên ku di têkiliyên xwe yên Xwedê û Îsa Mesîh de divê em bikin**:

- Ji Xwedê ve hezkirin (Jinû. 6:5; Zeb. 31:24, Met. 22:37)
- Naskirin/hînbûna Wî (Zeb. 46:10)
- Bi Wî ve bawerîanîn (Îbr. 11:6)
- Di derbarê Wî de ramandin (Zeb. 3:5-6; Wai. 12:1)
- Bi emirên Wî ve îtaetkirin (Wai. 12:13; Mîk. 6:8)
- Ji Wî re şukirkirin (Zeb. 107:8; Ef. 5:20; Kol. 4:2)
- Pesindayîna Wî (Zeb. 103:1-2, Ef. 5:19b)
- Ji Wî re murxan gotin (Zeb. 68:4 û 96:1)
- Bangê li Wî kirin (Zeb. 50:15)
- Ji Wî re peristin (Met. 4:10b)
- Nêzîkî Wî bûyîn (Aqû. 4:8)
- Ji Xudan Îsa hezkirin (Yû. 21:16; 2Kor. 5:9; 2Tîm. 4:8)
- Bangê li Wî kirin (K. Şa. 7:59; Rom. 10:13)
- Pesindayîna Wî (Pey. 5:12)
- Qebûlkirina Wî (Yû. 1:12)
- Ji Wî re bawerkirin (Mar. 16:16; Yû. 11:25-26; K. Şa. 16:31; 1Yû. 3:23)
- Çêtir naskirina Wî (Ef. 4:13)
- Ji Wî re îtaetkirin (2Kor. 10:5; 1Pê. 1:22)
- Şopandina Wî (Lûq. 14:27 û 14:33)
- Ji Wî re xizmetkirin (Ef. 6:7)
- Bi Wî re di têkiliyek nêzîk de bûyîn/Pardarî kirin (Yû. 15:2; 1Kor. 1:9 û 11:23-29; 1Yû. 1:3)

- Di Wî de mayîn (Yû. 15:4)
- Ji Wî re duakirin û bi navê Wî ve duakirin (Yû. 14:13-14, K. Şa. 7:59; Ef. 5:20)

**3(b)** Di helwest û tevgerên me yên ruhanî de:

- Pêşengiya herî mezin dayîna Serweriya Xwedê (Met. 6:33; Kol. 3:2)
- Fêkî dayîn (Lûq. 19:13)
- Nîşandayîna fêkiyên Ruh (Gal. 5:22; Ef. 5:9)
- Hewandina xezîneyên Ezmanî (Met. 6:20)
- Belavkirina Gotina Xwedê (2Kor. 5:20; 1Se. 1:8)
- Kirina ya ku Xwedê dilxweş dike (Ef. 5:10; 1Se. 2:4)
- Bangkirina Danezana Mizgîniyê ya Îsa Mesîh (Met. 28:19-20; Flp. 1:27; 1Tîm. 6:12)
- Bi bawermendan re pardarîkirin (Met. 18:20; K. Şa. 2:42)
- Domandina jiyanek pak û bêleke (1Se. 4:3; 2Se. 2:13; Îbr. 12:14)
- Tim û tim xwendina Kitêba Pîroz (Yşû. 1:8; Zeb. 119:162; Kol. 3:16)
- Diyarkirina armancên ruhanî (Zeb. 39:4; Flp. 3:14)

**PDJB4:** *Ez tim xewnên xerab yên dubare dikin dibînim. Gelo ez van xewnan çawa şîrove bikim?*

**BDB4:** Xewn bi sê beşî ve cuda dibin:

**1.** *Xewnên ku ji Xwedê ve têne:* Di Kitêba Pîroz de nivîsandiye ku Xwedê bi rêya xewnan ve bi mirovan re diaxife (mînak; Ûsiv: Met. 1:19-25). Yê ku xewnê dibîne, hema pêdihese ku yê diaxife Xwedê ye (mînak, Silêman: 1Qir. 3:5-15; Danîêl: Dan. 7) an jî Xwedê bona peyama xwe şîrove bike yekî din peywirdar dike (Weke Ûsiv xewnên serekê firnê û sersakî şîrove bike). Xewnên ku Xwedê bi me re diaxife her çi qas me bitirsîne jî an jî gira-

niyê bide jî, di nava demeke kurt de qenciyeke diyar pêk tînin. Tevî vêya di xewê de axaftina Xwedê ya bi me re tiştekî gellekî kêm dibe yî.

**2.** *Xewnên ku bêwate ne:* Pirraniya xewnan mîna ku di Eyûb 20: ayeta 8'an de hatiye diyarkirin berdemî û bêwate ne: ''Dê mîna xewnê bifire, carekê din neyê dîtin, dê mîna xewn û xeyala şevê dê tune bibe."

Divê şîrovekirinên sembolî yên di roja me de têne bikaranîn bitûmî bêne redkirin. "Remildaran xewn û xeyalên derewîn dibînin û bi têgihandina xewnên bêbinî, bitewşî dihedirînin" (Zek. 10:2). Di pirtûka Sîrak ya di nava Apokrîfan de cih digire de, di beşa 34:1-8'an de di derbarê mijarê de daxuyanek qenc cih digire: Hêviyên vala bêaqilan dixapînin; xewnan jî daxwaziyên ehmeqan dilezînin. Girîngîdayîna xewnan mîna hewldana siyekî girtinê an jî bayê zeftkirinê yî. Tiştên ku em di xewnan de dibînin mîna dîmena wecekî ya di mirêkê de yî şewqê dide. Mîna ku ji qirêjê pakbûn nazê, di derewê jî rastî nikare bizê.

Hemiyan şîroveyan, kehanetan û xewnan bêkêr in; mîna jinikeke welidandinê dike xeyalî ye. Heta ku ji aliyê Yê Herî Bilind e nehatibin şandin qet bala xwe nedin wan. Xewnan gellekan ji rê çewtkirine û yên ku li ser hêviyê avakirine birine têkçûnê. Xapandinên wisa nikarin tiştekî tevlî yekitiya Zagonê bikin; gotinên bawermendan yên zanyarî, tena serê xwe bêkêmasî ne."

**3.** *Xewnên ku di derheqa bûyerên ku hê em ji bandora wan xelas nebûne de hatine dîtin*: Hinek xewnan dibe ku ji ber bûyerên binehişî ne di dema xewê de derdikevin ser hiş ve pêk bên. Sedema xewnên wisa pirr aşkere ne: Tirsên ku nikarin bi serkevin, sûcen ku nehatine mukir hatin, bûyerên ku hê bandorên wan derbas nebûne (mînak bîranînên şer, tirsa azmûnê, pirsgirêkên zewacê hwd.).

Ya ku di pirsa li jorê de tête qalkirin dibe ku xewneke wisa be. Di nava dema pêvajoya başbûnê de, şêwirdariyek

berfirehî dê qenciyê pêk bîne. Ji ber ku hesta sûcdariyê her tim pirsgirêkan pêk tîne, divê em bibexşînin û bêne bexşandin.

**PDJB5:** *Guneh çiye?*

**BDB5:** Di Kitêba Pîroz de beriya ku qala gunehê bête kirin, çêbûna gunehê li ber çavan tête raxistin (Afr. 3:1-13). Yanê li dêvila pêşiyê daxuyankirina têgînê, paşê jî mînak dayînê, bitûmî ya li dijî vêya ye hatiye kirin: Pêşiyê cih li bikaranînê dane û paşê wê encam hatine derxistin. Guneh bi pirsa, "Ma gelo Xwedê bi rastî jî, 'Ji tu daran fêkiyê nexwin' got?'" (Afr. 3:1) ketiye rûyêerdê. Di vê pirsa dilxapînok de guman ji ber qenciya Xwedê tête kirin. Ji ber vê yekê guneh, vegotina vîna mirov ya li dijî vîna Xwedê yî. Him 10 Emir (Der. 20:1-17), him Waaza Îsa Mesîh ya li çiyê (Met. 5 – 7), gunehkarbûna mirov bi awayekî nûwaze tînin zimên. Ger mirov, ji Gotina Xwedê cuda bijî, helbet dê nizanibe ku daxwaziya Xwedê çiye. Ji ber vê yekê dê her tim di nava gunehê de bijî û gellek caran dê hay ji vê rewşê nebe.

Di Kitêba Pîroz de peyva pêşîn ya bona gunehê hatiye bikaranîn (Bi Îbranîtî: hatat) di Afirandin, ayeta 4:7'an de derbas dibe. Wateya vê peyvê "negihîştina armancê" yî. Di Grêkî de "hamartîa" ji di heman wateyê de yî.

Wateyên din yên gunehê: Berî xwe bi aliyekî din ve dayîn, xerabûn (Îbr.:avon), xerabî (Îbr.: raa), tûndî (Îbr.: hamas), bi xerabî ramandin (Îbr.: raşa). Neheqî jî guneh tête hesibandin: "Wey li serê zilamê ku qesra xwe bi neheqiyê ve, menzelê xwe yên jorê bi bêdadiyê ve ava kirine, cîranê xwe bêpere dixebitîne, mîşeya wî nadê! (Yêr. 22:13). Di Peymana Nû de ayeta ku li dijî vêya ye jî di Romiyan 14:23 de cih digire: "Her tiştê ku bi baweriyê nehatine kirin guneh in."

Herman Bezzel, gunehê mîna cudabûna mirov ji Xwedê ve binav dike. Îsa Mesîh di Yûhena 16:9'ê de têdighîne ku, gunehê bingehîn yê mirov li dijî Wî, bêpêwendmayîn e: "Di mijara guneh de, ji ber ku baweriyê bi min naynin."

Guneh pêkera herî mezin ya têkiliya di nava Xwedê û mirov de xeradike/dibire yî. Ger mirov bi bawerî anînê, bi navgîniya bexşandinê ve nekeve rêya rast (1Yû. 1:9), dê rastî encama esehî ya armancê revandinê bê: "Ji ber ku berdêla gunehê mirin e" (Rom. 6:23).

Bona gellek mirovî ya pêşengî tendrustiya wan e, lê li ber vê yekê girîngiyê nadin nexweşiya herî tirsehêz – yanê guneha ku encama wê mirin e –.

**PDJB6:** *Gelo Kitêba Pîroz destûrê li hevjiyana kesên nezewicîne dide? Cotek kengî (di çi mercan de) zewicî tête hesibandin? Dema biryara hevjiyanê bidin? Piştî têkiliya yekem carî cinsî? Piştî mehra fermî an jî merasîma dêrê?*

**BDB6:** Bona ku bersivdayîna van pirsên ku di roja me de her ku diçin hê jî girîngtir dibin bikin, divê ji pênc emirên ku xwe spartine Kitêba Pîroz bête qalkirin. Rêgeza şîrovekirina Kitêba Pîroz ya ku dê li vê bête bikar anîn; li dêvila ku encamê tenê ji ayetekê derxînin, dê ji peywendiya çend danezanênbingehîn ve bête diyarkirin (binêrin, Beşa Pêvek, Beşa II Rêgezên Şîrovekirinê).

**1.** *Zewac û zayenditî:* Xwedê saziya zewace tevlî hundirîna Afirandinê kiriye. Daxwaza Wî û ramanê Wî yê qenc ev e:

"Got, 'tenêmayîna Adem ne qenc e', 'Ez ê alîkareke li gor wî biafirînim'" (Afr. 2:18). Mebesta zewacê ew e ku, bibe şirîkantiyek di tûmiya jiyanê de bidome (Met. 19:6) û li gor sonda zewacê "heta ku hevser (cot)" bijîn didome". Dema Xwedê pergala vê şirîkantiya di nava mêr û jînê de yî

datîne, wisa dibêje: “Ji ber vê yekê dê zilam dê û bavê xwe berde û bi jina xwe ve bête girêdan, dê her du bibin yek beden” (Afr. 2:24). Ev “yek beden bûyîn” pêşiyê tuwanca zayenditiyê dike. Lê belê ev formula kurt hemiya mirov, ji ber vê yekê ruh û canê wî jî vedigre. Du miroıvên di jiyana xwe ya berê de bitûmî cihê bûn, dikevin nava têkildariyeke gellekî nêzîk de. Qandî ku di hest û ramanên xwe de dibin, di awaya fizîkî û ruhî de jî pêş ve diçin. Zayenditî, diyariyeke Xwedê ye û li gora Nivîsa Pîroz, armanca yekane ya zewacê ne zêdebûn e.

“Bi tesdîqa her du alî û bona demeke berwext, ji bilî xwedayîna duayê, hev û du red mekin…” (1Kor. 7:5).

“Bila kaniya te biberdar be û bi hevsera ku tu di ciwaniyê de pê re zewiciye bextewar bin. Bila pêsîrên wê, mîna askeke xwînşêrîn, mîna xezaleke narîn te her tim têr bikin. Bi evîna wê her tim bicoşe” (Meth. 5:18-19).

“Di bin tavê de hemî rojên emrê vala ya ku Xwedê daye te, hemî rojên bêwate bi hevsera xwe re bi jiyaneke xweşik û bedew biborîne…” (Waiz 9:9)

Kitêba Pîroz, tiştên ku divê di mijara zayenditiyê de em rast bikin, ji me re têdighîne. Divê mirov ji ramantengiya zêde (Hel. 4) û /an jî ji zebûniya şewhetê bireve. Di vê mijarê de pêşmercên herî girîng hezkirin û hurmet e (Kol. 3:19, 1Pê. 3:7).

**2.** *Saziya zewacê û dêr (Civaka Bawermendan) ji aliyê Xwedê ve hatiye damezirandin*: Li dinê gellek cureyên civatê mirovan hene ku di wan de zewac û malbat, dêr û dewlet (Rom. 13:1-7) li gora daxwaziya Xwedê ne. Dêra Îsa Mesîh û zewac, li dijî baweriya giştî, ne bûyerên mirovan bi xwe dîtine, lê du saziyên ku ji aliyê Xwedê ve bi taybetî hatine binavkirin in. Ji ber vê yekê li van her du saziyan jî êrîşên bi gotinên bêxwedê têne kirin (1Tîm. 4:3; Pey. 2:9).

Ji destpêkê ve tu çanda mirov nebûye ku tê de zewac

tunebe. Saziya zewacê tu carî girîngî û rojaneyiya xwe winda nekiriye û li ber hemî bizavên li dij – zewacê ne, û xeletiya mirovan ve dê li ser pêlan mayîna xwe bidomîne. Zewac pariyek ji pêşniyara Xwedê ya bona mirovan bi hezkirin û têkildariyê ve pêk tê ye. Bi heman awayî dê deriyên warê miriyan jî, li gor waada Îsa Mesîh, li dijî Dêrê – Civaka Bawermendan tu carî nikaribe di ber xwe de bide (Met. 16:18).

**3.** *Bi karanîna saziya zewacê ya mîna wekokekê*: Kitêba Pîroz baweriyê û têkiliya di nava mirov û Xwedê de, mîna zewacê ya di nava têkiliya mirovan de, ya herî ewlekar û nêzîk e û pêşiyê tê bîra mirov, dişibîne. "Xortek bi qîzekê re çawa bizewice, …Zava bi bûkê re çawa kêfxweş bibe, dê Xwedayê te jî bi te re wisa kêfxweş bibe" (Îşa. 62:5). A vay; sedema wekî zewacê şibandina têkiliya di nava Îsa Mesîh û dêra Wî de ev e: "Ya mêrno; Mesîh çawa ji civaka bawermendan hezkiribe û di oxra wê de xwe feda kiribe, hûn jî wisa ji jinên xwe hezbikin. Bi heman awayî, divê mêr jî mîna bedena xwe ji jinên xwe hezbikin. Yê ku ji jina xwe hez bike, ji xwe hez dike" (Ef. 5:25,28).

Kelama Xwedê di derbarê vê wekheviyê de wisa dibêje: "Ev raz mezin e û ez vêya di derbarê Mesîh û civaka bawermendan de dibêjim" (Ef. 5:32). Bona sembolkirina bi Mesîh re pevrabûna me ya abadîn, bikaranîna wekhevoka zewacê, nîşan dide ku divê zewacên dinyewî jî şirîkantiyek di tûmiya jiyanê de bidome bin. Her jin/mêr berdan, dibe sedema çewtkirina ramanê Xwedê û tahde li derûniya wekokê dike. Ev rastî, diyariyê li helwesta Îsa Mesîh ya rê nade jin/mêr berdanê jî dike (Met. 19:6-9).

**4.** *Wekî wekokekê bikaranîna gandêriyê*: Ger zewacek di bin baskê hezkirin û dilsoziyê de yî sembola têkiliya di navbera Xwedê û gelê Wî de yî be, wê gavê ji Xwedê ve dûrketin û bi îlahên biyan ve peristin, di Kitêba Pîroz de wekî zinêkirin an jî gandêrî tête binav kirin.

“Di dema Qiral Yoşiya de XUDAN ji min re, ‘ma te kirina Îsraêla çivanok dît?’ got, ‘çû ser her girê bilind, bin her dara pelên zêde û gandêriyê kir… Bi bêxemiya xwe, bi gandêriyê welêt qirêj kir; bi kevir û dara ve zinê kir’” (Yêr. 3:6,9).

“Kerihandinên te li girên li çolterê ne kirine – zinayên te, hîrehîr kirina te ya bi doxînsistî, bêariya fahşetiyên te – dîtim. Wey li tiştên ku dê bêne serê te, ya Orşelîm! Ma tuyê heta kengê wisa qirêjî bimîne? (Yêr. 13:27).

**5.** *Bêexlaqiya zayendî çiye?* Di zimanê Peymana Nû de tenê berdêlkek gotinên di Kurdî de mîna gandêrî, zinêkirin û bêexlaqiya zayendî ne heye, ew jî peyva di Grêkî de “porneria” ya ku “pornografî” jê derketiye yî. Di Peymana Nû de bêexlaqiya zayendî, zinêkir û homoseksûelan hemî pev re di rêzekê de cih digirin (Mînak 1Kor. 6:9). Lê Pornerîa jî, têgîna giştî ya ji bo diltêrbûna her daxwazên zayendî ên ku li derveyî saziya zewacê ya Xwedê damezirandiye, tête gotin e (mînak 1Kor. 6:18: 1Se. 4:3).

Vana dikevin nava wê:

- Têkiliya zayendî ya berî zewacê (Jinû. 22:28)
- Ji bilî hevsera xwe bi jineke din re têkiliya zayendî (Lêw. 18:20; Yêr. 5:7-9; Met. 5:32)
- Homoseksûelî (Afr. 19:5; Rom. 1:26-27; 1Tîm. 1:10)
- Ensest (Têkiliya zayendî bi dê û bav, xwuşk û bira an jî qîz û law re danîn). (1Kor. 5:1)
- Bi ajalan re têkiliya zayendî (Lêw. 18:23)

Bêexlaqiya zayendî, ji aliyê Xwedê ve bi awayeke tund tête bicezakirin: Ma hûn nizanin dê gunehkar nikaribin Serweriya Xwedê bi mêrasî bistînin? Mexapin! Ne yên bêexlaqiya zayendî dikin, ne yên bi seneman ve diperistin, ne dizan, ne çavbirçiyan, ne meyxuran, ne çêrbazan, ne jî rêbiran dê nikaribin Serweriya Xwedê bi mêrasî bigirin (1Kor. 6:9-10).

“Bila her kes hurmetê ji zewacê re bike. Bila nivînên

zewacê bi gunehê ve neyê qirêjkirin. Ji ber ku dê Xwedê, li yên ku bêexlaqiya zayendî dikin û zinê dikin re daraziyê bike” (Îbr. 13:4).

“Dê hemî segên nizm, sêrbazan, yên ku bêexlaqiya zayendî dikin, mêr dukujin, bi pûtan ve diperistin û ji derewê hezdikin û fenekiyê dikin, li derve bimînin (Pey. 22:15).

**Encam:** Li gor rêgezên Kitêba Pîroz bersiva ku dê li vê pirsê bête dayîn aşkere ye: Dema cot beriya zewacê pev re bijîn – mîna beriya zewacê û li derveyî zewacê ketina têkiliya zayendî – bêexlaqiya zayendî ye û heta ku tobe neke û ji jiyana xwe ya gunehkar venegere, mirov li derve Serweriya Xwedê dihêle.

Zewac kengî destpê dike? Mirov her ku dibin biyanê emirên Xwedê, hê gellek bêzewac, lê mîna zewicîbin û bêyî ketina qet tu lixwegirtinê dest bi pev re jiyînê kirinê. Her çi qas di navbera vê hevrebûna cotan û zewacê de qet tu ferq tunebe xuya bibe jî, ya rast e, nezewicandina wan e. Xwedê di vê mijarê de çi difikire, me li jorê di bûjena 5’an de girtibûn dest.

Li gor Kitêba Pîroz, zewac bi yên ku li jêrê hatine diyarkirin destpê nake:

- *Bi mebesta zewacê*: Aqûp xwest ku Rahêl mîna hevsera xwe be bistîne. Paşî ku beriya zewacê heft salî xebitî, Aqûp ji Laban re: “Dem buhurî, ka qîza xwe bide min, ez bizewicim” got. Wateya zewaca li vê, têkiliya zayendî danîn e. Em ji vê beşê du tiştî fam dikin: Aqûp berî zewacê, bi Rahêl re têkiliya zayendî daneniye û zewac, paşî merasîmeke bi civandina şêniyên alî ve pêk hatiye.
- *Bi têkiliya zayendî danîna hevseran*: Li Îsraêlê dema zilamek bi jinikekê re raketa divê bi wê re bizewiciya – û wekî kevneşopiyeke wê demê, divê bona bûkê piçekî pere bidaya (Jinû. 22:28-29). Beriya zewaca fermî bona têkiliyên nêzêkê ve destûr tunebû.

**Pênasiya zewacek kengê destpê dike**: Jin û mêr piştî merasîma zewaca fermî ya di civaka wan de derbasdar e – li ber Xwedê jî – jin û mêr (zewicî) têne qebûlkirin. Ev pênavkirin, bona hemî zewacên di Kitêba Pîroz de ne, dikare bête bikar anîn. Em li vê rastî rêgezekê di derbarê şîrovekirina ayetan ve têne: Weke jêpara hevbeş ya xezîneyek ji bûyerên şexsî ve pêk tê derxistina hînkariya Kitêba Pîroz. Çawa ku ev pênavkirin mîna li ser merasîmên di nava civakên gelên li herêmên gellekî tena ve dijîn bête bikar anîn, di çanda me de bona kirinên mehra fermî jî dê bikaribin bikar bînin. Di her awayî de ya girîng mirovên li dor cot in, bila bizabin ku ev cot bi kirina zewaceke fermî yek bûne. Ji niha pê ve dê tenê bona hev bêbar bin.

Ger zilamek li pîrekek zewicî binêre (an jî zilameke zewicî li jinikeke dinan jî berevajiya vê) û wê bixwaze, wê gavê li gor Waaza li Çiyê (Meta 5:28) dê zinê kiribin. Îsa Mesîh di bîra Aqûp de ji jinika ku rastî Wî hatiye re dibêje ku, ew zilam ne hevserê jinikê ye (Yû. 4:18). Ger di nava jinikê û mêrik de peymaneke fermî ya zewacê hatibûya kirin, dê Îsa Mesîh bi Wî awayî bi jinikê re neaxifiya.

Di tu derê Kitêba Pîroz de, di derbarê pêkanîna kirara zewacê de qet tu agahîdayîn nîne. Tevî vêya rojeke zewacê ya hatiye diyarkirin heye û piştî wê rojê mêr û jin êdî bi her awayî dibin yên hev.

Merasîma zewacê ya di dema Birahîm de (Afr. 24:67) ji ya dema Şîmşon (merasîma ku heft roj didome. Ser. 14:10-20) an jî ji ya dema Îsa Mesîh (Daweta li Kanayê Yû. 2:1-11) gellekî cudatir bû. Ger mirov bixwaze ji roja me ve mînakekê bide, li Efrîqaya Başûr divê kirara mehrê tenê ji aliyê peywirdarê mehrê yê rayedar an jî ji aliyeke dadgerekî bête kirin û piştî vê kirara fermî li cem Xwedê derbasdariyê qezenc dike.

**PDJB7:** *Bawerbûn nayê wateya zanebûnê – vê gavê em ê çawa baweriyê mîna vebiriyê bihesibînin?*

**BDB7:** Gellek lêkolîner li ser mijara baweriyê fikirîne û zerengiyên dîtinê yên cuda pêş ve birine. Tevî vê yekê van dîtinên wan, ne encamên pêvajoya fikirandina bêalî, lê baweriyên wanî şexsî dide xuyakirin.

*Hêla nêrîna nirxandinê*: Theo Löbsack wisa îdia dike: "Bawerî parastina ramanên pêşdîtinî dike û encamên zanistî yên ne li gor van dîtinan e red dike. Ji ber vê yekê di encama dahûrînê de bawerî, dikeve rewşa neyarê serekî yê zanistê."

Kant jî bi vegotineke nirxandinê ya mîna vê ye, bi gotina; "Bona ku ez cih ji baweriyê re cihê bikim, divê ez zanînê red bikim" dinivîse. Ev zerengiya Kant ya li dijî Kitêba Pîroz e, wî kiriye pêşengê gellek dîtinên feylesofî yên li dijî baweriyê ne. Li Norfa li Germenîstanê ye nivîsa li ser dîwarê dibistaneke navîn e; "bi tu kesê ku Xwedayê wî li ezmanan e bawer nebe!" encama vê hêla nêrîna nirxandinê ye.

*Hêla nêrîna erênî*: Sîr Isaac Newtonê ku herî mezinê mirovên zanistê yê hemî deman e tête hesibandin wisa dinivîse: "Kesê ku bi bêdilî bifikire dê bi Xwedê ve bawer nebe; lê yê ku birastî jî bifikire divê bi Xwedê ve bawer bibe."

Matematîkzanên navdar Blaise Pascal jî bi heman teqezî wisa têdighîne: "Çawa ku bona yê Xwedê dinase her tişt qala Wî dikin, ji yê ku ji Wî hezdikin, daxwaziya Wî dikin; ji yên ku li Wî digerin an jî Wî dinasin jî Wî venaşêrin."

Ev her du hêlên nêrînên li dijî hev in, nîşan didin ku bawerî ne kirinên bi nezaniyê hatiye kirin, lê xwe disipêre helwest û ramanên şexsî yên bitûmî bicih bûne. Yanê bi ramanên feylesofî nayê guhertin, tenê bi bawerî anîna mirov ya ji Îsa Mesîh re – bi kirina ku di Kitêba Pîroz de bi navê vegerîn tête binav kirin – pêk tê. Bona kesê bawer nake ramanên di derbarê mirinê de ne tewş in (1Kor. 1:18)

û wan fam nakin (1Kor. 2:14). Kesê ku bi, hezkirina Îsa Mesîh ve tijî ye dê berê xwe bide rastiyê (Yû. 16:13); bingeheke zexm ya baweriya wî heye (1Kor. 3:11) û bi vêya pirr bawer e: "Bawerî, bi yên ku têne hêvîkirin ewlebûn, ji hebûna tiştên nayên dîtin bawerbûn e."

**PDJB8:** *Ma divê nîşaneke derveyîn ya ji nûve bûyînê tunebe?*

**BDB8:** Bi Îsa Mesîh ve (bawer bûn) vegerîn û ji nû ve welidîn, du peyvên pêvajoya xelasiyê terîf dikin in. Vegerîn, di heman pêvajoyê de aliyê mirovî, ji nû ve bûyîn jî aliyê ruhî ye. Îsa Mesîh ji Nîkodîm re wisa dibêje: "Ez ya rast ji te re bibêjim, heta ku mirovek ji nû ve newelide, dê nikaribe Serweriya Xwedê bibîne" (Yû. 3:3).

Bona ketina hizûra Xwedê, ji nû ve bûyîn ferz e. Ji nû ve bûyîn, mîna welidîna xwezayî kirineke tebitî ye. Bi welidîna xwezayî jiyana me ya dinyewî destpê dike û em dibin hemwelatiyeke dinê. Bi heman awayî, hemwelatiya me ya ezmanî jî dîsa bi navgîniya welidînekê dibe. Jixwe bona ku em her yek carekê welidîne, di Kitêba Pîroz de di derbara vê welidîna duyem ya hemwelatiya ezmanî de bi me re dide qezenckirin, weke "ji nû ve welidîn/bûyîn" tête qalkirin.

Dema em tobe bikin û pişta xwe bidin jiyana me ya kevin û gunehkar em ê vegerin Îsa Mesîh. Her kesê ku bi hemî hebûna xwe vegere Xwedê, dê rojekê digel Xwedê be. Xwedê bi pêşkêşkirina jiyaneke abadîn, bi gotineke din, bi ji nû ve bûyîna me bersivê dide daxwaziyên dilê me. Pêwendiya vê pêvajoyê bi nîşanên derveyîn ve nîne, lê belê helwesta nû ya ku di jiyana nû de tête qebûlkirin, dê bi fêkiyên Ruh, yên ku têne dîtin diyar bibin: "Fêkiyê Ruh jî hezkirin, bextewarî, xweşî, sebir, mîhrîvanî, qencî, dilsozî, xûnermî û xweqontrol e" (Gal. 5:22-23).

**PDJB9:** *Hûn bi me re, mîna ku Xwedê we şandibin diaxifin. Ma mafê tevgera bi vî awayî kî dide we? (Pirseke di axaftina min ya girtîgehê de hatiye pirsîn)*

**BDB9:** Ez ji ber vê helwesta we ya pirsê mîna ku bangî qadê şer dikin pîrsîna we gellekî kêfxweş bûm. Ji ber, berpirsiyariya min ya tiştên ku dibêjim gellekî girîng e. Ger hûn li bendê bin ku Danezana Mizgîniyê ya Îsa Mesîh, ji ezmanan ji devê milyaketekî bibihîzin, hûn ê belasebep bisekinin. Xwedê xelasiyê bi navgîniya Îsa Mesîh temamkiriye, lê belê bangkirina vê rasteqîniyê emanetî mirov kiriye. Çawa ku şandiyên Îsa Mesîh, peywira bona jê re şagirtan perwerde bikin û rêyên Xudan bidin fêrkirin girtine ser xwe, ev bi daxwaza Xwedê re yekaheng e (Met. 28:19-20).

Em bi navê Xudanê erd û ezman afirandine xizmetê dikin ji ber ku, "Em kedkarên Xwedê ne…" (1Kor. 3:9). Ev peywir bona her kesên ku bi Îsa Mesîh ve bawer dibin hatiye dayîn. Rojekê em ê di rewşa hisabê de, di derbarê peywira xwe ya bangkirina Mizgîniya ku ji me re hatiye emanetkirin, dayînê de bin (Lûq. 19:11-27).

Peywirdarê herî bilind yên welatekî, li dervî welêt balyoz in. Balyoz bona nûneriya hikûmeta xwe bike bi her awayî hatiye rayedarkirin. Lawê Xwedê me jî bona belavkirina danezana Mizgîniyê bi peywira balyozî ve bilind kirine. Di Peymana Nû de ev yek bi aşkereyî tête têgihandin: Bi vî awayî, wekî Xwedê bi xwe, bi navgîniya me bangê bike, em bi navê Mesîh ve balyoziyê dikin. Em bi navê Mesîh lava dikin: Bi Xwedê re aşt bibin" (2Kor. 5:20).

Îsa Mesîh, di Lûqa 10:16'an de wisa dibêje: "Yê ku we guhdarî bike, dê min guhdarî bike; yê ku we red bike, dê min red bike. Yê ku min red bike, dê yê ku min şandiye jî red bike." Ji ber vê yekê em ne bi xwe û xwe, lê ji aliyê Xwedê ve hatin rayedar û fermî kirin.

**PDJB10:** *Gelo hûn di derbarê endazyariya genetîkê de çi difikirin?*

**BDB10:** Endazyariya genetîkê, ji rêyên nû ve tevîhevkirina genan pêkan dike. Endazyariya genetîkê, ji bo DNA ya zindiyan bi awayekî bilez û çalak guhertin û vana bona armancên diyarî bikaranînê ye.

Lêkolînên teknolojiya genê yên di roja me de, bala xwe daye pêşvebirina hicrokên girmiyan. Ev genên biyan (yên ji ajalanên pêsîrî an jî ji mirov hatine stendin) ên ku bi hicrokên girmiyan ve hatine derzîkirin di beşa tip û /an jî qadên teknîkî de (mîna derziyan an jî hormonan) dibin mîna palûkeyên berkêşîna bûjenên girîng dikin. Bi guhertina awahiya genê, berhema pêşîn ya ku hatiye berkêşandin, hormana însulînê ya bona nexweşên diyabetê gellekî girîng e yî. Di dema vê kirarê de ji bedena mirovekî tendrust ve, geneke bi awayekî asayî berkêşiya însulînê dike tête rahiştin û bi basîla E.Colî tête tevîhevkirin. Însulîna ku bi vî awayî tête peydekirin, bi însulîna di bedena mirov de têye berkêşkirin wekhev e.

Armancên demdirêj yên endazyariya genetîkê, mîna di nebatan de rûmeta tahmê zêdebikin û wan li dijî kurmik û nexweşiyan bitirûş bikin û geneke zexm bi tayikê DNA ya mirovan vekirinê, başkirina nexweşiyên mayînde, hene.

Rûmeta vê teknolojiya nû li holê ye. Lê divê em jibîr nekin ku, teknolojî diguherin (yanê bona armancên cihê jî dibe ku bêne bikaranîn); tefşoyek dibe ku him bona bi dîwêr ve kutana mîxekî him jî serîşkandina mirov bête bikaranîn.

Tu kes nikare encamên demdirêj yên teknolojiyên bi mebestên qenc ve hatine pêşvebirin texmîn bikin. Ev rewş bitaybet jî bona endazyariya genetîkê derbasdar e.

Ji têgihandina Peymana Kevin ve qenc tête zanîn ku, avakirina qûleya Babîlê bûye sedema daraziyek lihevxis-

tina zimanê mirovan. Rastiya ku hê jî kêm tête zanîn jî, Xwedê mirovan tevî tevgerên wan tenê hiştine yî: "…dê ramanên xwe pêkbînin, rastî astengiyekê jî neyên (Afr. 11:6). Xwedê destûrê dide ku mirov tiştê divê qet nên kirin jî bike.

Xwezîka mirovahî bona tevkuştinê odeyên gazê ava nekirina; xwezîka bona tunekirina bajaran bomba atomê nedîtibana, an jî ramanên mirovan dikin dîl nefikirîna.

Mirovahî hewl daye ku biçe hîvê û guhastina lebatan pêk anîne. Lê belê mirovahî dikare genan jî biguherin. Mirovek, pêwendiya wî bi Xwedê re nîne, xwe bi her alî ve serbixwe dibîne, ji ber vê yekê di kirinên xwe de tixûbekê nas nake. Kirinên kesekî wisa dê daraziyê ji wî re bîne. Lê kesê ku bi Xwedê ve bawer dibe dê rêgezên (pîvanên) Kitêba Pîroz bide ber çavan û çawa ku dikare hin tiştan bike jî, lê belê dê xwe ji ber kirina wan bide alî.

Di Afirandin 1: ayeta 28 de Xwedê bi emrê "zêde bibin", ji afirandinê ve parekê dide mirovan. Xwedê mirovan bi jin û mêrî afirandine û pêşmerca vê pêvajoyê diyar kiriye, lê belê Xwedê hê Afirker e; "Hebûna min ya hundirîn te afirand, di malzaroka diya min de te min hûnand" (Zeb. 139:13).

Leyîstina bi genan pêvajoya ku Xwedê diyar kiriye diguherîne: Genên ku tevî hêka berê girtiye tête kirin, dê derbasî nifşeyên ji par were jî bibin. Paş ve vegerandina vê destavêtinê (guhertinê) bêderfet e û gellekî xeterên wê hene. Li gor dîtina Ch.Flamig ya utopîk e armanca dawîn ya zanista genetîkê "afireke sermirovî" afirandine: "Mejiyên sereta yên mirovahiyê… dê metodên genetîk yên taybedmendiyên nû, lebatan û pergalên – biyo biafirînin, pêş ve bibin… Em yên afirên belengaz yên îrojê ne, em ê van afirên wekî xwedê ne, ku dê bibin şopînerên me, bona armanc û bextewariya xwe bikar bînin…" ([Guhertina awaya genetîk ya mirovan], cihê jibergirtin hatiye

kirin ‘Politik und Zeitgeschichte’ B3/1985, r. 3-17). Mirovê ku xwedî armancek wisa ye, dê vegere Prometheûsê ku Xwedê biçûk dibîne:

“Ez li vê rûniştime mirovên
Di wekheviya wecê min de ne çêdikim
Nîjadek mîna min e
Jan dikêşe, digirî
Zewqê distîne, bextewar dibe
Û yên mîna min te tune dihesibînin.”
(Johann Wolfgang von Goethe)

**PDJB11:** *Gelo Îsa Mesîh ji mêşên reş û kermêşan ve çi kirin? Ma wan kuştin?*

**BDB11:** Albert Schweitzer (1875–1965) bi îdyomeke wî pêk aniye, ya ‘hurmet bona jiyanê’ daye bihîstin ku – dema her tim ji aliyê mirovahiyê ve bête bikar anîn – dikarin bikevin ber zarokan jibergirtinê (kurtajê) ya ku li ser dinê, di salê de hejmara wê digihêje 80 milyonî. Schweitzer hê jî pêş de çûye û pûte daye ku di daristana bejî de tenê kêzikekê jî nekuştiye. Di Hîndûîzmê de li gor vê rêgezê (ahîmsa) ajal nayên kuştin. Di vê olê de wisa bawer dikin ku, mirov piştî mirina xwe dê di laşê ajalekê de dîsa biveje. Wekî encama vêya be li Hindîstanê ji mirovan heyşt carî zêdetir mişk dijîn. Qandî xesara ku van mişkan didin, xwarina ku dixwin jî, pirsgirêkek mezin e.

Emirê Kitêba Pîroz; “Tuyê mêr nekuje” (Der. 20:13), tenê bona nekuştina mirovan derbasdar e. Ev emir bona ajalan nayê bikaranîn, ji ber ku ew, bona ji mirovan re bibin xwarin hatine dayîn (Afr. 9:3).

Emrê di mijara nekuştinê ya Îsa Mesîh di Waaza xwe ya li Çiyê dabû de, weke alema ajalan jî bigire nava xwe nayê firehtirkirin. Pirsa li jorê dixwaze ku Îsa Mesîh jî têxe

tevgerên mîna hîndûîzm an jî Albert Schweitzer û Francisê Assisi yê ku bona kêzikekê eciqandiye xwe biceza dike. Xwedê di Kitêba Pîroz de daxuyan dike ku ka em ê bi ajalan re di nava tevgerek çawa de bin. Di Afirandinê de tête xuyakirin ku her tişt "gellek qenc" in (Afr. 1:31). Di destpêkê de mirin û nexweşî, kêzikên bizerar û ajalên bixeter tunebûn. Piştî Ketinê alema ajalan jî ji kûraniyê ve di bin bandorê de man û ev bandor di her ajalî de xwe bi awayekî cuda nîşan da. Mînak, ajalan mîna qirêj û paqij dabeşandin (Afr. 7:2). Ev dabeşandin pêş ve hate birin û ajalan mîna bixeter û hêjayî cuda kirin. Di derbarê parastina ajalên hêjayî de di 10 Emir de tête qalkirin (Der. 20:10,17). Di Jinûvelêkirina Zagonê 25: ayeta 4 de jî Xwedê mafê xwarinê dide gayê ku bênderê gêr dike.

Hinek ajalên di destpêkê de bona mirovan qenc bûn, paşê bûn mîna asîwekî. Di Kitêba Pîroz de di vê peywendiyê de bi taybet jî qala kuliyan, kêzikan, guran û beqan têne kirin. Dema mîna keriyekê bêne nîmandina daraziya Xwedê dikin. (Der. 10:12; Zeb. 78:45-46, 105:30-34; Yow. 2:25; Amo. 4:9). Bi heman awayî, mahr û dûpişk jî afirên bi xeter yên Xwedê mirovan li dijî wan diparêzin (Hej. 21:8-9; Lûq. 10:19) an jî, bona darazkirinê bi kartînin (Hej. 21:6; 1Qir. 12:11) in.

Sedema gellek nexweşiyan mîkroorganîzma ne (dirmiyan, vîrûsan, mişexuran). Ger em wesfa, vê dinya ketî bi awayekî dûrî rastî nirxandinê li Îsa Mesîh bar bikin, dibe ku em portreyek Wî ya hatiye çewtkirin xêzbikin. Ew bi rayedariyê daraziyê li hêzên mîna şepêlan û ba (Met. 8:27); mirin û nexweşiyan (Met. 8:3; Yû. 11:43-44); cinan û ruhên xerab (Lûq. 11:14) ên tunekir re dike. Îsa Mesîh him wekî Lawê Xwedê, him jî wekî mirov hate rûyê erdê. Wî, "derûniya qûl" û "wekheviya mirov" girt (Flp. 2:7-8). Yanê, Ew jî mîna mirovên din rastî kermêşan, mêşên keran û zerardarên mîna wan hat. Di derbarê pirsa ku hatiye pirsîn de, ka

Wî çi kiriye, di Kitêba Pîroz de nehatiye daxuyankirin. Lê belê di ronahiya zanînên li jorê ne de, em dikarin bibêjin ku Wî jî van zerardaran qewirandine û/an jî kuştine.

# 7. Pirsên Di Derbarê Buhuştê de Pirsên ku Her tim Miraq Dikin Lê Tu Carî Hewl Nedane ku Bipirsin

Piştî axaftineke li Mainz a Germenîstanê kirim, xwendekareke qîz bi awayekî bibiryar nêzîkî min bû û vê pirsê pirsî: "We piçekî berê qala demê û jiyana piştî mirinê kirin. Gelo bêkêmasî abadinî çiye?" Ji xanimeke ew qas ciwan û cazib bihîstina vê pirsê min gellekî şaş kiribû. Jîndar bû, ma çima mîna yên din vê pirsê paşê nedipirsî?

Min bi vî awayî bersivê da wê: "Ez dixwazim fêr bibim, gelo ev pirsa bona we çima ev qasî girîng e?" Bi vî awayî min bersivand: "Beriya demekê di min de, teşhîsa nexweşiya dil ya irsî kirin. Li gor gotina nûjdaran tenê bi çend salî emrê min maye. Ji ber vê yekê divê ez hîn bibim; **abadînî çiye?**"

Nişkav de hay jê çêbûm ku ev pirs ne bîrdozî an jî xwedênasî ye, lê bitûmî heyînî ye. Biryardarî û rastbêjiya jinika ciwan ya bersiva vê pirsê digere, ji kûr ve bandorê li ser min danî. Hê min dest bi bersiva xwe nekiribû, wê tiştên ku dixwaze ji min bibihîze daxuyan kirin.

Ji min re wisa got: "Ez dikarim dojehê xeyal bikim. Min pirtûkê Sartre xwendin. Di pirtûkek xwe de şayesandina dojehê di bîr ve tîne dike: Mirovan di menzelekê de nifte kirine, lê belê ji axaftina hevûdin ve fam nakin. Nikarin derkevin derveyî menzelê jî. Tu carî. A vay, dojeh ev e. Ez dikarim vêya xeyal bikim. Lê belê buhuşt cihekî çawa ye? Ya ku dixwazim bizanibim ev e. Ji kerema xwe re ji min re nebêjin cihekî ez ê her tim lê murxên "Halelûya" bibêjim an jî hemdê ji Xudan re bikim e. Ez nikarim heta abadîniyê murxan gotina xwe xeyal jî bikim. Daxwaziyek min ya heta abadîniyê ji Xudan re hemdkirin jî nîne. Lê belê haya

min jê heye ku, abadînî armanca jiyana me ye. Divê ew tiştekî wisa be ku ez bi daxwazek mezin li benda çêbûna vêya (yanê abadîniyê) bim!"

Di bersiva ku dam wê de hewl dam ku buhuştê mîna cihekî hezkirin û bextewariyê tijî ye terîf bikim. Hema gotina min qut kir, "Ev bo min ne bersiveke têra xwe misoger e. Ma li cihê ku tenê bextewarî hebe ez ê çawa bextewar bibim? Mirovek hew bi jiyîna hêrs û keserê ya li dijî wê ye bijî, dikare bextewar bibe, kêfxweş bibe."

Ev helwesta jina ciwan bû sedema pirsê hê bi kûrahî lêkolîna min û bitûmî li gora Kitêba Pîroz bersivdayîna min. Ez wê hevdîtina di nava me de qet jibîr nakim, ji ber bû sedem ku ez berê axaftina xwe ber ve mijara buhuştê ve bibim. Piştî her axaftina min hê jî zêdetirê guhdarîvanan, di derbarê jiyana piştî mirinê pirsên wisa diyarker bipirsiyana dê çi qas xweş bibûya!

Jinika ciwan piştî hevdîtina me ji min re wisa got: "Ma gelo di derbarê abadîniyê de çima ev qasî kêm waaz têne dayîn, an jî nivîs têne nivîsandin? Ma çima pirraniya waazan li ser jiyana îroyîn in? Mirov ji mijareke pirr girîng e dûr têne hiştin."

Jinika ciwan birastî jî mafdar bû. Piştî wê hevdîtina me ya Mainzê, di encamê de min beşeke di derbarê jiyana piştî mirinê ya bi kitekit de bi pêy vê pirtûkê vekir.

Jinika ciwan him bi buhuştê, him jî bi dojehê ve têkildar bû. Em ê jî, mîna Îsa Mesîh bi gellek caran û bicoşî waaz dabû, her du beşan pev re bigrin dest.

## Ya Dojeh?

Di dema Şerê Wîetnamê de, ji peywirdarên olê yên li eniyê ne yek, diçe cem leşkerek li ber mirinê ye. Leşker dizane ku di demekî kurt de bimire û bi abadîniyê ve rû be rû bibe, lê pirseke ruhê wî diqemirîne hebû: "Gelo dojeh heye?" Bersiva peywirdarê olê gellekî bi aşkereyî ye: "Na". Ber-

siva leşker jî bi hemî aşkeriyê yî: “Ger dojeh tunebe, wê gavê li vê qet pêdiviya me li we nîne. Vegerin welatê xwe! Lê belê ger bi rastî jî dojehek hebe, wê gavê we hemî kesên ku hûn bi wan re axifîbûn xapandin. Hûn li vê ji me re derewan dibêjin!”

Îsa Mesîh bi aşkereyî qala hebûna dojehê dike. Armanca Wî ne tirsandina me, lê hişyarkirina me û di ser de vexwendina cihê din yê di heman rasteqîniyê de, buhuştê yî.

Îsa Mesîh di Waaza xwe ya li Çiyê de me wisa hişyar dike: “Ger çavê te yê rastê te bixe gunehê, wê derxîne, bavêje. Ji ber ku tunebûna endamekî bedena te, ji avêtina hemiya laşê te ya dojehê qenctir e. Ger destê teyê rastê te bixe gunehê wê jêke û bavêje. Ji ber, tunebûna endamekî bedena te, ji avêtina hemiya laşê te ya dojehê qenctir e.” (Met. 5:29-30).

Em ji beşa Meta ya Peymana Nû ve jêgirtineke din bikin: “Ji yên ku bedenê dikujin, lê bona kuştina can hêza wan qîm nakin metirsin. Ji Xwedayê ku qandî him can û him bedenê di dojehê de mehv bike xurt e bitirsin” (Met. 10:28). Ma yê ku mirovan bişîne dojehê kî ye? Di nêrîna derba pêşîn de wisa xuya bibe jî yê ku vêya dike tu carî ne îblis e. Îblis bi xwe jî darazbûye û dê bête bicezakirin (Pey. 12:10 û 20:10). Dê Daraziya Dawîn bête kirin û Xwedê Îsa Mesîh mina dadger pîşandiye. Mîna ku me di Meta 25: ayeta 41’a de xwendine: “[Îsa Mesîh] paşê dê ji yê ku li çepê xwe re ne wisa bibêje: ‘Ya naletîno, ji ber min vekişin! Ji agirê natefe yê bona îblis û milyaketên wî hatiye amadekirin ve bêne birêkirin!’”

Gelo îkazên di derbarê dojehê de ne, bona kê hatine kirin? Bangî kê dikin? Min her tim digot qey ev bona yên baweriyê neanîne, diz û sûcdaran ve tête gotin. Lê belê Îsa Mesîh di her axaftina xwe de hişyarkirinên di derbarê dojehê de bo bawermendan dike. Tenê carekê bang li Fêrisiyan dike û gellekî bi tundî diaxife. Ji ber ku Fêrisiyan ras-

tiya xwe bi ser her tiştî ve digirin. Îsa Mesîh wan îkaz nake jî, ji ber ku vebir e encama wan dojeh e: “Wey li halê we ya alimên olê û Fêrisiyan, durûno! Hûn deriyê Serweriya Ezmanan li wecê mirovan ve digirin; ne hûn dikevin hundir, ne jî yên ku dixwazin bikevinê berdidin!” (Meta 23:13-14).

Dawid Pawsonê nivîskarekî Brîtanî ye, lîsteya tiştên ku li gora Kitêba Pîroz dibe dojehê çêkiriye. Di nava 120 bûjenê ku di vê lîstê de cih digirin de, komên mirovên li jêrê ne jî cih digirin:

- Yên zinê dikin
- Yên homoseksûel
- Zebûnên kêfdariyê
- Yên derewçîn
- Yên çikûs
- Yên pozbilind in
- Yên ku bi astrolojiyê (remla stêrkan) bawer dibin
- Yên tirsonek
- Yên teral
- …

Di Peymana Nû de di wekhevoka di derbarê talantan de wisa tête nivîsandin: “Paşê yê ku talantekî rahiştiye hatiye, ‘Efendî’ gotiye, ‘min dizanîbû tu zilamekî tund e. Tu ji cihê ku te neçandiye diçîne, ji cihê ku bênderê berba nekiriye berhev dike. Ji ber vê yekê tirsiyam, çûm, talantê ku te daye binax kirim. A vay, perê xwe rahêje!’” (Met. 25:24-25). Efendiyê wî vê bersivê daye wî: “Dîlê xerab û teral! Te dizanîbû ji cihê ku neçandime diçînim, ji cihê ku bênderê berba nekirime berhev dikim ha?” (Met. 25:26). Di dawiya nivîsê de cezaya redkirinê tê: “Vî dîlê bêkêr bavêjin derve, tariyê. Dê li wê girî û qirçîniya diranan hebin” (Met. 25:30). Kitêba Pîroz, vî cihê tarî wekî dojehê pênav dike. Ev dîla ne xwedênenas e ne jî bi awayekî serxwe xerab e. Ew Îsa Mesîh dinase û dizane. Ji ber vê yekê ji Wî

re bi gotina “Efendiyê min” xîtab dike. Tevî hemiyên vana winda dibe. Gelo ji ber çi? Ji ber ku teraliyê kiriye!

Îsa Mesîh di Waaza xwe ya li Çiyê de, di derbarê yên ku her tim gotina navê Wî kirine hînbûnekê dê bilindahiya Xwedê nebînin de îkazeke girîng dike: “Her kesê ku bi gotina ‘Xudan! Xudan!’ bangî min dikin dê nekevin Serweriya Ezmanan. Hew yê ku daxwaza Bavê min yê li ezmanan e bîne cih dê bikevê” (Met. 7:21).

Wekhevoka Deh Qîzî jî di derbarê dilsoziyê de yî. Lê belê ji van qîzan pêncî dibînin ku derî girtiye (Met. 25:10). Çima? Ji ber ku teşeya jiyana wan ji Emirên Xwedê zêdetir li gor kevneşopên wê rojê ne û Îsa Mesîh ne di navenda jiyana wan de bû. Ji ber vê yekê rastî van gotinên Îsa Mesîh yên ku qet ne li bendê bûn tên: “Ez ya rast ji we re bibêjim, ez we nasnakim” (Met. 25:12).

Di roja sêyem ya meha pûşbera 1988’an de qedaya trênê ya di dîroka Germenîstanê de herî tirsehêz e pêk hat. Tekereka trêna lezgîn dişikê, vagon ji rayan derdikevin ev jî dibe sedem ku trên li navçeya Eschede ya nêzîkî Hannoverê li pireke ji betonê ye diqewime. Di vê qedayê de 100 kes jiyana xwe ji dest dan. Di 21’ê pûşberê de bona bîranîna yên mirine merasîmeke hate çêkirin. Tevî merivên yên mirine serokwezîr û serokdewletê Germenîstanê jî tevlî merasîmê bûn. Helbet di rewşeke wisa de divê bona merivên miriyan axaftinên xemrevînî bihatina kirin. Lê belê divê dîsa jî ev axaftin rastîbûnî bin. Hemî zilamên olê yên protestan û katolîk ên ku di merasîmê de waaz dayîne wisa qal kirin ku dê hemiyên mirine biçin buhuştê. Ev ne rastî ye. Em nizanin çend hebê mirine Xudan Îsa Mesîh birastî nasdikin an jî nakin. Ev rêje bi dibêtiyek mezin qandî sediya taxa me an jî karxaneyên me ne. Hejmara yên ku Xudan Îsa Mesîh birastî jî girtine navenda jiyanên xwe sed heyf û mixabîn gellekî kêm e. Li gor Kitêba Pîroz tenê ew ê ji buhuştê re bêne qebûlkirin (Yû. 3:3).

Îsa Mesîh bona qedayek di dema xwe de, bona mirovên di bin qûleya Şîloha (Lûq. 13:4) ya ku bi ser wan ve têkçûye de wisa qal dike: “Lê belê ger hûn tobe nekin, hûn ê gişt wisa mehv bibin” (Lûq. 13:5). Xudan vê bûyerê ne ku bona yên mirine pîroz bikin, lê bona hînî yên ku dijîn bikin bikar tîne.

Waizek wisa dinivîse: “Mirovan di raborînê de ji dojehê bi xwe ditirsiyan. Di roja me de jî ji derbarê dojehê axaftinê de ditirsin.” Kesek ji xelasiyê, tenê tiştekî jê xelas bibe hebe qal dike. Ji ber ku dojeh heye, pêdiviya me bi Xelaskerek ve heye. Ev Xelasker jî Xudan Îsa ye: “Xwedê Lawê xwe bona darazkirinê neşand dinê, bona ku dinya bi navgîniya Wî xelas bibe şand” (Yû. 3:17). Îsa Mesîh deriyê buhuştê yî: “Derî ez im. Ger kesek bi navgîniya min bikeve hundir, dê xelas bibe” (Yû. 10:9).

**Gelo em di derbarê buhuştê de çi dizanin?**

Jêgirtina ji jêrê aidî helbestvanê Germen Heinrich Heine ê ku di navbera salên 1797–1856’an de jiyaye yî: Em ê buhuştê ji milyaket û tîvilan re bihêlin” (ji helbesta Wintermärchen). Ez hêvîdar im ku helbestvan paşê ramanên xwe yên di derbarê wê risteya de ne guhertibin, an jî dema li wî cihê tarî de, heta abadîniyê tenêbûna xwe didomîne de ji van nivîsên xwe ve poşman bûye be.

Ma gelo heçî tiştên ku dê di derbarê buhuştê de bêne gotin tenê ev in?

Baş e, lê gelo di derbarê buhuştê de em bi çi dizanin?

Dema em piçekî dakevin kûrahiya wê, dê bête famkirin ku hemiyên van gotinan nikarin têra xwe şayesandina buhuştê bikin. Xwedê di derbarê buhuştê de hinek tiştên diyar in ji me re daxuyan kirine. Bingeha van zanîna jî Kitêba Pîroz e; tiştên li derveyî wê têne axaftin û nivîsandin berhemên hêza xeyala mirov û ji gotegotê ve pêk tên. Di Kitêba Pîroz de, di derbarê vê armanca ku bona miro-

van hatiye dayîn gellekî pirr tête qalkirin. Her ku Kelama Xwedê bête xwendin û famkirin, gellek taybetiyên din ên buhuştê dê hê jî diyar bibin. Di vê xebata me de em ê ji jiyana xwe ya dinyewî ve mînaka bidin û mijarê hê jî berfirehî bigirin dest.

Her çi qas derfeta me ya ceribandina, gelo ka Kitêba Pîroz di mijarên dinyewî de rastiyê dibêje an nabêje, hebe jî, divê em tiştên ku di derbarê buhuştê de dibêjin rast qebûl bikin. Îsa Mesîh ji ber vê yekê bi vî awayî bangî me dike: "Dema ez tiştên di derbarê rûyêerdê de ne ji we re bibêjim, hûn bawer nekin, gava di derbarê ezman de bibêjim hûn ê çawa qebûl bikin?" (Yû. 3:12).

Têgihîştina daxwaza bi me re parkirina buhuştê ya Xwedayê abadîn û hêza Wî têra her tiştî dike, gellekî zor û zehmet e. Ew, xizmetkarên xwe dişîne û vexwendinê li hemî neteweyan dikin: "Efendiyê wî ji dîl re, 'Derkeve, rêyan û dora çîtan bigere, yê ku te dît, bona ku werin zorê bide wan ku bila mala min tijî bibe!' gotiye" (Lûq. 14:23).

Bona ku em vê fersenda bêhempa ji dest nerevînin, rêya ku diçe buhuştê bi awayekî gellekî aşkere ji me re hatiye terîfkirin. Îsa Mesîh di Yûhena 14:6 de wisa têdighîne: "'Rê, rastî û jiyan Ez im… Bêyî navgîniya min tu kes nikare were digel Bav.'" Dê ev waad di buhuştê de biçe serî. Tenê mirovên ku Îsa Mesîh wan xelaskirine dê bikaribin bikevin wê (Yû. 3:36; 1Yû. 5:13).

Li jêrê xwezaya buhuştê hê jî bi kitekit tête vekolandin:

**B1:** *Buhuşt cihê ku heta abadîniyê em ê li bextewar bibin e*

Hizirmendê Fransewî Jean Jacques Rousseau (1712–1778), bi gotinên "Bextewarî xwedîbûna hisabekî bankê ya têrî tijî û dehaneke gellekî qenc dixebite yî", negihaştiye wateya rasteqîn ya bextewariyê.

Voltaire (1694–1778) jî bi gotina, “Ka bextewariya bêkêmasî çiye, nayê zanîn; ev hest bona mirovahiyê nehatiye afirandin” dinivîse. Ev hizirmend jî xelet e. Îsa Mesîh dikare me bi rastî jî bextewar bike. Gotinên Îsa Mesîh yên di derbarê bextewarbûn an jî pîrozbûnê de, ji têgîna “bextewarî” ya ku di roja me de tête famkirin, di wateyên hê jî kûrtir de ne. Di vê têgîna de hêmana abadînî gellekî girîng e. Îsa Mesîh dizanîbû ku peywira Wî ya bingehîn xelasiya mirovan e (Met. 18:11). Yên hatine xelaskirin bextewar in, ji ber ku fersenda ketina Serweriya Xwedê bi dest ve xistine.

Ev bextewariya bilind li rûyê erdê destpêdike û di buhuştê de rayedar (temam) dibe: Ji ber vê yekê, qandî ku yên bi navgîniya Wî nêzîkî Xwedê dibin xelas bike xurt e. Ji ber ku bona navbeykariyê ji wan re bike tim dijî” (Îbr. 7:25). Tenê yên ku xelasbûne dê zanibin bextewarî û kêfxweşiya rasteqîn çiye.

Buhuşt cihê guneh lê nîne ye. Bextewarî li wê nûwaze û abadîn e. Qirêjiyên dinyewî qet nikare jiyana li wê ye qirêj bikin. Gellek mirov, dibe ku li vê dinê hewcedar bin ku jan û êşên nayên gotinê bikêşînin. Pirtûkxaneyan, bi pirtûkên jan û bûyerên tirsehêz yên mirovan jiya ne têdighînin û lêpirsînê li destûra ku Xwedayê Hêza Wî Têra Her Tiştî ye û bi hezkirinê ve tijî ye daye vê jankêşiya wan ve tijî ne.

Mirovahî ji tofana Nûh heta roja me ji bêtarên biçûk û mezin nehatine bexşbar girtin. Di roja yekem ya sala 1755 de erdhejînek li Portekîzê pek hat, bajarê Lizbonê bi serûbinî kir. Şêst hezar kes jiyana xwe ji dest dan. Ew bêtar ne li gor ramana dinê ya gellekên mirovên wê demê bûn. Geothe yê nivîskareke Germen e gellekî di bin bandora vê bûyerê de ma û di nivîseke xwe de bi vî awayî nirxand: “Xwedayê Afirker û Parêzkerê Erd û Ezman e, bicezakirina digel yê nerast, yê rast jî, mîna bavekî tev negeriyaye.”

Jan û tengasiyên bitoqîn bi têgihîştînê naqedin. Zêdebûna hejmara qurbanan – şeş hezar an jî şêst hezar – bo me zêde ne girîng e. Tenê mirina kesekî jî me ber ve vê pirsê dibin: "Xwedê çawa destûrê da vê yekê?".

Di jiyana piştî mirinê de dê şopa hemî êş û tengasiyan ji holê bêne rakirin. Tu tiştê ku êş û jan û kerihîn û şer û mirinê bînin bîra me dê tunebin. "Dê ji çavên wan hemî hêstiran paqij bikin. Êdî dê mirin nebe. Êdî ne şîn, ne girî ne jî jana dil dê hebin. Ji ber ku pergala berê ji holê rabûye" (Pey. 21:4).

Wê gavê dê bedenên me ji hemî nexweşiyan û lawaziyan xelas bibin; êdî dê pêdivî nebe ku bi mîkroban, vîrûsan û nexweşiyan ve şer bikin. Dê cihên mîna nexweşxane an jî girtîgeh jî nebin. Êdî dê pêdivî li nûjdaran, parêzdaran, polêsan, qerdiyanan û kolînerên gorê re nemîne. Dema em di buhuştê de bin, dê tu kes nexwaze ku şunda vegere dinê. Dê bar û hizrên me li wê, heta abadîniyê biqedin.

Frederickê Mezin yê Qiralê Prûsyayê (1712–1786), navê "sansoûssî" (cihê hizr lê nîne) dabû qesra xwe ya li bajarê Potsdamê ya ku nêzîkî Berlinê yî, lê belê di hemiya jiyana xwe de bûbû hêsîrê hizran. "Sansoûssî" tenê dibe ku birastî terîfkirina buhuştê be.

Buhuşt, cihê yekane yê tê de şer, pevçûn, kerihîn, dilsoznemayîn û dilşkestin nîne ne.

**B2:** *Buhuşt cihê ku hestên me jê zewqê bigirin e*

Em, mirov, bona tiştekî xweşik temaşe bikin an jî bibihîzin, dikarin pereyên pirr xerc bikin.

- Mînak, bona beşdarbûna vekirina lîstikê Olîmpiyatê pereyên pirr têne dayîn. Bilêtên Olîmpiyata Havînê ya di 1996'an de li Atlantayê, ger em yên di bin des-

tan de bi buhayî hatine firotan nehesibînin, bi ser 1000 Dolarî ve dihatin firotan.

- Yên ku dixwazin tiştên taybet bibihîzin jî, bilêtên konserên orkestrayên şefên navdar derhênaniyê lê dikin distînin. Konsertên vekirinê yên ku gellekî têne xwestin in.
- Bona dildayên fûtbol an jî tenîsê jî lîstikên Wîmbeldon û Superbowlê fersendên taybet ên ku nayên revandin in.

Niha her xweşikiya ku bona me cazib e, dema bi rewnaqiya buhuştê ve bêne hevberîkirin, tune têne hesibandin. Di Kitêba Pîroz de zanyariya Xwedê û buhuşt wisa tête şayesandin: “Tiştên ku Xwedê bona hezkirên xwe amade kirine qet tu çav nedîtine, qet tu guh nebihîstine, dilê qet tu mirovê ne têgihîştiye” (1Kor. 2:9).

Li buhuştê ne tenê çav û guhên me, dê hemî sehekiyên me diltêr bibin. Sehekiya tamgirtinê jî tevlî vêya ye. Bi rastî dora vêya gellekî berfireh e; her tiştê ku me bextewar dikin – hezkirin, xweşî, şabûn, hevaltî û qencî – dê li buhuştê hebin.

**B3:** *Buhuşt cihê ku pîroziya abadîn lê tê kirin e*

Ma gelo em bona pîrozbahiyekê çawa xwe amade dikin? Merasîmê xelata Oskarê di meha adarê de ya her salê li Los Angelesê têtê lidarxistin. Merasîmên 1998’ê di roja 23’yê adarê de bi şeveke galayê ya bi beşdariya lîstikvanên navdar, çêkirên fîlman û sponsoran ve destpê kir. Di kovarekê de kelecana Oskarê bi vî awayî têtê têgihandin:

“Tiştên ku divê beriya Oskarê bêne kirin:
Beriya sê mehê ji kûafur ve jivanê bigire
Beriya mehekê biçe navenda xweşikayiyê
Beriya deh rojî pore xwe kur bike

Beriya rojekê biçe solaryûmê

Roja Xelata Oskarê:

Sibehê: werzîşê bike, serê xwe bişo, porê xwe bişo, xwarinên sivik bixwe

Nîvroj: Li benda sêwirînerê porê be

Piştî nîvrojê: Li hêviya pisporê makyajê bisekine

Saet tam di 4'an de: divê mêvan li hêwanê amade bin

Paşê derî têne girtin. Êdî zar hatine avêtin. "Û yê ku xelata Oskarê qezenc kiriye…"

Mîna ku di vê mînakê de xuya dibe, amadekariyên vê merasîma ku dê 3-4 saet bidome hewldanên mezin dixwazin. Pirraniya vê tahbê bona xweşkbûnê tête dayin. Lê belê hemî xweşikayiyên li vê dinê ne di nava demê de xera dibin û winda dibin. Her ku temen pêş ve diçe, hewldanên bi metodên nexweza ne, navberê girtin jî zêdetir dibin. Dê di buhuştê de bona tu yên vana pêdivî nemînin. Li wê em ê gişt nûwaze bibin. Birastî li wê em ê gişt birewnaq bin. Rewnaqî jî qatê herî bilind yê nûwazebûnê yî.

Di Peymana Kevin de Îsa Mesîh bi vî awayî tête têgihandin: "XUDAN serweriyê diajo, bi rewnaqiyê ve hatiye nixumîn, şiyanê li xwe kiriye û xemilandiye…" (Zeb. 93:1). Ew "Xudanê Bilind Îsa ye" (Aqû. 2:1). Ew ê di hatina xwe ya duyemîn de bi hemî hêz û rewnaqiya xwe ve xuyabibe (Met. 24:30). Di Yûhena 17: ayeta 22'an de Îsa Mesîh bi vî awayî bangî Bavê Xwe dike: "Bilindahiya ku te daye min dame wan."

Pirsgirêkek Xwedê heye. Ma ka dê çawa pêk bîne ku em mirovan rewnaqî û kêfxweşiya buhuştê fam bikin? Mîna Îsa Mesîh di wekokekê de daxuyan kiriye: "Serweriya Ezmanan, mîna qiraleke dawetê ji lawê xwe re amade dike yî" (Met. 22:2). Şahiyên dawetê pîrozkirinên herî nûwaze yên li rûyêerdê ne. Her tişt bi kitekitan têne amadekirin:

- Mêvan têne vexwendin

- Xwarin û vexwarinên herî xweşik têne amadekirin
- Di wê roja taybet de qala pirsgirêkan nayên kirin
- Bûk ji her wextî xweşiktir xuya dibe û kincê di jiyana xwe de herî nûwaze û birûmet e li xwe dike
- Her kes demeke gellekî qenc diborînin

Îsa Mesîh wekokekê tête zanîn bikar tîne û ji me re mîna pîrozbahiyek nûwaze terîf dike. Di xwarina dawîn de Îsa Mesîh bi vî awayî bangî şagirtên xwe dike: “Ez vê yekê ji we re bibêjim. Heta wê roja ku di Serweriya Bavê xwe de ez bi we re ya teze vexwim, ez ê carekî din ji vî berê mêwê venexwim” (Met. 26:29).

Xemra ku em li wê vexwin dê ne mîna yên ku em li rûyêerdê vedixwinin be. Ez bawer im ku em ê di buhuştê de xwarinê jî bixwin. Ya na divê em Lûqa, ayeta 12:37’an çawa şîrove bikin? “…Ez ya rast ji we re bibêjim, dê efendiyê wan (Îsa Mesîh) piştika xwe bi pişta xwe ve girê bide, dîlên xwe li dora sifrê bide rûniştin û were û ji wan re xizmetê bike.” Em dikarin wisa bihesibînin ku dê esehî ev sifra gellekî dewlemend be. Têgînên dinyewî yên mîna “birûmet” û “bêhempa”, bona daxuyankirina tiştên ku em ê li buhuştê li wan bibin xwedî dê qîm nekin. Lê belê aşkere ye ku dê buhuşt mîna şahînetek bicoş be.

Niha jî dor tê surprîzekê: Buhuşt ne tenê mîna şahiyekê yî, birastî jî cihê şahiya dawetekê lê tê kirinê ye jî. Di Peyxamgirtin 19: ayeta 7’an de wisa dinivîse: “Em kêfxweş bibin û bicoşin! Wî bilindtir bikin! Ji ber ku daweta Berxê destpê dike. Bûka Wî amade bû.” Îsa Mesîh bi xwe zava, em yên ku bi navgîniya Wî xelasbûne jî bûk in. Yên ku bona vê dawetê hatine vexwendîkirin divê xwe bextewar bihesibînin. Di wekhevoka Lawê Windabûyî de wisa dinivîse: “…Bi vî awayî dest bi kêfê kirine” (Lûq. 15:24). Dê kêfxweşiya me ya li buhuştê ê dawî be; ji niha ve ne pêkan e ku em dereca vê bextewariyê texmîn bikin.

Îsa Mesîh di Waaza xwe ya li Çiyê de, di derbarê Afirandina berhema xwe de ye wisa têdighîne: “Ma çima hûn bona kincan xemgîn dibin? Hela binêrin sosinên çolterê çawa mezin dibin! Ne dixebitin ne jî ta dirêsin. Lê belê ez vê yekê ji we re bibêjim, tevî hemî rewnaqiya xwe Silêman jî mîna vana li xwe nekiribû” (Met. 6:28-29).

Afrandin, hezkirina xweşikiyê ya Xudan Xwedayê Afirkirê her tiştî nîşan dide; qet tu mirov nikarin vê xweşikyê lasayî bikin. Xwedê çavkaniya her tiştê xweşik û nûwaze ye.

Xwedê piştî gellekî tengasiyan Eyûb berdar dike: “XUDAN encama Eyûb ji destpêka wî ve bi bereket danî. Bu xwediyê çardeh hezar mîhî, şeş hezar deveyî, hezar cot gayî, hezar kerî. Heft lawê wî, sê qîzên wî bûn. Navê Yemîma (qûmriya biçûk) da qîza xwe ya pêşîn, Kesîa (darçîn) da ya duyem, Keren – Happûk (qaba giranbiha) jî li ya sêyemîn kir” (Eyûb 42:13-15). Bi vê yekê xweşikiya qîzên Eyûb têne nîşandayîn. Di roja me de bijiyana dê qethiyen Pêşbaziya Xweşikiyê ya Dinê qezenc bikirana.

Di Zebûra 45’an de ji Afirker bi xwe yanê ji Îsa Mesîh ve tête qalkirin: “Tu herî xweşikê mirovan î, xêr weşiyaye lêvên te. Ji ber ku Xwedê te heta abadîniyê pîroz kiriye ” (Zeb. 45:2).

Dema Ew, ji ber gunehên mirovan li ser xaçê tête qurbankirin jî, dev ji hemî xweşikayiyên xwe berdide. Di Îşaya 53:2’an de wisa dinivîse: “…Ji awayekî nêrînê, ji xweşikayiyê bêpar bû. Dîmeneke Wî ya dilê me bikêşe jî tunebû.”

Îsa Mesîh her tim bi rengdêrên bêqisûr û nûwaze ve tête şayesandin. Di Îşaya 33: ayeta 17’an de wisa dinivîse: “Tuyê Qiral bi hemî xweşikiya Wî bibînî…” Murxa Germenî ya gellekî tê nasîn “Herî Xweşik Xudan Îsa” vî aliyê Xudan pêş de dide:

Serwerê xwezayê herî xweşik Xudan Îsa,
Tu, yê ku Lawê Xwedê û mirov î
Ji te hezdikim
Pesnê te didim
Tu şabûn, rewnaqî û taca ruhê min î.

Mêrgên bi çîçegên biharê xemilîne xweşik in
Daristanan hê jî xweşik in
Îsa ji hemiyan xweşiktirî
Îsa ji hemiyan xweşiktir
Ew dilên biderd dicoşînî.

Roniya rojê xweşik e: roniya heyve û
Stêrkên çavdişekînin hê jî xweşik in
Roniya Îsa hê jî dibiriqe
Roniya Îsa hê jî paktir e
Ji hemî milyaketên li buhuştê ne.

Xelaskerê Nûwaze! Xudanê Neteweyan!
Lawê Xwedê; Lawê Mirov!
Rewnaqî û bilindahî,
Hemd û pesnahî,
Bila heta abadîniyê yên te bin.
(“Schönster Herr Jesus” 1677)

Ger hezkirina Xwedê ya bona hezkirinê di hebek berfê ya pariyek ji Afirandina Wî ye de, di sosinekê de, di orkîdê de û di gonceyên çîçegan yên di gellekî rengdar in de, an jî di pirtikên civîkan yên bi rengên nûwaze xemilîne de bi aşkereyî xuya dibe, divê taybetmendiyek girîng ya buhuştê jî xweşikî be!

Gellek mirov li vê dinê li xweşikiyê digerin. Birînsazên bedewkariyê, di roja me de gellekî rewacdar in. Beşek endustriyê ya bona alîkariyê li bedewbûnê dikin û/

an jî wê diparêzin gellek berheman çêdikin hene. Tevî vêya Qiralîçeyên Xweşikiyê yên Dinê jî rojekê dibînin ku xweşikiyên wan tune dibin. Li vê dinê her tişt derbasdar in (Rom. 8:20).

Împaratorîça Awustûryayê Elîzabeth, bi navê xwe yê din Sîssî (1837–1898), di sedsala 19'an de wekî jinika herî xweşika Ewropa nav û deng dabû. Ew qasî xwe dieciband ku, ji 13 saliya xwe pê ve destûr neda ku ne dîmenê wê bête kêşandin û ne jî wêneya wê bête çêkirin.

Nivîskara Germen Annelie Fried wisa têdighîne: "Jinên ku di telewizyonan de stêrk in, di çel saliya xwe de dev ji karên xwe berdidin. Ger hê jî zêde bixebitin, dê temaşevan ji menzelên xwe yên rûniştinê ve dest bi jimartina qermîçekên wan bikin."

Lê buhuşt jî li dijî dinê cihê ku xweşikî lê serweriyê dajo ye. Her kesê ku biçe wê, dê heta abadîniyê xweşik bimîne. Em dizanin ku dema em bibin mîna Îsa Mesîh (1Yû. 3:2), em ê xweşikiya Wî jî bigirin. Mîna ku em têdigihêjin têgîna "ciwaniya abadîn" ya dinyewî, bona ku vê nûwazebûna ezmanî terîf bike, qîm nake.

### **B5:** *Buhuşt cihê ku jiyanên me lê diltêr bibin e*

Pirraniya gelheya dinê di bin sînorê birçîbûnê de dijîn. Her roj çel hezar zarok ji ber xwarina kêm dimirin. Hinekan jî dewlemend in; dikarin bibin xwediyê hemî dewlemendiyên dinyewî lê dîsa jî ne bextewar in. Gellekan di nava lepên depresyon û hizran de ne an jî ji her tiştî aciz bûne.

Îsa Mesîh hay ji pêdiviyên mirovan yên ruhanî û fizîkî hebû; "Dema ajaweyan dîtin dilê Wî bi wan şewitî. Ji ber ku mîna pezên bêşivan şaş bûn û perîşan bûn" (Met. 9:36). Îsa Mesîh dixwaze ku bitaybet di vê mijarê de alîkariyê bi mirovan re bike, ji ber vê yekê di Yûhena 10: ayeta 10'an

de sedema hatina xwe ya bingehîn wisa têdighîne: "…Ez jî bona mirovan bigihêjin jiyanê, jiyaneke pirr hatim."

Baweriyê bi Îsa Mesîh ve anîn (vegerîna Wî) jiyanên me yên li vê dinê ne ji bingehê ve diguherinin, wisa ku êdî em dikarin cihêtiya di nava jiyana kevin û nû de bibînin (Rom. 6:4; Kol. 2:6; 1Pê. 4:3). Lê belê jiyanên me hew dema em biçin buhuştê, dê bi awayekî bitûmî bête cih. Tenê dema em li wê bin, em ê cara yekemîn fam bikin ku hela wesfa jiyanê çawa ye.

Rexnekirek gotibû ku ew qet nafikire li ser ewrekê rûnê û bi dehhezar salan li harpê bixe. Van gotinên wî şayesandineke jiyana piştî mirinê yî û di Kitêba Pîroz de nînin.

Buhuşt jiyana zêdeyî ye. Xela bûyereke li buhuştê nîne yî. Tu tiştên li wê pêdivî nînin ku pêş ve bêne birin. Her tişt bêqisûr in. Dê li wê aciziya can jî nebe, ji ber ku buhuşt bêkêmasî ye û jiyaneke diltêrî pêşkêş dike.

Dikarin dojehê weke cihekî daxwaziyên diltêrnebûne dê lê bêne jiyandin e. Lê li buhuştê jî dê êdî daxwaz û dilxwazî nebin. Ev nayê wê wateyê ku dê hemî van daxwaziyên me yên dinyewî li buhuştê diltêr bibin. Em ê bibin pardarên dewlemendiyên buhuştê ku – xeyalkirina van dewlemendiyan jî bêderfet in – dê ev dewlemendî hemî dilxaziyên me yên dinyewî nepêwist bikin.

Dema em li ser dinê demên xweş dijîn, naxwazin ku bila vana winda bibin. Geothe wisa dinivîse: "Meçe, bimîne! Tu çi qasî xweşik î."

Kamera dikarin demên borîn zeft bikin, lê belê nikarin nîmandina jiyanê bikin. Ji aliyê din, buhuşt mîna hevdemiyek heta abadîniyê bidome dê bête binavkirin. Li wê tu tişt bi mirinê ve nehatiye bisînor kirin. Her tişt mayînde ne.

Em dikarin li ser vê dinê, di demeke tekane de tenê li cihekî bin. Her tevgera me, me ji hezkirên me ve dûr dixînin. Gotina "Bi xatirê te" gellek carî dibe ku tahl be. Lê li buhuştê tu carî em ê hewcedar nebin ku bibêjin "bi xatirê we."

Avahîsazên roja me her tim bona sêwirandina bînayên nû dixebitin. Porteqaleke qeşartî bûbû çavkaniya sirûşa Jorn Ûtzonê avahîsazê Awahiya Operaya Sdneyê. Em dibin heyranê balexaniyên ber ve ezman ve dirêj dibin. Avahîsazek wisa dinivîse: “Avahîsazî pêdiviyên hunerê bi awayeke nûwaze tevîhev dikin. Avahîsazî, derbirîna dilxaziya mirov ya abadîniyê yî. Nûwazeyên avahîsazî yên mîna Seda Çînê an jî Pîramîdên Gîzeyê, di nava berhemên herî mayînde, yên ji destê mirov derketine ne de.”

Di Girava Jûîstê ya di Behra Bakûr de yî, navenda germikê ya ji sedsala 19’an maye, li pêy xebatek mezin ya nûkirinê, di sala 1998’an de dîsa bona xizmetê hate vekirin. Ev awahiya taybet ya bi navê “Qesra Sipî ya li Qeraxa Behrê” tê zanîn, li ser gireke bilind hatiye avakirin û dîmena pêşîn ya bi ber çavên rêwiyên ji aliyê behrê têne dikeve yî.

Di saziyan de tevî oteleke pênc stêrkî yan tê de hêwana baloyê, bar û bona zarokan beşeke cihê heye, xaniyên taybet jî hebûn. Van xaniyên 80 metroçargoşe ne, bi bihayeke mîna $850,000 gellekî zêdeyî têne firotan. Tevî vêya, di xaniyê herî buha de jî dîmena behrê û roniya tavê pev re nînin. Di xaniyên li bakur dinêrin de dîmena behrê hene, lê belê raste rast roniya tavê nagirin. Li aliyê din ger hûn xaniyeke rojê dibînin bipejirînin, divê hûn dev ji dîmena behrê berdin. Li cihekî ev qasî nûwaze û biha de jî bi her tiştî xwedî nebûn jî tiştekî ecêb e.

Piştî mirina xwe, em ê di xaniyeke ji aliyê Îsa Mesîh ve hatiye pêşnûma kirin de bijîn. Tu avahîsazên dinyewî nikarin pêşnûmaya Afirkerê Gerdûnê xeyal jî bikin. Îsa Mesîh di Yûhena 14:2-3’an de wisa têdighîne: “Di mala Bavê min de gellek cihên jiyînê hene. Ger ne wisa bûya min ê ji we re bigotina. Ji ber ez diçim ku ji we re cih amade bikim. Ger

ez biçim û ji we re cih amade bikim, bona ku hûn jî li cihê ku ez lê me bin, ez ê dîsa werim û we bigirim digel xwe."

Îsa Mesîh ji du hezar salî zêdetir e mala me amade dike. Divê ev xanî tiştekî nûwaze be! Mala me ya li ezmanan, dê di wesfeke, ji hemî konforên dinyewî yên li navenda germikê ya li girava Jûîstê yî gellekî seretatir be. Di Afirandinê de tenê hebeke berfê, tenê pelek darê berûyê jî çawa bêhempa hatibin afirandin, dê xaniyê ku Îsa Mesîh bona me amade bike hê jî bêmînak û bêhempa be!

Di ser de dê her xanî bona yê ku tê de bijî, bi taybetî bête amadekirin, nebe dubarekirina hev.

Em ê di buhuştê de, di bin roja ku qet naçe ava de, heta abadîniyê bibin xwedî cihekî.

### **B7:** *Buhuşt cihê ku em ê lê serweriyê bajon e*

Dê buhuşt bibe cihekî lê murxên bextewariyê tête gotin û şabûnek abadîn lê tête dijîn: "Dê êdî nebe şev. Dê pêdiviyên wan ne li ronahiya çirayê ne jî li roniya tavê hebin. Dê Xudan Xwedê ji wan re bibe ronahî û dê heta abadîniyan serweriyê bajon" (Pey. 22:5).

Di wekoka Azmûna Ewlebûnê ya di Lûqa, beşa 19:11-27'an de hatiye têgihandin de, bona her dîlî mînayek tête dayîn û bona ku vî pereyî bixebitînin emir tête dayîn. Dîlek pereyê ku rahiştiye derdixîne deh qatê wê, yeke din jî dike pênc qatî. Dema Îsa Mesîh daraz dike ji dîlê yekem re wisa dibêje: "'Eferim dîlê qenc!'… 'Ji ber ku te di karekî biçûk de ewlebûna xwe nîşan da, tuyê bibe rayedarê deh bajarî" (Lûq. 19:17). Dema dîlê duyem tê, ew jî mafê xwe distîne: "Tuyê bibe rayedarê pênc bajarî" (Lûq. 19:19).

Em dikarin ji hemiyên vana vê encama derxînin: Dê piştî mirinê rayedariya daraziya bona me bête dayîn… Dê mezinahiya qadên bidin bin berpirsiyarên me ne wek-

hev bin. Ev qadên berpirsiyarê, dê li gor xizmeta me ya li dinê bona Serweriya Xwedê kirine bêne diyarkirin. Em ê li buhuştê tevî Îsa Mesîh serwertiyê bajon. Em ê bibin şirîkên serweriyeke dê heta abadîniyê bidome.

**B8:** *Buhuşt cihê ku Îsa Mesîh lê ye*

Dibe ku encamên civînên dîrokî, yekcaran bandorê li ser girseyên mezin deynin. Mînak çêkirina porselenê di encama civînek di navbera fizîkvan Tschirnhaus û sîmyager Johann Friedrich Bottger hatiye dîtin. Di roja me de jî, ger Xwedê dest dabe wê, ji civînek rêze, dibe ku encameke dibehitîne (şaş dike) derkeve.

Du kesê ji berê ve hev nas nakin têne digel hev. Di mijarekê de digihêjim famkariyeke hevbeş, li gor wê tevdigerin û dibe ku ji vêya bigihêjin encamên girîng.

Civîna tekane ya encamên wê gellekî girîng in û bandora wê gellekî mezin e, civîna di navbera mirov û Xwedê de ye. Ji ber ku dê ew mirov di Îsa Mesîh de bigihêje jiyana abadîn. Di Kitêba Pîroz de di derbarê wê civîna de gellek carî qal tê kirin. Li Erîhayê Zaxayo yê nerxgir e, baweriyê bi Îsa Mesîh ve tîne û teşeya jiyana xwe diguhere (Lûq. 19:1-10). Peywirdarê qesrê yê Hebeşîstanê jî çawa ku li Orşelîmê li Xwedê digere, lê Wî li çolê dibîne. Bi awayekî ji xelasbûnê ve ewle, di nava şabûnê de rêya xwe didomîne (K. Şa. 8:26-39). Pawlosê demekê ji bawermendên Mesîhî re zulmê dikir jî dibe mizgînkarê herî mezin yê hemî deman (K. Şa. 26:12-18). Her mirovê ku dilê xwe ji Wî re veke, dikare bi awayekî cuda û bêhempa Îsa Mesîh nasbike. Yê ku qandî bi Wî re rastî hev hatinê dilawêr bin, dê diyariya qebûlkirina buhuştê li xwe heq bikin.

Îsa Mesîh, di Yûhena 17:24'an de bi vî awayî bangî Bavê xwe dike: "Ya Bav, ez dixwazim ku, yên te dane min jî li

cîhê min, bi min re bin ku, bila ew bilindahiya min ya ku te daye min bibînin; ji ber ku te berî afirandina dinê ji min hez kir.” Ev daxwaz dê di buhuştê de biçe serî. Em ê li wê, heta abadîniyê bi Wî re bin. Dema baweriya me bitûmî derkeve holê, dê cihê wê heyranbûnek mezin bigire. Dema Qiralîçeya Şebayê hate qesra Silêman bi şaşitiyê wisa diqîre: “…Nêviyê zanyariya te ya mezin ji min re nehat têgihandin. Tu ji qandî ku bihîstime hê jî seretatir e” (2Dî. 9:6). Ev şaşmatî, dema em bikevin Qiraletiya Xwedê dê hê jî licih be.

Pirsên girîng ên ku em di jiyana xwe ya dinyewî de li bersivên wan digerin hê jî hene. Dema em li wê bi Îsa Mesîh re bin, dê her tişt aşkere bibe: “Hûn ê wê rojê qet tiştekî ji min re nepirsin…” (Yû. 16:23). Dê di hizûra Xwedê û Îsa Mesîh de “Êdî şev nebe” (Pey. 22:5). Ji ber ku pêdivî ji xewê re jî namîne, dê li wê livîn jî nebin. Dê roj heta abadîniyê bibiriqe. Lê belê dê çavkaniya vê ronahiya ku dibiriqe ne cismekî ezmanî be. Tu roja ku hatiye afirandin nikare heta abadîniyê bibiriqe; “Pêdivî nîne ku bajar ji aliyê roj an jî heyvê ve bête ronîkirin. Ji ber ku rewnaqiya Xwedê wê ronî dike. Berx (= Îsa Mesîh) jî çira Wî ye” (Pey. 21:23).

Peyxamber Îşaya vê roja di Qiraletiya Xwedê de yî wisa têdighîne: “Dê rojê ronahiya te ne tav be êdî, heyv jî te ronî neke; ji ber ku dê XUDAN bibe ronahiya te ya abadîn, Xwedayê te jî rewnaqiya te. Êdî dê roja te neçe ava, heyva te venekişe, ji ber ku dê XUDAN bibe ronahiya te ya abadîn, dê rojên te yên şînê dawî bibin” (Îşa. 60:19-20).

Di mehên havînê de bi hezaran mirov bona ji roja ku dibiriqe qenciyê bibînin diçin beravan, lê belê qezenca yekane ya gellekan şewatên cidî ên rojê û rîska bi kansêra çerm ve ketin dibe. Ji ber vê yekê, difikirin ku gelo kremên paraziyê yên ku bikar tînin ji bandorên tavê ên xeternak têra xwe diparêze an jî na? Û bi hizrê ve dikevin. Lê belê tava abadîn ya di buhuştê de yî dê ji me re qenc bê û tu carî

neşewitîne. Ew ê qet ne mîna tava diqemirîne ya ku em ji çolên vê dinê nasdikin be (Pey. 7:16).

**B9:** *Buhuşt cihê ku em ê bibin wekhevê Îsa Mesîh e*

Di Kitêba Pîroz de wisa dinivîse: “Ya xoşewîstno, em niha zarokên Xwedê ne û ji me re hîn nehate nîşandan ku em ê çawa bibin. Ger ew xuya bibe, em dizanin ku em ê bibin mîna wî; ji ber ku ew çawa be, em ê Wî ûsa bibînin” (1Yû. 3:2). Wateya vê ayetê çiye? Mirov di diruvê Xwedê de hatibû afirandin, lê belê vê nasnameya xwe di dema Ketinê de windakiribû.

Di Kitêba Pîroz de Îsa Mesîh wisa tê şayesandin: “Law biriqandina bilindahiya Xwedê û derûniya hebûna Wî ye” (Îbr. 1:3). Ger em di buhuştê de bibin wekhevê Îsa Mesîh, wê gavê em ê jî bibin biriqandina bilindahiya Xwedê û wekhevê heman hebûna Wî bin.

Wekî kesên cuda ne dê kesayetiyên meyî cuda jî hebin, lê belê em ê ji aliyê wesfên xwe yên fizîkî (xweşikî, bilindî, şêwe, bêqisûriya fizîkî) bibin mîna Îsa Mesîh (Flp. 3:21). Ev bedenên ku em ê lê bibin Xwedî, dê bi dem an jî warê ve neyên bisînor kirin (Yû. 20:19).

Em di jiyana xwe ya vê dinê de bi mirovên ku bi me re heman ramanî û bawerî par dikin re gellek kêm rastî hev tên. Lê belê dema em rastî hev bêne jî ji axaftina ku bi wî kesî re dikin kêfekî mezin distînin û hay jê nabin ku dem çawa dibore. Yên ku têne axaftin jî handêr û birûmet in. Gotinên yê ku li hemberî me yî, me ber ve ramanên nû yên ku me berê qet nefikirîne dibin.

Em ê di buhuştê de bi Îsa Mesîh re, di ramanê de yek bibin. Bi Wî re pêwendî dê bibe hêmana jiyana me ya em nikarin dev jê berdin. Paşî ku hemî pirsên me yên din-yewî bêne bersivandin jî dê tiştên bê sînor yên ku em li ser

bifikirin hebin. Wekî yên ji me hezdikin bixwazin di derbarê me de hînî hê gellek tiştî bibin, em jî bona hê zêdetir Serweriya Xwedê ya dawiya wê nîne (Îşa. 40:28) û Îsa Mesîh hê jî zêdetir nasbikin û bizanibin hê jî daxwazkar bibin (Kol. 2:3). Xwedê hema piştî afirandina mirov peywira nav li ajalan kirinê da wî (Afr. 2:19-20). Ma vê yekê nîşan nade ku dê Xudanê me heman pêwendiyê di buhuştê de jî bidomîne? Pêwendiya di buhuştê de ne danûstendina zanîna qandî ansîklopediyekê dagire, lê dê bibe mîna gotûbêjeke her tim dewlemendtir dike.

**B10:** *Buhuşt cihê taybet yê ku bi kovanê li bendê bin e*

Dema em li naveroka danezanên Îsa Mesîh binêrin, bûyerek ji ber çavan revandin bêderfet e. Ew her tim bona buhuştê vexwendinê li me dike. Îsa Mesîh bi gotinên, "Dem tijî bû", "Serweriya Xwedê nêz bû. Tobe bikin, bi Mizgîniyê ve bawer bikin!" dest bi hînkariya xwe dike (Mar. 1:15) Îsa Mesîh bi celebên wekokan hewl dide ku buhuştê ji me re têbigehîne.

"Serweriya Ezmanan":

- "mîna zilamê ku tova qenc diçîne zeviya xwe ye" (Met. 13:24).
- "mîna heba xerdelê ya ku zilamek radihêje û bi zeviya xwe ve diçîne ye" (Met. 13:31).
- "bona hemî hevîrê binepixîne wekî havêna tevî sê olçek ard dike yî" (Met. 13:33).
- "wekî xezîneyek li zeviyê veşartiye yî" (Met. 13:44).
- "mîna bazirganekî li mirwariyên qenc digere yî" (Met. 13:45).
- "mîna torekê yî" (Met. 13:47).
- "mîna qiraleke yê bona lawê xwe şahiya dawetê amade dike yî" (Met. 22:2).

Axaftina ku Îsa Mesîh bi Zexayo re kiriye, bi danezaneke di derbarê xelasiya abadîn ve dawî dibe: “Ev mal îroj gihaşt xelasiyê… Çawa ku Lawêmirov bona li yê windabûyî bigere û bibîne hat” (Lûq. 19:9-10).

Îsa Mesîh ji zarokan re ne li vê dinê jiyanek hêsan, lê buhuştê waad dike: “Berdin bila zarok werin digel min, ji wan re nebin asteng” got. “Ji ber ku Serweriya Xwedê, ya yên wisa ye” (Lûq. 18:16).

Dema Îsa Mesîh zilamê felçoyî dibîne, pêşiyê jê re; “Rabe, bimeşe” nabêje, “gunehên te hatin bexşandin!” dibêje (Met. 9:2). Li vê carekî din em bi aşkereyî dibînin ku merca pêşîn ya buhuştê, ji gunehê xelasbûn e û ev yek bona Îsa Mesîh gellekî girîng e.

Mijara bingeh ya Waaza li Çiyê ya ku di roja me de gellek jibergirtinê jê dikin, buhuşt e:

- “Xwezî li yên ku di oxra rastiyê de zulmê dibînin! Ji ber ku Serweriya Ezmanan ya wan e” (Met. 5:10).
- “Hûn pêşiyê li pêy Serweriya Wî û rastiya Wî biçin, dê wê gavê hemiyên vana jî ji we re bêne dayîn” (Met. 6:33).
- “Ji deriyê teng ve bikevinê; ji ber ku deriyê dibe têkçûnê fireh û rê jî hêsan e û yên ku dikevin wê, gellek in. Lê belê deriyê ku dibe jiyanê teng û rê jî dijwar e û yên ku wê dibînin kêm in.” (Met. 7:13-14).

Şagirtên Îsa Mesîh hê nû ji gera mizgîndayînê vegeriyane, dema dîtine ku ruhên xerab jî li ber wan hustî danîne, bi vê yekê şa bûne. Îsa Mesîh di bîra wan de tîne ku bona ew kêfxweş û şa bibin sedemek hê jî girîng heye: “Tevî vêya bi hustîdayîna ruhan ya ji we re ne, kêfxweş nebin, bi navên xwe yên li ezmanan nivîsandine kêfxweş bibin!” (Lûq. 10:20). Îsa Mesîh tenê pêşaniyê dide vê mijara ku divê pê re kêfxweş bibin. Di 1.Pêtrûs, ayeta 1:8’an de di derbarê vê mijarê de yî: “…hûn bi kêfxweşiyek bilind ya ku nayê gotinê ve dicoşin.”

Ger em bikaribin rêya bilindahiyê nîşanî tenê yek kesî jî bidin, dê ev li ezmanan bibe sedema şabûnên mezin: “Ez vêya ji we re bibêjim, bi heman awayî dê milyaketên Xwedê jî bona yek gunehkarekî ku tobe kiriye dê bi awayekî mezin kêfxweş bibin” (Lûq. 15:10).

Wateya vêya ev e:

- Peywira herî girîng ya zarokên Xwedê, Kelama Xwedê ya berê mirovan bide buhuştê bangkirin û bihîstin e. Ev peywira ezmanî hê xwedî pêşaniyek herî mezin e.
- Heta şunda vegerîna Îsa Mesîh, divê armanca mayînde waazkirina Kitêba Pîroz û wekî pêşengiya ruhanî mayîn bin.
- Divê zanîna li ezmanan hebûna maleke me (Flp. 3:20) derûniya jiyana me pêk bîne; divê em vê bextewariya xwe ji mirovên din re jî bibêjin.

# Beşa Pêvek

### Daxuyanên Kîtêba Pîroz

Em ê li jêrê bona famkirina Kitêba Pîroz, rêgezên herî girîng bigirin dest. Bona ku hêsan be mijaran bi sernavên binî ve û bi beşan ve hatine cihêkirin.

### I. Rêgezên bingehîn yên Kitêba Pîroz

Di qada zanistê de bona ku li ser mijareke diyar, zanînê bidest ve xistinê divê mercên destpêkê bêne formûlekirin, yanê rêgezên bingehîn bêne diyarkirin. Zanîngirtin dê bisipêrin vê bingehê. Ev metoda ji ber wesfa taybetmendiyên Kitêba Pîroz, her çi qas bitûmî li ser Kelama Xwedê ve neyê bikaranîn jî, lê dîsa mirov dikare rêgezên bingehîn bînin berhev. Ev rêgezan bona xebatên Kitêba Pîroz bingehekê pêktînin. Ji ber vê yekê, bi taybet bona yên ku di vê mijarê de zêde tiştî nizanin dê qenciyek bilind pêk bîne. Ev rêgezên bingehîn dê heta ku kare fêmkariya me ya “Kitêba Kitêban” hêsan bikin.

Li jêrê di beşên destpêka rêgezên bingehîn de daxuyanek kurt cih digire. Paşê jî jêgirtinên berfireh ên Kitêba Pîroz yên ku rastandina vê daxuyaniyê dikin cih digirin. Di vê beşê de gellek carî cih dayîne têginên yekwate yên Kitêba Pîroz in. Mînak: Kelama di derbarê Mesîh de (Rom. 10:17), Kelama Xwedê (Met. 15:6), Emirê XUDAN (1Sa. 15:23), Kitêba XUDAN (Îşa. 34:16), Kitêb (Yêr. 30:2), Nivîs; Nivîsên Pîroz (Lûq. 4:21; Met. 21:42, 2Tîm. 3:15), Peymana Kevin û Nû (2Kor. 3:14; Lûq. 22:20).

**I. 1. Rêgezên bingehîn yên Kitêba Pîroz (R= Rêgezan)**

**R10:** Kitêba Pîroz, yekane çavkaniya zanînê ya ji aliyê Xwedê ve hatiye daxuyankirin û rayedar hatiye danîn e. "Xwedayê Îsraêlê XUDAN dibêje ku: 'Hemî gotinên ku gihandime te bi kitêbekê binivîse'" (Yêr. 30:2). Xudan Îsayê bilindtirkirî wisa emir dike: "Vana binivîse!" "Ji ber ku ev gotinan ewlekar û rast in" (Pey. 21:5).

Ji Kitêba Pîroz ne peyveke dikare bête derxistin, ne jî peyvek pê ve tête vekirin (Jinû. 4:1-2; Pey. 22:18-19). Ji ber vê yekê hemî kitêbên din yên di "gotinê de" peyxam in (Kitêba Mormonana, Qurana Musilmanan) ne peyxama Xwedê ne.

Di Galatiyan, ayeta 1:8'an de bêhempabûna peyxama Kitêba Pîroz tête derbdan û encama bi her awayî guhertina danezana mizgîniyê têtê daxuyankirin: "Em an jî ji ezmanan milyaketek jî, ger mizgîniyek ji mizgîniya ku me bi we re dayîne bihîstin cudatir e bidin bihîstin, bila nalet li wî be!"

**R11:** Heta ji dahûrîna dawîn de jî, mirov bi awayekî bêkêmasî hê tênagihêje ku Kitêba Pîroz çawa pêk hatiye (Lûq. 1:1-4). Ka Kelam çawa ji Xwedê ve têgihîştine nivîskarên Kitêba Pîroz, ev nepenek nayê çareserkirin e. Vegotinên mîna; "A vay gotinên xwe xistim devê wî" (Yêr. 1:9). "Min vê mizgîniyê ji mirovan nestendin, ji tu kesî jî fêr nebûm. Îsa Mesîh vêya ji min re daxuyan kir (Gal. 1:12) bi awayekî aşkere qinyata, Kitêba Pîroz çavkaniyek xwedanî ye, dide me. Ka nivîskaran naveroka Kitêba Pîroz çawa girtine, ew bona me bi awayekî gellekî veşartî dimîne.

**R12:** *Zerengiya xwedanî ya Kitêba Pîroz*: Çavkanî û Afirkerê Kitêba Pîroz Xwedê ye. Li gor 2. Tîmotêyos 3: ayeta 16'an hemî Nivîsên Pîroz peyxama Xwedê ne (Bi Grêkî "theopneustos = ya ku ji aliyê Xwedê û Ruhê Pîroz ve

hatiye dayîn, ya ku ji aliyê Xwedê ve hatiye pifkirin). Çavkaniya vê zanînê Yekitiya Sêyan, yanê Bav, Law û Ruhê Pîroz e.

a) *Xwedayê Bav*: “Xwedê di demên kevn de di peyxamberan de, bi gellekî caran û bi pirr teheran ji bapîran re axifî, di dawiya van rojan de di Lawê xwe yê ku bi navdîtiya wî aleman afirandiye û kiriye mêraskerê her tiştî de ji me re axifî” (Îbr. 1:1-2).

b) *Îsa Mesîh*: “Xwe biparêzin, yê ku dibêje red mekin! Ji ber ku ger dema wan yê li rûyê erdê wan îkaz kir red kirin, çawa nikarîbûn xelas bibin, ger em wecê xwe ji yê ji ezmanan ve dibêje bizivirînin, em hîn jî zêde xelas nabin!” (Îbr. 12:25).

c) *Ruhê Pîroz*: “Hûn ku, yên bi navgîniya wî, baweriyê bi Xwedayê ku wî ji mirinê ve vejandiye û bilind kiriye dikin; wusa ku, bila baweriya we û hêviya we di Xwedê de be” (2Pê. 1:21).

**R13:** *Zerengiya mirovî ya Kitêba Pîroz*: Kelama Xwedê bona me di firakên axînî de têne pêşkêşkirin, yanê ramanên xwedanî yên di derbarê Xwedê de yên veşartî, famnekirina hezkirin û dilovaniya Wî bi vegotinên zimanê mirov yê ku bona têgihîştinê qîm nake têne gîhandin. Tevî vêya peyv bi “ruh û jiyanê” ve tijî ne (Yû. 6:63).

## I. 2. Rasteqîniya Kitêba Pîroz

**R20:** *Rasteqîniya Kitêba Pîroz ya ku nayê guhertin*: “Kelama te rast e” (Yû. 17:17). Ev wesfa di Peymana Kevin de tête rastandin: “Xwedê ne mirov e ku bila derew bibêje; ne lawê mirov e ku, ramanê xwe biguherîne. Ma gelo Ew bibêje qey dê neke? Ma sozê bide dê neyne cih?” (Hej. 23:19). Îsa Mesîh di Yûhena 14:6’an de têdighîne ku rastî Ew e. Nivîskarê Germen Manfred Hausmann

(1898–1986) bi vî awayî daxuyaniya xwezaya rasteqîniyê dike: “Rastî, qandî ku tenê ji rastbûnê neyê pîvandin mezintir û hê jî kûrtir e.”

**R21:** *Tevayiya di navbera Kelama Xwedê û Îsa Mesîh de*: Di navbera Îsa Mesîh û Kelama Xwedê de tevayiyek hişê mirov nagire heye (Yû. 1:1-4, Pey. 19:13). Îsa Mesîh him mîna Lawê Xwedê be û him jî mîna Lawê Mirov be hate dinê: “Lê belê dev ji bilindahiya xwe berda, awaya qûlitiyê girt û di wekheviya mirov de welidî. Di şêweya mirov de bi mirinê, bi mirina ser xaçê jî hustî xwar kir û xwe nizm kir” (Flp. 2:7-8). **Lê belê** li dijî mirovên din qet tu gunehê wî tunebû (an jî bitûmî bêguneh e).

Heman rewş bona Kitêba Pîroz jî wisa ye. Dema mirov ji derve li Kitêba Pîroz binêre, her çi qas mîna pirtûkên din şêweyên wêjeyî tê de cih bigirin jî, li dijî wan, Kelama Xwedê ye û bitûmî bêqisûr e (Meth. 30:5); şaş nabe û xwediyê rastiyek teqez e (Zeb. 119:160).

**R22:** *Di Kitêba Pîroz de ji aliyê rastiyê cihêtiyên wesfî nînin*: Wesfa rasteqîniya Kitêba Pîroz li gor beşên wê an jî nivîskarên wê cihêtiyan nîşan nade. Peymana Kevin bi Peymana Nû re cihêtiyê nîşan nade, yanê mirov nikare pêş de bide ku nakokî di nava têgihandinên wê de hene. Bi heman awayî tu kes nikare bibêje ku di navbera çar beşên pêşiyê yên Peymana Nû (Danezana Mizgîniyê) û nameyên Pawlosê şandî de tu nakokî hene. Ji ber ku hemiyên Nivîsên Pîroz bi peyxama Xwedê ve hatine nivîsandin (Gal. 1:12). Tevî vêya kûrahiya wateya danezanan û têkiliyên wan yên bi hevûdin re her tim di heman astê de namînin. Ji ber vê yekê girîngiya têgihandina xelasiyê ya di Yûhena 3:16’an de yî, bi kitekitên rêwîtiya ku di Karên Şagirtan 27:12’an de yî nayên hevberî kirin. Bi heman awayî wateya afirandinê ya di beşa yekemîn ya Afirandinê de hatiye têgihandin

ji lîsteya gelê Cihûyên ji sirgûnkirinê vegeriyane Îsraêlê ya di Ezra beşa 2.'an de yî, li cihekî gellekî cudatir e.

### I. 3. Ceribandina rasteqîniyên Kitêba Pîroz

**R30:** *Rasteqîniyên Kitêba Pîroz heta astekê dibe ku bêne ceribandin*: Xwedê naxwaze ku em bi çavên girtî baweriyê bînin. Ji ber vê yekê bona ku em Gotina Wî biceribînin û bigihêjin rastiyê pîvanên ewlekar (darikên pîvanê) dane me.

**1.** *Di jiyana me de*: Îsa Mesîh têdighîne ku em dikarin Kelamê di jiyana xwe de bikar bînin û bi vî awayî wê biceribînin: "Îsa bersivê da wan û got: Hînkariya min ne ji min, lê ji yê ku ez şandime tê. Ger kesek bixwaze xwestina wî bîne cîh, ew ê bizanibe ku ka ev hînkarî ya Xwedê ye, an ez ji xwe dibêjim" (Yû. 7:16-17).

**2.** *Di azadiya me de*: Îsa Mesîh fêr dike ku hînkariyên rêşaş (bîrdozî û terîqetan mirov dikin hêsîr) mirov bindest dikin; lê belê qebulkirina ramanên Wî û di jiyanê de bikaranîna wan mirov azad dikin: "Ger hûn di gotinên min de bimînin, bi vî awayî hûn bi rastî jî şagirtên min in. Hûn ê bi rastiyê bizanibin û rastî dê we azad bike!" got (Yû. 8:31-32).

**3.** *Bi qebûlkirinê*: Çawa ku tahma porteqalekê tenê dema bête xwarin tête famkirin be, rasteqîniya Kitêba Pîroz jî tenê di yên ku bona wê bixwînin û qebûl bikin hewl didin de dê bi hêsanî bête famkirin. Nîqaş û dozîneyan, nakeve cihê xebata Kitêba Pîroz. Veriyayiyan di vê mijarê de tevgereke mînakî nîşan didin: "Lê belê vana ji yên li Selanîkê hîn jî pêş ve difikirîn û gotin bi balkêşî û têkiliyek mezin guhdarî dikirin û her roj lêgerînê li Nivîsên Pîroz dikirin û digotin ka tiştên hîn dikin rast e, an çewt e (K. Şa. 17:11).

**4.** *Encaman*: Dê di jiyana her kesê ku li gor Kelama Xwedê dijî û balê dide hişyarkirinên/şîretên Wî de dê pêş-

veçûnên qenc bi aşkereyî bêne dîtin. (Û wekî din lê binêrin pirs û bersiva PKP2): “Tiştên ku di Kitêba Zagonê de nivîsandine ji devê xwe nexîne. Bona tu hemiyan bi pûtedayinê bîne cih bi şev û roj wê bifikire” (Yşû. 1:8).

**5.** *Bi guhdarîkirina Kelama Xwedê ve*: Xwedê, bona her kesê ku waazkirina Kelama Wî guhdarî dikin, waadek taybetî dide. Dê her kesê ku bi dilekî vekirî Kelama Xwedê guhdarî dikin bawer bibin: Nexwe bawerî bi bihîstina agahiyê, bihîstin jî bi belavbûna gotina di derbarê Mesîh de ye dibe” (Rom. 10:17).

**6.** *Xwezaya me ya gunehkar*: Di Kitêba Pîroz de beşên di derbarê xwezaya gunehkar ya mirov ya ku bi kesayetiyê ve spartiye, ji derûniya hebûna me re ji beşên din zêdetir bi rasteqîniyê ve xitabê dikin. Yên ku bi dilekî vekirî û bi serrastî difikirin dê hay jê bibin ku teşhîsên kesayetî yên Kitêba Pîroz rast in: “…Qet cihêtî nîne. Ji ber her kes gunehê kir û bêyî bilindahiya Xwedê ma” (Rom. 3:22-23).

Ez wisa difikirim, tu kes nîne ku bibêje 1.Yûhena ayeta 1:8’an bona wî ne derbasdar e: “Ger em bêjin gunehê me nîne, em ê xwe bixapînin û dê di hundirê me de rastî nebe.”

*Nîşe*: Deqek balkêş e ku rasteqîniya Kitêba Pîroz tenê ji aliyê yên ku ji Kelama Xwedê re îtaetê dikin ve tête famkirin. Yên ku kesayetiyên xwe li derve dihêlin û tenê ji aliyê ramanê ve nêzîkî Kitêba Pîroz dibin, dê bibînin ku rasteqîniya Kitêba Pîroz bo wan nayê gihaştin e (1Kor. 1:19). Di derbarê vê mijarê de dibe ku hesibandinên matematîkî yên ku bawerdêr in (lê binêrin pirs û bersiva PKP1) dikarin bibin alîkar, lê belê gavên ku dê di mijara baweriyê de bêne avêtin bi biryara şexsî ve girêdayiye. Waadên Xwedê an bi baweriyê têne qebûl kirin an jî bi bêbaweriyê ve têne redkirin.

## I. 4. Mijara Kitêba Pîroz

**R40:** *Kitêba Pîroz têgihandina Îsa Mesîh dike*: Ev rastî tenê ne bona Peymana Nû, bona Peymana Kevin jî derbasdar e. Îsa Mesîh di hînkariyên xwe de bi vî awayî qala Peymana Kevin dike: "Hûn lêkolînê li Nivîsên Pîroz dikin. Ji ber ku hûn dibêjin qey di vana de hûn dibin xwediyê jiyana abadîn. Yên ku şahidiyê ji min re dikin jî van nivîsan in!" (Yû. 5:39).

Em bi navgîniya Peymana Nû, dikarin bigihêjin Peymana Kevin, ji ber ku Nivîsên Pîroz qala Îsa Mesîh dikin. Îsa Mesîh vê rastiyê di rêya Emwasê de fêrî şagirtên xwe dike (Lûq. 24:13-35). Armanca bingehîn ya Kitêba Pîroz, di Yûhena 20: ayeta 31'an de hatiye derbdan: "Çi heye ku tiştên hatine nivîsandin, bona ku hûn baweriyê bînin ku Îsa, Mesîhê Lawê Xwedê yî û bi navê Wî bigihêjin jiyanê hatine nivîsandin."

**R41:** *Kitêba Pîroz têgihandina vê dinê û axretê dike* (Yûhena 3:12): Mînakên ku em dikarin bona mijarên di derbarê vê dinê de ne bidin: Bûyerên dîrokî, têgihandinên rêwîtiyê, bûyerên ji serê mirovan derbas bûne, zagonan, têgihandina rewşa ruhî ya mirovan, şecereyan, dîrokçeyên mirovan, têgihandinên mizgînkirinê, pirsên di derbarê jiyana rojane de û daneyên zanistî. Li derveyî vana Kitêba Pîroz gellek caran bona ku em berê dilên xwe bi rûmetên ezmanî (Met. 6:33; Kol. 3:2), yanê bi Xwedê re, Îsa Mesîh re û Ruhê Pîroz re, bi Serweriya Xwedê re, bi Vejîn û Roja Daraziyê re, buhuşt û abadîniyê ve berdin pêk tîne.

**R42:** *Kitêba Pîroz mirov bi awayekî herî rasteqîn binav dike*: Mêr û jinên di Kitêba Pîroz de ne, mîna lehengekî nayên bilindtirkirin. Tevî hemî lawazî, qisûr û qebhetên wan, tevgerên wan yên mînakî jî bi gotineke aşkere tête gihandin. Heta ser qebheta Dawidê ku [Xwedê] wî li gor dilê xwe dîtiye (2Sa. Beşa 11; K. Şa. 13:22).

**R43:** Tiştên ku di Kitêba Pîroz de hatine daxuyankirin, mifteya yekane ya famkirina me ya demê û vê dinya em li ser dijîne ne: Kitêba Pîroz, çavkaniya hemiya zanînê ye; wekî din tu tişt nikare cihê wê bigire.

Dema mirov van her sê bûyerên raborînê – Afirandin, Ketin û Tofan – ji nezaniyê bê, derfet nîne ku dema niha bête famkirin.

Pênc bin – rêgezên vê rasteqîniyê hene:

**1.** *Raborîn, bona ku em dema niha fambikin, rêya yekane ye:* Ev danezan tam li dijî îdiayên ku paresanparêz pêş ve didin in. Parêsanparêz îdia dikin ku, mirov ger ji daneyên çavderiyê roja me ve derkevin rê, dê heta ku dilê wan bixwaze, encamên di derbarê raborînê de ye derxînin.

**2.** *Afirandin tenê bi saya baweriyê tête famkirin*: "Em bi saya baweriyê famdikin ku danezan bi destûra Xwedê hate afirandin. Wisa ku tiştên têne dîtin ji tiştên nayên dîtin ve pêk hatin" (Îbr. 11:3). Cûreyên hêmanên Afirandinê, bi gelekî ayetan ve tên rastandin:

- Bi Kelama Xwedê ve: Zeb. 33:6; Yû. 1:1-4; Îbr. 11:3
- Bi hêza Xwedê ve: Yêr. 10:12
- Bi zanyariya Xwedê ve: Zeb. 104:24; Meth. 3:19; Kol. 2:3
- Bi navgîniya Lawê Xwedê ve: Yû. 1:1-4 û 1:10; Kol. 1:15-17; Îbr. 1:2b
- Bi xwezaya Îsa Mesîh ya mexsûsî Wî ye ve: Met. 11:29; Yû. 10:11 û 14:27
- Di destpêkê de qet tu bûjen tunebû ve: Îbr. 11:3
- Bi tunebûna têgîna demê ve: Zeb. 33:6

**3.** *Mirin, encama gunehê mirovê yekem e*: (Afr. 2:17 û 3:17-19); Rom. 5:12, 5:14 û 6:23; 1Kor. 15:21).

**4.** *gunehê mirov û encamên wê, bandorê li hemî afirandinê danîne* (Rom. 8:20,22). Awahiyê bizerar ên di bîyolojiyê de (mînak: bakterî û parazîtên rê li nexweşiyan vedikin; marên bi jehr û pîrpendan; ajalên hov; nebatên goşt-

xur û dijwariyan “devî û kelemiyên di axê de” [Afr. 3:18]), dema li ser Ketinê balkêşî nebe, nayên daxuyankirin. Sedema xerabûna gerdûnî ya ku çavdêrî lê tête kirin jî ji ber vêya pêk tê.

**5.** *Awahiya jeolojîk ya rûyêerdê a roja me, bêyî Tofana Nûh nayê daxuyankirin.*

## I. 5. Danezanên Kitêba Pîroz

**R50:** Her çi qas di Kitêba Pîroz de cih ji tu zanîna negirîng e nehatine dayîn jî, hemî danezan ne di heman girîngî û kûrahiyê de ne. Mînak; ayetên Yûhena 3:16 û Karên Şagirtan 18:1 hevberî hev bêne kirin, dê ev mijar hema diyar bibe. (Binêrin R22).

**R51:** *Di Kitêba Pîroz de hemî rastiyên bingehîn yên bona me pêwist in hene*: Naveroka Kitêba Pîroz hemî hêmanên bona di jiyanê de mirov bi serkeve û bigihêje armancê abadîn wedigre nava xwe, bo vê yekê bêkêmasî ye. “Kitêba XUDAN bixwînin vekolînê lê bikin: Dê ji tu yên vana kêm nemînin, dê tu ajalên bêyî hevber e nebin. Ji ber ku ev emir ji devê XUDAN derket, dê Ruhê Wî jî wan berhev bikin” (Îşa. 34:16).

**R52:** *Vegotinên Kitêba Pîroz di nava hev de nakevin nakokiyê*: Hinek hêmanên di nêrîna pêşîn de weke nakokiyê xuya dibin jî, dema ji nêzîk ve bêne lêkolînkirin, dê tunebibin. Sedema herî zêde ya vê yekê jî xemsarîkirina hinek rêgezên Kitêba Pîroz in:

**1.** *Vegotinên Kitêba Pîroz bigiştî gellekî kurt in:* Bawerîanîna Lêwî (Meta) tenê bi ayetekê hatiye têgihandin (Met. 9:9).

Bi heman awayî, pirsa ku di derbarê jinên lawên Adem de jî, ji ber kurtayiya vegotinên Kitêba Pîroz pêk tên. Li

gor Afirandin 5:4’an, law û qîzên Adem bûne. Li pêy wê, pêşiyê bira û xuşk pev re zewicîne, di nifşeyên li pêy jî bi xaltî, kurmam û dotmaman pev re zewicîne. Di heman piştî Afirandinê de vê celebê zewacên di nava malbatê de ne bixeter bûn (binêrin PDA11 û bersiva wê).

**2.** *Vegotinên paralel ên hinek vegotinên Kitêba Pîroz hene. Di van vegotinên paralêl de hêlên cihê têne derbdan*. *Mînak 1*: Şecera Îsa Mesîh ya di beşên Meta 1:1-17 û Lûqa 3:23-38’an de hatine dayîn hem wekheviyan, him jî cihêtiyan xuya didin. Di beşa Meta de şecereyeke tîpîk ya bi Birahîm ve destpê dike û bi Ûsivê hevserê Meryem ve diqede hatiye qeydkirin. Ji aliyê din di Lûqa de şecereyek ji Ûsiv destpê dike û şunde diçe ta Adem, heta dirêjî Xwedê dibe hatiye dayîn. Şecera di beşa Meta de ji 3 x 14 navî, ya di beşa Lûqa de jî ji 77 navî ve pêk têne. Diyare ku wateyek sembolîk ya vê rewşê heye. Ji ber sedemên sembolîk û bona dîmenek giştî ya hê jî daxuyanker e pêşkêş bike, di her du şecereyan de jî hinek navan li derve hiştine. Tevî vêya, her du beş jî di mijarên li jêrê ne de di nava ahengeke bêkêmasî de ne:

- Îsa, ne lawê Ûsiv e
- İsa, “stêrkek ji Aqûp ve derdikeve yî” (Hej. 24:17)
- Îsa, ji ezbeta Cihûda ye (Pey. 5:5)
- Îsa, ji nîjada Qiral Dawid e (1Dî. 28:4-7; Pey. 5:5)

*Mînak 2*: Hinek kitekitên ne girîng in di vegotinên Vejîna Îsa Mesîh de cihêtiyan nîşan didin. Ev rastî, nîşan dide û dipeyitîne ku her çar beşên danezanên mizgîniyê ên ku destpêka Peymana Nû pêk tînin, şahidiyên çavdêriyê ne û ji ber hev nehatine stendin. (Xweza ye ku vegotinên şahidên qedayek trafîkê, çawa ku gişt rast bin jî, dê piçekî ji hev cihêtir bin.)

**3.** *Hinek danezanên ruhanî, wateyên xwe yên rasteqîn, tenê dema hev temam bikin, nîşan didin*: Wesfên fizîkî ên ronahiyê bi rêyeke bitûmî temamker (bi Latînî comple-

mentûm = tiştê ku temam dike, an jî dadigre) tête daxuyankirin: Ronî dikare mîna herikaneke li aliyekî mîna şewleyekê – û ji aliyê din mîna ji parîkên bûjenî (fotonan) pêkhatibe tevbigere. Wesfên rasteqîn yên roniyê, tenê bi du cureyên tevgerên li dijî hev in bêne yekkirin dê bête famkirin. Di Kitêba Pîroz de danezanên mîna vêya hev temam dikin cih digirin. Bo vê yekê di derbarê xelasiyê de du danezanên, birastî hev temam dikin lê belê mîna nakokî di nava wan de hene jî cih digirin (Binêrin PX1 û bersiva wê).

a) "Ji ber em di wê qinyatê de ne ku mirov ne bi cihanina pêdiviyên Zagonê, lê belê bi baweriyê pak dibin" (Rom. 3:28).

b) "Hûn dibînin, mirov ne tenê bi baweriyê, bi kiryarê jî paqij dibe" (Aqû. 2:24).

**4.** *Hinek pirsgirêk ji wergera ku hatiye kirin pêk tên*: Mînak: Li gor wergera Kitêba Pîroz ya Martîn Luther wergerandiye, Aqûp pûtên îlahan di bin dara berûyê de veşartine (Afr. 35:4). Lê di wergera Elberfeld ya Germenî de jî, li gor teksta orîjînal hatiye wergerandin û navê darê weke "terebînth" (darê benîştê terebentînê) hatiye wergerandin.

**Nîşe**: Mirovan Kitêba Pîroz ne ji ber ku nakokî di navê de heye, lê ji ber ku bi dîtinên wan ve lihev nake red dikin.

**5.** *Di hinek rewşên kêmkêmî de daxuyaniya beşên di dîtinê de nakok in gellekî dijwar e, lê belê dîsa jî bi rêgezî pêkan e:* Mînak; Mirina Cihûda Îsxeryotî (Met. 27:5b → K. Şa. 1:18), Yên di hundirê Sindoqa Peymanê de (1Qir. 8:9 → Îbr. 9:4), mirina Saûl (1Sa. 21 → 2Sa. 1).

*Mînaka bidaxuyan*: Li gor Meta, ayeta 27:5, Cihûda Îsxeryotî xwe daliqandiye. Lê di Karên Şagirtan 1: ayeta 18 de jî: "…Paşê bi ser serî de ket, bedena wî qelişî û hemî rêviyên wî rijiyan derve" tête nivîsandin. Ev herdu nivîsên pîroz yên di derbarê mirina Cihûda de ne, wekî pev re di nakokiyê de bin xuya dibin. Birastî ger bala xwe bidin danezana paşê tê, dê bête dîtin ku her du di nava ahengê de ne.

Mînak, weke daxuyaniyek sembolîk be mirov dikare vegotina; ew bitûmî têk çûbû an jî werîs yan jî guliyê darê paşê şikestibû, bikar bîne (Binêrin R59).

**R53:** Kitêba Pîroz, pirtûka yekane ya danezanên peyxambertiyê yên rasteqîn tê de cih digirin in. Rastiya hemî van peyxamberiyan di nava dema fezayê de hatine peyitandin (û wekî din binêrin PKP1û bersiva wê).

*Terîfkirina Peyxamberiyê*: Peyxamberî, bûyere ku dê di dahatûyê de pêk bê, li derveyî zanîna mirovê asayî, ji berê ve têgihandin e. Ji ber vê yekê peyxamberiyan, bûyerên ku dê di dahatûyê de bibin, ji berê ve gihandin e. Ev gihandinên pêşîn, ji bûyerên di qeydên dîrokê de cih digirin, lê belê ji bûyerên ji berê ve bûne û qediyane gellekî cihêtir in. Îsa Mesîh bi gotinên di Yûhena 13:19'an de; "Ez vana ji niha ve ji we re dibêjim ku, dema ev yek bibin, hûn bawer bikin ku Ez Ew im" gotine ve bi armanca xurtbûna baweriyê ji pêşiyê ve gihandinê dike.

**R54:** *Xwedê gellek caran, pêşiyê bi daxuyaniya kitekitekê rastiyên ku dixwaze derxîne holê destpê dike,* li pêy gav bi gav daxuyaniyê dike. Mînaka vê metodê ya herî diyar e, peyxambertiyên ku di derbarê hatina Îsa Mesîh ya dinya me de hatine kirin in.

**R55:** *Ji ser ve xwendina nivîseke pîroz, dibe ku bibe sedema kitekitên ku derbas dibin, weke tiştên negirîng in bêne dîtin.*

Lê belê gellek caran ev kitekitan di nava peywendiya giştî de xwedî cihekî gellekî girîng in.

*Mînak 1*: Emirê "hûn ê hestiyan neşikînin" ya di Ji Misirê Derketin ayeta 12:46'an de derbas dibe, di derbarê berxê ku dê di Cejna Fisihê de bête qurbankirin e. Ev gotinan, di derbarê Îsa Mesîhê ku di Yûhena 1:29'an de bi gotina, "A vay, Berxê Xwedê yê dê gunehê dinê ji holê

rake!” de tête binavkirin, danezaneke pêşîn e. Ev kirina ku leşkerên Romê çêqên her mehkûmê ku tête înfazkirin dişikînin bona Wî nehatiye bicih anîn (Yû. 19:32-36).

*Mînak 2*: Di Peymana Kevin de mîna ku ji berê ve hatiye têgihandin, divê Îsa Mesîh li derveyî dîwarên bajarê yê Orşelîmê ve bi xaçê ve bihata şidandin, ji ber ku di demên kevnar de pêşkêşiyên ajalan, bona gel qirêj nekin li derveyî artêşgehê dihatin şewitandin (Lêw. 16:27; Îbr. 13:11-12).

**R56:** *Nivîsên Pîroz zanînên ew qas kûr digire naveroka xwe ku mirovek tu carî nikare wan biqedînin* (1Kor. 13:12). Xwedênasê Germen Georg Huntermann (1929–2014) wisa dinivîse: “Tiştên ku Kitêba Pîroz dixwaze ji mirovan re bighîne; ji wêdetirê tiştên aqil bikare kişf bike destpê dikin.”

**R57:** *Danezanên Kitêba Pîroz, ramanê mirov dibuhurin*. Pariyê dema Kitêba Pîroz “ji beriya damezirandina dinê” destpê dike (Ef. 1:4) û heta abadîniya Xudan Xwedê dirêj dibe (Pey. 22:5).

Kitêba Pîroz bersiva pirsên ku zanista xwezayê nikare bibersivîne dide:

- Xwezaya mirinê çiye? Mirin ji ber çi heye û dê heta kengî hebe?
- Mirov çiye? Em ji ku derê tên? Wateya jiyanê çiye û em diçin ku?
- Dê abadînî tiştekî çawa be?

**R58:** *Kitêba Pîroz, berhemek wêjeyî ya xweser e*. Yek ji dewlemendiyên Kitêba Pîroz jî, danezanên xwe bi awaya şêweya wêjeyî şêwaz û cûreyên di qet tu pirtûkî de nîne têgihandina wê ye. Helbest (Zeb. 119), qesîde (Kol. 1:15-17), murxê evînê (Hel.), têgihandina zanistî ya bi zimanekî axaftina rojane (Afr. Beş 1), têgihandina dîrokî (Esra), nix-

mane ([alegorî] bûyerek ji jiyana rojane ve mîna hevberiyê bikaranîn Meta 13:3-23), mînandin (Bi Grêkî *parabole* = anîna digel hev; bona rewşeke tenê û taybet bi hevberkiyê şîrovekirinê di hînkariyekê de bikar anîn, Lûqa 18:1-8), zimanê sembolî (Yû. 15:1), zimanê peyxamberî yê sembolî (Pey. Beşa 6), gotinên peyxamberiyê (Met. Beşa 24), paradoks (Flp. 2:12-13), waaz (K. Şa. 17:22-31), îkaz (Kol. 3:16-17), pesnahî (Ef. 1:3), pîrozkirin (Flp. 4:7), hînkarî (Rom. 5:12-21), şecere (1Dî. Beşa 3), dua (Zeb. 35), şahidiya şexsî (1Yû. 1:1-2), têgihandina xewnê (Afr. 37:6-7), Bi yekserî axaftina Xwedê (Met. 3:17), rênîşanî/şêwirdarî (Yû. 4:7-38), têgihandina nakokiyan (K. Şa. 15:7-21), dadgehan (Yû. 18:28-38), gotinên zaniyariyê (Meth. 13:7), waadan (Mar. 16:6), darazî (Met. 11:21-24), tiştanok (Ser. 14:12-14), zagondanîn (hiqûka şareza, hiqûka cezayê, zagonên di derbarê exlaq, dêlindêzî û tendrustiyê), helbesta coşdar (Helbesta Helbestan), jînenîgarî (Beşa Nehemya), Ji hev re nivîsandina şexsî (Fîlêmon), rojnivîsk (K. Şa. Beşa 16), monolog (Eyû. Beşên 32-37), diyalog (Eyû. Beşên 3-31), teksta apokalîptîk (Danîêl, Peyxamgirtin), bişîfrekirina derbasdar (Dan. 12:9), pêşgotin (Bi Grêkî *prologos* = ya ji berê ve hatiye gotin, Lûq. 1:1-14), Paşgotin (Bi Grêkî *epîlogos* = ya paşê hatiye gotin, Yû. 21:25), Têgihandina bikêmkirinê (Bi Grêkî *elleipsis* = ya ji derve hatiye hiştin, şêweya ku kitekitên ne girîng in nehatine tevlêkirin, Met. 9:9), têgihandina xazeyî (Bi Grêkî *metaphora* = cihê wê guhertin, Oba. 1:4), nivîsa yafta/bangewaziyê (Yû. 19:19), danezana bişîfre (Pey. 13:18).

*Ji aliyê din di Kitêba Pîroz de van şêweyên nivîsariyê nînin*: Destan, efsane, çîrok, pesname, hîcw, komedî, henek, utopîstî (îdealîzm), çêkirnoka zanistî. Şêweyên wêjeyî yên mîna fîşalî (Bi Grêkî *hyperballein* = armancê buhartin, zêdetir çûyîn, Met. 11:18) û îronî (Bi Grêkî *eîroneîa* = vegotina tinazî, tinaza sergirtî, 2Kor. 12:11) kêm

û kêm hatine bikar anîn. Û li aliyê din, dema tekst bêne xwendin dê bi aşkereyî bête dîtin ku vegotinên wisa bi awayekî şêwekarî hatine bikaranîn.

Di dîroka dinê de, pirtûkek din nîne ku him mîna Kitêba Pîroz ji serî heta dawiyê bi sedî sed rast be û him jî ji aliyê şêwazê ve ev qasî berfireh e nîne.

**R59:** *Kitêba Pîroz, şêwaza dewlemend ya wêjeyê heta dawiyê bikar tîne*. Mîna gellek danezanên rasterast ên di Kitêba Pîroz de cih digirin hene, şêweyên din ên nivîsê jî hatine bikar anîn

**1.** *Zimanê diyardenasî (fenomenolojîk)*: Bûyerek, li dêvila mîna ku bûye têgihandin, weke lê şahidî bûye (hatiye temaşekirin) tête têgihandin: Zanista ezmanî ya hemdem û Kitêba Pîroz ji roja helatî û çûye ava ve mîna "Helatina rojê û çûyîna wê ya ava" qaldikin, lê birastî ev bûyeran ne ji ber tevgera rojê, ji ber ku dinya li dora xwe dizîvire pêk tên.

**2.** *Têgihandina biwêjî*: Biwêjên kin, gellek caran ji daxuyanên dirêj hê jî licih e (Ser. 14:18 "…ger hûn bi nogîna min nehatina cotkirin…").

**3.** *Zimanê helbestî, dîmenî* : (Hel. 8:3): "Destê çepê di bin serê min de, bila destê rastê min himbêz bike".

**4.** *Zanist û teknolojiyê ne bi zimaneke teknîkî, lê bi şayesandin û peyvên hê jî hêsan e daxuyandin:* Qala hinek pêşveçûnên toknolojî yên di demên ku di Kitêba Pîroz de hatibû nivîsandin de hê çênebûne tête kirin. 'Û ji aliyê din tiştên ku zanista hemdem wan bi navên dûvelang, laboratûara fezayê û îstesyonên dûvelangê binav dikin, di Kitêba Pîroz de bi şayesandinên dîmenî têne daxuyankirin: "Tu mîna qertelê bilind bibe jî, hêlîna xwe di nava stêrkan de dayne jî,…" (Oba. 1:4).

Li dêvila navlêka "ontogenez"ê ya jînekolojîk e û li dêvila pêşveçûna embroyonîk ya di nava malzarokê de pêk

tê, di Kitêba Pîroz de di malzaroka dayikê de kelbengiya zarok wisa têté têgihandin: "Dema li cihê veşartî hatim afirandin, dema di kûrahiyên erdê de hatim hûnandin, bedena min ji te veşartî nebû" (Zeb. 139:15).

**5.** *Formulasyona xwe spartiye rastiyên zanistî*: Têgihandina Afirandinê bona vê yekê mînaka herî qenc e. Mînak; pîvandina – demî û yekeya demê bi rastiyeke fizîkî, bi dorê têté binavkirin (Afr. 1:14,19)

**6.** *Bona pêwendên hevbeş yên ruhî bêne daxuyankirin, ji jiyana rojane mînak têne dayîn:* Di beşa Meta 13: ayetên 3-23'an de cotkarê di mînandinê de yî, kesê ku danezana Kitêba Pîroz waaz dike yî. Tov jî gotina Xwedê yî, kelem asteng in û axa qenc jî, dil û guhê mirovan yên vekirî ne.

**R591:** *Divê her beşê Kitêba Pîroz, bi balkêşiya, bona xwe şêweyek wêjeyî ya xweser (R58) û şêwaza xwe bête nirxandin*:

Ji ber vê yekê, divê danezanên Kitêba Pîroz yan raste rast bi wateya xwe ya rasteqîn pûte bê dayîn an jî, ger armanc dayîna wateyek din be, teqez li gor wê wateyê bête famkirin.

a) *Gotin bi gotinê/bi wateya rasteqîn*: Di Lûqa 24: ayeta 44'an de Îsa Mesîh bi vî awayî qala Nivîsên Pîroz dike: "Gava ez hê bi we re bûm min vê yekê ji we re gotibûn: 'Divê heçî tiştên ku di Zagona Mûsa de, di nivîsên peyxamberan de û di Zebûran de di derbarê min de hatine nivîsandin, werin cîhê xwe.'" Di Nivîsên Pîroz yên din de jî metodek wekhev têté derbdan: "Ev, bona vê gotina ku Xudan bi navgîniya peyxamberan gihandiye bête cih bû…" (Met. 2:15); "…Ma we di Nivîsên Pîroz de van gotinan qet nexwendin?…" (Met. 21:42); "Vê nivîsa ku we guhdarî dikirin, îroj hatiye cih" (Lûq. 4:21).

b) *Weke li gor wateya ku dayîna wê tê xwestin be*: Mînak, mirov nikare gotinên Îsa Mesîh yên: "…Ez mêw im

hûn jî şivmêw in…" (Yû 15:5) bi wateya wan ya rasteqîn bigire, ev gotinan, divê li gor wateya ku hatiye armanckirin bête famkirin. Wateya ku dayîna wê tête xwestin dê bi rehetî bête famkirin, lewre zimanê şayesandin ya dîmenî a ku hatiye bikar anîn, bi hêsanî famkirina wê pêk tîne. Di vê mînaka ku me dayîne de, hînkariya bingehîn de dawiya ayetê de cih digire: "Hûn bêyî min nikarin qet tiştekî bikin."

## I. 6. Rûmeta Danêzanên Kitêba Pîroz

**R60:** *Danezanên Kitêba Pîroz, zanînên herî bi rûmet in*: Mizgînkerê navdar yê Germen Wilhelm Pahls (1936– ) wisa dinivîse: "Danezana Mizgîniyê, nûçeya herî birûmet ya ji mirovan re hatiye gihandin e. Tu tiştek din nîne ku ji dûr û nêzîk bi wê re bête hevberîkirin ku ji mirovahiyê re hatibe gihandin…" Di Zebûra 119'an de pesnahiya Kelama Xwedê ya rûmeta wê bi ser her tiştî re ye tête kirin: "Mîna yekî xenîmetê dîtibe, ez dê di peyvên ku te dane de kêfxweşiyê bibînim" (Ayeta 162), "Zagona ku ji devê te ve derdikeve, bona min ji hezaran zêr û zîvî hê jî birûmettir e" (Ayeta 72).

**R61:** Kesê ku Kelama Xwedê red dike, dê ji ber vê tevgera xwe bête darazkirin: Waazkirina Kelama Xwedê dibe bawerî anîn û xelasiyê; redkirina wê jî dibe têkçûnê:

1.Samûyêl 15:23: "…Ji ber ku te emirê XUDAN red kir, XUDAN jî qiralbûna te red kir."

Yûhena 8:47: "Yê ku ji Xwedê ye, dê gotinên Xwedê guhdarî bike. A vay, ji ber ku hûn ne ji Xwedê ne, guhdarî nakin."

Karên Şagirtan 13:46: " Divê me Gotina Xwedê pêşiyê bigehanda we. Çawa ku we wê redkirin û xwe li gor jiyana abadîn nedîtin, niha em diçin neteweyên din."

**R62:** *Kitêba Pîroz ji Peymana Kevin û Peymana Nû ve pêk tê*: Her du jî Kelama Xwedê ye û li dijberî hev nayên bikar anîn.

Di Peymana Nû de tim û tim ji jêgirtinên ji Peymana Kevin hatine bikaranîn.

Herî girîngên peyxamberiyê Peymana Kevin, di Peymana Nû de hatine temam kirin. “Hemiyên wana (Gelê Peymana Kevin) çawa ku bi saya baweriyên xwe pesnahiya Xwedê qezenc kirine, lê tu yek jî negihaştin ya hatiye waadkirin. Bona ku ji me cihêtir negihêjin rayedariyê, Xwedê bona me tiştên hê jî qenc amade kirine” (Îbr. 11:39-40).

Xudan Îsa Mesîh di Peymana Kevin de jî heye: “Hûn vekolîna Nivîsên Pîroz dikin. Ji ber ku hûn dibêjin qey di vana de hûn dibin xwediyê jiyana abadîn. Yên ku şahidiyê ji min re dikin jî van nivîsan in!” (Yû. 5:39).

**R63:** *Apokrîfên (Peymana Kevin) wekî Kelama Xwedê nayên qebûlkirin*: (Bi Grêkî *apokryphos* = veşartî, nepandî derverastiyê) Van pirtûkan di demên vabera Peymana Kevin û Nû de hatine nivîsandin.Sedemên herî girîng yên li derveyî Kitêba Pîroz mayîna wan li jêrê hatine dayîn:

**1.** Van nivîsan hinek hînkariyên li derveyî Kitêba Pîroz in digirin naveroka xwe (binêrin Beşa Pêvek, II Rêgezên Şîrovekirina Kitêba Pîroz RŞ4). Mînak, weke, bi dayîna sedeqê bexşandina gunehan (Tobîas 12:9); parêstina sêrbaziyê (Tobîas 6:9); gunehên kesê miriye, bi navgîniya kesên şundamayîne bexşandin (2.Makabiyan 12:46).

**2.** Ev pirtûkan tû carî tevlî Kanona Cihûyan nebûne, lewre pêvekên paşê hatine kirin in. Ji ber vê yekê apokrîfan her tim bûne mijareke nîqaşiyê. Dêra Katolîk di Konseya Trentê ya ku di sala 1546’an de pêk hatiye, apokrîfan mîna Peymana Kevin û ya Nû hemtayî daniye. Divê ew kirin, mîna biryareke li dijî tevgera reformê ya wê demî hatiye stendin bête nirxandin.

**3.** Tu nivîskarên Peymana Nû jibergirtina Apokrîfan nekiriye. Lê belê di Peymana Nû de, ji bilî çar kitêbên kurt, ji hemî kitêbên Peymana Kevin ve jibergirtin hatiye kirin.

**4.** Apokrîfan bêqisûrbûna xwe îdia nakin. Di Pirtûka Sîrak de, di beşa gotina pêşiyê de wisa nivîsandiye: "Ez reca dikim van nivîsan bi balkêşiyeke famker bixwînin û ger hebe li xeletiyan biborînin. Çawa ku bona wergerandina pirtûkê hewldanek mezin nîşan dam, lê dîsa jî hinek vegotin kêm xuya dibin."

*Nirxandina Apokrifan*: Gelo divê Apokrîfan ji binî ve red bikin? Martîn Lûther bi serê van pirtûkan vê nîşeyê vekiriye: "Ev pirtûkan ne hemtayê Kitêba Pîroz in, lê belê dîsa jî di xwendina wan de qencî heye." Nivîskarê vê pirtûkê jî vê başdarî dîtinê dibe. Heta ku Apokrîfan bi Kitêba Pîroz ve hemta neyên girtin û tenê mîna nivîsên helbestî yên rûmeteke wanî dîrokî hene (mîna Makabiyan) bêne nirxandin, dibe ku qenciya wan hebin. Girîngiyek taybet ya Pirtûka Sîrak heye, ji ber ku li ser bûyerên ku di jiyana rojane de bûyîna wan pêkan e şîrove hatine kirin. Çawa ku îdia nake ku Gotina Xwedê yî, lê ji aliyê naverok û şêwazeyê mîna pirtûkên zanyariyê yên Kitêba Pîroz in.

## I. 7. Fambûn û famkariya Kitêba Pîroz

**R70:**

*a) Armanca Kitêba Pîroz bi hêsanî fambûn e:* "Ji bilî tiştê ku hûn bixwînin û fambikin em tiştekî nanivîsin" (2Kor. 1:13).

b) D*i naveroka Kitêba Pîroz de, di heman demê de ew qasî ramanên kur hene ku em tucarî nikarin hemiyên vana fambikin*: "Ji ber ku ramanên min ne ramanên we ne, rêyên we ne rêyên min in" dibêje XUDAN. "Ji ber ezman çawa ji rûyêerdê ve bilindtir be, Rêyên min jî ji rêyên we, ramanên min ji ramanên we bilindtir in" (Îşa. 55:8-9).

Charles H. Spûrgeon (1834 – 1892) di derbarê van her du taybetiyên Kitêba Pîroz de wisa dibêje: “Di naveroka Kitêba Pîroz de, rasteqîniyên nûwaze, ên famkariya me diborîne û sînorên hişên me nîşanî me didin hene. Lê belê famkirina hînkariyên bingehîn û girîng yên Kitêba Pîroz ne zehmet in.”

Çawa ku danezana Kitêba Pîroz bona her kesî di asta bihêsanî gihaştinê de yî (K. Şa. 17:11), lê dewlemendiya wê û tevayiya wê naqede û bêdawî ye (Rom. 11:33).

**R71:** *Kitêba Pîroz ji aliyê çelûpêncî zêdetir nivîskarên cihê, ên ku karê nivîsê ji wan re hatiye emanetkirin ve, di venêrana Ruhê Pîroz ve hatiye nivîsandin:* Ji ber vê yekê, naveroka wê, bêyî Ruhê Pîroz, bi awayekî rast nayê famkirin. “Lê belê mirovê xweza tiştên ku di derheqê Ruhê Xwedê de ne qebûl nake; ji ber ku vana ji wî re mîna tewşikî têne û ew nikare wan fam bike; ji ber ku ji aliyê ruh ve têne nirxandin. Lê belê mirovê ruhanî, hemû tiştan daraz dike; lê ew bi xwe ji aliyê tu kesî ve nayê daraz kirin” (1Kor. 2:14-15).

## I. 8. Rasteqîniya danezanên Kitêba Pîroz

**R80:** *Kitêba Pîroz xwedî rastiyek derasayî ye:* Vê wesfa Kitêba Pîroz dema ji aliyê zimanzanî, watedarî, ruhanî, dîrokî, zanistî ve bête vekolîn dê hê jî diyar bibe. Zulmdîtina bawermendên Mesîhî diyar dike ku aliyê dîrokî ya Kitêba Pîroz rast e. Bona dêra dema pêşîn, bi gotina “…Kesên ku di oxra navê Xudanê me Îsa Mesîh de canên xwe ji dest berdayî ne” (K. Şa. 15:26) tête nivîsandin.

Ji aliyê din, dema di Kitêba Pîroz de qala demên dawîn tête kirin, wisa tê nivîsandin: “…Min canên yên ku ji ber Kelama Xwedê û şahidiya ku didomîne hatine kuştin, dîtin” (Pey. 6:9). Di demên par de jî baweriyên cihê xwestine ku Îsa Mesîh tevî pergala ramanên xwe bikin. Ola Îslamê Îsa

wekî peyxamber be qebûl dike. Tevgera aştiyê jî Wî, ji ber ku aştîxwazeke bilindtir dikin. Hinekên din jî difikirin ku Ew mamosteyek qenc e an jî reformîsteke civakî ye.

Bona Albert Schweitzer (1875–1965) Îsa Mesîhê dîrokî hê jî girîngiyê li xwe bar dikir. Carl Friedrich v. Weizsacker (1912–2007; Birayê serokkomarê kevin yê Germenîstanê) jî civakeke aştiyê damezirandiye û pêş de daye ku mirovek dikare aştiya dinê pêk bîne.

Gellekan, heta ku li gor armanca wan be di derbarê Îsa Mesîh de diaxifin. Di ola îslamê de, rasteqîniya Îsa Lawê Xwedê yî nayê qebûlkirin. Lê belê tenê em bi Wî bawer bibin Ew ê bikaribe bibe xweşiya me; “Ji ber ku Mesîh bi xwe aştbûna me ye…” (Ef. 2:14). Ya na li dijî vêya Ew ê bibe Darazkirê me; “Û Wî emir da me ku, em ji gel re şahdeyiyê bikin û waz bidin ku Darazkirê mirî û zindiyan, yê ji aliyê Xwedê ve hatiye wezîfedar kirin, Ew e” (K. Şa. 10:42). Ev rastî, ji aliyê Tevgera Aştiyê ve tête paşçav kirin. Rastiyek din ya tête paşçav kirin jî; di Peyxamgirtin beşa 6’an de Îsa Mesîh wekî Berxê mohrê vedike û çar suwarên peyxamî yên nûneriya şer û mirinê dikin mîna daraziyê dişîne yî.

Nivîskarê Germen yê navdar Franz Alt (1938– ) li ser Waaza li Çiyê pirtûkek nivîsandiye. Lê belê di vê hînkariyê de destûra herî girîng ya Îsa Mesîh; ya ku dibêje, divê dev ji rêya fireh ya dibe têkçûnê bê berdan û ji deriyê teng ve bikevinê, ji nedîtinê ve hatiye. Her çi qas di pirtûka xwe de gellekî qala Îsa Mesîh kiribe jî, ev ne bes e. Îsa Mesîh di Waaza xwe ya Li Çiyêyî de vê îkazê dike: “Her kesê ku ji min re dibêje: Ya Xudan, ya Xudan! Ne yê ketina Serweriya Ezmanan e! Lê yê ku viyana Bavê minî ezmanî bike, dê bikevê. Wê rojê, dê gellekan ji min re bibêjin: Ya Xudan, ya Xudan! Ma me bi navê te peyxamberî nekirin? Ma me bi navê te cinan neqewirandin? Ma me bi navê te gellek karên biqudret nekirin? Û wê demê, ez ê bi eşkeretî

ji wan re bêjim: Min we qet nas nekir; ji min dûr herin, kesên bêzagon!” (Met. 7:21-23).

Tenê derbdayîna aliyên mirovî yên Îsa Mesîh, mirovên din bêhedar nakin. Lê belê em, mecbûr in ku Îsa Mesîh mîna ku Kitêba Pîroz têgihandiye bidin nasîn û bangkirin. Gellekan dema danasîna Îsa Mesîh, mîna Lawê Xwedê tête kirin, gellekî bêhedar dibin. Di roja me ya hemî rûmet têkdiçin de, zulûm li benda yên ku danezana Kitêba Pîroz bitûmî qebûlkirine û dixwaze bila Mizgîniya Îsa Mesîh be, dixwaze bila têgihandina Afirandinê be, li pêy gotinên “ji ber ku wisa hatiye nivîsandin” disekinin e. Waada serkeftinê, parazkirê Kelama Xwedê bûyîn û şahidiyê li Mizgîniya Îsa Mesîh kirin e (Pey. 12:11).

## I. 9. Dempariya ku danezanên Kitêba Pîroz wan digire nava xwe

**R90:** *Kelama Xwedê abadîn e*: Peyxamber Îşaya, derbasdariya nebatan û bêmiriniya Kelama Xwedê bi vî awayî hevberî hev dike: Giha hişk dibe, çîçeg diçilmise, lê belê Kelama Xwedayê me heta abadîniyê dimîne” (Îşa. 40:8).

Îsa Mesîh di Meta 24:35’an de bêdûmahîka gerdûnê hevgerî Kelama Xwe dike: “Dê ezman û erd ji holê rabin, lê belê dê gotinên min tu carî ji holê ranebin” (Meta 24:35).

Martin Luther (1483 – 1546) wisa dinivîse: “Kitêba Pîroz ne kevnar e ne jî hemdem e, ew abadîn e.”

Kitêba Pîroz di ser demê ye (demê diborîne), ji ber ku têgînên wê yên di derbarê şêwaza tevgeran de û zerengiyên wê yên nêrînê, gellekî pêşdatirî dema hatiye nivîsandin e. Her çi qas di Kitêba Pîroz de qala zebûniya tevzînerê, kurtaj û teknolojiya genê nehatibe kirin jî, li hemberî vana şêwaza ku bête pejirandin bi aşkereyî hatiye daxuyankirin. Wekî din tu pirtûk mijaran ev qasî bi berfirehî nanivisîne. Mînak; di roja me de pergala dadiyê, ger di mijareke nû de

zagonên ku derbasdar nehatibin çêkirin, dê darazî nikaribe rayedariya xwe bikar bîne û bixebite.

### I. 10. Gihaştina rasteqîniya Kitêba Pîroz: Berîdayina Îsa Mesîh

Li pêy hemî tiştên ku hatine nivîsandin niha divê em bipirsin; gelo em ê çawa bigihêjin rasteqîniya Kitêba Pîroz? Kesê ku di derbarê vê mijarê de qet bi tiştekî nizane dê Kitêba Pîroz çawa bixwîne û fam bike? Piştî civîneke mizgîniyê rewşenbirek ciwan nêzîkî min bû û xwest ku di derbarê famkirina Kitêba Pîroz de hînî dîtinên min bibe. Di dema axaftina xwe de çend dijrabûnên wî bersivandim û şik û gumanên wî buhartim. Paşê ji min re got ku dê Kitêba Pîroz di ronahiya hin ekolên feylesofî de bixwîne. Min bi vî awayî wî bersivand: "Hûn dikarin wisa bikin, lê belê wê gavê hûn ê Xwedayê ku xwe di Îsa Mesîh de daxuyankiriye nebînin. Lê dêvila wê hûn ê Xwedayekî tevxwedayî ya feylesofan a ku ne şexsî ye bibînin. Feylesofan Kitêba Pîroz di çarçofeya ramanên xwe de xwendine, lê belê Xwedayê ku di Îsa Mesîh de xelasiya me pêk aniye nedîtine. Ger hûn jiyana xwe bidine Wî, hûn hema dikarin îşev bigihêjin Kitêba Pîroz û Xwedayê Zindî. Gelo hûn dixwazin vêya bikin?" Zilamê ciwan pêşniyara min gebûl kir û li hêwanê ma.

**R100:** *Xwe binasin*: Werin em pev re Romiyan 3: ayeta 23 bixwînin: "Ji ber ku her kes gunehê kirin û bêyî bilindahiya Xwedê man." Ev ayet xuya dike ku em hemiyan di çavên Xwedayê Zindî de windabûyî ne. Em nikarin nêzîkî Wî bibin, ji ber ku di navbera me de gunehê ku me ji Wî veqetandine disekine û di xwebûna me de bona pesindayina Wî daxwaz jî nîne. Bi kurtayî; em bi tu awayî Wî heq nakin. Ji Ketinê vir de di navbera Xwedayê zindî û mirovê gunehkar

de kendaleke kûr heye. Gelo hûn vê teşhîsa Xwedê qebûl dikin?

**R101:** *Rêya yekane ya derketinê:* Rêya yekane ya ji vê herênayê derketinê, bitûmî karê Xwedê ye. Lawê Wî li ser xaçê bona gunehên me hatiye bicezakirin. Îsa Mesîh bona ku yê windabûyî xelas bike hatiye (Met. 18:11). Kesî wekî din yê xelasiyê pêk bîne nîne (K. Şa. 4:12). Ma gelo hûn dikarin vê rastiyê qebûl bikin?

**R102:** *Li gunehên xwe mukir bên*: Werin em pev re 1.Yûhena 1: ayetên 8-9'an bixwînin: "Ger em bibêjin ku gunehên me nîne, em xwe dixapînin û di nav me de rastî nabe. Lê belê ger em gunehên xwe mukir bên, bona ku gunehên me li me bibexşîne û me ji her xerabiyê ve paqij bike, Ew dilsoz û dadmend e."

Rayedariya bexşandina gunehan tenê aidî Mesîh Îsa ye. Ger em bi gotina Wî ewle bibin û gunehên xwe ji Wî re mukir bêne û bexşandinê bixwazin, em dê bikaribin bi dilsoziya Wî bawer bikin. Em dikarin bi rastiya Îsa Mesîh dê me ji bar û dîlitî û encamên gunehê bitûmî xelas bike ewle bibin. Lê belê di vê mijarê de tenê fikirandin ne bes e. Divê em dest bi tevgerê bikin! Gelo hûn bona kirina vêya daxwazkar in? Niha em hemî bi hev re di vê mijarê de bi duayekê bangî Xudan Îsa Mesîh bikin, (hûn dikarin vê duayê mîna bingehekê bigirin û bi awayekî din jî bang bikin):

Xudan Îsa; îroj dîtim ku di derbarê te de diaxifin û famkirim ku tu bona çi hatiye vê dinê. Te bi hezkirina xwe ya bêdawî min jî kêşa digel xwe. Tu hemî gunehên min – yên niha hay jê çêbûm û hê hay jê nebûme, yên ji min veşartî ne – dibînî. Tu bi her tiştî – qisûr û qebhetên min û her leqîna çewt ya dilê min – dizanî. Her tiştên min di Kitêba te de qeydkirî ne. Jiyana min bo te pirtûkek vekirî ye. Ez bi jiyana xwe ya niha nikarim li ber bilindahiya te biseki-

nim. Ji ber vê yekê ez ji te bexşandina hemî gunehên xwe û bitûmî paqijkirina xwe daxwaz dikim. Amîn."

We niha heçî tiştên ku divê hûn ji Xwedê re bibêjin gotin (1Yû. 1:8-9). Xwedê ewlehiya waada xwe dide. Gelo hûn dibêjin li çi qasê sûcên we hatiye bexşandin? Ji sedî heyştê ya wê? Ji sedî pêncî an jî ji sedî dehê wê? Wisa hatiye nivîsandin: "Lê belê ger em gunehên xwe mukir bên, bona ku gunehên me li me bibexşîne û me ji her xerabiyê ve paqij bike, Ew dilsoz û dadmend e." (1Yû. 1:9).

Hûn **bitûmî** hatine bexşandin! Belê hemiyên gunehên we, ji sedî sed! **Ev rastiyek e** – ne feraziyeyek, ne dibêtiyek an jî hêviyek e! – Kitêba Pîroz di vê mijarê de gellekî esehî ye, divê em bi vê rastiyê bitûmî bawerdêr bin. Di vê peywendiyê de hemî pev re ayetên 1.Pêtrûs 1:18-19 û 1. Yûhena 5:13'an bixwînin: "Û hûn dizanin ku, hûn ji jiyana xwe yî vala ya ji bapîrên we ve mayî, ne bi tiştên fanî, ne bi zêr, an jî zîv ve hatine standin, lê belê bi fidya biqîmet, bi xwîna Mesîh ya wekî xwîna berxikekî bêqisûr û bêleke ve."

"Bona hûn bizanibin ku jiyana we ya abadîn heye, ji we re, ji yên ku bi navê Lawê Xwedê ve bawerî anîne re, van tiştan nivîsandim û bi vî awayî hûn (ji niha pê ve jî) bi navê Lawê Xwedê bawer bikin."

**R103:** *Jiyana xwe bi rêvebirina Wî ve berdan*: Êdî Xudan Îsa Mesîh li hemî gunehên we bexşandine. Niha hûn dikarin hemî jiyana xwe bi destê Wî ve berdin. Di Yûhena 1: ayeta 12'an de wisa dinivîse: "Di kê de Law hebe, di wî de jiyan heye; di kê de Lawê Xwedê tunebe, di wî de jiyan nîne."

Her kesê ku jiyana xwe bi rêvebirina Îsa Mesîh ve berdane, mafê zarokê Xwedê bûyinê qezenc dike. Zarokê Xwedê bûyîn, ne xelateke ji ber karên meyî qenc, oldariya me an jî bi dêreke diyar e çûyîna me ye. Ji ber ku em jiyana

xwe radestî Lawê Xwedê dikin, bona îtaetkirin û şopandina Wî daxwazkar in, em mafê zarokê Xwedê bûyînê bi dest ve dixin.

Em vê yekê bi duayekê bizexmînin: “Xudan Îsa te hemî gunehên min bexşandin. Her çi qas bitûmî di vê ramanê de ne têgihîştîbim jî ez bi waadên te ewle dibim. Niha ji te dixwazim ku tu bikeve jiyana min. Di rêya ku te nîşanî min daye de rêvebiriyê li min bike û bibe rêberê min. Ez dizanim tu bo min her tiştên qenc dixwazî, bo vê yekê ez her qadên jiyana xwe bi çavdêrî û rêvebiriya te ve berdidim. Ji kerema xwe re min ji her tiştên ku di çavên te de ne rast in xelas bike. Ji kerema xwe re, di bin bereket û xêra te de hînbûn û tevgerên nû di min de pêkbîne. Ji kerema xwe re bona Kelama Te bînim cih dilekî îtaetker bide min. Ji kerema xwe re, alîkariyê bi min re bike ku ez di bin bandorê tiştên din û ramanên mirovan de nemînim. Bona ku ez Kitêba Pîroz fam bikim çavên dilê min veke ku ez bi awayekî rast hînî Kelama te bibim û di jiyana xwe de pêk bînim. Tu Xudan û Xelaskerê min î; ez dixwazim te bişopînim. Amîn.”

**R104:** *Pêşwazî bûyîn*: Xudan pêşwaziyê li we kir! We, bi berdêlekî Wî bi xwe daye stend û xelas kir. Êdî hûn zarokê Xwedê ne. Ev zarok di heman demê de mêrasker e; mêraskerê xezîneyên ezmanî ne. Ma hûn dizanin niha li ezmanan çi heye? “…gelo kêfxweşî?” Helbet! Di Lûqa 15:10’an de wisa dinivîse: “Ez vê yekê ji we re bibêjim, bi heman awayî dê milyaketên Xwedê jî bona gunehkarekî tobe kiriye kêfxweş bibin.” Vegera we ya Îsa Mesîh li ezmanan bûye şabûnek mezin. Tenê kesek Mizgîniya Îsa Mesîh bibihîze û Wî qebûlî jiyana xwe bike, bona hemî ezmanan dibe sedema şabûnê. Îsa Mesîh mîna Xudan û Xelasker qebûlkirin û pê bawerî anîn, bi navê vegerîna Wî tête binavkirin. Em gunehên xwe didine Wî. Ew jî hemiyan

paqij dike. Êdî em ji nû ve welidîne têne hesibandin, ji ber ku Wî jiyanek nû daye me. Êdî em dibin zarokên Wî. Bi Îsa Mesîh ve bawerî anîn û ji nû ve welidîn aidî hev in. Mîna her du aliyên pereyê hesinî ne.

**R105:** *Şukir kirin*: Xelasî, diyariyek Xwedê daye me ye. Ev rêya xelasiyê tenê bi saya hezkirina Wî ji me re vebûye. Bona xelasiya me tu tevkariya me nabe. Ev diyariyek bitûmî bêberdêl tête dayîn e. Her kesê ku diyarê distîne "spasiyê" dike. Niha em pev re şukiriyê ji wî re bikin. Bi gotinên xwe duayek şukiriyê ji Îsa Mesîh re bisêwirînin û bangî Wî bikin…

**R106:** Belê, lê niha dê çi bibe? Rewşa ku em tê de ne, di Kitêba Pîroz de mîna pitikek nû welidiye tête terîfkirin. Pitikek nû welidiye, helbet aidî malbata xwe yî, hûn jî êdî aidî malbata Xwedê ne. Pitikên nû welidîne, yekcaran ji demên krîtîk yên ên bi mirina pitikan ve encam dibe derbas dibin. Ev bûyer bona baweriya me jî mijara axaftinê yî. Em bi vegera Îsa Mesîh ji nû ve diwelidin. Mijara gotinê jiyanek nû ye. Pêdiviya yê nû welidiye li xwedîbûneke şemûs, eleqa û balkêşiyê hene. Xwedê bona ku em di rêya rast de werar bibin, hemî pêdiviyên me ji me re pêk tîne. Ger em şîretên Xwedê guhdarî bikin, em ê rastî mirina pitikan ya ne li bendê ne, neyên. Mijarên li jêrê digirin dest, tenê bona şagirtiya Îsa Mesîh, bona jiyaneke bi Wî re bête derbaskirin jî pêşmercên dev ji wan nayên berdan in. Ger em bi van pênc mercan ve pêwendî bimînin, Xwedê dê gihaştina me ya armanca hatiye diyarkirin mîsoger bike:

**1. Xwendina Kelama Xwedê**: We biryara xwe li gor Kitêba Pîroz ya Kelama Xwedê yî dan. Kitêba Pîroz, pirtûka yekane ya ji aliyê Xwedê ve hatiye rayedarkirin e. Ji aliyê rayedarî, rasteqînî, çendaniya zanînê û çavkaniyê tu pirtûk nîne ku bi Kitêba Pîroz ve bête hevber kirin. Di

jiyana we ya nû de bona xwedîbûnê teqez pêdivî heye ku Kelama Xwedê bête xwendin. 1.Pêtrûs 2: ayeta 2'an de bi aşkereyî ev mijar tête derbdan: "Mîna pitikên nû welidîne, bêriya Kelama Xwedê ya şîrê bêhîle di bîr de tîne, bikin."

Her roja bona xwendina Kelama Xwedê û famkirina daxwaziya Wî, demek diyar cihê bikin. Bona destpêka xwendina Kelama Xwedê, ji her çar beşên pêşiyê (mînak; Yûhena) yekî hûn destpê bikin, dê hê jî qenc be. Xwendina Kitêba Pîroz bînin elimandinek rojane ya şabûnê dide. Hûn firavînxwarinê an jî paqijkirina diranên xwe qet jibîr nakin ne wisa? Hûn dikarin xwendina Kitêba Pîroz jî bikin pariyek girîng ya jiyana xwe ya rojane.

**2. Duakirin:** Her roj bi Xwedê re biaxifin. Ew bi navgîniya Kelama Xwe bi me re diaxife û dixwaze em jî pê re biaxifin. Her tiştên xwe ji Wî re gotin, bona me îmtiyazek mezin e.

Li gora Kitêba Pîroz, hûn êdî tenê dikarin ji Xwedayê ku Bavê we ne û Îsa Mesîhê ku Xelaskerê we, Şivanê weyî qenc, hevalê we û hertiştê we ne, re dua bikin. Di Kitêba Pîroz de nenivîsiye ku li derve vêya ji yekî din re dua bikin. Dê dua hêzê bide we. Dê we bi awayekî erênî biguherînin. Her hêmanên jiyana we dibe ku bibe mijareke duayê: Xemgîniyên we, şabûnên we, pêşniyarên we. Bona her tiştê ku daye we şukiriyê ji Xudan re bikin. Bona mirovên wekî din û tengasiyên ku dikêşînin jî dua bikin. Bona yên li dora we ne jî baweriyê bi Wî bînin dua bikin. Xwendina Kelama Xwedê û duakirin, dê "gerîneke rûhanî" ya bona jiyanek ruhanî ya bi tendrust pêdivî jê re heye didin destpê kirin.

**3. Îtaetkirin:** Her ku Kitêba Pîroz bixwînin hûn ê di derbarê jiyaneke digel Xwedê ka dê çawa be bigihêjin zanînên qenc. Di vê mijarê de heçî tiştên ku hûn famdikin wergerînin çalakiyê; dê Xudan we berdar bike. Xwedê ji ber ku em bi Kelama Wî ve îtaet dikin û emirên Wî tînin cih, dê dilxweş bibe. Em dikarin hezkirina xwe ya ji Xudan

re bi herî qencî, bi îtaetkirina Wî nîşan bidin: "Xwedê hezkirin, di wateya emirên Wî bicih anîn de ye. Emirên Wî jî ne giran in" (1Yû. 5:3).

Dê dinya rêyên cihê nîşanî we bide, lê belê Kitêba Pîroz, pîvana ku Xwedê tesdîq dike wisa daxuyan dike: "Ji mirovan zêdetir, divê Kelama Xwedê bête guhdarî kirin" (K. Şa. 5:29).

**4. Pardarî:** Xwedê mirovan, bi pêdiviya bi yên din re hevpariyê bike afirandiye. Ji ber vê yekê divê hûn bi bawermendên Mesîh yên din ên ku jiyana xwe radestî Xwedê kirine re di nava têkiliyê de bibin. Ev kesan yên ku hûn ê bikaribin bi wan re dua bikin û di derbarê baweriya xwe de biaxifin in. Ger komira ku dişewite ji manqilê bête derxistin, dê di demek kurt de bicemide. Weke rêzikek be, hezkirina we ya ji Îsa Mesîh re ye jî dema bi bawermendên din re neyê pardarkirin, dibe ku bicemide. Beşdarî dêrekê bin û di civakê de çalak bin. Civakek dêra mizgînkar ya bi hemiya Kitêba Pîroz ve bawer dikin, bona ku hûn di rêya Xudan de pêş ve biçin gellekî girîng e. Dev ji kirina pardariyê bernedin…

**5. Bawerî:** Paşî ku we Îsa Mesîh mîna Xudan û Xelasker qebûl kirin, di jiyana we ya nû de pêşveçûna ruhanî gellekî girîng e.

Pawlosê Şandî ji Timotêyos re wisa dinivîse: "Lê tu jî bi rêgezên tu hîn bûyî û bi wan ewle dibe ve dilsoz bimîne…" (2Tîm. 3:14). Di dawiya jiyana xwe de Pawlos kariye ku wisa bibêje: "Têkoşîna bilind domandim, pêşbaziyê qedandim, baweriyê parastim" (2Tîm. 4:7). Divê em wî mînak bigirin û baweriya xwe biparêzin. Baweriyê bi Îsa Mesîh ve anîn ne destpêka encamekê, lê ya jiyaneke nû ye.

Êdî em "kedkarên" Xwedê ne (1Kor. 3:9). Divê em xîret bikin û alîkariyê bidine ku bila mirovên din jî di Mesîh de bigihêjin xelasiyê.

Du encamên bawerîanînê hene: Ya yekem, jiyana me ya li dinê wateyeke nû digire. Ya duyem jî em dê bibin zarokên Xwedê û mêraskerên jiyana abadîn.

*Deqa ku divê em her tim di bîra xwe de bînin*: Heta ku em mîna temaşevaneke bêalî bimînin, em ê nikaribin bigihêjin rastiya Kitêba Pîroz. Bona vê yekê divê em bibin "mirovê di nava mijarê de." Her kesê ku jiyana xwe bona Îsa Mesîh nezirandiye û diyariya xelasiyê girtiye, dibe mirovê "li bota canparêziyê suwar bûye" û bi vî di nava mijarê de ye. Her çi qas ketina nava mijarê bona her kesî bi awayekî cihê pêk bê jî, yên ku li jorê qala wan têne kirin, hêmanên baweriyê ên gellekî girîng in pêk tînin:

Gehîştina hişmendiya gunekariyê; mukirhatina gunehan; bi tobekirinê bi Îsa Mesîh ve weke Xudan û Xelasker bawerîanîn. Pêşveçûna ruhanî a vay, di vê deqê de destpê dike.

## I. 11. Encam

Di vê beşê de xwestim ku zerengiyên Kitêba Pîroz yên herî girîng in, bi awayejî rêgezên bingehîn kurt bikim. Ez hayîdar im ku keda mirovî ya bona Kitêbek ew qasî Xwedanî ye, dê bêkêmasî nebe û dê nikaribe têra xwe daxuyaniya dewlemendiyên Kitêba Pîroz bikin.

## II. Rêgezên şîrovekirina rasteqîniya Kitêba Pîroz (RŞ=Rêgezên Şîrovekirinê)

**RŞ1:** *Kitêba Pîroz xwe bi xwe daxuyan dike:* Bi gotineke din ji bilî Kitêba Pîroz pirtûk nîne ku xwe bi xwe ev qasî qenc şîrove bike. Ev rêgeza girîng ji aliyê Îsa Mesîh (mînak: Met. 19:3-6), ji aliyê şandiyan (mînak: Gal. 3:16) û ji aliyê peyxamberan hatiye pejirandin.

**RŞ2:** *Îsa Mesîh bi xwe mifteya yekane ya hemî şîroveyan e*: Ji ber vê yekê, bi taybet Peymana Kevin, ger Îsa Mesîh mîna çavkaniyê neyê nîşandayîn dê qenc neyê famkirin (mînak: Zeb. 110:1; Îşa. 53).

**RŞ3:** *Divê şîrovkirin bi ayetên pîroz ên din ve ne di nava nakokiyê de be,* (wekî din binêrin R52).

**RŞ4:** *Divê tenê ji ayetekê an jî ji gotarekê hînkariyek girîng neyê derxistin*. Danezanên gellekî girîng in, bi peywendî û awayan hatine dubarekirin. Mînak;

- Bêgunehiya Îsa Mesîh (1Yû. 3:5; 1Pê. 2:22; 2Kor. 5:21)
- Gunekariya mirov (Afr. 8:21; Zeb. 14:2-3; Îşa. 1:5-6; Met. 15:19; Rom. 3:23)
- Pilana Xwedê ya Xelasiyê (Hêz. 34:12; Met. 9:13; 1Se. 5:9; 1Tîm. 2:4)

*Nîşe:* Hezkirina Îsa Mesîh ji Bav (Yû. 14:31) û hezkirina Bav ji me (Yû. 16:27) di Kitêba Pîroz de bi vegotinek aşkere, tenê carekê cih digire. Tevî vêya ev rastî di hundirê gellek danezanan de tête tuwanckirin û/an jî wisa tê hesibandin. Ji ber vê yekê mirov bi rehetî dikare bibêje ku ev rastî xwe spartiye ayetan.

**RŞ5:** *Divê peywendî û hemdîtina Kitêba Pîroz her tim li ber çavan bête girtin.* Guhnedana vê rêgezê dê rê li hînkariyên çewt û xelet veke. Şandinên çepûrastê (ayetên referans) gellekî girîng in.

**RŞ6:** *Mirov dikare hinek hînkariyên Kitêba Pîroz, ji talîla bitûniya bûyerên tena serê xwe ne derxîne holê*: Kitêba Pîroz ne kitêbek monoton ya ji zagon – an jî – pexşana ve pêk têye yî. Bi hezar mînakên ku têne dayîn, tête daxuyankirin ku divê mirov bi Xwedê û mirovên din re têki-

liyê deyne. Dema lêkolîn di mijarên wekhev de li para hevbeş bête kirin, pêkan e ku mirov ji nava vana hînkariyek Kitêba Pîroz derxîne. Bona vê yekê, wekî mînakek qenc be mirov dikare têgihandina dîroka netewa Îsraêlê ya bikitekit nîşan bide. Xwedê çawa vê netewê berdar û daraz kir (1Kor. 10:11). Pirsa PDJB6 bikaranîna vê rêgeza şîrovekirinê hatiye bersivandin.

**RŞ7:** *Peymana Kevin daxuyankira jêneger ya Peymana Nû ye (bi gotineke hê jî diyar çareserkirina şîfreya wê ye).* Yanê, bêyî Peymana Kevin, famkirina gellek beşên Peymana Nû bêderfet in. (Minak: Afirandin, Ketin, Tofan).

**RŞ8:** *Naveroka peyxamgirtin ya Peymana Nû ji ya Peymana Kevin ve hê jî berfirehtir e.* Ev rastî, dema di Peymana Nû de beşa Nameya ji Îbraniyan re bête xwendin, dê bête rastandin. Em vê pirsê, mîna mijara "tol hildan" bigirin dest û daxuyanî bikin. Bona mirovekî xesara bide me tol ajotin û vê kirina wî "bi zêdeyî li wî wergerandin" hestek xwezayî ya taybetmendiya mirovbûnê yî: "Ger tola Kayîn dê heft carî bête hildan, divê tola Lamex heftê û heft carî bête hildan" (Afr. 4:24). Xwedê di Zagonên ku li Çiyayê Sînayê dane de, tolhildanê bi awayekî tund "yekî bi yekî" bi vî awayî bisînor dike: ji çav re → çav, ji diran re → diran, ji birîn re → birîn, ji pelçixandinê re → pelçixandin (Der. 21:23-25).

Îsa Mesîh jî di Waaza xwe ya Li Çiyê de zagona Peymana Kevin, her rewşê bi gotina, "lê belê ez ji we re dibêjim ku" destpê dike û daxuyan dike. Li ser Ji Misirê Derketin 21: ayetên 23-25'an ve Jinûvelêkirina Zagonê 32: ayeta 35 tetbîq dike û tolhildanê qedexe dike: "Lê belê ez ji we re dibêjim ku, li dijî yê xerab di berxwe de nedin. Dêma xwe ya çepê bifitilînin ber yê ku şîrmaqê li dêma we ya rastê dixe" (Met. 5:39).

**RŞ9:** Çawa ku di her beşa diyarkirî de bi aşkereyî nehatibe şermezarkirin jî, *di Kitêba Pîroz de tu carî li gunehê çav nayê girtin.* Ev rêgez di şîrovekirina wekoka keyayê fenek yê di beşa Lûqa di ayetên 16:1-8'an de derbas dibe de cihekî girîng bi dest ve dixe (Bnr. G10).

**RŞ10:** *"...dernekevin derve ya ku hatiye nivîsandin..."* (1Kor. 4:6).

**RŞ 11:** *Rasteqîna Kitêba Pîroz, di derbarê mijareke diyar de – ger li ser wê mijarê de di Kitêba Pîroz de hatibe vekolînkirin – ji çavkaniyên zanîn û zanyariyên din her tim pêş de ye.* "Balkêş bin! Bila tu kes bi feylesofiya xwe ne spartiye Mesîh, lê spartiye kevneşopiya mirovan û rêgezên bingehîn yên dinê, bi gotinên vala û xapînokî we bindest nekin." (Kol. 2:8).

**RŞ12:** *Vekolînkirina hemî ziraviyên gramêrî û wateyî yên di nivîsan de ne gellekî girîng in.* Şandî Pawlos di Galatiyan 3: ayeta 16'an de bikaranîna Afirandin ayeta 22:18'an ve metoda şîrovekirina Nivîsên Pîroz daxuyan dike.

**RŞ13:** Çawa ku wergerên Kitêba Pîroz yên vebirî û rast hene, wergerên hê jî kêmtir vebirin jî hene. Dema wateyên gumanbar hebin li nivîsa xweser (Bona Peymana Kevin li Îbranîtî, bona Peymana Nû li Grêkî) nêrîn dê rast be. Peyvek diyar e ger qenc neyê famkirin, mirov dikare li tekstên tê de heman peyv bi awayekî hê jî hêsantir hatiye bikaranîn binêre û wateya wê diyar bike.

Armancên cihê yên wergerên cihê hene. Mînak, di wergera Germenî ya Martîn Lûther wergerandiye de zimaneke bijarte, zimanekê hêsin û bandordar hatiye bikaranîn. Di wergerên ku wergervan şîroveyên xwe tevlê kirine de divê mirov gellekî balkêş be. Divê wergerên Kitêba Pîroz yên bi

armancekê ji teksta xweser ve dûr dikevin û li gor civakeke diyar in bitûmî bêne redkirin. (Mînak: Wergera “Dinya Nû” ya Şahidên Yehowa).

**RŞ14:** *Hinek beşên Kitêba Pîroz wekî di nava hev de di nakokiyê de bin, birastî hev temam dikin.* (Di vê peywendiyê de Rêgeza R52 bûjena 3 hevberî hev bikin)

## III. Divê em çima Kitêba Pîroz bixwînin?

Xwedê dixwaze ku xwendina Kitêba Pîroz bibe pariyek xweza ya rojane ya mîna xwarin û vexwarinê be. Ji ber vê yekê di Yêremya 15: ayeta 16a de wisa dinivîse: “Çawa ku min gotinên te dîtin, wan daqurtandim…” Ka ji ber çi divê Kitêba Pîroz rojane bête xwendin, dîsa di Kitêba Pîroz de nivîsandiye. Ji van sedeman yên ku herî girîng in li jêrê ne.

**1.** *Bona Xwedê çêtir nasbikin:* Bilindahiya Wî (Zeb. 19), hezkirina Wî (1Yû. 4:16), dilovaniya Wî (Hej. 14:18), dilsoziya Wî (Zeb. 25:10), rastiya Wî (Hej. 23:19) tenê em bi xwendina gotinên Wî dikarin fam bikin.

**2.** *Bona baweriyê:* “Nexwe bawerî bi bihîstina nûçeyê, bihîstin jî bi belavbûna gotina di derbarê Mesîh de ye dibe” (Rom. 10:17).

**3.** *Bona pêşveçûna me ya ruhanî:* “Û ger we qenciya Xudan tahm kiribin, mîna pitikên nû bûyî ne, bêriya şîrê ruhanî, yê bêhîle bikin, da ku, hûn bona xelasiyê bi wê ve mezin bibin.” (1Pê. 2:2).

**4.** *Bona ku ji xelasiyê bawer bibin:* “Bona hûn bizanibin ku jiyana we ya abadîn heye, ji we re, ji yên ku bi navê Lawê Xwedê ve bawerî anîne re, van tiştan nivîsandim” (1Yû. 5:13).

**5.** Ji bo perwerdeya rast*:* “Divê li gor perwerde kirinê, bibe yê ku bi zexmî, bi gotina dilsoz ve digire, da ku, bila di perwerdeya zexm de bikaribe teşwîqê bike û bika-

ribe dengê yên ku li dijî dibêjinê bibire” (Tît. 1:9). Kitêba Pîroz hemî hînkariyên bona em jiyan û ramanên xwe serrast bikin, pêdiviya me bo wê heye dide me. Ji aliyê din endamên hinek civakên hînkariyên rêşaş pejirandine, Kitêba Pîroz tenê bona tesdîqkirina ramanên xwe, mîna referansekê nîşan didin.

**6.** *Bona ku em di jiyana xwe de bi ewlekarî pêş ve biçin:* “Gotina te bo min çira, bona rêya min ronahî ye” (Zeb. 119:105).

**7.** *Bona ku em pêşaneyên jiyana xwe diyar bikin:* “Hûn pêşiyê li pêy Serweriya Wî û rastiya di Wî de ye biçin, wê gavê dê hemiyên vana ji we re bêne dayîn” (Met. 6:33).

**8.** *Bona mezinkirina zarokên xwe zanînên rênîşan didin bistînin:* “Van gotinên min di hiş û dilên xwe de bigirin. Weke nîşanek be li destên xwe girêbidin, mîna pêçeka eniyê bipêçin. Wan hînî zarokên xwe bikin. Dema hûn di mala xwe de rûdinin, di rê de dimeşin, radizên, radibin, qala wan bikin” (Jinû. 11:18-19).

**9.** *Bona bi cîranên xwe re têkiliyên rast deynin*: “…mîna xwe ji cîranê xwe hez bike” (Met. 19:19) û “Qet tu tiştî bi azweriyên ezezî an jî pesnahiyên vala mekin. Her yekê we bila bi dilnizmî yê din ji xwe seretatir bihesibînin (Flp. 2:3). “Lê belê ez ji we re dibêjim: Ji neyarên xwe hez bikin û ji bona yên ku zulmê li we dikin, dua bikin.” (Met. 5:44).

**10.** *Bona şabûnê dîtin û tezebûnê:* “Ez ê mercên xwe tu carî winda nekim, ji ber ku te bi wan jiyanê da min” (Zeb. 119:93). “Çawa ku min gotinên te dîtin, wan daqurtandim, ji min re bûn kêfxweşî, ji dilê min re şabûn. Ji ber ku ez yê te me ya XUDAN, Xwedayê Serwerê Her Tiştî!” (Yêr. 15:16).

**11.** B*ona di rewşên dijwar de xemrevîniyê bibîne:* “Ez bi toz û axê ve hatim raxistin, li gor soza xwe jiyanê bide min” (Zeb. 119:25).

**12.** *Bona di dema tengasiyê de alîkarî stendinê:* “Di

dema xwe ya tengasiyê de bangî min bike, ez ê te xelas bikim, tuyê jî min bilindtir bikî” (Zeb. 50:15).

**13.** *Bona bi rêya çewt ve şaş nebe:* “Ez bi li gora mercên te kirinê zanyariyê qezenc dikim. Ji ber vê yekê nefrîna min ji her rêyên çewt in” (Zeb. 119:104). Îsa Mesîh têdighîne ku nezanî mirovan bi rêya çewt ve dibe: “Îsa bi gotina, ‘Ji ber ku hûn bi Nivîsên Pîroz û hêza Xwedê nizanin, hûn xelitîn e’ bersivê da wan” (Met. 22:29).

**14.** *Bo xwe ji gunehê parastinê:* “Ez gotina te ji hişê xwe dernaxînim, bona li dijî te gunehan nekim” (Zeb. 119:11).

**15.** *Bona li gunehan mukir bên:* “Hemiya Nivîsên Pîroz peyxama Xwedê ne û bona perwerdekirina fêrkirin, pekandin, anîna ser rê û rastiyê, qenc in” (2Tîm. 3:16).

**16.** *Bona şîrovekirina dema di navê de ye:* “Peyxama Îsa Mesîh e. Vêya, Xwedê, bona ku bûyerên dê di dema nêzîk de çê bibin nîşanî qûlên xwe bide, da wî û ew, bi navgîniya milyaketê xwe şand û wê nîşanî qûlê xwe Yûhena da…” (Pey. 1:1)

**17.** *Wekî bingeha xebatên zanistî be:* Kitêba Pîroz ji me re rêgezên bingeh yên cûreyên guliyên zanistiyê pêk tîne. Pêşmercên vê xebatê bi taybetî destpêka dinê û jiyanê (mînak: gerdûnnasî, jeolojî, biyolojî) an jî di qadên din yê li mirova nihêrtin de cihekî girîng digire (mînak: psîkolojî, tip), xwedî wesfên dev jê nayê berdan.

**18.** *Bona famkirina daxwaziya Xwedê:* “…bona jihevcihêkirina daxwaziya Xwedê ya qenc, tête ecibandin û rayedar e, bi nûbûna ramanên xwe biguherin” (Rom. 12:2). Daxwaziya Xwedê tenê ne di Deh Emiran de (Der. 20:1-17), di cûreyên beşên Kitêba Pîroz de jî bi aşkereyî hatiye diyarkirin (Mînak: 1Se. 4:3 û 5:18; 1Pê. 2:15; Îbr. 10:36 û 13:21).

**19.** *Bona pakbûna ramanan:* “Bi gotina ku ji we re gotim hûn ji niha ve pak in” (Yû. 15:3).

**20.** *Bona tevgera bi zaniyarî:* “Bingeha zanyariyê tirsa

XUDAN e, her kesê ku rêzikên Wî bînin cih dibe xwediyê eqlê selîm. Heta abadîniyê pesnahî jê re têne pêşkêşkirin!" (Zeb. 111:10).

## IV. Divê Em Kitêba Pîroz Çawa Bixwînin? (RX=Rêgezên Xwendinê)

**RX1:** Divê em Kitêba Pîroz wekî dua bikin bixwînin. Martîn Luther di vê mijarê de şîretek bi zaniyarî dide: "Heta ku destên xwe li ser ayetan digerînin, şopên lingên wan bihezkirinê bişopînin."

Berî ku em dest bi xwendina Kitêba Pîroz bikin, tiştên ku divê em bikin:

**1.** *Ji Xudan bona xwe famkariyê xwestin:* "Çavên min veke ez nûwazeyên di zagona te de ne bibînim" (Zeb. 119:18).

**2.** *Ji Xudan re şukirkirin û pesnahiya Wî dayîn:* "Bila ji lêvên min pesnahî biherikin, ji ber ku tu rêzikên xwe hînî min dikî" (Zeb. 119:171).

**3.** *Mîna mirovekî diyariya mezin distîne:* "Mîna kesekî xenîmetê dîtiye, di gotinên ku te dane de şabûnê dibînim" (Zeb. 119:162).

**RX2:** Divê em Kitêba Pîroz di nava bendewariyê de bixwînin: "Devê min vekirî, ez bi helkehelk im, ji ber ku bêriya emirên te dikim" (Zeb. 119:131).

**RX3:** Divê em Kitêba Pîroz bi awayekî giyanî bixwînin: "…Wisa ku, em ne di rêya kevin ya zagona nivîsî de, lê di rêya nû ya Ruh de qûlitiyê bikin" (Rom. 7:6). Dema di Kitêba Pîroz de li ser ayetan dixebitin (binêrin R80) çawa ku vebirî (bêxeletî) bûyîna wê hatibe pêşniyarkirin jî, li dijî rêzikparêziya baweriyeke tund û bêcanî îkazan jî dikin (Met. 23:23,33).

Kitêba Pîroz berê me dide Ruhê Pîroz: “Wî me ne bona zagona nivîskî, lê bona bibin xizmetkarê peymaneke nû ya xwe spartiyî Ruh ve pispor danîn. Zagona nivîskî dikuje, lê belê Ruh dijîne” (2Kor. 3:6).

**RX4:** Divê em Kitêba Pîroz bi dilnizmî bixwînin: Ramanên Xwedê hişê me û ramanên me diborîne, ji ber vê yekê, mijarên em ji wan fam nekin jî bin, divê em qet bi şik û gumanê nekevin. Ev nêzikayiyek dilnizmiyê dixwaze yî: “‘Ji ber ku ramanên min ne ramanên we ne, rêyên we ne rêyên min in’ dibêje XUDAN” (Îşa. 55:8).

**RX5:** Divê em Kitêba Pîroz bi hezkirinê bixwînin: “Ez çi qas ji zagona te hez dikim! Di tûmiya rojê de li ser wê difikirim” (Zeb. 119:97).

**RX6:** Divê em Kitêba Pîroz bi baweriyê bixwînin: “…Dîsa jî ez ê toran li ser gotina te bireşînim (berdim)” (Lûq. 5:5).

**RX7:** Divê em Kitêba Pîroz weke peyamek şexsî ya ji Xwedê ve hatiye (weke peyamek hezkirinê) bixwînin: Di vê mijarê de dixwazim cih bi jibergirtina xwedênasê navdar A. Bengel bidim: “Nivîsên Pîroz nameyeke Xwedê ji min re şandiye ne; wisa ku ez dizanim divê jiyana xwe li gor wê biajom û li gor wê ji aliyê Xwedê ve bême darazkirin.”

**RX8:** Divê em Kitêba Pîroz bi sixletî bixwînin: “Bila gotina Mesîh, bi hemû dewlemendbûna xwe di hundirê we de bijî; bi hemû zaniyariyê hînî hev û din bikin, şîretan bidin hev, bi gotina Zebûran, qesîdeyan û murxên ruhanî di dilê xwe de bi şikiryê awazan bilindî Xwedê bikin.” (Kol. 3:16).

## V. Deh Waadên ku Ji Yên Kitêba Pîroz Xwendine re Hatiye Dayîn (Bona Kesên Kelamê Xwendine û di Jiyana Xwe de Bikar Tînin):

**1. Waad:** *Aîdî Xwedê bûyîn:* "Yê ku ji Xwedê be, gotinên Xwedê guhdarî dike…" (Yû. 8:47).

**2. Waad:** *Xweşiyê dîtin:* "Yên ku ji Zagonê hezdikin, xweşiyek mezin dibînin, tu tişt nikare wan tilpekî bikin" (Zeb. 119:165).

**3. Waad:** *Şabûnê dîtin:* "Min vana ji we re, bona şabûna min di we de be û şabûna we temam bibe gotim" (Yû. 15:11).

**4. Waad:** *Pîrozbûn:* "A vay, ez zû têm! Xwezî li yê ku li gor gotina peyxamberî ya vê kitêbê dike!" (Pey. 22:7).

**5. Waad:** *Fêkîdayîn:* "Ya wisa mîna darê li dora ava herikbar hatiye çikandî ye, fêkiyê xwe di demsala xwe de dide, pelê wê qet naçilmise. Her karê ku dike bi ser dixîne (Zeb. 1:3).

**6. Waad:** *Serkeftîbûn:* "Tiştên di Kitêba Zagonê de nivîsandine ji devê xwe nexîne. Bona bi pûte pêdanê hemiyan bîne cih şev û roj wê bifikire. Wê gavê tuyê serkeftî be û bigihêje armanca xwe" (Yşû. 1:8-9).

**7. Waad:** *Bersiva duayan girtin:* "Hûn di min de bimînin û gotinên min di we de bimînin, hûn her çi bixwazin dê ji we re bêne dayîn" (Yû. 15:7).

**8. Waad:** *Pakbûna ramanên mirov:* "Bi gotina ku min ji we re gotin, hûn ji niha ve paqij in" (Yû. 15:3).

**9. Waad:** *Qezenckirina zanyariyê:* “Tu Nivîsên Pîroz, yên ku bi navgîniya baweriya ku ji Mesîh Îsa re ye, dikare te bike zanyar û bighîne xelasiyê bike, ji zarokantiya xwe de dizane,” (2Tîm. 3:15). “Ger ji we yekî di zanyariyê de xwedî kêmasî be, bila ji Xwedayê ji her kesî re bi destfirehî, bê pekandinê dide ve bixwaze; dê Xwedê bide wî” (Aqû. 1:5).

**10. Waad:** *Xwedîbûna diyariya jiyana abadîn:* “Ez ya rast ji we re bibêjim, bona yê ku gotina min bibihîze û bi yê ku min şandiye re baweriyê bîne, jiyana abadîn heye. Yekî wisa nayê darazkirin, ji mirinê derbasî jiyanê bûye” (Yû. 5:24).

## Peyama Xwendekarekî

Rojeke înê ya meha tîrmeha sala 1987'an, saet jî heft û nîvê êvarê. Ez ji Düsseldorfê hê nû hatim Münchenê. Di taxa Marienplatz ya bajêr de di navendeke danûstandinê digerim. Li ber modaxaneyekê, yekî kaxezekê ji min re dirêj dike. Ev vexwendnameyek konferansa profesorek dê di mijara "Sedema Hebûna Stêrkan" de li Modaxaneya Muhlhauser li pêy demek kurt de wê bide bû. Xwe bi xwe re mîna, "Mijareke balkêş lê belê ez bawer nakim ku ji min zêdetir bizanibe. Lê dîsa jî herim û gotinên wî guhdarî bikim dê qenc be" fikirîm.

*Birêz Gîtt Beg,*

*Niha fam dikim ku çi bûye! Tê bîra min ku axaftina we ya wê şevê ji aliyê kesên ku mîna min ji kuçê derbas dibûn hatin û êrîşên tund kirin. Divê ez diyar bikim ku wê demê mirov çi dikirin qet fam nekirim. Gelo haya wan jê nînebû ku axaftvan ya rast dibêje? Ma gelo çawa wisa kor dibûn? Tiştên ku dihatin gotin bitûmî rast bûn! Heta wê demê di derbarê mijarên bawerî, dêr û hwd. de pêwendiyekê nexwestibûm. Bona min Îsa Mesîh mîna yên din mirovek bû. Lê dîsa jî axaftina we ya wê şevê bû sedema biryara herî girîng ya jiyana xwe stendinê.*

*Şeva par û ya dawiya konferansê min jiyana xwe radestî Xudan Îsa Mesîh kir. Birêz Gîtt Beg, yê ku min bona vê biryarê bistînim teşwîq kir, hûn, yê xizmetkarekî Qiraletiya Xwedê bûn. Niha, yanê deh sal li pêy wê rojê, dixwazim ku minetdariya xwe ji we re daxuyan bikim. Wa deman ez bîstûneh salî bûm. Neh meh li pêy konferansa we, ez li Düsseldorfê, di dêrek Îmadkar de îmad bûm. Lê mixabîn di dema ku li pêy tê jiyana min ket demeke xerab. Ez êdî bona Bavê xwe yê Ezmanî nedibûm çavkaniya şabûnê. Lê li*

*dijî vê yekê min rêya xwe şaş kir, bi zêdeyî li hebûnên dinyewî ve hatim pêwendbûn û jiyaneke li dijî Kelama Xwedê tê ajotim.*

*Niha ez famdikim ku wan deman Xudan Îsa bi xêra xwe min li ser pêlan hişt û dîsa berê min da rêya rast. Ez dixwazim têbighînim ku min vê yekê jî bi alîkariya we çawa pêk aniye. Rojekê ez û hevsera xwe, bêyî diyarkirina cihekî em lê bimînin, gereke kurt ber ve Holandê kirin. Rêya me, me anîn Noordwîjka navçeyek rexa behrê ye. Hê sezona havînê destpê nekiribû û gellek wargehên qonaxdayînê, ên em lê bimînin hebûn. Me biryara xwe bona pansiyonekê li ser rêgehê dan û hilkişiyan menzelên xwe. Bona ku mêvan bixwînin, pirtûkek û kovareke bi navê "ethos" danîbûn menzelê. Min pirtûkê girt destê xwe û destpêkirim û vegotên pêşiyê yên di pêşgotinê de ne, xwendim: "Çavkaniya ramanê nivîsandina vê pirtûkê, di derba konferansên mizgînîdayînê ên ku nivîskar li Mala Moda ya Muhlhauser a li Munîhê yî didan derket holê. Modakar Harro Muhlhauser, destûrê da ku em di dema heftayekê de her şev, qatê yekem ya karxana wî bikar bînin...." (Binêrin, Pêşgotin).*

*Nişkav de hay jê çêbûm! Tiştên ku di wê demê de ji dilê min derbas bûn, bona we famkirina wan gellekî zehmet e! Mirovê ku berê min daye Îsa Mesîh, dîsa bi min re diaxifî! Him jî bi çi awayî axaftin! Di pirtûka "Pirsiyariyan" de, bersivên li gor jiyana baweriya min ya wê demê de gellekî licih in hatibûn dayîn.*

*Ev bûyer di bihara 1993'an de pêk hatin. Ji axaftinên we yên Munîhê vir de deh sal buhurîn. Niha ez 39 salî me. Hevsera min jî mîna min bawermendeke Mesîhî ye. Sê zarokên me yên çar û du û yek salî hene. Di wan rojên min yên kevin de qet wateya jiyana min tunebû. Ez ne xwedî dîtinek dinê ya maqûl e bûm. Lê belê niha ez bi awayekî rast li jiyanê dinêrim. Ger hûn zanibin ev çi cihêtiyek mezin pêk tîne!*

*Dema baweriyê bi Xudan Îsa Mesîh ve anîm û bûm zarokê Xwedayê Zindî, wateya jiyana xwe dîtim. Ez bi Kelama Xwedê ve ewle dibim, baweriya xwe diparêzim û cihê xwe ya di civaka bawermenda deyî digirim. Min rê, rastî û jiyanê dîtin.*

*Birêz Gîtt Beg, ez bi dil û can spasiyê ji we re dikim.*

*Dîetmar Schmîdt*
*Grevenbroîch, 24 Tîrmeh 1997*

# Nivîskarê Pirtûkê: Kurteçîroka Jiyanê

Ez dixwazim di vê beşê de ka Xwedê çawa bi navgîniya Xudan Îsa Mesîh min dîtiye ji we re bighînim. Bi parvekirina çend demên jiyana xwe ya tevî Xudan bûm, banga Wî ya bo min, rêvebirina jiyana min û di her qadê de bona min çawa bûye bereket, dixwazim ji we re bighînim.

**1. Dema Zarokantî û Gehîştinê:** Ez di 22 reşemî 1937'an de li Prûsyaya Rojhelat, Raîneck/Ebenrodeyê hatime dinê. Heta ku mîna penaberê şer reva me, min di zeviyên malbata min de zarokantiyek bextewar û bêpirsgirêk borand.

Di Kewçêra 1944'an de, hê heft salî bûm û diçûm pola duyemîn, tevî malbata xwe hewcedar bûn ku ji bi seyareya hespan ji Raîneckê koçî Peterswaldê (başûrê Prûsyaya Rojhelat) bikin. Lê dema li wê bûn, me nûçeya dagirkeriya Rûsan gellekî bi derengî, di rêbendana 1945'an de bihîstin. Zimanê belavoka fermî ya kurt û tund her kesî qurfandin: "Yê ku bikaribin xwe xelas bikin, bila xwe xelas bikin!" Ji ber ku wê demê nexweş bûm û şewata canê min hebû, min ranekirin û tevî livînên min kişandin pêy seyareya hespan.

Ji nû ve em ketibûn rêyan, lê belê hê zêde neçûbûn ji aliyê Rûsan ve hatin sekinandin. Leşkeran dest dan ser birayê min Frîtzê 15 salî ye. Me wî carekî din nedîtin. Paşê diya min (Emma Gîtt, paşnavê wê ya qîzitiyê Gîrod) bi Ûkranyayê ve hate ajotin û piştî demek kurt li wê mir. Ji xaltîkên min duda, pisxaltiya min Rena, kalê min û ez di mijdara 1945'an de ji aliyê Polonyayiyan ve hatin dersînor kirin. Kalê min, ji ber ku em li der ve radizan, şevekê serma girt.

Ev bûyer beriya rêwitiya me ya ji Prûsyaya Rojhelat/Osterode destpê kir û di trêna barê de deh roj domiya pêk hat. Di dema rêwîtiyê de paşî ku li Sanîtza nêzîkî Rosto-

ckê ye sekinekê de, ya axir em gîhaştin navçeya Wyk ya li girava Fohra di Behra Bakur de yî.

Ji ber ku bavê min wan deman li Fransayê hêsîr ketibû haya wî ji tiştên ku bi serê malbata wî ve qewimîne tunebû. Bavê min mîna hêsîrên din li kaxezên ku mehê carekê têne belavkirin nikarîbû peyaman binivîse, ji ber ku hemî merivên me ji Prûsyaya Rojhelat ve berbi herêmên nayên zanîn reviyabûn. Bavê min şevekê di xewna xwe de ji dûrva merivek meyî, yê ku beriya şer li Rhînelandê jiyaye dibîne. Di vê xewna xwe de piştî gellek salan cara yekem pev re diaxifin. Dema ji hev vediqetin merivê me ji bavê min re wisa dibêje: “Hermann were serîdanka min.” Bavê min di xewna xwe de wisa dipirse: “Ma ez nizanim mala te li kuye. Ka navnîşana xwe bide min.” Merivê me bi vî awayî dibersivîne: “Li Bochûmê Kuça Dorstener, numra 134a.” Li pêy vêya bavê min hişyar dibe, qendîlekê vêdixe û navnîşana di xewna wî de jêre gotine bi cihekî ve qeyd dike. Dema vê xewna ecêb ji hevalê xwe yên girtî re dibêje, hemiyan pê re qerfên xwe dikin. Ji ber ku pûte dide xewna xwe û dê nameyekê ji wê navnîşanê re bişîne pê henekê xwe dikin û dikenin.

Lê belê navnîşana ku bavê min nameyê dişîne rast e. Bi vî awayî bi navgîniya merivekî meyî ji dûr ve fersend dibe ku bi xaltîka min ya wê demê navçeya Wyk ya li girava Fohrê rûdinê (Lîna Rîek paşnavê wê ya qîzitiyê Gîrod) bikeve têkiliyê. Nûçeya jiyîna bavê min, min bextewar kiribû. Bizorê bawer dibim ku ez ne sêwî me û bavekî min jî heye. Bavê min dema di sala 1947’an de ji hêsîriya xwe ya Fransayê vegeriya, ji malbata wî ya wendayî ez tenê mabûm. Hewldana dîtina karekî me heta zeviyên Sasse ya bakurê Germenîstanê birin.

Tiştên ji wê demê di hişên min de mane ne zêde ne. Qandî ku tê bîra min, ji gund, çend zarokan min bangî “saeta zarokan” dikirin. Ji ber ku nizanîbûm ev saeta zaro-

kan çiye, min digot qey saeta çîrokên pêriyan tête gotin e. Bi vê sedemê tevlî civîna mala Rahîbe Erna ya tenê bi menzelekê yî bûm. Paşê ez gellek carî tevlî van civînan bûm û gellek saetên xwe li wê buhurandim. Rahîbe Erna li gund, bi nêrîna nexweşan têkildar dibû.

Rahîbe Erna her sibeha yekşemê ji me re çîrokên ji Kitêba Pîroz in digotin. Dua dikir û digel me qesîdeyên Xudan bilindtir dikirin digotin. Piştî civîna pêşîn haya min jê bû ku tu eleqa van civînan bi çîrokên periyan re tunebû. Tiştên ku hatibûn gihandin min ji binî ve bandordar kiribû. Tiştên ku bihîstim, di dilê min de neqşiyan û destpê kirim û bi awayekî ahengdarî tevî civînan bûm.

Sala par bavê min dîsa zewicî û em hemî pev re li navçeya Jeetzela nêzîkî me ye koç kirin. Bavê min li zeviyên çend kîlometro dûrî gund in dixebitî. Bavmehriya min (Adelheît Gîtt paşnavê wê ya qîzitiyê Lîpowskî) gellekî ji min hez kir. Ji malbatên cotkar yên gund re cil û bergan diduritin û gellekî dixebitî. Di berdêla wê de em bêyî dayîna kirê rûdiniştin. Bavmehriya min bona ku xwarina me peyde bike, wekî karê duyem be ji destê wê ve her çi dihat, dikir. Ew bi xwe katolîkek rêzikên olê tînin cih bû. Lê çawa ku wisa bû, bona min, yê ku di wî emrê xwe de gellek di bin bandora dora xwe de dimîne, mîna xwe bike Katolîk, qet hewl neda. Ji ber vê tevgera wê, ez wê gellekî teqdîr dikim. Lê ez jî her çi bibe bila be, bi awayekî ahengdarî beşdarî saeta zarokan bûm.

Bi saya Xizmeta Rahîbe Erna ya xwe nezirandiye, di dilê min de tova Xwedê ya ku dê paşê şiv bide hatibû çandin.

Di sala 1950 de bavê min di Eyaleta Westphalîa, herêma pîşesaziyê karekî dît û em bi malbatî çûn Hohenlîmbûrgê û li wê bicih bûn. Mixabîn li wê pardariyek min teşwîq bike nedîtim. Li dibistanê perwerdeya olî ya lîberal e û li ser nirxandina Kitêba Pîroz e dihate dayîn. Di encama vê yekê

de saeta zarokan ya berê beşdarî wê dibûm di bîra xwe de anîm û xwe bi xwe wisa fikirîm: “Çi heyf e ku çîrokên Rahîbe Erna ji me re digotin ne rast in.” Tevî vêya agirê ku pêt û pêt di dilê min de dişewite û tîbûna min ya bona rastiyê qet netefiyan. Dêra ku yekcaran diçûmê jî di gera min ya li Xwedê re qet fêda wê nebû. Waazên ku didan gellekî bê alî û ji ser de bûn; nedigotin, pêdivî heye ku mirov dilên xwe biguherin.

**2. Dirêjî Xwedê bûyîn:** Min perwerdeya xwe ya bilind li Hannowerê di Zanîngeha Teknîkî de temam kir. Paşî ku bernameya xwe ya li Zanîngeha Aachenê qedandim, di kewçêra 1971’an de li Enstîtuya Fizîk û Teknolojî ya Brûnswîckê, ya ku niha bi navê Teknolojiya Zanînê tête zanîn ve destpê kirim û serekantiya beşekê kirim. Rewşa min ya wê demê dikarim bi vî awayî kurt bikim: Ez ji aliyê kar ve gellekî serfiraz bûm. Azmûnên di derbarê du pisporiyê de bi “cûmlaûde” (dereca serfiraziya herî sereta) derbas kiribûm û dozîneya xwe bi dereceyek qenc stendibûm.

Li dervî vêya ji Zanîngeha Aachenê bona min du heb madalyayên “Borchers” (madalyayên serfiraziyên zanistî yên bona bîranîna Fizîkvanên Germen Hans-Jurgen Borchers têne dayîn) hatibûn dayîn. Bi pêşniyara kar ya hema li pê vêya stendibûm dest bi xebatên xwe yên zanistî kirim.

Di sala 1966’an de zewicîm. Du zarokên me bûn. Em malbateke dilşa bûn. Rewşa me ya aborî gellekî qenc bû, pirsgirêkên me yên malbatî an jî tendrustî jî qet tunebûn. Hinekan dikarin bibêjin qey di jiyana me de qet ji Xwedê re cih nîne. Ez dixwazim bi taybet derbdayîna vê mijarê bikim, ji ber ku di şahidiyên ku heta vê demê guhdarî kirime de, mirovan têgihandine ku gellek caran ji ber tundiyek di jiyana xwe de berî dayîne Mizgîniya Îsa Mesîh. Ev rewşa bona jiyana me ne wisa bû. Mîna li ser dinê gellek

cûreyên mirovan hene, bangkirina Xwedê ya ji mirovan re jî, ji ev qasî rêyên cihê ve pêk tê.

Di payîza sala 1972'an de tevî hevsera xwe beşdarî du civînên mizgîndayînê yên li Brûnswîckê ne, bûn. Sazkirên civîna pêşîn ya li dibistanekî herêma em lê dijîn saz bû, civakek Xirîstiyan ya biçûk bû. Bona her kesên beşdar bûne Kitêbek Pîroz û pênûsek sor didan. Ez wisa fikirîm ku ev ramanek gellekî qenc e. Dema beşdarvan li ser beşên girîng dixebitîn, binya her ayetê ku vekolînê dikirin xêz dikirin. Li pêy vê xebata ku heftiyekê domiya, Kitêbên Pîroz dan beşdarvanan. Bi vî awayî ez û hevsera xwe bûn xwediyê du Kitêbên Pîroz yên wekhev û dema me pev re dixwendin, dor dihat ayetên binê wan xêzkirî, me wisa hês dikirin ku em di civînê de ne.

Civînên cûreyên duyem jî, hema li pêy ya yekem hatin sazkirin. Qandî 2000 beşdarvan, her roj hêwana bîneya şaredariya Brûnswîckê dadigirtin. Mijarên ku li ser wan xebat dihatin kirin ji hinek danezanên Kitêba Pîroz ên hejmarên wan gellekî kêm in hatibûn stendin û gişt, bi awayekî aşkere bang li mirov dikirin ku bila biryarê bide. Her şev bona xwe radestî Îsa Mesîh bikin û jiyaneke bawerî biajon bang dihatin kirin. Vexwendname gellekî aşkere bû…

Li pêy waaza ku Leo Janz li ser Lûqa 17: ayetên 33-36 dabû, divêtiya rêya xelasiyê an jî daraziyê bijartina min ew qasî diyar bû ku, min kelecanî û tirsa xwe bindest kir û derketim pêşiyê. Hevsera min jî digel min derket pêşiyê. Tevî hevdîtinên şexsî li pêy duayên ku bi şêwirmendan re (ruhanî) hatin kirin, em ji xelasiya xwe ve bawer bûn. Her du şêwirmendên ku em bi wan re axifîn jî endamên Koma Kitêba Pîroz ya xebata malan ya ku em jî paşê tevlî wê bûne bûn. Li Brûnswîckê şevên mizgîndayînê domiyan. Yek caran ji Dêra Martîniyê Waiz Heînrîch Kemner diaxifî. Di van şevan de dêr heta dev tijî dibû. Ez waaza wî ya li

ser avên ku ji perestgehê ve herikîne (Hezekiyêl 47) tu carî jibîr nakim. Danezana wî ya xurt ew qasî bandorê li ser min kir ku, hema di wê demê de biryar dam ku ez ê lêkolînê lê bikim hela vî mirovê taybet ji ku ve hatiye. Divê teqez min wî dîsa guhdarî bikira.

Paşê demek din rêya min dagerî Krelîngenê. Krelîngen li nêzê Walsrodê gundeke biçûk û mîna xewnê bû. Di bin darê berû yên Krelîngenê de, civînên (mizgîndayînê) yên dirêjî Ciwanên Ahldenê bûyîn, bi awayekî girîng bandorê li ser pêşveçûna min ya ruhanî danîn. Pirtûkên Waiz Kemner min teşwîq dikirin û bona ku ez jiyana xwe birêkûpêk bikim, bi awayekî qenc alîkar dibûn.

Li pêy hemî van pêşveçûnan, min berê xwe da xebatek hê jî nezirandî û taybet bona Kitêba Pîroz. Di encamê vê xebata xwe de têgihîştim ku Kitêba Pîroz bitûmî Kelama Xwedê yî û mora rastiyê lê ye. Bandora vê têgihîştina min ya vê rastiyê gellekî mezin bû. Kitêba Pîroz bingehên zexm yên jiyan û ramanên min pêk dianîn. Çawa ku ewlehiya min bona Kelama Xwedê ya di zarokantiya xwe de di civînan de bihîstime hatibe cih, wisa qenîet anîm ku ez bona vê rastiyê diyarî kesên din jî bikim amade me. Pêşiyê di dêra xwe de, bi kirina serekketiya xebata Kitêba Pîroz dest bi xizmeta Xudan kirim. Û ji aliyê din, dema fersendê didîtim, şahidiya bawerbûna xwe ya ji Îsa Mesîh re jî didam.

Ez wisa bawer dikim ku aidbûna civakeke bawermendan ya xwe spartiye Kitêba Pîroz û ji vê civakê re xizmetkirin merca pardariyê ya nebe nabe yî. Min Îsa weke Mesîh, Lawê Xwedê û Xelasker naskir. Ew yê ku aidî abadîniyê yî, Xwedayê ku Bavê xwe ye berdaye, bedena mirov girtiye û daketiye nava me û li gor pêşniyara Xwedê ya ku hişên me nagire, me xelaskirine. Hemiya Peymana Nû şahidiyê dike ku Xwedê bi navgîniya Îsa Mesîh Afirkerê tevî dinya me û hemiyên zindî li ser in, yê hemiya gerdunê yî. Ji bilî vê rastiyî tu tişt nîne, ji ber ku “her tişt bi navgîniya Wî bû,

tu tiştê ku heye, bêyî Wî nebû” (Yû. 1:3). “Ji ber ku li erd û ezman, hemû tiştên xuya dibin û yên xuya nabin, textan, serweriyan, rêvebiriyan û hukimraniyan, her tişt di wî de hate afirandin; hemû tişt bi navgîniya wî û bona wî hatine afirandin” (Kol. 1:16).

Ev rastî, bona min yek ji ramanên herî bilind in. Afirker û mirovê li ser xaçê ye yek û heman in! Gelo sedema Xudanê Xudanan û Qiralê qiralan bo min biriye ser xaçê çi bû? Yûhena 3: ayeta 16’an vê pirsa min dibersivîne, lê belê dîsa jî hişê min tênagihêje kûraniyên vê rastiyê: Sedema vêya hezkirina Wî ya bêdawî ya bona me ye. Hezkirina Wî bona mehvnebûna min her tiştî kiriye.

**3. Kitêba Pîroz û Zanistî:** Mijareke di Kitêba Pîroz de cih digire, her tim tehsîrê li ser min kiriye: Pêwendiya ayetên pîroz û pirsên zanistî – bitaybet jî yên di derbarê afirandinê de –. Haya min jê heye ku ev deqa hiş û zanistî digihêjin hev bona rewşenbirên dema min mîhengek e. Ger bîrdoziya peresanê rast be, pêdivî nîne ku têgihandina afirandinê rast be. Û ji aliyê din ger têgihandina afirandinê rast be, wê gavê divê bîrdoziya peresanê xeletiyek li dinê ya herî mezin û bi xeter e be. Dema ez di qada pisporiya xwe – yanê di zanista zanînê de – ji aliyê bûyerên hatine qebûlkirinê dinêrim, peresanê bi vî awayî dinirxînim: Ev modela ne tenê bi kitekitên xwe yên biçûk de, ji pêşniyarkirinên xwe yên bingehîn de jî xelet e.

Pariyek girîng ya jiyanê ji aliyê zanîna di hicrokan (DNA) de pêk tê. Lê belê zanîn ne bûyerek bûjenî, lê kemiyetek hişmendî ya ji viyan û aqil ve pêk tê ye. Zanîna nû jî ne di emcama guhertin (mûtasyon) û neqandinê de, lê tenê di pêvajoya ramanê afirkerekî dê bête hilberandin. Kitêba Pîroz vê rastiyê bêkêmasî û bi awayên cuda ve têdighîne. Mînak; Methelokên Silêman 3:19: “XUDAN bingeha dinê bi zaniyariyê ve danî, ezmanan bibaqilî bicih kirin.”

**4. Di Xizmeta Xudan Îsa de: Di betlaneyek me di sala** 1976'an de di girava Langeoogê ya di Behra Bakur de yî, tevî hevalbendên xwe yên nêzîk in kirine de, mijara giştî ya axaftinên me yên li beravê ne, afirandin bûn. Hevalê min pêşniyar kir ku ez dîtinên xwe yên di derheqa vê mijarê de ne bi civaka wî ya bawermendan ve par bikim. Bi vî awayî min axaftina xwe ya giştî di sala 1977'an de kir. Çawa ku agahiya civînê tenê bi devan hatibû bangkirin, lê hejmara beşdarvanên ji herêmên dûr ve hatine min şaş kir. Aşkere bû ku ev mijar, bona gellek mirovî pirsek dijwar ya li benda bersiva xwe yî bû.

Vê axaftina min ya cara pêşîn kiribûm, bû sedema paşê rêvekirina gellek caran mîna axaftvanekî vexwendina min. Ev xizmeta min sala par di tûmiya welêt de ew qasî pêşve çû ku, êdî ji vexwendiyên distendim, tenê hinekan dikarîbûm qebûl bikirama.

Di kovarek bona Xirîstiyanan e paşê nivîseke di derbarê dîtina peresanê û têgihandina Afirandinê ya di Kitêba Pîroz de yî tevî hev kirine, nivîseke xwe spartiye Kitêba Pîroz û nakokiyên di nava peresan û Afirandinê de nîşan dide û wan hevberî hev dikin amade kirim. Lê belê vê nivîsa min ji aliyê kovarê ve nehate qebûlkirin, ji ber ku nêrîneke derhênerê weşanê ya li "xwedêzanistî" yê cihê bû. Ev xebata min bi alîkariya nivîskarekî din mîna rîsaletekê hate amadekirin û di meha gulanê ya 1977'an de li Brûnswîckê qandî 3.000 hebî hate çapkirin. Weşanxane li pêy demekî kurt ji me xwestin ku em naveroka vê rîsaletê berfirehtir bikin û wergerînin pirtûkekê. Wê pirtûka ku me amade kiribûn, bi navê "Afirandin an jî Peresan?" cara yekem di sala 1978'an de hate çapkirin.

Bi saya vê weşanê, gihaştim derfeta naskirina zanayên zanist, yên nêrînên wan ên di derbarê peresan û Afirandinê de nêzîkî min in. Paşî demekî din, komek xebatê ya navê wê Gotin û Zanîn (Wort und Wissen) e hate damezirandin.

Ez vê koma ku birastî komeleyek qeyda wê ya fermî heye, di sala 1981’an de weke rêvebirekî beşdar bûm. Armanca komelê Kelama Xwedê di qada ramandinê (entelektûêl) de bike mijara nîqaşê û piştgirî û pêşvebirina xebatên zanistî yên di derbarê Kitêba Pîroz de ne bû. Bîrdoziya Peresanê di her qadên zanista xweza û civakê de bandorên xesardar û mayînde hiştine. Bitaybet jî gihaştina rewşenbîran bo Kitêba Pîroz ew qasî dijwar kirine ku, birastî jî pêdiviya wan ji alîkariyê re hene.

Dema bi kûrahî li ser daneyan vekolîn bête kirin dê bê dîtin ku şîroveyên/daxuyaniyên rastiyên zanistî yên bi spartina têgihandina Afirandinê, ji şîroveyên li gor têgihandina peresanê têne kirin hê jî rasteqîne ne.

Bi salan e ez li ser dozîneya zanînê dixebitim, di encama xebatên xwe de kariyam ku hinek zagonên xwezayê ên di derbarê zanînê de ne formule bikim. Di zanîngehên li welatê xwe û derveyî welat in de û di konferansên zanistî de, li ser dozîneya zanînê axaftinan kirim.

Yên li dora min in biheterî dixwestin ku ez axaftinên xwe bikim awaya pirtûkekê. Li ser vê yekê, tevî konferansên xwe destpê kirim û pirtûkê jî nivîsandim. Pirtûka min ya duwemîn “Di nava şeş rojî de ji aloziyê ber ve mirov” (Navê wê ya kevin logos an jî kaos) di sala 1980’an de hate çapkirin. Bi hinek şundavegerînên ji xwendevanan ve girtime fam kirim ku pirtûka min rê lê vekiriye ku gellek mirov ji peresanê vegeriyane Afirandinê. Dema biçûkbûm yekî bigota ku tuyê rojekê bibe nivîskar min ê qet pê bawer nekiriba. Di salên xweyî dibistanê de ji nivîsandina kompozîsyon an jî nivîsên cerbê ve qet hez nedikirim. Wisa ku, ger pêkanbûya ji dêvila nivîsandina kompozîsyonekê ketina deh azmûnên matematîkê didam ber çavan.

Di nava demê de hay jê çêbûm ku pirsên di dawiya konferansên min de ji min têne pirsîn, di hinek qalibên diyar de ne. Van pirsan di rêzepirtûkan de girtim dest. Rasteqî-

niya her tim ewlebûna Kitêba Pîroz di pirtûka min ya navê wê “Mîna ku Hatiye Nivîsandin” (1985) de bi kûrahiya xwe hatiye daxuyankirin. Pirtûka min ya bi navê “Şahidiya Kitêba Pîroz ji Afirandinê re” (1983) ye, dide xuyakirin ku danezanên di Afirandinê de ne di roniya bûyerên zanistî yên roja me de ne jî ewlekar in. Di pirtûka min ya bi navê “Ger Zimanê Ajalan Hebûya” ye û di sala 1990’î de hatiye çapkirin de Afirandin, bi spartina zanistiyê be jî bi awayekî hêsan û xweş hatiye bi dest ve rahiştin. Wesfên alema ajalan ya bi hostayî hatine pêşniyarkirin ne tenê şaşitiyê, tevî wê baweriyê jî pêk tîne. Di pirtûka min ya bi navê “Û Olên Din?” (1991) de jî, bi nêrîna Kitêba Pîroz rewşa olan, ol dikarin gunehan bidin bexşandin yan na û xelasiyê pêktînin an na hatiye bi dest ve rahiştin.

Ji ber ku tevî mijara di vê pirtûka min de hatiye vekolandin Mizgîniya Îsa Mesîh jî bi dest ve hatiye girtin, wesfa wê ya mizgîndayinê bitaybetî bilind e. Ji min re dihat gotin ku xwendevan dixwazin bitaybet pirtûkên rastiyên zanistî bi danezanên Kitêba Pîroz ve têkildar dikin. Xebatên pirtûkên wisa bû deqa navend ya xebata min jî. Pirtûkên min yên navên wan “Stêrk û Armancên wan” (1993), “Di destpêkê de zanîn hebû” (1994) û “Nûwazeya Mirov” (1996) li gor vê armancê ne. Di hemiyên van pirtûkan de mijarên zanistî, bi ewlekariyek bêkêmasî di Kitêba Pîroz de radihêjin dest û bi daxuyaniyek bêkêmasî banga baweriyê ji Îsa Mesîh re tête kirin.

Di sala 1990’î de bi telefonekê ji kesekî nenas ve stendime, bo min qadeke nû ya xebatê vebû. Kesê ku geriya ji min re got ku ew li Yekitiya Sowyetan hatiye dinê û li wê perwerdê dîtiye. Birastî ew bi xwe Germen bû, lê belê bi awayekî têkûz dikarîbû bi Rusî bixwîne û binivîsîne. “Min gellekî pirtûkên we xwendin. Gelo hûn naxwazin digel min werin Yekitiya Sowyetan (ya kevin) û li wê konferansê bidin? Ez dikarim axaftinên we wergerî-

nim Rûsî.” Min ji wî bona ramandinê hinekî wextê xwest. Dema carekê din li min geriya, min qebûlkirina pêşniyara wî jê re got. Bi vî awayî di Gulana 1991’ê de rêwîtiya xwe ya pêşîn ber ve Moskovê ve kirim. Deh rojan di şunwarên cihê de (mîna akademiya mamosteyan, dibistana danûstandinê, nexweşxane, karxane, artêşgehan) me Mizgîniya Xwedê dan bangkirin. Xwedê bi xêra xwe dilê guhdarvanan vekir. Gellekan biryar stendin ku jiyana xwe radestî Îsa bikin.

Ew kesê ku Xwedê pêk anî ku em pev re xizmetê bikin Dr. Harry Troster e. Ew bi xwe di beşa pêşvebirinê ya Mercedes-Benzê de dixebite. Ji sala 1990’î vir de me pev re her sal bona mizgîndayînê rêwîtiyê li welatên di nava Bloka Rojhelatê de ne kirin. Em pev re du carî çûn Moskovê, carekê jî çûn Kazakîstan û Kirgizîstanê. Wekî din me seriyekî dan herêma bakur ya Prûsyaya Başûr (ya ku di roja me de di nava tixûbên Rûsyayê de ye).

Em tu carî tena xwe dernakevin van rêwîtiyan; her tim tîmeke ezmûndar jî digel me ye. Di her gera me de berî ku em bigihêjin cihê ku em diçinê, bi zêdeyî Peymana Nû, Pirtûkên Mizgîndayinê û yên zarokan dişandin wê.

Di bernameyên me yên gerê de welatên ku Îngilizî lê dihat axaftin jî hebûn. Mînak di sala 1992’an de em qandî şeş hefteyî li Komara Efrîqeya Başûr hinek bajaran geriyan û konferansan dam.

Heman bernameya gerê di sala 1995’an de qandî Namîbya jî bigire naveroka xwe hate firehtir kirin. Di sala 1997’an de ji Awistûryayê pêşniyarekê stendim. Li Brîsbane, Darwîn, Perth, Adelaîde, Melboûrne, Hobart (Tazmanya), Sydney û Canberrayê rêzekonferansan dam.

Dema difitilim û li raborînê dinêrim û çawa ku ez zanayekî zanistî bûm û lê bi awayekî ne li bendê bûm û hêvî nedikirim îroj bûme waiz û nivîskarê pirtûkên Xirîstiyaniyê, bi xwe şaş û metal dimînim.

Waizê mizgînkarê navdar Heînrîch Kemner demekê wisa gotibû: “Em tam nadin, têne tamdan.” Ez wisa bawer im ku ev gotinan bikaranîna Xwedê ya di jiyana min de bi taybet derbasdar in. Xwedê mirov dixe nava rewşên taybet. Dema Wî derî vekir, divê hûn bimeşin. Ji ber ku tenê tiştên Xwedê amadekirine, xwedî berdarî û pîrozkirina Wî ne.

## Çavkanî

Lîsteya pirtûkên yên nivîskar in û berhemên din yên jibergirtin ji wan hatine kirin in. Referansên ku hatine stendin bi tîpa G hatiye şanîdan (mîna G4, G7).


[G1] So steht's geschrieben, Neuhausen-Stuttgart*, Çapa 5. 2000, 200 Rûpel

[G2] Das biblische Zeugnis der Schöpfung, Neuhausen-Stuttgart*, Çapa 8. 2004, 188 Rûpel

[G3] What About the Other Religions? *(Û Olên din)*, CLV Bielefeld**, Îngilîzî Çapa 2. 2001, 159 Rûpel (Germenî 8. Çapa 2004, 174 Rûpel)

[G4] In 6 Tagen vom Chaos zum Menschen Logos oder Chaos – Naturwissenschaftliche und biblische Grundfragen zur Schöpfung – Aussagen zur Evolutionslehre *(Di Nava Şeş Rojî de ji Aloziyê Berve Mirov)*, Neuhausen-Stuttgart*, Çapa 6. 2002, 238 Rûpel

[G5] In the Beginning was Information *(Di Destpêkê de Zanîn Hebû)*, CLV Bielefeld**, Bi Îngilizî Çapa 2. 2000, 256 Rûpel (Bi Germeni Çapa 3. 2002, 360 Rûpel)

[G6] Did God Use Evolution?, CLV Bielefeld**, Bi Îngilizî Çapa 2. 2001, 152 Rûpel (Bi Germenî Çapa 7. 2005, 159 Rûpel)

[G7] Stars and Their Purpose *(Stêrk û Armancên Wan)*, CLV Bielefeld**, Bi Îngilizî Çapa 2. 2000, 217 Rûpel (Bi Germenî Çapa 4. 2004, 222 Rûpel)

[G8] If Animals Could Talk *(Ger Zimanên Ajalan Hebûya)*, CLV Bielefeld**, Bi Îngilizî Çapa 4. 2001, 124 Rûpel (Bi Germenî Çapa 15. 2006, 128 Rûpel)

[G9] The Wonder of Man *(Nûwazeya Mirov)*, CLV Bielefeld**, Bi Îngilizî Çapa 1. 1999, 156 Rûpel (Bi Germenî Çapa 2. 2003, 155 Rûpel)

[G10] Nur die Klugen kommen ins Himmelreich (Şîroveya di derbarê Keyayê Fenek ya di Lûqa 16:1-8'an de derbas dibe), Kovara 'Bibel und Gemeinde' (1985), Hejmar 2, r. 191-200.

Navnîşanên ku hûn ê bikaribin sparîşa pirtûkan bikin:
* Hänssler-Verlag, P. O. Box, D-71087 Holzgerlingen, Germenîstan
** CLV Bielefeld, Ravensberger Bleiche 6, D-33649 Bielefeld, Germenîstan

Hemî ayetên Kitêba Pîroz ên di vê pirtûka de hatine bikaranîn, heta ku ya dijî wê neyê diyarkirin ji Kitêba Pîroz ya Kurdî hatine jibergirtin.

Peymana Kevin © Hoffnûng und Leben e.V. (Komela Hêvî û Jiyanê) Mijdar 2011 Germenîstan
Peymana Nû © Hoffnûng und Leben e.V. (Komela Hêvî û Jiyanê) Mijdar 2011 Germenîstan
Hemî mafên weşanê li ser Hoffnûng und Leben e.V. (Komela Hêvî û Jiyanê) ye.

# Kurtkirinên Kitêba Pîroz

**Kitêbên Peymana Kevin (Tewrat Û Zebûr)**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Afr | Afirandin | Wai | Waiz |
| Der | Ji Misirê Derketin | Hel | Helbesta Helbestan |
| Lêw | Lêwiyiyan | Îşa | Îşaya |
| Hej | Li Çolê Hejmartin | Yêr | Yêremya |
| Jinû | Jinûvelêkirina Zagonê | Law | Lawêj |
| Yşû | Yêşû | Hêz | Hêzekîêl |
| Ser | Serweran | Dan | Danîêl |
| Rût | Rût | Hoş | Hoşêya |
| 1Sa | 1.Samûyêl | Yow | Yowêl |
| 2Sa | 2.Samûyêl | Amo | Amos |
| 1Qir | 1.Qiralan | Oba | Obadya |
| 2Qir | 2.Qiralan | Yûn | Yûnis |
| 1Dî | 1.Dîrokan | Mîk | Mîka |
| 2Dî | 2.Dîrokan | Nah | Nahûm |
| Ezr | Ezra | Hab | Habaqûq |
| Neh | Nehêmya | Tsêf | Tsêfanya |
| Est | Ester | Hag | Hagay |
| Eyû | Eyûb | Zek | Zekerya |
| Zeb | Zebûran | Mal | Maleyaxî |
| Meth | Methelokên Silêman | | |

**Pirtûkên Peymana Nû (Încîl)**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Met | Meta | 1Tim | 1. Tîmotêyos |
| Mar | Markos | 2Tim | 2. Tîmotêyos |
| Lûq | Lûqa | Tit | Tîtûs |
| Yû | Yûhena | Flm | Fîlêmon |
| K. Şa. | Karên Şagirtan | 1Pê | 1. Pêtrûs |
| Rom | Romiyan | 2Pê | 2. Pêtrûs |
| 1Kor | 1.Korîntiyan | 1Yû | 1. Yûhena |
| 2Kor | 2.Korîntiyan | 2Yû | 2. Yûhena |
| Gal | Galatiyan | 3Yû | 3. Yûhena |
| Ef | Efesiyan | Îbr | Îbraniyan |
| Flp | Fîlîpiyan | Aqû | Aqûp |
| Kol | Koloseyiyan | Cih | Cihûda |
| 1Se | 1.Selanîkiyan | Pey | Peyxamgirtin |
| 2Se | 2.Selanîkiyan | | |